



K.T

**ZANÎNGEHA BÎNGOLÊ
ENSTÎTUYA ZIMANÊN ZINDÎ
ŞAXA MAKEZANISTA ZIMAN Ê WÊJEYA KURDÎ**

**LÊKOLÎNEK LI SER RADYOŞANOYÊN DI RADYOYA
REWANÊ DA**

Amadekar

Serhat KAYA

TEZA MASTERÊ

ŞÊWIRMEND

Dr.Öğr.Üyesi Zafer AÇAR

BÎNGOL – 2022



T.C
BİNGÖL ÜNİVERSİTESİ
YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ
KÜRT DİLİ VE EDEBİYATI ANA BİLİM DALI

ERİVAN RADYOSUNUN RADYO TİYATROLARI
ÜZERİNE BİR ARAŞTIRMA

Hazırlayan
Serhat KAYA

YÜKSEK LİSANS TEZİ

Tez Danışmanı
Dr.Öğr.Üyesi Zafer AÇAR

BİNGÖL – 2022

NAVEROK

NAVEROK	i
BİLİMSEL ETİK BİLDİRİMİ	v
KURTEBÊJE	vi
KURTE	viii
ÖZET	ix
ABSTRACT	x
PÊŞGOTIN	xi

DESTPÊK	1
Armanca Tezê	2
Rêbaz û Sînorên Tezê	3
Zehmetîyên Tezê	3

BEŞA YEKEM

1. Radyo	5
1.1. Pênaseya Radyoyê	5
1.2. Dahêna Radyoyê	5
1.3. Armanca Radyoyê	6
1.4. Di Dîroka Kurdan da Çend Radyoyên Sereke	8
1.4.1. Radyoya Bexdayê	8
1.4.2. Radyoya Levantê	9
1.4.3. Radyoya Qahîreyê	9
1.4.4. Radyoyên li Îranê	10
1.4.5. Radyoya Gurcistanê û Tiflîsê	11
1.4.6. Radyoya Rewanê	11
1.5. Cureyên Bernameyên Radyoyan	11
1.5.1. Bernameyên Mûzîkal	13
1.5.1.1. Bernameyên Muzîkan	13
1.5.1.2. Bernameyên Muzîkên bi DJ	13
1.5.1.3. Bernameyên Muzîkên Bênavber	13
1.5.2. Bernameyên Dengî	13
1.5.2.1. Bernameyên Nûçeyan	13
1.5.2.2. Bernameyên Perwerdehî û Çandî	13
1.5.2.3. Bernameyên Werzîşê	14
1.5.2.4. Bernameyên Nîqaş û Sohbetê	14
1.5.2.5. Bernameyên Pêşbirkan	14
1.5.2.6. Bernameyên Talk Show ên Henekî	15
1.5.2.7. Bernameyên Belgewarî	15
2. Bernameyeke Serbixwe “Radyoşano”	15
2.1. Terma Şano(Drama) yê	15
2.2. Du Cureyên Sereke di Şanoyê da	17

2.2.1. Tragedya.....	17
2.2.2. Komedyaya	18
2.2.2.1. Komedyaya Giran.....	18
2.2.2.2. Komedyaya Gernasîyê.....	19
2.2.2.3. Komedyaya Romantîk	19
2.2.2.4. Komedyaya Sivik	19
2.2.2.5. Komedyaya Lihevalîyayî.....	19
2.2.2.6. Komedyaya Tesîrker	19
2.2.2.7. Komedyaya karakter û edetan	20
2.3. ‘Çibûna’ Radyoşanoyê.....	20
2.4. Cudahîyên Şano û Radyoşanoyê.....	22
2.5. Rêzikên Giştî yên Şano û Radyoşanoyê	24
2.5.1. Hilbijartina mijarê	24
2.5.2. Pevxistin.....	25
2.5.2.1. Beşa Destpêkê	25
2.5.2.2. Beşa Pevçûyîne.....	25
2.5.2.3. Beşa Tevlihevîyê	26
2.5.2.4. Beşa Lûtkeyê	26
2.5.2.5. Beşa dawîyê.....	26
2.5.3. Aheng	26
2.5.4. Bicihkirina Karakteran	27
2.5.4.1. Karakterên sereke	28
2.5.4.2. Karakterên dijber	28
2.5.4.3. Karakterên Alîkar	28
2.6. Taybetîyên Radyoşanoyê.....	28
2.6.1. Efekt di Radyoşanoyan da.....	29
2.6.2. Dîyalog di Radyoşanoyan da	30
2.6.3. Monolog di Radyoşanoyan da	31
2.6.4. Muzîk di Radyoşanoyan da.....	32
2.6.5. Sehne di Radyoşanoyan da	33
2.6.6. Wext di Radyoşanoyan da	33

BEŞA DUYEM

1. Kurtebehsek li ser Kurdên Kafkasyayê.....	34
1.2. Xebatên Wêjeyî li Kafkasyayê	35
1.2.1. Dema Ewîlîn.....	36
1.2.2. Dema Duyan.....	37
1.2.3. Dema Sêyan	37
2. Xabatên Şanoyê di Êwra Kafkasyayê da.....	38
2.1. Tîyatroya Elegezê ya Dewletê.....	39
2.2. Tîyatroya Tîblîsê ya Gelêrî.....	41
2.3. Kronolojîya Şanoyên Kafkasyayê	43
3. Êrîvan Xever Dide: Radyoya Rewanê	46

3.1. Berpirsyarên Radyoya Rewanê	49
3.1.1. Casimê Celîl (1908-1998).....	49
3.1.2. Xelîlê Çaçan Mûradov (1924-1981).....	51
3.1.3. Ehmedê Gogê (1937-2003).....	52
3.1.4. Keremê Seyad(1938-2021).....	53
3.2. Çend Bernameyên Radyoya Rewanê	54
3.2.1. Bernameyên Propagandayê	54
3.2.2. Bernameyên Nûçeyan	55
3.2.3. Bernameyên Jîyana Gunditîyê	55
3.2.4. Bernameyên Edebî	56
3.2.5. Bernameyên Klaman.....	56
3.2.6. Bernameyên Radyoşanoyê	58

BEŞA SÊYEM

1. Bernameyên Radyoşanoyê di Radyoya Rewanê da	59
1.1. Şengilo, Mengilo û Xalîçengilo.....	63
1.2. Zembîlfroş	65
1.3. Serdar û Karê	67
1.4. Leyl û Mecnûn.....	70
2. Herdu Radyoşanoyên Radyoya Rewanê: <i>Bêqelen</i> û <i>Destebirak</i>	72
2.1. Bêqelen	72
2.2. Fêrikê Ûsiv	72
2.2.1. Jîyana Wî.....	72
2.2.2. Berhemên wî	73
2.3. Hilbijartina Mijarê	74
2.3.1. Pevxistin.....	75
2.3.1.1. Beşa Destpêkê	76
2.3.1.2. Beşa Pevçûyîne.....	76
2.3.1.3. Beşa Tevlihevîyê	77
2.3.1.4. Beşa Lûtkeyê	78
2.3.1.5. Beşa Dawîyê	79
2.3.2. Aheng	79
2.3.3. Bicîhkirina Karakteran	80
2.3.3.1. Karakterên Sereke	80
2.3.3.2. Karakterên Dijber	81
2.3.3.3. Karakterên Alîkar	81
2.3.4. Kadroya Lîstikvanan	82
2.3.5. Biwêj û Gotinên Pêşîyan Folklorîk di Bêqelen da	83
2.3.5.1. Gotinên Pêşîyan.....	83
2.3.5.2. Biwêj	83
2.4. Taybetîyên Radyoşanoya Bêqelen	84
2.4.1. Efektên di Bêqelenê da.....	84
2.4.2. Diyalog di Bêqelenê da	86
2.4.3. Monolog di Bêqelenê da	88

2.4.4.	Sehne di Bêqelenê da	89
2.4.4.1.	Sehneya Yekem	89
2.4.4.2.	Sehneya Duyem	89
2.4.4.3.	Sehneya Sêyem	89
2.4.4.4.	Sehneya Çarem	90
2.4.4.5.	Sehneya Pêncem	90
2.4.5.	Muzîk Di Bêqelen da	90
2.4.6.	Wext di Bêqelenê da	91
2.2.	Destebirak	91
2.3.	Wezîrê Eşo	92
2.3.1.	Jîyana Wî	92
2.3.2.	Berhemên Wî	93
2.4.	Hilbijartina Mijarê	94
2.4.1.	Pevxistin	95
2.4.1.1.	Beşa Destpêkê	95
2.4.1.2.	Beşa Pevçûyînê	96
2.4.1.3.	Beşa Tevlihevîyê	97
2.4.1.4.	Beşa Lûtkeyê	98
2.4.1.5.	Beşa Dawî	99
2.4.2.	Aheng	99
2.4.2.1.	Bicîhkirina Karakteran	100
2.4.2.1.1.	Karakterên Sereke	100
2.4.2.1.2.	Karakterên Dijber	101
2.4.2.1.3.	Karakterên Alîkar	101
2.4.3.	Kadroya Lîstikvanan	101
2.4.4.	Bîwêj û Gotinên Pêşîyan di Destebirak da	102
2.4.4.1.	Gotinên Pêşîyan	102
2.4.4.2.	Biwêj	102
2.5.	Taybetîyên Radyoşanoya Destebirakê	103
2.5.1.	Efekt di Destebirakê da	103
2.5.2.	Dîyalog di Destebirak da	104
2.5.3.	Monolog Di Destebirak da	109
2.5.4.	Sehne di Destebirak da	109
2.5.4.1.	Sehneya Yekem	109
2.5.4.2.	Sehneya Duyem	110
2.5.4.3.	Sehneya Sêyem	110
2.5.4.4.	Sehneya Çarem	110
2.5.5.	Muzîk di Destebirakê da	111
2.5.6.	Wext Di Destebirakê da	111
ENCAM		112
ÇAVKANÎ		115
PÊVEK		120
DESTEBÎRAK(Wezîrê Eşo)		120
BÊQELEN (Fêrikê Êsiv)		136

BİLİMSEL ETİK BİLDİRİMİ

Yüksek Lisans tezi olarak hazırladığım *Lêkolînek Li Ser Radyoşanoyên Di Radyoya Rewanê Da* adlı çalışmanın öneri aşamasından sonuçlanmasına kadar geçen süreçte bilimsel etiğe ve akademik kurallara özenle uyduğumu, tez içindeki tüm bilgileri bilimsel ahlak ve gelenek çerçevesinde elde ettiğimi, tez yazım kurallarına uygun olarak hazırladığım bu çalışmamda doğrudan veya dolaylı olarak yaptığım her alıntıya kaynak gösterdiğimi ve yararlandığım eserlerin kaynakçada gösterilenlerden oluştuğunu beyan ederim.

... / ... / 2022

Serhat KAYA

BİNGÖL ÜNİVERSİTESİ
YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ MÜDÜRLÜĞÜNE

Serhat KAYA tarafından hazırlanan “*Lêkolînek Lî Ser Radyoşanoyên Dî Radyoya Rewanê Da* ” başlıklı bu çalışma, 28.01.2022 tarihinde yapılan tez savunma sınavı sonucunda [oybirliği ile/ oy çokluğu ile] başarılı/başarısız bulunarak jürimiz tarafından [Kürt Dili ve Edebiyatı] Anabilim Dalı’nda Yüksek Lisans tezi olarak kabul edilmiştir.

Tez Jürisi Üyeleri (Unvanı, Adı ve Soyadı)

Başkan	: Doç. Dr. Canser KARDAŞ	İmza:
Danışman	: Dr.Öğr.Üyesi Zafer AÇAR	İmza
Üye	: Dr.Öğr.Üyesi İlyas SUVAĞCI	İmza:

ONAY

Bu Tez, Bingöl Üniversitesi Yaşayan Diller Enstitüsü Yönetim Kurulunun/...../2022 tarih ve sayılı oturumunda belirlenen jüri tarafından kabul edilmiştir.

Dr.Öğr. Üyesi Abdullah BEDEVA
Enstitü Müdürü

KURTEBÊJE

C.	: Cild
Çev.	: Çeviren
Hwd	: Her Wekî Din
J.	: Jimar
R.	: Rûpel
Wer.	: Werger
Bnr.	: Binêre

KURTE

Bi dahêna radyoyê ra gelek bernameyên cur bi cur hatine weşandin û pêwendîyên însan û gelan li dinyayê bi hevdu ra xurttir bûne. Radyo ne tenê di warê agahdarkirin û nûçeya, herwiha di warê wêjeyê da jî gavên xurt avêt û bernameyeke weke radyoşano kir nava lîteratura xwe. Di wêjeya Kurdî da jî gelek weşanên radyoyên curbicur xizmet kirine û zêdetir di warê stranan da bûne dengê çanda Kurdî. Ji wan weşanên radyoyan da yek jî weşanên Radyoya Rewanê ye ku ev weşanên kurmançî ji bo pêşketina lîteratura Kurdî bûn qonaxeke sereke û çand û hunera Kurdî bi saya weşanên radyoyê pêşdatir çû. Di nav bernameyên Radyoya Rewanê da weşanên radyoşanoyan jî cihekî grîng digirt. Şanoyên ku heya niha hatibûn nivîsin an jî radyoşanoyên ku ji nû va dihatin veçêkirin ji bo guhdarên radyoyê li ser mîkrofonê dihatin lîstin. Gelek kedkar û nivîskarên Kafkasyayê di rêya veçêkirin û nivîsîna radyoşanoyan da xebat kirine û ew weşan bi saya wan pêşdatir çûne.

Heya roja îroyîn tu xebat li ser radyoşanoyên Radyoya Rewanê nehatibû kirin. Me jî armanc kir wekî lêkolînekî li ser van radyoşanoyan bikin, yên ku di bin tarîyê da mane derxin holê û grîngîya wê nîşanî xwîneran bikin. Ev xebat jî li ser radyoşanoyên ku di Radyoya Rewanê da hatine weşandin lêkolînê dike, yên ku li ser medyayên civakî hatine weşandin bi kurtasî dinirxîne, tesbît dike û bi taybetî jî ji ber hebûna metn û qeyda wan, zêdetir li ser radyoşanoyên bi navên “Bêqelen” û “Destebirak” Radiwest e. Hêvî ew e ku ev xebata yekem a li ser radyoşanoyên Radyoya Rewanê derî li xebatên dîtir veke û ji wan xebatan ra bibe xîmekî.

Miftepeyv: Radyoşano, Destebirak, Bêqelen, Radyo, Radyoya Rewanê, Kurdên Kafkasyayê.

ÖZET

Radyonun icadıyla birlikte birçok radyo programı yayına girdi ve dünyanın birbiri ile iletişimi daha da güçlendi. Radyo sadece haber ve bilgi verme alanında değil, ayrıca edebiyat alanında da sağlam adımlar attı ve radyo tiyatrosu gibi programları literatürüne ekledi. Kürt edebiyatın da da birçok radyo kürtçe yayınlar yaparak edebiyata hizmetler yapmıştır ve özellikle Kürt ezgileri konusunda Kürt kültürüne katkıda bulunmuşardır. Kafkasya kürtlerinin edebiyatının gelişmesinde de Erivan Radyosunun önemli bir rolü olmuştur ve kürt edebiyat ve kültürü radyo yayınları sayesinde daha da ilerleme kaydetmiştir. Erivan Radyosunun programlarında radyo tiyatrolarının yayınlanması önemli bir yer tutmaktaydı. O güne kadar yazılmış tiyatrolar veya yazılan radyo tiyatroları radyo dinleyicileri için mikrofonda oynanılıyordu. Birçok ünlü Kafkasya yazarı radyo tiyatrosu yazarlığında ve düzenlenmesinde çalışmalar yürütmüş ve onlar sayesinde bu yayınlar daha da ilerlemiştir.

Bu çalışmada Erivan Radyosunda yayınlanan radyo tiyatroları üzerine araştırma yapmakta, sosyal medyada yayınlanan tiyatroları kısaca değerlendirmekte, tespit etmekte ve özellikle metinlerinin ve kayıtlarının elde edilmesinden dolayı Bêqelen” ve “Destebirak” adlı radyo tiyatroları üzerine derinlemesine durmaktadır. Umud ederiz ki Erivan Radyosu tiyatroları üzerine yazılan bu ilk çalışma gelecek yeni çalışmalara kapı aralar ve o yapılacak çalışmalara bir temel oluşturur.

Anahtar Kelimeler: Radyo tiyatrosu, Destebirak, Bêqelen, Radyo, Erivan Radyosu, Kafkasya Kürtleri.

ABSTRACT

With the invention of the radio, many radio programs were broadcast and the communication of the world with each other became stronger. Radio took solid steps not only in the field of news and information, but also in the field of literature and added programs such as radio theater to its literature. In Kurdish literature, many radios have made services to literature by broadcasting in Kurdish, and they have contributed to Kurdish culture, especially in terms of Kurdish melodies. Yerevan Radio also played an important role in the development of the literature of the Kurds of the Caucasus, and Kurdish literature and culture made further progress thanks to its radio broadcasts. The broadcasting of radio theaters had an important place in the programs of Yerevan Radio. The theaters that were written until that day or the radio theaters that were written were played on the microphone for the radio listeners. Many famous Caucasian writers have worked on radio theater writing and editing, and thanks to them, these publications have progressed further.

In this study, he conducts research on the radio theaters broadcast on Yerevan Radio, briefly evaluates and identifies the theaters broadcast on social media, and elaborates on the radio theaters called “Bêqelen” and “Destebirak”, especially due to the acquisition of their texts and recordings. We hope that this first study on Yerevan Radio theaters will open the door to new studies to come and form a basis for those studies.

Keywords: Radio teather, Bêqelen, Destebirak, Radio, Yerevan Radio, Caucasian Kurds.

PÊŞGOTIN

Kurdên Kafkasyayê di gelek çetnayên demê ra derbaz bûne, hatine derwarkirin û di nav şert û mercên zehmet da ji bo pêşketina wêjeya xwe xebat kirine. Bi taybetî piştî Şerê Cîhanê yê Yekem Kurd ji alîyê Sovyeta Yekgirtî hatin parastin û wan ji alîyê wêjeya xwe va gelek xebat kirin. Qadeke ku Kurdên kafkasyayê lê êwirîn jî xebatên şanoyê bûn. Herçiqas di dema Stalîn da Kurd careke din rastî derwarîkirinê û zehmetîyan hatibin jî li Şanogeha Elegezê da şanoyên Kurdî li ser dikê hate lîstin. Piştî mirina Stalîn jî bi avabûna para Kurdî di Radyoya Rewanê da çand û hunera Kurdî berbelavtir bû. Herwiha Radyoya Rewanê ji bilî bernameyên nûçe û yên din, dest bi bernameyên radyoşanoyan jî kirin. Kar û barê şanoyê bi carekî da ket ser milê Radyoyê bixwe. Xebatkarên radyoyê şanoyên ku heta niha hatibûn nivîsîn li gor radyoyê ji nû va veçêdikirin û didan ber pêlên radyoyê.

Ev xebat jî ji destpêka axaftinên Radyoya Rewanê heta niha li ser radyoşanoyên ku hatine dengkirin disekine. Radyoşanoyên ku wê demê dihatin kirin di dengxaneyê radyoyê da tê parastin. Lê ji ber şert û mercên wê hinek ji wan wenda bûne an jî bi dûmahîya demê ra qeyda wan xirab bûye. Me jî heya ji dest hat xwe gihand radyoşanoyên hatine weşandin. Me bi tevahî xwe gihande şeş radyoşanoyên ku Radyoyê Rewanê da hatibûn weşandin. Ji bilî du heban (Bêqelen û Destebirak) me xwe negihande metnên yên mayîn. Ji ber wê jî em di kakilê tezê da zêdetir li ser radyoşanoyên Bêqelen û Destebirak sekinîn.

Ez di serî da spasîyên xwe mamoste Dr. Zafer AÇAR dikim ku ew di rêya nivîsandina tezê da ji bo min bû çira; rê û rêbaz nîşanî min da, li ser min sekinî, bi min ra çerçivî û ji bo kemilandina min ji min ra bû mînakekî. Herwiha ez gelek ji Mîdia Rashidova ya keça nivîskar Wezîrê Eşo razî me ku wê gelek ked ji bo min da. Wisa ku ew nebûya min nikaribû xwe bigihanda pirtûka Wezîrê Eşo ya bi navê Mizgînî û min nikaribû çîroka Tîgran û Mehmûd (radyoşanoyê da navê wê Destebirak e) wek metn bida ber destê xwe. Midia Rashidova di hînbûna tîpên kirilî da jî min ra bû alîkar û ew fîrsed kete destê min ku ez çîroka Tîgran û Mehmûd latînîze bikim û di pêvekê da bigihînim ber destê we. Ez gelek spasîyên xwe Tîtalê Kerem jî dikim wekî ew ji bo min çû dengxaneyê Radyoya Rewanê û di derheq kadroyên lîstikvanan da hin agahî dane min. Herwiha ez gelek ji Nihat GÜLTEKİN

razî me wekî ew jî di rêya bidestxistina çavkanîyan da gelek bi min ra çerçifi. Dîsa ez spasîyên xwe hevalên xwe yê ezîz Ferhat MAMUK û Bahar ENÇ dikim ku wan jî di sererastkirinên tezê da gelek alîkarî dan min.

Hêvî ew e ku ev xebat ji bo pêşdaçûna lîteratûr, çand û hunera Kurdî bibe mînakeke piçûk û ji xemxurên Kurdî ra bibe palpişteki.

DESTPÊK

Radyoşano cureyeke bernameyên radyoyan e. Herwiha ev hunera vegêranî hêza xwe ji şanoyê digire. Berîya ku televîzyon pêş bikeve ev hunera vegêranî li ser radyoyan gelek populer bû. Bi taybetî dema Şerê Cîhanê yê Duyem da rola radyoyê li ser tekilî û agahdarkirinê gelek zêde bû. Herwiha erka nûçedayînê jî li ser piştî radyoyan bû. Lê piştî ku televîzyon pêş ketin û xelqê qesdî televîzyonê kir, hêza radyoyan û bernameyên wek radyoşano jî şikestin û xelqê arezûyê li wan nekirin.

Di dîrokê da yekem radyoşano wekî ya *Comedy of Danger* (komediya xetereyê) ya *Richard Hugs* tê qebûlkirin. Radyoşano xwedî terzekî ye ku ji şanoyan cudatir e. Di şanoyan da berî her tiştî dîmen tê. Divê lîstikvan ji alîyê şiklî va xwe baş adapteyî rola xwe bike. Lê ji ber ku di radyoşanoyê da dîmen tune, tiştî girîng deng û şayesandin e. Armanca lîstikvanan ew e ku guhdar bikeve di nav xeyalan û meseleyê hîs bike.

Herçiqas Kurd ji ber sedemên polîtîk û tunebûna ‘xwebûn’ê di warê radyoyê da paş da mabin jî ew tanga xwe da têkoşîyane û wan xebat kirine. Wisa ku di warê xebatên radyoyê da Radyoya Rewanê xwedî cihekî taybet e. Dema Radyoya Rewanê di sala 1955an da weke resmî dest bi xebata xwe kir bi gelek alîyan va dengê xwe gihand Kurdan. Weşanên cihêreng ên vê radyoyê ji bo pêşketina muzîka Kurdî pêngaveke giring bû. Herwiha Radyoya Rewanê di warê radyoşanoyê da jî gelek ked da û şanoyên hatine nivîsîn bi awayê vegêranî pêşkêşî cimaeta guhdaran kir.

Berîya ku radyoşano di radyoyê da bîne lîstin, “sala 1937an, bi qirara hukumeta Komara Ermenistanê, li navenda nehîya Elegezê, li gundê Kurdan-Elgezê (berê gund ra digotin Çamûşvana mezin) Têatroya Kurda ya Dewletê hate damezirandin” (Boyik, 2012: 93). Wê demê di nav Kurdên kavkazê da xebatên şanoyê pêş ketin û li gundê Elegezê bi seroktîya “Celatê Koto” (Boyik, 2012: 96). di Têatroya Elegezê ya Dewletê da şanoyên kurmancî hatin lîstin. Şanoyên ku ji alîyê nivîskarên Kurd va hatibûn nivîsîn li ser dike hatin lîstin. Pê ra jî destanên wek *Mem û Zîn*, *Ker û Kulik* û *Siyabend û Xecê* di formata şanoyê da hate lîstin.

Têatroya Elegezê tevî tev deh salan karê xwe berdewam kir. Lê ji ber sedemên şer gelek çetnayî çêbûn û di sala 1947an da zirze li derîyê têatroya Elegezê

ket. Ji bilî Têatroya Elegezê, di têtroya Tîblîsê ya Gelêrî da jî şanoyên kurmancî derketin li ser dike.

Bi vî rengî piço piço li Kavkazê xebatên şanoyê berdewam kirin. Lê dema Radyoya Rewanê bi fermî dest bi weşanên xwe kir, ji bilî kilam, meqam û muzîka Kurdî, şanoyên ku hatibûn nivîsîn li ser radyoyê hatin lîstin. Destanên kurmancî jî ji alîyê nivîskaran va ji nû va dihatin çêkirin û di formata radyoşanoyê dihatin lîstin. Herwiha gelek nivîskar, dengbêj û navdarên Kurd ên Kavkazê di beşa radyoyê ya kurmacî da kar kirin. Kesên wek Fêrikê Êsiv, Wezîrê Eşo radyoşanoyan da him di dilqên karakteran da lîstin û him jî şanoyên xwe di radyoyê da dane lîstin. Ji bilî nivîskaran, dengbêj û muzîkjenên wek Aslîka Qadir û Keremê Seyad jî di rolên radyoşanoyan da cih girtine û deng dane. Ji ber vê hindê Radyoya Rewanê di rêya radyoşanoyê da xwedî roleke sereke ye. Bi vê barmilkirinê ra di radyoyê da gelek şano hatin lîstin û pêşkêşî guhdaran bû. Gelek destanên Kurdî jî ji nû va hate veçêkirin û li ser mîkrofona Radyoya Rewanê hate lîstin. Herwiha şanoyên berîya radyoyê hatibûn nivîsîn ji nû va li gor radyoyê hatin veçêkirin û li ser radyoyê hatin lîstin. Ji destpêka para axaftina Kurdî di Radyoya Rewanê da hetanî niha ji çilî zêdetir radyoşano hatine weşandin. Ji wan radyoşanoyan tenê qeydên şeş heban hatine parvekirin. Me jî di vê xebatê da xwe gihande şeş qeydan û bi metnê wan va tenê du şano (Destebiraka Wezîrê Eşo û Bêqelena Fêrikê Êsiv) ketin ber destê me

Loma vê xebata xwe da me zêdetir giranî da ser herdu radyoşanoyên bi metn û di pêveka tezê da jî metnên herdu radyoşanoyan da.

Armanca Tezê

Piştî ku li cîhanê radyo hate dahênan û gelek cûrebername hatin pêşkêşkirin pêwendîya di navbera merivan bêtir çêbû û radyoyê li ser çand û hunerê jî xebat kirin. Di nav bernameyên radyoyan da radyoşano jî heye ku piştî dahêna radyoyê gelek popûler bû. Gelek radyoyên li ser cîhanê ev cûrebername diweşandin û di rêya pêşketina wêje û çanda xwe da xebat dikirin. Di nav Kurdan da jî Radyoya Rewanê bûbû dengê Kurdên li wir. Ji bo pêşdaçûna Kurdî di vê radyoyê da gelek arşîvên muzîkan hatin tomar kirin, gelek dengbêj strîn û gelek radyoşano li radyoyê hatin lîstin. Ev xebat jî armanc dike ku girîngiya Radyoya Rewanê bi tevî radyoşanoyên tê da hatine weşandin nîşan bike, teknîkên wan şanoyan biçespîne û raberî xwîneran bike. Di vê xebatê da ji ber kêmasîyan, me hinekî behsa radyoşanoyên bi navê

Serdar û Karê, Zembîlfroş, Şengilo, Mengilo û Xalîçengilo û Leyl û Mecnûn kirîye û bi kurahî jî li ser radyoşanoyên *Destebirak* a *Wezîrê Eşo û Bêqelen* a Fêrikê Ûsiv rawestîyane.

Rêbaz û Sînorên Tezê

Ev xebat bi teknîka analîza dokumentê ku dikeve qada lêkolînên kalîtatîv, analîza dokumentên dengî yê radyoşanoyê dike. Li ser radyoşanoyên Radyoya Rewanê ku wekî dokumentên dengî yê grîng in, ji bo edebîyat û hunera Kurdî, ev xebat dê bi analîz û deşîfrekirina van dokumentên dengî pêk were. Di pişka ewil da em ê berî her tiştî li ser radyoyê, dîroka wê ya dinyayê û cureyên wê bi xwendin û lêkolînan tesbît bikin û binivîsin. Herwiha emê di dîroka Kurdan da radyoyên ku weşanên kurmancî kirine tesbît bikin. Pişt ra jî em ê derbasî lêkolîna şanoyê, radyoşanoyê û cihê wan êdî dîrokê da raxin li ber çavan. Di pişka duyem da jî em ê li ser êwra Kavkazê ji aliyê lîteratur û xebatan va biêwirin. Pê ra jî em ê behsa şanonûsînên Kavkazê û xebatên wan bikin. Herwiha em ê li ser Radyoya Rewanê bisekinin û pê derxin ka çi xebat kiriye, di beşên wê yê kurmancî da çi cure weşan hatîye kirin, dengbêj û muzîkjenên wê kî/kê ne û kîjan radyoşano di tê da hatine listin. Di pişka sêyem da jî em ê werin li ser kakilê xebata xwe û em ê li ser radyoşanoyên berdest bisekinin. Ji ber ku *Destebirak* a *Wezîrê Eşo* hêjî bi tîpên latînî nehatîye çapkirin em ê teksta wê latînîze bikin. Ji ber ku tenê metnên radyoşanoyên *Bêqelen* û *Destebirakê* hebûn me analîza vê xebatê zêdetir bi van her radyoşanoyan sînardor kir. Radyoşanoyên ku tenê qeydê wan hebûn jî ne kurahî be jî hatîye behskirin.

Zehmetîyên Tezê

Herçiqas heya niha li ser Radyoya Rewanê û keda wê ye li ser çanda Kurdî gelek xebat hatibin kirin jî li ser bernameya wê ya radyoşanoyan tu xebat nehatine kirin. Ji ber vê yekê jî nebûna çavkanîyan çetinayîyeke xurt peyda kir. Herwiha nebûna qeydên radyoşanoyan jî di nivîsîna tezê da zehmetî afirandin. Ji ber şert û mercên dinyayê dest neda ku em herin dengxaneya radyoyê û bi tevî metnên wan qeydên radyoşanoyan bînin. Ji ber vê yekê jî me bi raya medyaya civakî xwe gihande Tîtalê Kerem, ku niha jî xebatkarekî radyoyê ye, û me ji wî qeydên radyoşanoyan xwest. Lê ji ber şert û mercên radyoyê û ji ber kevinbûna qeydan dest neda ku Tîtalê kerem ji me ra zêdetir qeyd û agahî bide. Dîsa jî em bi saya Tîtalê Kerem navên listikvanên radyoşanoya *Bêqelen* û navên çend listikvanên radyoşanoyên din hîn bûn

û ev bixwe jî ji me ra bû çavkanîyeke mezin. Ji ber hebûna metna Bêqelenê me pê ra zehmetî nekişand lê di destpêkê da metna radyoşanoya Destebirak tunebû. Me jî bi raya medyaya civakî xwe gihande keça Wezîrê Eşo ya bi navê Mîdîa Rashidova û me metna Destebirak di nav pirtûka Wezîrê Eşo ya bi navê Mizgînî da bi tîpên kirîlî hilda. Radyoşanoya Destebirak berî ku di radyoyê da were lîstin di pirtûka *Mizgînî* da di sala 1976an bi sernava *Tîgran û Mehmûd* hatibû çapkirin. Me jî serê ewil metna ber dest latînîze kir û pişt ra jî halê wê ye ku li gor radyoyê hatîye adaptekirin nivîsî û wek pêvek di dawîya tezê da nîşan kir.

BEŞA YEKEM

1. Radyo

1.1. Pênaseya Radyoyê

Amûrên ragihandinê yê girseyan di jîyana mirovahîyê da xwedî cihekî taybet in. Wisa ku di vê dewr û dewranê da ji bo ragihandinên di navbera merivan da ev amûr bargiran in. Berîya ku meriv van amûran nas bike divê bizanibe ka ragihandina girseyî çî ye; “Ragihandina girseyî yek ji wan rêyên ragihandinan e ku heman peyamê di demek kin da digihîne gelek mirovan” (Çetin, 1999: 144). Ji demên berê heya niha, bi pêşketina teknolojiyê ra amûrên wek rojname, telgraf, tîlefûn, radyo, televîzyon, kompûter, kovar û yê din di rêya ragihandina girseyî da hatine bikaranîn û her ku diçe zêdetir tîn bikaranîn. Di jîyana îroyîn da her çiqas zêdetir ev ragihandinên girseyî bi saya tîlefûn, televîzyon û înternetê pêk were jî, hin amûrên qedîm hê jî di nav gel da tî bikaranîn. Yek ji van amûrên qedîm jî radyo ye. Radyo “di zimanê latînî da ji peyva *radius* tî ku ev peyv tî wateya tîrojdayînê” (Kuyucu, 2013: 137). Bi vî teherî meriv dikare ji bo pênaseya radyoyê bibêje ku; Radyo ew “amûre ku elektromagnetîkê digire û vediguherîne frenkansên deng” (Tzp Kurdî, 2014: 102). Ji vê pênaseyê jî tî fêhm kirin, ji bo ku deng ji amûra radyoyê derkeve divê pêlên elektromagnetîk hebin. Weşanên radyoyan jî bi saya pêlên elektromagnetîk û dûvelangan xwe digihînin guhdaran. Bi kurtasî “weşana radyoyê, bi rêya deng neqlkirina bûyerekî an jî peyamekî(deng-muzîk) ye ku ev tişt bi saya wizeya pêlên elektromagnetîk(pêlên Hertz) pêk tî” (Aziz, 1981: 15).

Radyo li gor kronolijîya amûrên teknolojîk, di warê pêşketina ragihandin û agahdarkirîna di navbera mirovan da dahêneke sereke bû. Lê piştî ku dahênên ji radyoyê serkeftîtir(di qada ragihandinê da) derketin, bikaranîna radyoyê jî bi dûmahîya demê ra kêmtir bû. Dîsa jî di roja me da radyo “ji sîyasetê heya hunerê, ji çandê heya ekonomîyê, di gelek qadan da û di veguherînên civakî da bi awayekî aktîv tî bikaranîn” (Doğan, 2017: 8).

1.2. Dahêna Radyoyê

Dema meriv li dîroka dahêna radyoyê lêdikole, ne mimkune ku tenê li navêkî an jî dîrokekî rast were. “Ji bo pêşketina teknîka radyoyê gelek keddar hene lê meriv divê navê van herçar zanyarên sereke bide: James Clerk Maxwell, Heinrich Hertz, Guglielmo Marconi, Lee de Fores” (Aziz, 1981: 8). Ji bo pêşketina radyoyê, di gelek

welatan da xebatên cûr bû cûr hatine kirin û di axirîyê da radyo û weşanên radyoyê dest pê kirine. Ger meriv di rêya dahêna radyoyê da kronolojîyekê çêbike dê wiha be:

“1800: Fîzîkzanê îtalyan Akessandro Volta pîla ceyranê keşf kir.

1864: Hebûna pêlên elektromagnetîk Ji aliyê fîzîkzanê îngilîz J.C. Maxwell hate keşf kirin.

1882: Lêkolînerê îngilîz William Henry Preece ji bo ku deng neqî bike ragihbarîya avê bi kar anî.

1888: Fîzîkzanê alman Heinrich Hertz Maxwell teorîya xwe pêk anî û di laboratuwarê da pêlên elektromagnetîk çêkirin.

1899: Lêkolînerê îtalyan Guglielmo Marconi yekem peyama radyoyê gihande wêdetirê Qenala Îngilîzan(Behra Manş).

1900: Yekem pêla elektromagnetîk ya deng ji aliyê Reginald Aubrey Fessendenê fransîz 1,6 kîlometr dûr hate şandin.

1907: Lee De Forest yekem weşanên radyoyê(muzîk) bi amûra bi navê Audion Tube dike.

1927: Edwin Amstrong banda Modulasyona Frekansê (FM) dît” (Doğan,2017: 12-13).

Piştî ku van zanyaran keşfê xwe kirin û ji bo weşanên radyoyê hîmên xurt danîn, weşanên bi rêk û pêk û profesyonel dest pê kirin. “Li Pittsburg a bajarê YDA yê di sala 1920an weşana nûçeyên hîlbijartinê, ku ev weşan ya îstasyona radyoyê ya bi navê KDKA yê bû, di heman demê da dibe yekemîn mînakê weşanên radyoyê yên profesyonel” (Trt Akademi, 2020: 7). Bi vî awayî sala 1920î ji bo weşanên radyoyên profesyonelî dibe destpêkek. Piştî YDA yê “welatên din jî di warê weşanan da dereng nemane; herwiha di sala 1922an da li Îngilistanê, Fransayê, Yekîtiya Sovyetê, di sala 1923an da jî li Almanyayê weşanên radyoyê dest pê kirine. Pişt ra jî bi dorê heya sala 1927an di welatên wek Arjantîn, Awistralya, Îtalya, Japonya, Norwêç, Zelandaya Nû, Hollanda, Swîsre, Çekya, Yekîtiya Afrîkaya Başûr da Weşanên radyoyan dest pê kirine” (Aziz, 1981: 10).

1.3. Armanca Radyoyê

Gelemperî amûrên ragihandinê yên girseyan di wê armancê da nin ku dixwazin dengê xwe bigihînin gel û wan jî agahîyan bêpar nehêlin. Di radyoyê da jî armanca sereke ev e. Piştî ku radyo hate dahênan û di gelek welatan da dest bi weşanên

profesyonelî kir, bi yek dengî hemû guhdar kir bin bandora xwe û wisa jî rê li ber wan da. Wisa jî ew agahîyên ku merivan dixwast bi hemû miletî va pê bihese bi dahêna radyoyê va mimkun bû û radyo di vê erka xwe da serkeftî bû. Gelemperî “weşanên radyoyan li dora pênc armancên sereke xwe dişidîne ku ev; nûçevanî, perwerdehî, propaganda, reklamên xizmetdar û hebûnên wan, kêfxweşkirin, qanihkirin û çalakirina guhdaran e” (Kasım, 2011: 64). Piştî ku guhdar guh didêre radyoyê di hal û tevgerên wan da guherîn çêdibin, ji der û dora xwe haydar û agahdar dibin. Jixwe weşanên radyoyan “li gor daxwaz, pêwendî û zewqên guhdaran şikl digre” (Koç, 2012: 70). Ji ber vê yekê jî gelek bernameyên cur bi cur di radyoyan da tên weşandin û pê ra jî di dilê guhdaran da cî digire.

Hilbet piştî ku radyo di hemû dinyayê da popularîteya xwe bi dest xist û hêza wê ya li ser gel ji alîyê dewletî û serokên wan hate ferqkirin, ji bo armancên siyasî jî hate bikaranîn. “Deshilatdarên ku dixwestin îdeolojîyên xwe belav bikin, welat an jî civakên ku ji bo azadiya xwe têdikoşîyan ji vê hêza raydoyê sûd wergirtine” (Kuruoğlu, 2016: 8-11).

Berîya ku em mînakên bidin divê em wiha bidin zanîn ku “radyo di dîroka xwe da dikare li ser sê êwran dabeş bibe: 1-Dahêna wê(1860-1920), 2- Êwra radyoyê ya zêrîn(1920-1945), 3-Radyoya piştî televîzyonê(ji 1945an heya roja me)” (MEB, 2012: 2). Dema radyo hê di qonaxa dahênê da bû ji bo agahdarkirin û nûçegihanîyê gelemperî rojname dihatin bikaranîn. Lê ji ber ku hêza rojnameyê ne wek ya radyoyê bû, agahdarbûneke girseyî di nava civakê da çenedibû. Lê piştî ku weşanên radyoyê dest pê kirin civak bi carekî ket bin bandora radyoyê. Herwiha “pêşdaçûnên radyoyê di dema Şerê Cîhanê yê Duwem da xwe gihande bi milyon guhdaran û ji bo wan bûn bengînîyekê” (Trt Akademi, 2020: 27). Di vê rêyê da meriv dikare bibêje ku radyo ji ber ku pêlên dangan e û xwe digihîne her kesî, di wê dewrê da wek amûreke propagandayê gelek hatîye bikaranîn û gel di bin bandora xwe da hîştîye. Wisa jî “bandora wê ya civakî û psîkolojîk herî zêde di Şerê Cîhanê yê Duwem da xwe dide der” (Koç, 2012: 71). Di şerê Cîhanê yê Duwem da “aktorên siyasî û civakî yên wê demê, ku dixwestin hêza xwe xurttir bikin an jî civakê di hêla xwe da bixşînin, çavgirtî amûra radyoyê bikaranîn ku wê demê di nav amûrên ragihandinê da radyo ya herî pêşketî bû” (Öztürk, 2017: 165). Wek mînak şerê di navbera Almanya û Yekîtiya Sovyetê da bandora propagandayên radyoyan gelek bû. Li Yekîtiya Sovyetê, ji bo propagandaya li hember êrîşa Almanyayê, di radyoya Moskovayê da

weşan dihatin lidarxistin. “Di radyoyan da timî bangewazî ji bo gel dikirin û dixwestin gel li hember hêzên Almanayê yê dagirker şer bikin û tevî refên hêzên partîzanan bibin” (Gülada, 2019: 128). Helbet ev propagandayên radyoyê li hemû welatan dihate kirin. Wek mînak wê demê li Tirkîyê jî di salên 40î, di radyoyan da “weşanên bi navê *Saeta Gernasîyê* û *Leşker Diaxive* tê weşandin ku ev weşan ji bo sinca gel li hember şer dayne dikirin” (Trt Akademi, 2020: 37).

1.4. Di Dîroka Kurdan da Çend Radyoyên Sereke

Weke her neteweyên din, Kurd jî di hêla weşangerîya radyoyên Kurdî da têra hêza xwe kar kirine û dengê xwe dane bihîstin. Lê ji ber tinebûna dewleteke yekgirtî îstasyonên radyoyan ên xweser nikaribûne ava bikin. Lê dîsa jî Kurdan li gor rewşa dinê û li gor polîtîkayên dewletên ku lê dijîyan çand û hunera xwe di radyoyan da bi gel dane bihîstin. Wek mînak çanda dengbêjîya ku ji “xwe”bûna Kurdan heya niha hatîye, bi dahêna radyoyê û bi belavbûna wê ra êdî di radyoyan da hatîye bihîstin û tomar kirin. “Bi taybetî di salên 1930yî da Radyoya Bexdayê, di salên 1940î da Radyoya Urmîyê û piştî salên 1950î jî Radyoya Rewanê hemû civak hildaye bin bandora xwe û pê ra jî dengbêjan ji wan sûd wergirtine” (Keleş, 2019: 387). Di derbarê dîroka yekemîn weşana Kurdî ya radyoyê da agahîyeke teqez tune. “Weke ku tê zanîn yekem weşana Kurdî di sala 1924an”(Ağcakulu, 2012: 53) li Sovyeta Yekgirtî hatîye kirin. “Lê gorî agahiyekê, yekem weşana radyoyê bi zimanê Kurdî di radyoya *Şerq el-Ednayê*(Radyoya Ereban ya Rojhilata Nêzik) ku li Jaffayê ji aliyê Brîtanya va hatibû damezirandin dest pê kiriye” (Amudî, 2017). Lê di derbarê van herdu radyoyan da jî tu agahî tune.

1.4.1. Radyoya Bexdayê

Radyoya Bexdayê di dîroka weşanên Kurdî da xwedî pîleyeke mezîn e. Ji ber ku vê radyoyê û beşên wê ên Kurdî gelek mazûvanî û mêvandarîya çand û hunera Kurdî kirîye. “Ev îstasyona radyoyê ku di sala 1936an ji aliyê hikûmeta Iraqê va hatîye damezirandin, di serî da 15 xulekan bi soranî weşan dikir lê di sala 1946an pê va weşana Kurdî bi 2 saet û 45 xulekan domand” (Ağcakulu, 2012: 51). Bêguman Radyoya Bexdayê ji bo pêşdaçûna çanda Kurdî pêlekaneke sereke bû”. Dengbêjên navdar yê wekî M. Arîfê Cizîrî, Îsa Berwarî, Meyrem Xan, Seîd Axayê Cizîrî, Nesrîn Şîrwanî, Eyşe Şan” (Engin, 2019: 417) di vê radyoyê da kilam gotin û çanda dengbêjîyê pêş da birin. “Weke tê nasîn ku Meryem Xan bi rêya Radyoya Bexdayê

dengê xwe daye bihîstin û bûye yekemîn jina dengbêj ku kilamên wê hatine tomarkirin û plakên kilamên wê hatine derxistin” (Elçi, Cengiz, 2019: 981).

Weke Amûdî (2017) behs dike, Dema Radyoya Bexdayê ku serî da 15 xulekan weşana Kurdî dikir berpirsyar û xebatkarê beşa radyoyê *Kamil Kakemîn* bû. Piştî ku wextê weşana Kurdî dirêj bû çend rewşenbîrên din jî li radyoyê zêde bûn û xebitîn. Yek ji wan jî *Sadiq Behadîne Amêdî* bû ku him karmendê beşa radyoya Kurdî bû û him jî li zaningeha Bexdayê mamoste bû. Bi vî teherî derîyê Radyoya Bexdayê ji bo vegotin û çanda Kurdî zêdetir vebû û ew çand belavtirê Kurdan bû. Bi xêra vê radyoyê gelek kilamên Kurdî hatin tomarkirin. Wek mînak Hesên Zîrek di sala 1953an da diçe Radyoya Bexdayê bi tevî Orkestraya Radyoyê bi dehan kilamên xwe tomar dike. Herwiha Mihemed Arif Cizrawî jî di Radyoya Bexdayê da distrê û 14 plaqên xwe di radyoyê da tomar dike. Dîsa gelek kilamên hunermendên Kurd ên wek Tahir Tewfîq, Elî Merdan Iliyas Xidir, Hisên Ni’emet, Mihemed Şêxo di radyoyê da bi kilmên xwe strane û bi dengê xwe şewq vedane.

1.4.2. Radyoya Levantê

Radyoya Levantê yek ji wan radyoyan e ku weşanên Kurdî jî kirîye. Ev radyo di Şerê Cîhanê yê Duwem da li Beyrûdê hatîye vekirin. “Radyoya Levantê, ku di rêveberîya hikûmeta Fransayê da bû, 5ê Adarê di sala 1941an dest bi weşanên xwe kir û heftê du caran bi nîv seatê weşanên nûçeyan û muzîkên Kurdî dikirin” (Ağcakulu, 2012: 50-51). Ji ber ku Kurd jî li ser axa Rojhilata Navîn gelekî qedîm bû, vê radyoyê dixwast Kurdan jî ji agahîyan bêpar nehêle. “Radyoya Levantê ya ku bi fransizî û erebî weşan dikir û xîtabê erebên Sûrîyeyê dikir, pê ra jî li hember îngilîzan weşan dane dest pê kirin. Ev radyo ji bo Kurdan jî agahdar bike weşanên kurt û bi Kurdî dikir. Herwiha ji wan weşanan hinek digihîştin Kurdên li Turkîyeyê jî” (Şeker, 2017). Lê “piştî 1ê Nîsana 1946an ev îstasyona radyoyê kete destê hikûmeta Lûbnanê û pê ra jî ev weşan kuta bûn” (Ağcakulu, 2012: 50-51).

1.4.3. Radyoya Qahîreyê

Di dîroka weşangerîya radyoya Kurdî da Radyoya Qahîreyê jî xwedî pîleyeke berz e. Ji ber ku ev radyo rasterast li hember Pakta(hevpeymana) Bexdayê piştî Kurdan dikir û xîtabê hesta neteweperwerîya Kurdan dikir. “Beşa Kurdî yê Radyoya Qahîreyê di 1ê Hezîrana 1957an da li kolana El-Şerîfê dest bi weşana xwe kir. Di sala 1963an de, radyo çû avahiya Masbîroyê ku her rojê ji saet çarê êvarî heta 5

pêncê êvariye dewam dikir, anku rojê saetekê weşana bi Kurdî dikir” (Amûdî, 2017). Ev weşanên Kurdî “di serdema serokê Misirê yê berê Cemal Ebdunasir de bi rêbazeke dijî Pakta Bexdayê weşan dikir û piştgiriya pirsra Kurd dikir. (Amûdî, 2017). Ev weşanên Kurdî di wê armancê da bûn ku Kurdên li Iraqê li hember rejîma Bexdayê rakin. Ev bixwe polîtîkayeke Misirê bû. Ji ber vê yekê jî di radyoyê da “bi tevî helbestên Kurdî yên neteweperwerîyê, ku di nava wan da sirûdên Ey Re8qîb û Ey Kurdino jî hebûn, weşanên muzîkên Kurdî dihate kirin”(Ağcakulu, 2012: 53).

1.4.4. Radyoyên li Îranê

Weke Radyoya Bexdayê, radyoyên ku li Îranê hatine vekirin û weşanên Kurdî kirine gelek xizmet ji pêşdaçûna çanda Kurdî kirine. Wekî Mahabad (2020) behs dike li gor dîrokên fermî di sala 1968an da Şahê Îranê yê bi navê Muhammed Riza Şah Pehlewî dixwaze têkilîyên xwe bi rêvebirîyên xweser ra xurt bike. Loma jî radyoya Êrmîyeyê û Radyoya Abadanê ava dike. Wê demê Sovyeta yekgirtî piştgiri dide û di sala 1969an da di Radyoya Êrmîyê da weşanên Kurdî dest pê dikin. Ev radyo serê pêşî di hetfeyekê da seatekê weşana Kurdî dike. Lê pişt ra jî ev seatek dibe du seatan û li Tehran û Kirmanşahê deng vedide. Di vê radyoyê da gelek navdarên Kurd cî girtine û kilamên xwe gotine. Brahîmê Newrozî, Hemîd Yusufî, Mistafa Elîzade û Îran Mucerd a bi navê Îran Xanim dihate nas kirin hinek ji wan navdaran in. Di vê radyoyê da bi hezaran kilamên Kurdî tên tomar kirin û tê arşîvkirin. Ev jî dibe gencîneyekê û digihîje roja me. Herwiha ev weşan bandoreke baş li ser Kurdên Maku, Êrmîye û Mahabadê dikin. Weke ku tê dîtin “Radyoya Êrmîyê jî ji bo ku dengbêj dengê xwe bidin bihîstin bûye xwedî mîsyoneke cidî” (Bozkuş, 2019: 108).

Helbet ji bilî Radyoya Êrmîyeyê, li Îranê hin radyoyên din jî bi domahîya demê ra vedibin û qurt bi qurt weşanên Kurdî dikin. Paksirêşt (2019) navê radyoyên li Îranê wiha dide û dibêje: “**Radyoya Kirmaşanê:** Ev radyo ya Têranê bû, piştî 14 salan veguhestin Kirmaşanê lê piştê dîsan vegerandin.

Radyo Têran: Ji sala 1984an ve ji Kirmaşanê hatiye Têranê.

Radyo Êrmîye: Hîn jî heye.

Radyo Meşed: Hîn jî heye”.

1.4.5. Radyoya Gurcistanê û Tiflîsê

Li Gurcistanê jî di radyoyan da weşanên Kurdî hatine kirin. Li gor hin agahîyan serê pêşî “di sala 1946an di Radyoya Tiflîsê da bernameyeke nîv saetî tê çêkirin ku ev bernameya Kurdî ji agahî û muzîkan pêk dihat. Piştî ra di 29ê Îlona 1978an di Radyoya Gurcistanê da bernameyeke nûçeyan ya bi navê *Deng û Be’san* tê çêkirin û ev bername hefteyê da 20 xulek bûye” (Ağcakulu, 2012: 54). Berpirsyar û avakare Radyoya Gurcistanê jî Keremê Anqosî bûye. “Keremê Anqosî ji sala 1978an heta 2004an di Radyoya Gurcistanê da serok û rêvebir bûye” (Kevirbirî, 2019). Radyo piştî 2004an 3 salan navber dide weşanên xwe û piştî ra dîsa dest bi weşanên xwe dike. “Vê gavê ev radyo bi navê “Radyo ronkayî” weşanên xwe dike û ji bilî 3 salan bi temamî 38 sal in weşanên xwe didomîne” (Erkmen, 2019).

1.4.6. Radyoya Rewanê


Di dîroka radyoyên Kurdî da yek ji radyoyên Kurdî Radyoya Rewanê ye ku li ser Kurdan gelek bandor kirîye û ji bo çand û hunera Kurdî xebitîye. Radyoya Rewanê “sala 1955an meha çîle da bi resmî dest bi weşana xwe kirîye”(Boyik, 2012: 73). Ev radyoya ku li Ermenistanê ava bû ji çandê heya dîrokê bû dengê Kurdên Sovyetê û bi dû ra jî dengê xwe gihand gelek welatên din. “Di demeke kin da nav û dengê Radiyoya Yêrêvanê li Ermenistanê, Kurdên welatê Sovyetê û hidûdên wê der belavbû” (Boyik, 2012: 74). Ev radyo di serî da bi alîkarîya merîvên Ermenî û bi dû ra jî gihîştina Kurdên xwendî derkete pîleyeke jorîn. Serî da berpirsîyarî “heta sala 1957an nivîskarê navdar Casimê Celîl” kir. Piştî ra jî “sala 1957an wek berpirsîyarê beşê Xelîl Mûradov hate kivşkirin”(Boyik, 2012: 74). Jixwe gelek kedkar û karmend hene di Radyoya Rewanê da. Em ê di beşa duyem ya vê tezê da bi hurgulî li ser Radyoya Rewanê rawestin û êwr bi êwr şiro vekin.

1.5. Cureyên Bernameyên Radyoyan

Meriv dikare bibêje ku radyo hemû şaxên hunerê û hemû rêyên agahdarkirinê di hundirê xwe da dihevwîne. Herwiha li gor daxwazên gel bernameyên cur bi cur hatine çêkirin û hê jî tene çêkirin. Lê bernameyên radyoyan li gor dewr û dewrana xwe şikl girtine û wisa di radyoyan da weşan hatine kirin. Wisa ku “radyo di hin êwrên deman da pirtir weşanên nûçevanîyê kirine, di hin deman da jî pirtir weşanên kêfê kirine” (Kuyucu, 2013: 376). Helbet ev jî li gor rewşa jenîna dinyayê şikl girtiye. Wek mînak di Şerê Cîhanê yê Duwem da zêdetir weşanên nûçevanîyê hatiye

kirin û zêdetir hewla radyoyê li ser propagandayan bûye. Lê li gor rewşa dinyayê û herwiha bi pêşketina teknolojiyê ra jî bernameyên radyoyan cihereng û çê bûne. Bi taybetî “piştî ku di sala 1955an da teknolojiya stereoyê derket û radyoyê jî weşanên stereoyê kirin, muzîk di radyoyan da pêş ket” (Kuyucu, 2013: 376).

Azîz(1981: 56) ji bo cureyên bernameyên radyoyê wiha dibêje û disenifîne: “Meriv dikare pêşîyê weşanên radyoyan bi wesfeke giştî li ber çavan bigire û di nav du koman da bicivîne. 1-Bernameyên Dengî, 2-Bernameyên muzîkal”. Herwiha Azîz (1981: 56) di derbarê pênaseyên van cureyên bernameyan da wiha dibêje: “Bernameyên dengî ew weşanên bi deng in ku xwe digihînin gel. Bernameyên muzîkal jî ew weşan in ku bi muzîkê dengê xwe digihînin gel an jî ew girseya ku bi wê muzîkê xwe tesele dike”.



Bernameyên Nûçeyan
Radyoşano(Lîstikên Radyoyê)
Bernameyên Perwerdehî û Çandî
Bernameyên Werzîşê
Bernameyên Nîqaş û Sohbetê
Bernameyên Pêşbirkan
Bernameyên Talk Show ên Henekî
Belgewart

Bernameyên muzîkan
Bernameyên Muzîkên bi DJ
Bernameyên Muzîkên Bênavber

1.5.1. Bernameyên Mûzîkal

1.5.1.1. Bernameyên Muzîkan

Bernameyên muzîkê ew weşan in ku xwe bi rêya muzîkê digihînin gel an jî girseya ku bi vê bernameyê ra eleqedar e. (Tufan, 2010: 60). Di vê curebernameyê da divê weşan bi baldarî bîn weşandin û muzîkên ku tên hilbijartin li gor guhdaran bibe. Ger di van bernameyan da muzîkên li gor dilê guhdaran neyê weşandin guhdar kêr dibin û ji weşanê diqetin. Ji ber vê yekê muzîkên li gor dilê guhdaran dê li gor berjewendîyên radyoyan bibe. Di van bernameyan da xîmên sereke muzîk û pêşkêşvan e. “Meriv dikare muzîkên vê bernameyê wek slow, klasîk, muzîkên dansê, muzîkên folklorîk û yên din kategorîze bike”(Aziz, 1981: 56).

1.5.1.2. Bernameyên Muzîkên bi DJ

“Bernameyên muzîkên bi Dj, ew curebername ne ku bi rêvebirîya pêşkêşvan mûzîkên hatine hilbijartin tên nasîn û bi awayekî herikbar bi hevdu va tên girêdan” (Tufan, 2010: 52). Bi taybetî guhdarên van bernameyan ciwan in. “Di van curebernameyan da tenê agahdarkirin ji bo muzîkan û çalakîyên muzîkan tên kirin û ji aliyê pêşkêşvanên bi navê “Dj” tên pêşkêşkirin” (Kuyucu, 2013: 383).

1.5.1.3. Bernameyên Muzîkên Bênavber

Wek navê vê curebernameyê va jî kifş e, muzîkên di vê bernameyê da bênavber in. “Di weşanên vê radyoyê da ne pêşkêşvan û ne jî Dj diaxive” (Kuyucu, 2013: 383). Piştî ku ji aliyê weşangerên radyoyan hate fêmkirin ku hin girse tenê ji bo muzîkan radyoyê guhdar dikin, ev curebername jî hate avakirin.

1.5.2. Bernameyên Dengî

1.5.2.1. Bernameyên Nûçeyan

Di vê curebernameyê da “nûçeyên ku qîmeta wan tên girtin bi hurgûlî tên vekolîn” (Türkmen, 1994: 23). Bi dû ra jî di radyoyan da bi dengekî asan tên pêşkêşkirin. Di vê curebernameyê da armanc bûyerên ku di welêt û dinyayê da diqewimin, bi perspektîfeke bêhêl, bigihînin guhdaran. Di bernameyên nûçeyan da deng asan û kêr in. Gelemperî yek an jî du kes diaxife. Meriv dikare bibêje ku di bernameyên nûçeyan da gelekî kêr e an jî muzîk têtê bikaranîn.

1.5.2.2. Bernameyên Perwerdehî û Çandî

Radyo bi weşanên xwe yên perwerdehî û çandî jî xwe digihîne gel. Di bernameyên çandî da armanc ew e ku çandên gel ji guhdaran ra vebêje û şirove bike.

Herwiha ev curebername dixwazin çanda xwe nîşanî neteweyên din bikin. Di bernameyên perwerdehiyê da jî armanca sereke agahdarkirin e. Bi pê ra jî hewl didin ku şîretan li guhdaran bikin û di derbarê zanîna wan da pîvanê bikin û lê zêde bikin. “Di qada perwerdehiyê da sê armancên giştî yên bikaranîna radyoyan hene ku ev: di waneyan da raste rast bikaranîna radyoyê, bikaranîna wê ya di dibistanan û ji bo perwerdehiyêke giştî bikaranîna wê ya di nav civakê da ye (Tufan, 2014: 111).

1.5.2.3. Bernameyên Werzîşê

Yek ji bernameyên radyoyan bernameyên werzîşê ne. “Bernameyên werzîşê ew weşan in ku bûyerên girîng ên di qada werzîşê da radigihîne, nûçe û bûyerên di derbarê werzîşê da bi kurahî lêdikole û hemû bizavên werzîşî bi weşana zindî digihîne guhdaran” (Ataman, 2013: 56). Di bernameyên werzîşê da hemû bizav û binbeşên werzîşê tê ragihandin. Lê weke ku Aziz jî dibêje “di weşanên werzîşî da hedefa sereke guhdarên mêr in” (Aziz, 1981: 56). Ji ber ku di cîhanê da mêr zêdetir nêzîkî bizavên werzîşê ne.

1.5.2.4. Bernameyên Nîqaş û Sohbetê

“Bernameyên nîqaşan ew weşan in ku xwedî pêşkeşvanekî objektîf in û du an jî zêdetir axivêrên wan hene ku fikrê wan cihê ne”(Kuyucu, 2013: 381). Di van bernameyan da pêşkêşvan weşana xwe dide dest pê kirin û li ser mijareke hîlbijartî axivêran dor bi dor dide axaftin. “Bernameyên sohbetê jî ew weşan in ku pêşkêşvan ew kesên di sektorên cihereng û populer da vedixwîne bernameya xwe û bi wan ra sohbetê dike. (Kuyucu, 2013: 381). Di herdu curebernameyan da jî pêşkêşvanekî radyoyê heye û bernameyê bi rê va dibe. “Bernameyên bi vî teherî dibe ku bi vegotina spîkerekî an jî pêşkêşvanekî be, axaftina di navbera du kesan an jî bi terza pirs-bersivê bibe (MEB, 2011: 33).

1.5.2.5. Bernameyên Pêşbirkan

Berî ku teknoloji bi pêşketina xwe va hîmê xwe di zemîna dinyayê da bikute û berî ku televîzyon pêş bikeve, di radyoyan da bernameyên pêşbirkan gelek navdar bûn. Lê bere bere hêza bernameyên pêşbirkan jî di radyoyan da şikest. “Bernameyên pêşbirkan ên ku di radyoyan da tên pêşkêşkirin ew weşan in ku bi awayekî şên hînîkirinê dike aramanca xwe û wisa tên damezrandin” (Kuyucu, 2103: 380). Bi vî teherî meriv dikare bibêje ku bernameyên pêşbirkan di formata şên-agahî da ye. Ji

ber vê yekê jî “di weşanên pêşbirkan da ji bo zindîmayîne vegotin esas e” (Aziz, 1981: 68).

1.5.2.6. Bernameyên Talk Show ên Henekî

Bernameyên talk show ên bi henekî “ji aliyê pêşkeşvanekî û bi tevî alîkarên wî va tê amade kirin û pêşkêşkirin” (Kuyucu, 2013: 381). Ev bername “bi şeweya xwe ya kêfê va tê ber çava û temaşevan di stuyoyê da an jî guhdar bi alîkarîya dûvelangan tevî van bernamayan dibin” (Gül, 2009: 63). Weke her bernameyên radyoyan, di vê bernameyê da jî pêşkeşvan li ber çav e û barê giran li ser wî ye. Ji ber vê yekê jî “bernameyên talk showên henekî jêhatîbûn û serkeftîna takekesî ya pêşkêşvan dihevin” (Kuyucu, 2013: 381). Ji bo pêşdaçûn û serketina vê bernameyê gelek rê û rêbaz tête bikaranîn. “Lê bi taybetî ji bo bernameyên henekî dengên çepikan li pişt weşanê tê dayîn” (Aziz, 1981: 66) ku zêdetir bala guhdaran bikişîne û guhdar li hevdu zêde bibin.

1.5.2.7. Bernameyên Belgewarî

Belgewartî di eslê xwe da xwe dispêre rastîyê. Ji ber vê yekê jî di bernameyên belgewartî da rastî li pêş e. “Bernameyên belgewartî xîmê xwe li ser delîlên rasteqînê, çavkanîyên nivîskî û roportajan ava dike. Armanca van bernamayan bi taybetî agahdarkirin û pêşkêşkirina rewş an jî rasteqîrokekî ye” (Kuyucu, 2013: 382). Herwiha di bernameyên belgewartî da rastî nayên veşartin û bi awayekî objektîf li ber çava tên raxistin.

2. Bernameyeke Serbixwe “Radyoşano”

Berî ku em dest pê bikin û radyoşanoyê ji hevdû veçîrînin divê em hinekî behsa şanoyê bikin. Ji ber ku rasterast şano û radyoşano têkilî hevdû ne. Lê divê bête zanîn ku radyoşano binbeşeke şanoyê nîn e û lê di rêya hûnerê da jî nêzikî hevdû ne.

2.1. Terma Şano(Drama) yê

Dema mirov li nav cureyên hunerê da çepilê şanoyê dikişîne û dixwaze li ser wê vekolîneke kûr bike, bêguman li rast behreke dûr û derez tê. Wisa be, em ê vê hunera ku hê singê xwe Yewnana Antîk da kutaye û heta vê kêlikê hatîye çawa nas bikin? Divê berî her tiştî em wisa destnîşan bikin ku “şano ew şaxeke hunerê ye ku li ser jîyanê disekine, bingeha wê li ser mirovan e û arasteyî mirovan dibe” (Kaya, 2007: 240). Yanî şano bi xwe li ser bingeha mirovahîyê û jîyanê welidîye. Brecht, li ser “çibûna” şanoyê dibêje ku “Şano ji bo MEBesta kêfxweş kirinê, ew bûyer in ku bi

şayesandinên xurt hatine çêkirin û an di nava mirovan da derbas bûne, hatine gotin an jî bûyerên pevxistî(xeyalî) ne” (Brecht,1993: 25). Bi gotina Brecht jî tê fêmkirin, wekî şano li dor bûyerên ji berê çêbûyî an jî xeyalî difilite û wisa hildide dest. “Jê cuda, ew taybetmendîya şanoyê ya ku ji hunêrên din cihê dibe ew e ku şano ji aliyê zarîkirinê da jîyanê bi rêya mirovan li ser dikê dide bercestekirin” (Nutku, 2001: 28).

Dema mirov li koka şanoyê dikole tê digihîje ku kokên wê heta civakên prîmîtîv diçe. Di civakên prîmîtîv da qaîde û zagonên dînî û pê ra jî ew rîtuêlên wan ên dînî tovê şanoyê reşandine û bûne sedema peydabûna lîstikên şanoyê. Lê ji aliyê term û ji aliyê zildana tovê şanoyê va mirov dikare bibêje ku Yewnana antîk ji bo şanoyê destpêkek e. Yewnanîyan li gor bawerîyên xwe ji bo xwedayên xwe rîtuêlên dînî dikirin, stran digotin û reqs digirtin. Weke ku Şener mînak dide (2003: 11) di nav îlahîyên yewnanan da reqsek hebû ku navê wê dromenon bû. Reqsvan di van rîtuêlên dînî da ji bo xwedayê xwe li ber xelqê reqs digirtin û ji xwedayê xwe hêz dixwastin. Herwiha li gor bawerîya wan piştî reqsê xwedayê wan ji nû va diwelidî, dihat li nava rîtuêla dînî û hêz li xelqê belav dikir. Helbet di bawerîyên yewnana antîk da tenê xwedayek tunebû. Ji ber vê yekê gelek rîtuêlên dînî û reqs hebûn. Şener (2003: 11) wiha destnîşan dike ku di mîten Osîrîs, Attîs, Tîammuz, Adonîs, Dîonîzos, Demeter da tê dîtin ku bûyerên mirin û ji nû va vejîn bi şêweyên cur bi cur in. Bi tevgerî teqlîtkirina van mîtan binyata dramayê jî avêt. Peyva dramayê jî bêguman ji van reqsên bi navê dromenon tê. Herwiha Nutku (2001: 27) jî ji bo peyva dramayê wiha dibêje ku “Peyva Dramayê di yewnanîya kevin da ji bo ‘tiştekek kirin’ an jî ‘tiştekekî ku tê kirin’ dihat bikaranîn. Herwiha wateyeke din ya dramayê jî di yewnana kevin da “lîstin” e.

Yewnanîyên antîk, di warê pêşketina çand û hunerê da serkeftî û xebatkar bûn. Bi vî teherî, ev yewnanîyên ji bo çand û hunera xwe pozşewitî, di warê hunerê da gavkirinên xurt pêk anîn. “Serdema Klasîk a şaristanîya Serdema Yewnana Antîk, ku di navbera sedsala V. û IV. a BZê de pêk hatîye, ji aliyê çand û hunerê ve geştirîn serdem e. Di warê tragedya û komedyayê de mezintirîn berhem di vê serdemê da hatine nivîsîn” (Şener, 2015: 15). Di warê xebatên şanoyî da “erka şanoya yewnana antîk ew bû ku him welatîyên xwe ji aliyê fikirkirin, azadî û berpirsîyarîyê da perwerde bike him jî dorhêleke wisa ava bike ku nîrxên wan were parastin û li ber zêdegavîyan were girtin” (Şener, 2003: 86).

Piştî ku şano li yewnana kevin zîl da hêdî hêdî li dinyayê berbelav bû û binbeş û çeşnên wê afirîn. Helbet bi dûmahîya demê ra û li gor rêbazên wek romantîzm û realîzm afirîn û şanoyên modern ên wek şanoyên politîk û absurd afirîn. Di roja me ya îroyîn da şanoyê heta postdramayê jî kok vedaye.

2.2. Du Cureyên Sereke di Şanoyê da

2.2.1. Tragedya

Şano, li gor naverok û şeweyên xwe ji hevdu vediqete û cureyan peyda dike. Yek ji cureyên şanoyê jî Tragedya ye. Dema meriv xîmê tragedyayê palpişt bike, dîsa li rastî yewnana Antîk tê ku “B.Zê sala 534an da Peîsîstaros li Atînayê yekem pêşbirka tragedyayê li dar dixê” (Nutku,2011: 32). Lê helbet dîroka tragedyayê gelek berîya van pêşbirkan e. Weke ku me li jor jî behs kir, di Yewnana Antîk da rûtuelên dînî dihatin li dar xistin û li gor bawerîyên xwe îlahî digotin û reqsê digirtin. “di dêlindêzên Dîonyosos da qurban dihatin serjêkirin û goştê wan li xelkê feqîr belav dikirin. Pişt ra jî ji bo bikevine pêşbirkê sê şairên tragedyayê bi sê tragedyayên xwe û bi lîstikeke satîrî diketin pêşbirkê” (Yıldırım, 2017: 434). Ji alîyê termînolojîya tragedyayê da jî Nutku (2011: 33) dibêje ku “ev peyv di zimanê yewnanî da ji ‘tragoîdia yê tê; peyvên tragos(bizin) û oîdîe(klam) digihîjin hevdu û wateya ‘klama bizinan’ derdikeve holê”. Herwiha ev nav jî ji cilên lîstikvan û reqsvanan tê ku dema reqsvan diçûn bileyîzin postê bizinan li xwe dikirin.

Di derbarê pênasêkirinan da “yekem car BZê sala 320 an da Arîstoteles di pirtûka xwe ya bi navê *Poetika* yê da dike. Li gorî wî taragedya teqlîtkirina tevgerê ye ku ev tevger xwedî dirêjahîyeke dîyar û destpêk û kutabûnekê ye û ji alîyê exlaqê va jî heddê xwe da ye” (Nutku,2011: 33). Li gor fikra Arîstoteles divê lehengê tragedyayê xwedî exlaqekê be û divê bikeve rewşeke xirab da ku lîstik bandor li ser temaşevan bike. Wisa be, dema em li gor xeyset û taybetîyên tragedyayê tevbigerin dikarin bibêjin ku tragedya “ew cureyeke lîstikê ye ku bi gotinên mezinkirî tê nivîsîn û piştî ku lehengê tragedyayê di lîstikê da dikeve rewşeke xirab li ser hestên tirsê û dilpêsoinê disekine” (Taner, And, Nutku, 1996: 111). Herwiha lîstikên tragedyayê dixwaze derseke exlaqî bide temaşevanan.

2.2.2. Komedyaya

Di nav baskên hunera dramayê da şaxeke din jî komedyaya ye. Weke tragedyayê, komedyaya jî ji demên yewnana antîk da derketîye holê. Jixwe “yên ku li ser tragedyaya û komedyaya Yewnana Antîk lêkolîn kirine wisa dane zanîn ku herdu cure jî ji rîtuêlên ji bo afirînerê Dîanîsos hatine kirin afirîne” (Şener, 2003: 8). Lê li gor rêzîkê tragedyaya berîya komedyayê derketîye. Piştî tragedyayê “duwem cureşanoya Yewnana Antîk komedyaya ye” (Nutku, 2011: 56). Berî hingê di dêlindêzan da cureya tragedyayê li pêş bû û zêdetir mijarên mîtolojîk ji bo tragedyayê dibûn çavkanî. Herwiha tragedyaya ne ji bo kêf û henekê bû; wisa ku ji rîtuêlên dinî peyda bibû û pê ra jî li ser êşa lîstikvan radiwestîya. Lê komedyaya dijberî tragedyayê ye. Ji bo kêf û henekê derketîye holê. “Ev cure B.Zê sala 486an da di şahîyên li ser navê Dîanîsos dihatin li dar xistin da zîl daye. Di yewnanî da komodîa tê wateya klama komos; komos jî tê wateya cergebez û şahîyê” (Nutku, 2011: 42). Hevparîya tragedyaya û komedyayê ew e ku herdu jî ji rîtuêlên ji bo xwedayê Dîanîsos hatine lîstin afirîne. “Her çiqas tragedyaya ji stranên şînî yê ku ji bo Dîanîsos afirîbe, komedyaya jî ji dêlindêzên şahî û kêfê yê ku ji bo Dîanîsos hatine lidarxistin afirîye” (Nutku, 2011: 42). Kanîya herdu cureşanoyan heman afirîner e lê şêwe û armanc ji hevdu cuda ye.

Piştî ku ev cure jî li dinyayê berbelav bû, çeşnê wê jî pê ra afirîn û mijarên cureya komedyayê berfirehtir bûn. Nutku cureyên komedyayê bi heft xalan disenifîne (Nutku, 2001: 66-70). ku ev *komedyaya giran*, *komedyaya gernasîyê*, *komedyaya romantîk*, *komedyaya karakter û edetan*, *komedyaya tesîrker*, *komedyaya lihevalîyayî* û *komedyaya sivik* in.

2.2.2.1. Komedyaya Giran

Nivîskarê vê cureyê ji bo ku fikreke xwe bide der têdikoşe û li gor wê şanoya xwe dinivîse. Yanî “komedyaya giran bi îddeayekî derdikeve pêşberî me. Lê vê îddeaya xwe ne tenê bi rêya nîqaşê dike, herwiha bi têkîlîyên di navbera karakteran, bi axaftinên di navbera wan nîşan dike û temaşevan dide fikirandin” (Nutku, 2011: 66). gelemperî di dawîya komeydayên giran da dawîyeke bi kêfî tune. Lê dawîyeke xirab jî tune. Di vê cureyê da armanc vegotina fikrekî ye û ev cure dixwaze temaşevan li ser meseleyê bifikire.

2.2.2.2. Komedyaya Gernasîyê

Komedyaya gernasîyê bi şêweya xwe hinekî dişibe tragediyayê. Lê helbet tragedia di hundirê xwe da êşê û dawîyeke nebaş dihevin. Lê komedyaya gernasîyê da tiştekî wisa tune. Di vê cureyê da lehengekî gernas heye û serê wî/wê tim dikeve belayê. “Lê di rastîyê da ev gernas figurekî trajîk nîne. Leheng bixwe dikeve rewşên pêkenîyê lê ji van rewşan difilite û belayên li ser xwe bi awayekî pêkenokî derbaz dike” (Nutku,2011: 67). komedyaya gernasîyê da tu car temaşevan gunehê xwe bi leheng nayîne, tenê bi wî dikevin.

2.2.2.3. Komedyaya Romantîk

Ev cureya komedyayê zêdetir li ser serpehatîyên şovalyeyan e. Di hundirê mijarê da dibe ku serpehatîyên ku tije şer hebin. Lê di vê cureya komedyayê da bûyer ne utopîk in. Yanî bûyerên xeyrî tabîî di mijara wê da tune. Weke ku Nutku (2011: 68) jî dibêje “di vê cureya komedyayê da mijareke ku ne derasayî, lê bûyîna wê jî zehmet, bi awayekî bawerdêr tê pêşkêşkir.

2.2.2.4. Komedyaya Sivik

Di nav cureyên komedyayê da ya herî jirêzê ev cure ye. Mijarên tevlihev û bûyerên şerûdî tune ye. Weke ku Nutku (2011: 71) jî dibêje: “di van curekomedyayan da listik bi awayekî lixav û rêkûpêk pêk tê; di nav jîyana mirovan da bûyerên piçûk dibin mijara vê cureyê. Ken û henek jî ji van bûyeran tê afirandin û lê tê zêdekirin.

2.2.2.5. Komedyaya Lihevalîyayî

Wek navê wê jî dîyar e, mijara vê curekomedîyê zêdetir li ser entîkayan e. Bûyer û tevlihevî di mijarê da gelek e. “Aksîyona listikê bi gelek tevlihevîyan didome. Lê xala nîskokê di vir da li ser karakteran nîn e, herwiha li ser fêlên wan e. Ev hêmanên kenê jî ji wan fêlên karakteran diwelide. (Nutku,2011: 70).

2.2.2.6. Komedyaya Tesîrker

Yek ji cureyên Komedyayê ev e ku ji navê wê jî dîyar e, bandor li ser temaşevanan dihele. Ji alîyê mijarê va “di vê cureya komedyayê da lawik û keçek heye ku ji hevdu hez dikin. Lê li pêşîya wan astengî derdikevin. Herdu evîndar jî ji van astengan difilitin û digihîjin hevdu” (Nutku,2011: 70). Temaşevan di vê cureya komedyayê da him digirîn û him jî dikenin. Lê talîya talî listik bi encameke xweşik diqede.

2.2.2.7. Komediyaya karakter û edetan

Di nav curekomedyayan da ya ku herî zêde li ser civakê xwar dibe û şaşîyên civakê nîşan dike ev komedyaya karakter û edetan e. Ev cure li gor dewr û dewrana xwe mijarên edetî û toreyî hildide dest û bi awayekî komedîk pêşkêşî temaşevanan dike. “ev cure dema bûyereke nûjen li ser dikê pêşkêş dike, bi rêya henekan ‘divêtîyê’ nîşanî gel dike” (Nutku,2011: 70). Yanî, armanca vê cureşanoyê vegotina mijara lîstîkê nîn e. Ev cure dixwaze şaşîyê nîşan bike û rêya rast nîşanê gel bike. “Di vir da hêmana kenînê ne ji rewş û bûyeran, wisa ku taybetîyên karakteran tê afirandin. Têkîlîyên di navbera karakteran jî li gor edetên wê civakê tê nîşan dan” (Nutku,2011: 70). Herwiha ev curekomedyaya bi armanca rexnekirina civakê derdikeve pêşberî temaşevanan.

2.3. ‘Çibûna’ Radyoşanoyê

Di roja me ya îroyîn da di radyoyê da an jî di televîzyonan da gelek bernameyên diramatîk ji bo guhdaran an jî ji bo temaşevanan tê amadekirin. Lê wek pênase em dikarin bibêjin ku bernameyên dramatîk ew bername ne ku xwe dispêrin diyalogan, zimanê wan li gor radyo û televîzyonê tê hazîrkirin, feyza xwe ji berhemên edebî digirin. Wek me gotî gelek li ser radyo û televîzyonan tên lîstin. Ji ber vê yekê jî rola edebîyat û şanoyê li ser bernameyên dramatîk gelek e. Bernameyên dramatîk ji çîrokan, romanên an jî ji hunerên edebî hêz digirin û ji nû va tên dîzaynkirin. “Bi taybetî di prodîksîyonên dramayê da ji cureyên edebî ên wek çîrok, roman, helbest û yê din sûd hatine wergirtin” (Gül, 2009: 52). Radyoşano jî weke ku me di nav cureyên bernameyên radyoyan da jî navê wê nivîsî, bernameyeke radyoyê bixwe ye û bernameyeke dramatîk e. Berî ku em bikevin nava çibûna radyoşanoyê, divê li ser şanoyê bixwe jî kurteagahîyên me hebin. Weke ku me li jor behs kir, şano xwe dispêre demên kevnare û şax bi şax heya rojame hatîye û hunereke domdar e. Lê ev radyoşanoya ku bi şanoyê ra têkildar e, li ber dîroka şanoyê nikare kapan bavêje. Berî ku em hinekî behsa dîroka radyoşanoyê bikin divê em bizanibin ku bi kurtasî radyoşano “ew lîstîkên nivîskî ne ku ji bo radyoyan da werin lîstin hatine amadekirin û çav ne di tê da, arasteyî guh dibe. (Taner, And, Nutku,1996: 89). Yanî radyoşano li ser dikê nayê temaşekirin, herwiha li ser radyoyan tê guhdar kirin. Ji ber vê yekê jî ev huner di nav şaxên bernameyên radyoyan da ye. Bi dûmahîya demê ra ji van lîstîkan ra gelek navên cuda hatine gotin. Ji ber ku di eslê xwe da lîstîkeke li ser radyoyoyan e, wek radyoşano hatîye

bilêvkirin. Lê ev terma şanoyê nayê wê wateyê ku lîstikên şanoyan li ser radyoyan tên xwendin. Meriv dikare wiha bibêje ku “Radyoşano ew lîstikên radyoyan ên bi sî an jî şêst deqeyî ne ku an jî roman û çîrokên cur bi curî hatine adapte kirin an jî rasterast ji bo radyoyê hatine nivîsîn” (Kars,1993: 278). Lê dibe ku şanoyên ji bo dikê hatine nivîsîn jî ji aliyê xebatkarên radyoyê ji nû va li gor radyoyê bête dîzayn kirin û li ser radyoyê were lîstin. “Herwiha lîstikên radyoyê ji ber hêmanên xwe yê wek efekt, deng, muzîk û dîyalogan wekî *qûtîya bisêhr, pîyesên radyofonîk û di mîkrofonê da radyo* jî hatiye bilêvkirin”(Göçer, Kurt, 2020: 53).

Radyoşano ji aliyê dîroka xwe va girêdayî radyoyê û girêdayî dahênên radyoyê ye. “Dahêna hunera radyoşanoyê ji bo ku piştî dahêna mîkrofonê derketîye” (Çorbacioğlu,1967: 7) dîroka wê ne kevnar e.

“Berîya ku radyoşanoyeke tam û tamam were weşandin, çend ceribandin hatibûn kirin. Berhemên edebî ji van ceribandinan ra bûne çavkanî. Di sala 1923 an jî Julius Sezar, di heman salê jî *Bazirganê Venedîkê*, ji *Romeo û Julîet*, ji *Qral Jonh*, ji perçeyên *Machbeth* hin beş di radyoyê da tên dayîn lê ev metin yê kurtkirî ne. Berîya ku derbasî dramayên radyoyê bibin pêşîyê lêrikibandin tên kirin. Yekem lîstika ku li radyoyê tê adebtekirin jî *donzdeh şev a Shakespeare* e”(Drakakis,1981:4, vgh, Arslan, 2010: 18).

Li ser dîroka radyoşanoyê teqezbûneke kîp û bêgumanî tune. Jixwe piştî dahêna radyoyê bernamêyên cur bi cur derketin û metnên edebî jî ji bo radyoşanoyê bûn çavkanî. Lê hin metin kêmkirî bûn û domdarîyeke xurt pêk nedihat. Lê dema ku em bixwazin li ser tam û temambûna radyoşanoya yekem behsekê bikin, em dikarin bibêjin ku di dinyayê da yekem radyoşano li Brîtanyayê tê weşandin. “Li Brîtanyayê yekem radyoşano ya bi navê *A Comedy of Danger(komedîyeke xetere)* ji aliyê Richard Hughes 15 Rêbendana sala 1924 an da li radyoya BBCyê tê weşandin” (Hand, Traynor, 2011: 68). Pişt ra jî di radyoyan da cur bi cur weşanên dramayê tên kirin û lîstik tên lîstin. Ev lîstikên ku li ser radyoyan dihate kirin pêşîyê ji aliyê gel va ecêb dihate dîtin. Ji ber ku guhdarên radyoyan weşanên li ser radyoyan dihate temaşekirin wek rastîyekî qebûl dikirin û diketin hêwirzeyeye mezin. Wek mînak “di sala 1938an da Orson Welles di bernemeyeke radyoyê da temsîla pirtûka bi navê *Şerê Cîhanan* kir ku ev kirina wî li ser civakê gelek bandor kir. Hin girse bawerîya xwe bi lîstika li ser radyoyê hate lîstin anîn û guman kirin ku yê ji Behramê(mars)

hatine û dinya dagir kirine” (Öztürk, 2017: 168). Jixwe pişt ra jî gel hêdî hêdî hînî radyoşanoyan bû û wan her dem lîstik dişopandin. Radyoşanoya ku yek ji perçeyekî grîng ya weşanên devkî ye, “bi netewebûna radyoyê ra, bi taybetî jî di salên 1940an da êwra xwe ya zêrîn jîya” (Göçer, Kurt, 2020: 53). Lê bi dû ra piştî dahêna televîzyonê bandora radyoyê û radyoşanoyê kêmbû. “piştî ku televîzyon berbelav bû, gel arasteyî televîzyonan bû û bi vî teherî gel hêza xeyalkirina gel ya ku bi bihîstinê radyoşano dişopandin bere bere qels bû” (Tufan, 2010: 49). Temsîlên di televîzyonan da dîtbarî ye. Kesê ku li televîzyonê temaşe dike ji hêza xeyalkirina xwe hêz nagire. Herwiha her tişt li ber çavê wî ye. Di xeyalên xwe da mekanên li gor dilê xwe ava nake. Erka ku dikeve li ser gel tenê temaşekirin e. Lê “eger em temsîlên radyoşanoyan guhdar bikin, em ê di goşeyeke hişê xwe da sehneyeke modern ava bikin ku him me bide kenandin, him me bide fikirîn, û him jî tixûbên xeyalkirina me firehtir bike” (Tözem, 1941: 23).

2.4. Cudahîyên Şano û Radyoşanoyê

Her çend rêzikên şano û radyoşanoyê yên hevpar hebin jî, herdu huner ne heman çiqilê darekê ne. “Em hunera li ser dikê bi çavan dibînin û bi guhan jî dibihîzin. Lê radyoşanoyê da şûna çavan xeyal derdikeve pêş û tenê xîtabê guh dike. Ji ber vê taybetîya radyoşanoyê herdu huner ne ji heman cureyê ne”(Muharremli, 1967: 8). Herwiha cudahîyeke di navbera herdu huneran jî sependina wan e. Wisa ku şano li ser dikê tê lîstin û ji bo şanoyê amûr(cilên lîstikvanan, ronahî, amûrên ji bo lîstikê hewce û yên din) divê. Lê di radyoşanoyê da tenê mîkrofon hewce dike. Di radyoşanoyê da ji seheka bihîstinê ya herî girîng guh e. Ji ber ku guhdar tenê bi guhên xwe diyalogan dibihîze û lîstikê di xeyalên xwe da disêwirîne. Lê şano bixwe ne wisa ye. Wisa ku divê meriv şanoyê temaşe bike, tevgerên karakteran bipêve û seh bike. Muharremli ji bo ku vê xala me behs kir zelaltir bike mînakeke wiha dide; “Di lîstikeke şanoyê da kêliyêkê çavên xwe bigirin. Hûnê demeke kin da fêm nekin ku li ser dika şanoyê çi diqewime. Ji ber ku hûnê êmek şûn da dengên nû ji lîstikê bibihîzin û temaşevan dê bi hin tiştan bikenin. Ev ceribandineke hêsan e. Di vir da hûnê tu tiştî ji şanoyê fêm nekin”(Muharremli, 2020: 49). Lê di radyoşanoyê da guhdêrandin bes e. Ne hewceyî dîtîne ye. Herwiha Neşe Kars (1993: 275-277) jî cûdahîyên di navbera şano û radyoşanoyê bi van xalên jêrîn radixe ber çavan:

-“*Di şanoyê da xîmê bingehîn dîtin e. Ango hêmanên dîtbare zêdetir in. Lê di radyoşanoyê da taybetîya dîtbare tune. Hêmaya wê ya bingehîn deng e*”

Di vir da divê nivîskarê radyoşanoyê mijara lîstikê an jî karakterên wê li gorî radyoyê hilbijêre. Weke me behs kir, radyoşanoyê da hêmaya sereke guhdarkirin e. Wek mînak nivîskarê radyoşanoyê karaktereke lal nikare bide lîstin. Ev li gorî zagonên radyoşanoyê şaş e. Kurtasî divê lîstik li gorî radyoyê bête dîzayn kirin.

-“*Di lîstika şanoyê da mekan û dem bi sînor e. Ango lîstik di dem û mekaneke dîyar da pêk tê. Di radyoşanoyan da lîstik bi mekanekê û demekê va sînordar nîn e. Bi saya muzîk û efektan lîstik dikare here hemû deman an jî mekanan*”

-“*Di şanoyê da lîstikvan û temaşevan di heman atmosferê da ne. Lê di radyoşanoyê da guhvarvan ne ji fîzîk û tevgerê lîstikvan, bes tenê ji dengê wî/wê tesîr digire û bi saya radyoyê têkilî bi lîstikvan datîne*”.

-“*Şanoyê da lîstikek dikare salek-du salan bênavber were pêşkêşkirin. Lê radyoşano salê carekê dikare bête pêşkêşkirin*”.

-“*Lîstikeke şanoyê tucarî dubare nabe. Wisa ku divê hercarê xwe ji nû va dîzayn bike. Lê radyoşano li ser mîkrofonê tê lîstin û tê tomar kirin. Ku bi dû ra hewce bike dikare were sererastkirin*”.

Jixwe lîstikên radyoşanoyê pêşî tên tomar kirin û bi dû ra li ser weşanên radyoyê tê weşandin. Ji ber vê yekê sererastkirin an jî lê zêdekirina wan hêsan e.

-“*Ji bo sêrkirina lîstika şanoyê divê meriv here bilêtan bikire û here mekana şanoyê. Lê radyoşano di radyoyê da tê weşandin û guhdar ku derê bixwazin dikarin guh bidêrinê*”.

-“*Dîroka şanoyê bi dîroka mirovahîyê ra paralêl e. Dîroka wê heta heyama Yewnana Kevnar diçe. Lê yekem radyoşano çend sal piştî destpêka weşanên radyoyê yên profesyonel (sala 1921an li Amerîkayê) di sala 1924an bi lîstika “Xetere” yê ya nivîskarekî îngilîz dest pê dike*”

-“*Di radyoşanoyan da dîyalog kurt in*”.

Dîyalogên dirêj ên di şanoyan da, an jî sêwirandinên dûr û derez divê di radyoşanoyê da tunebin. Herwiha divê amûrên ku di lîstikê da tên bikaranîn divê bi deng were behs kirin.

2.5. Rêzikên Giştî yên Şano û Radyoşanoyê

Her çiqas radyoşano û şano du hunerên cihê bin jî hevrêzikên wan ên sereke ji hev cuda nînin. Herdu huner jî ji bo nivîsandina wan rê û rêbaz divên. Berî ku ew bîst lîstin, divê merheleya nivîsandinê kuta kiribin. Wê demê divê ev pêlekên nivîsandinê çawa bin? Helbet berî her tiştî divê meriv balê bikêşe hêmanên nivîsandina herdu huneran. Çorbacioğlu (1967: 12) wisa destnîşan dike ku ev herdu huner pêşî “hêla jîyana merivên balkêş” dibîne û piştî ra jî wê dike “qewareyeke estetîk”. Ango hemû bûyerên însanî ji bo herdu huneran nabe mijar. Divê balkêşîyek hebe û bala merivan bikêşe. Piştî ku ev balkêşî bi dest ket bi du ra jî nivîskar wê balkêşîyê disurîne, zêdehîyan jê davêje, li ser zêde dike û herî dawî dike qalibeke estetîk. Wisa be, meriv têdigihêje ku hemû mijarên însanî nabin mijara şano û radyoşanoyê. Divê balkêş bibe û bi dû ra ji alîyê nivîskar dest lê were werdan.

Di şano û radyoşanoyê da şeş rêzikên sereke hene ku ev; “hîlbijartina mijarê, pevixistin, aheng, bicihkirina kesan, axaftin û zimanê şanoyê ye” (Çorbacioğlu, 1967: 12-40).

2.5.1. Hîlbijartina mijarê

Di herdu huneran da jî hîlbijartina mijarê merheleya sereke ye. Ji ber ku şert û mercên radyoşano û şanoyê ji hevdu cuda ne, hemû mijar nikarin bibin mijara şanoyê. Wisa ku mijara ji bo şanoyê hatîye hîlbijartin divê li gor sehneyê be. Eger mijarên têrxeyalî di şanoyê da hebin lîstikvan nikarin li ser dikê bileyîzin. Lê ji ber ku radyoşano li ser mîkrofonê tê lîstin hemû mijar dikarin bikevin tûrikê wê. Bi giştî “tiştê girîng ew e ku divê nivîskar mijareke balkêş hîlbijêre, derheqê mijara hîlbijartî da fikrên wî hebin û divê bikaribe fikrên xwe bi awayekî têrbandor bigihîne temaşevan an jî guhdaran” (Nutku, 2001:165). Dîsa jî ji bo ku ev herdu huner balkêş û têreleqe bibe divê herdu huneran da jî “mijar li ser derd, xweajo, hest û kêmasîyên merivan bin” (Çorbacioğlu, 1967:15). Herwiha Çorbacioğlu (1967: 14-20) wisa dîyar dike ku “divê mijarê da pevçûyîn, kesayetên sempatîk hebin û divê temaşevan an jî guhdar ji mijarê bawer bikin û dawîyê da jî xapandineke mijarê hebe”. Tözem jî (1941: 23) li ser nivîsandina mijarên radyoşanoyan wiha hişyarî dide û dibêje:

“Nivîskar di hîlbijartina mijarê da bi dilê xwe ye. Lê divê ev berhem bi zimanê xwe, bi armanca xwe û bi her tiştê xwe va arasyetî guhdarên girseyên mezin, yê bajar û gundan bibe û divê bê guman ji bo gel bête nivîsîn. Divê yê bajarî jî yê

gundî jî tu rexneyê li berhemê nekin. Divê hemû mijar ji bo derd û kêfa me be. Di nivîsandina berhema radyoşanoyê da divê nivîskar xwe ji şêweyê romanê û ji zêdeçirirandinan dûr bike. Divê heya ji dest were lîstikvanên radyoşanoyê zêde neaxive, hin tiştan zêde biqîmet neke û zêde propagandaya fikra berhemê nede”.

2.5.2. Pevxistin

Piştî ku nivîskar ji bo hunera xwe mijar hîlbijart derbasî merheleya duyem dibe. Ev merhele jî pevxistin e. “Pevxistin ew tişt e ku mijara hatîye hîlbijartin êdî dikare were sazîkirin” (Çorbacioğlu, 1967: 20). Yanî pevxistin “ew tevî e ku çîroka hîlbijartî li gor armanca nivîskar tê mezin kirin û tê sazîkirin” (Nutku, 2001: 169). Weke dê bête fêhm kirin jî, mijarek bixwe gelek bûyeran di hundirê xwe da dihevin. Lê ev bûyer xweberê nayên nahişîn hevdu û saz nabin. Ji ber vê yekê ji bo bûyeran dîzayn û sazîkirin divê. Wisa jî meriv dikare bibêje; “pevxistin ew yekbûnî ye ku di nav pêwendîya sedem-encamê û geşedaneke mantiqî da ji bûyerekî dest pê dike, bi bûyerên geşedanî berdewan dibe û piştî ra jî kuta dibe”. (Nutku, 2001: 170). Di pevxistinê da pênc beş heye ku ev pênc beş ji bo yekbûna pevxistinê xîmên bingehîn in.

2.5.2.1. Beşa Destpêkê

Beşa destpêkê “ew agahîya tê dayîn e ku ji bo temaşevan çîroka lîstikê baştir fêhm bikin” (Nutku, 2001: 171). Yanî di destpêkê da, di derbarê lîstikê agahî tên dayîn. Ji bo pevxistinê ev beş xîma sereke ye. Wisa ku di beşa destpêkê da tiştê girîng kişandina bala temaşevanan e” (Nutku, 2001: 172). Eger di vê beşê da agahî baş nehate dayîn an jî bala temaşevanan nekişand lîstik di serî de dikeve rêya têkçûnê. Ji ber ku “serkîfetina pîyeseke li gor serkeftina beşa destpêkê ye” (Çorbacioğlu, 1967: 20). Nivîskarê lîstikê eger hewcedarî pê bike, dikare di vê beşa destpêkê da karakteran bide nasîn û di derbarê çîrokê da agahiyên sereke bide.

2.5.2.2. Beşa Pevçûyînê

Piştî ku beşa destpêkê xilas dibe, di lîstikekî da beşa pevçûyînê diwêlîde. “Di vê beşê da aksiyon çêdibin û gur dibin. Bûyer, agahî û kesên ku di beşa destpêkê da tê behs kirin di vê beşê da pev diçin. Ev peyva pevçûnê tenê ji bo pevçûneke fîzîkî nayê bikaranîn. Li gor bûyerên lîstikê, dibe ku pevçûnê ruhî, kêmanî, derengmayînê û hwd jî hebin”(Nutku, 2001: 172).

2.5.2.3. Beşa Tevlîhevîyê

Beşa tevlîhevîyê piştî bûyerên pevçûnê derdikevin holê ku “di vê beşê da pirsgirêk derdikevin û bûyer hemû pêdivîya çareserîyekê divên” (Çorbacıoğlu, 1967: 23). Herwiha di vê beşê da temaşevan jî ji ber tevlîhevîyên lîstikê dikevin hestên tevlîhev û zêdetir bala xwe didin ser lîstikê. Pê ra jî, di vê beşê da girêkên bûyeran zêde dibin. Di beşa tevlîhevîyê da karakterên sereke xwedî erkeke grîng in. Ji ber ku hemû girêk li dor wan dişide û kîp dibe. Helbet di lîstikekî da beşa tevlîhevîyê ne tenê bi bûyeran diafire. Dibe ku di kesayetîyên karakterên sereke da jî pirsgirêk biafirîn û ji bo vê beşê bibin kereste. “Gurbûna beşa tevlîhevîyê li gor karakteran rewş û aksîyonan diguhere” (Nutku, 2001: 173).

2.5.2.4. Beşa Lûtkeyê

Beşa Lûtkeyê “pîleya herî jor ya bûyerên beşa tevlîhevîyê ye” (Nutku, 2001: 178). Gava di lîstikekî da tevlîhevî zêdetirîn dibin û bûyer ber bi dawîyekê va diçe ev beş derdikeve holê. Di vir da “veguherîna bûyeran bi tevî kelecana xwe digihîje lûtkeya herî bilind” (Çorbacıoğlu, 1967: 23). Herwiha di vê beşê da aksîyon zêdetir dibin û kelecana temaşevan an jî guhdarvanan digihîje radeya dawî. Meriv dikare bibêje ku di vê beşê da ji çareserî, an jî bi gotineke din dawîyê ra hinek dimîne.

2.5.2.5. Beşa dawîyê

Weke ji navê wê jî diyar e, beşa dawîyê “beşa dawî ya lîstikê ye; pirsgirêkên ku di pevxistinê da derketibûn di vê beşê da çareser dibin û hemû kîpbûnên tevlîhevîyan sist û rast dibin” (Nutku, 2001: 180). Herwiha “ev êwr ji bo temaşevanan êwra rehetîyê ye; ji bo wan jî rewşên alozî xilas dibin û her tişt sererast dibe” (Çorbacıoğlu, 1967: 24). Divê nivîskarê lîstikê di vê beşê da hemû pirsên temaşevan an jî guhdaran bersivandibe û tu guman li dû wan nehîştibe. Pê ra jî ji bo serkeftina beşa dawîyê divê nivîskar dawîyeke fêmbar, balkêş û bibandor li lîstikê bîne. Gelemperî di cureya “Tragedyayê da beşa dawîyê biêş kuta dibe lê di cureya komedyayê da beşa dawî bi bextewarîya temaşevanan kuta dibe” (Nutku, 2001: 180).

2.5.3. Aheng

Ev rêzika şano an jî radyoşanoyê nîşaneyê pîvana lîstikê dide der. Wisa ku divê di lîstikekî da yekgirtîyek hebe. “meriv dikare berhemêke lîstikê bişibîne nîgar an jî peykerekî. Çawa ku di van berheman da ahengeke pîvandî heye, divê di lîstikekî da jî ahengeke pîvandî hebe” (Çorbacıoğlu, 1967: 25). Wisa be em ê çawa lîstikê di

ahengekî da bigirin? Ji bo vê yekê jî du merhele hene “perde û takêşîkirin” (Çorbacioğlu, 1967: 25). Merheleya yekem di lîstikekî da perde ye ku ev merhele ji bo safîkirina çîrokê hewce ye. Wisa ku berîya hertiştî divê nivîskar lîstikê ji hevdu veqetîne û bi dû ra di derbarê hejmara perdeyan da biryar bide. Di vir da divê nivîskar baldar be ji ber ku “her mijarek di nava xwe da cur bi cur ji hevdu vediqete. Eger meriv mijareke yek perdeyî ji hevdu veqetîne tehma pîyesê namîne” (Çorbacioğlu, 1967: 26). Merheleya duwem jî takêşîkirin e. Di vê merheleyê da divê nivîskar pîvanekî di navbera perdeyan da çê bike. Eger perdeyek ji yeke din girantir û zêdetir bikêşe di lîstikekî da tewşîkî derdikeve. “Di radyoşanoyê da şûna perdeyan beş hene. Ev zagon di ahengê da ji bo beşên radyoşanoyê jî derbasdar in” (Çorbacioğlu, 1967: 27).

2.5.4. Bicîhkirina Karakteran

Her çiqas di lîstikekî da hemû karakter li gor bûyeran cihê xwe digirin û di hişê temaşevan an jî guhdaran da dabeş dibin jî divê nivîskarê lîstikê karakterên xwe li gor erka wan bipeyîtîne. Herwiha divê “axaftinên karakterên lîstikê jî di nava xwe da bi aheng bibe û li gor şert û mercên lîstikê tevbigere” (Nutku, 2001: 183). Ji ber vê yekê jî dîzayna karakterên lîstikê divê teqez were kirin. Özakman (2017: 13) divêtîyên karakteran wiha rêz dike;

- *Divê di taybetîyên wan da ahengek hebe.*
- *Bi taybetî divê li gor şêwe û mijarê werin hilbijartin*
- *Karakterên dijî hev divê di wê taybetmedîyê da bin ku pevçûnan pêş da bibin.*
- *Divê karakter bi tenê erênî an jî bi tenê neyînî nebin.*
- *Divê rêzika bingeîn ew be ku karakter bi tevgerên wan werin nîşandan.*
- *Divê kesayetîyên karakterên sereke fîcete û nişkêva neyê gotin; divê heddê xwe da be, gav bi gav were gotin û zêde jî dereng neyê gotin.*
- *Kesayetîyên karakterên sereke bi hebûna karakterên dijberî wan dikare hêj bandortir bête ravekirin.*
- *Divê karakter neşibin hevdu. Dijberî hev nebin jî divê ji hevdu cuda bin.*

Li alîyekî din Çorbacioğlu (1967: 30-31) karakterên lîstikekî di sê sernavan da disenifîne:

2.5.4.1. Karakterên sereke

Di lîstikekî da “bûyer li dor van kesan dizivirin” Her wisa mijara lîstikê jî li ser karakterên sereke ne û hemû qewimandin li ser serê wan derbaz dibe. “Dema karakterên sereke derdikevine hemberî temaşevanan divê bikaribin bala wan bikîşînin ser xwe û ji xwe bawer bin”(Nutku, 2001: 183).

2.5.4.2. Karakterên dijber

Dema di nav lîstikekî da karakterên dijber tune bin tu wateya lîstikê jî namîne. Di nav afirandinên karakteran da divê karakterên dijberî karakterên sereke jî hebin ku bûyer biqewimin û tevlihevî çêbibe. “Ev karakterên dijber ji ber sedemekî li hember karakterên sereke ne û wekî wan nafikirin û wekî wan tevnagerin”(Çorbacioğlu, 1967: 31).

2.5.4.3. Karakterên Alîkar

Karakterên alîkar ji bo berdewamîya bûyerên lîstikê hewce ye. Lê bandora karakterên alîkar li ser lîstikê kêmtir e. “Ger nivîskar karakterên alîkar ji lîstikê derbixe jî dîsa dikare gotin û fikrên xwe bibêje. Lê bêtir karakterên alîkar domandina lîstikê çetin dikeve” (Çorbacioğlu, 1967: 31).

2.6. Taybetîyên Radyoşanoyê

Radyoşano li gor şanoyê xwedî avantajên taybet in. Wek mînak di şanoyê li ser dikê da meriv nikare serê yekî jê bike. An jî li gor mijarê nikare li ser dikê berfê bide barandin û zû bi zû mekanê biguhere. Lê di radyoşanoyan da ev yek gelek hêsan e. Ji ber ku lîstikvan bi dengê xwe dikare her tiştî bike. Taybetîyên radyoşanoyê Çorbacioğlu (1967: 12) di çar xalan da dicivîne û dibêje ku radyoşano:

- “*Ji hêza xeyalkirina guhdaran sîd werdigire*”

Guhdarê radyoşanoyê li gor mijara lîstikê di hişê xwe da sehneyekê ava dike û wisa lîstikvanan dide lîstin. Bi şayesandinên lîstikvanan ra guhdar li gor xwe dekorekê ava dike û di sehneya xeyala xwe da lîstikê temaşe dike.

- “*Ji alîyê sehneyên xwe va nêziktirê rastîyê ye.*

Ji alîyê mijarê va di hin lîstikan da sehneyên wisa hene ku tu carî li ser dikê nayê lîstin. Wek mînak şerekî mezin li ser dikê nayê lîstin. Lê radyoşano wê derfetê dide guhdaran ku xeyalên xwe da qadeke şerî ava bikin.

- *“Ji alîyê mekanê va bêsinor e.*

Di radyoşanoyan da lîstikvan dikare hemû mekanan da bigere. Ji ber ku metnên radyoşanoyan ji alîyê mekanê va bêsinor e. Nivîskarê radyoşanoyê dikare karakterên xwe hemû deveran bide gerandin.

- *“Ji alîyê temsîlê va hêsan e.*

Di serî da lîstikvanê radyoşanoyê ji alîyê cil û bergên xwe va azad in. Ji ber ku kesên wan bibîne tune. Ya grîng di radyoşanoyan da deng e. Herwiha di radyoşanoyan da karakter dikarin dengê xwe tomar bikin, rast bikin û dîsa tomar bikin. Lê lîstikeke dikê da ev ne mimkûn e. Di radyoşanoyan da girseyên temaşevanan ên li ber çav tune ne. Bi vî şiklî lîstikvanên radyoşanoyan nakevine kelecaneke. Jixwe mekan studyoya radyoyê bixwe ye. Tu sehne û dekorasyon tune ye. Ji bo lîstikvanekî tenê ya grîng dîksîyon û deng e. Ji ber vê yekê jî temsîl di radyoşanoyan da gelek hêsan û bêmesref e.

2.6.1. Efekt di Radyoşanoyan da

Di lîstikên radyoşanoyê da hin hêmanên bingehîn hene ku divê teqez di lîstikê da bête bikaranîn. Ji ber ku radyoşano ne lîstikeke ser dikê, lê lîstikeke ser mîkrofonê ye. Di şanoyan da dîtbarî li pêş e û temaşevan zêde hewcedariya hêmanên radyoyê nake. Lê di radyoşanoyan da hêmanên bingehîn ên wek efektê ji alîyê gelek mijaran alîkarîya guhdaran dike û sehneya xeyalê guhdar ronî dike. Ji hêmanên radyoşanoyê yek jî efekt bixwe ye. Efekt “ew amûr in ku ji alîyê deng û ronahîyê va li ser dikê bandorekî pêk tînin” (Taner, And, Nutku, 1996: 32). Yanî efekt di weşaneke radyoyê da xwedî roleke pêledar e. Di radyoşanoyan da jî efekt xwedî erkekê ye û “yek ji wan rêyan e ku di radyoşanoyan da rastîyê li lîstikê zêde dike û lîstikê bandortir dike” (Tufan, 2010: 50). Azîz (1981: 68) li ser efektê dibêje ku “bi taybetî di bernameyên dramatîk da ji bo cih, dem û atmosferê gelek efektên cur bi cur tên bikaranîn”. Di nav efektên radyoşanoyan da gelek cure tên bikaranîn. Hin efekt bi alîkarîya amûrên teknolojîk tên bikaranîn lê “di radyoşanoyan da dengên vokal (wek qêrîn, qulpik kirin, bêhnijîn û yên din) ji dengê xwe yî resen were bikaranîn jî wek efektên pejirandin” (West, 2007: 47). Dîsa Özakman (2007: 36) erk û taybetmendiyên efektê wiha gurz dike û dide zanîn ku efekt;

- *“Mekanê diyar dike”*

Meriv dikare dengê bayê, dengê erebeyan, dengê şilfîyê, dengê derîyan û yê din wek mînak nîşan bide. Eger dengê bayê di lîstikê da were dayîn wê demê em ê bizanibin ku di lîstikê da mekan ne li mal, herwiha li derveyî mal e.

-“*Demê dîyar dike*”

Dema efektên wek dengê dîkan an jî dengê çîlevîla çûkan were bikaranîn meriv pê dihise ku destê sibê ye. Gelek mînakên efektê hene ku dikarin demê dîyar bikin. Herwiha vebêjerê lîstikê jî dikare bi guhdaran bide dîyar kirin ku kîjan dem e. Wek mînak “berbanga sibê bû” an jî “êvar ketibû”

-“*Di lîstikê da sehneyan girê dide hevdu*”

Wek mînak eger du karakterê di sehneya yekem da ji bo sibetirê li ber behrê soza hevdîtîne bidin hevdu sehneya duwem bi dengê pêlên behrê dest pê dike. Wê demê em dikarin bipeyîtînin ku efekt sehneyan girê dide hevdu.

-“*Atmosferê çêdike*”.

Wek mînak di lîstikekî da bûyer di daristanekî da biqewime dengê çûkan wek efekt tê dayîn.

-“*Tris û hêrsê dide hîs kirin*”.

Lîstikê da bûyerên tirs û xof hebin efekt bûyeran rasttîr û xurttir dikin. Wek mînak dengê vemirîna lempeyan an jî dengê çirîna derîyan ji bo atmosfera tirsê gelek bi bandor e.

2.6.2. Dîyalog di Radyoşanoyan da

Weke ku hate peyitandin, radyoşano araasteyî guh dibe û ji bo têrxeyleke kûr û dûr hin hêman divê bibin kûrsîyên erdê va zeliqî. Yek ji wan hêmanan jî dîyalog e. Dema nivîskarê lîstikê berhema xwe amade kir an jî çîrokek li gor radyoyê hate adaptekirin divê dîyalogên metnê xurt bigire. Ji ber ku weke efektê dîyalog jî hêmaneke sereke ye di radyoşanoyê da. Berîya her tiştî “di lîstikên radyoyê da portreyên karakteran bi dîyalogan tên dayîn” (Tufan, 2010: 50). Di nav karakterên lîstikê da portreyên cur bi cur hene û ev cur bi curî bi dîyalogan tên kifş kirin. Wek mînak di lîstikekî da karakterekî şermoke bi dîyalog û axaftinên xwe dîyar dibe û guhdar li gor wê portreya karakter di xeyalê xwe da diafirîne. Çorbacioğlu(1964: 47-53) li ser erka radyoyê wiha dibêje û erkên dîyalogan wiha rêz dike:

“Di radyoşanoyê da pênc erkên dîyalogê hene ku ji van ya yekem di hest û xwestekên karakteran dide dîyarkirin. Ji xwe hemû metnên şanoyî ji bo vê armancê tîr nivîsîn. Ji bilî vê erkê di radyoşanoyê da çar erkên dîyalogê hene”.

-“*Dîyalog demê dîyar dike*”.

Di radyoşanoyê axivêr destpêkê da ji bo guhdaran dikare agahîyan bide. Wek mînak axivêr dikare bibêje “*roj nîvro bû*” Wê demê guhdar pê dihesê ku wext di lîstikê da nîvro ye. Wekî din dîyalogên di navbera karakteran da jî demê dîyar dike. wek mînak karakterek bibêje yekî din; “*zû bike, hêçik mêja esrê bang nedaye*” em ê wê demê pê bihesin wext nêzikî esrê ye.

-“*Dîyalog cih dîyar dike*”.

Weke efektê dîyalog jî mekanê dide pê hisîn. Wek mînak du karakter di navbera dîyalogên xwe da behsa aksesûarên malê bikin em ê wê demê pê bihesin ku mekan malek e. Herwiha axivêr jî dikare berîya lîstikê mekanê teswîr û dîyar bike.

-“*Dîyalog aksesûaran dîyar dike*”.

Di şanoyan da em aksesûarên li ser karakteran li ber çavê xwe dikarin bibînin lê di radyoşanoyan da em tenê dikarin xeyal bikin. Lê ji bo xeyalkirina me jî divê aksesûarên ku hatine bikaranîn di dîyalogan da werin dayîn. Em jî di radyoşanoyan da aksesûarên karakteran bi xêra dîyalogan xeyal dikin û pê dihesin. Wek mînak di lîstikekî da şer derkeve û yek bibêje yekî “*tu mêr bî, kêra destê xwe dayne û wisa were*” em ê pê bihesin ku di destê yekî da kêr heye. An jî di navbera dîyalogan da yek henekê xwe bi cilê kesekî bike em ê jî li gor dîyalogan cil û bergên lîstikvan xeyal bikin.

-“*Dîyalog rewşa karakteran dide dîyar kirin*”.

Herwiha dîyalogên di lîstikê da derbaz dibin rewşa karakteran hîs û tevgerê wan, armancê wan, hez û nefreta wan dide dîyar kirin. Em bi dîyalogan pê dihesin ku kîjan karakter di kîjan rewşê da ye û kîjan karakter sereke û alîkar e. Bi vî teherî di lîstikeke radyoşanoyê da xîmeke bingehîn jî dîyalog bixwe ye.

2.6.3. Monolog di Radyoşanoyan da

Weke hêmanên din, di şanoyan da hêmaneke sereke jî monolog in. Monolog ji alîyê wateyê va “di lîstikên şanoyê da axaftina karakter a xwe bi xwe ye”. (Taner,

And, Nutku,1996: 68). Di lîstikekên şanoyan da car caran karakter li ser mijarekî an jî bûyerekî xwe bi xwe biaxe û binhiş an jî gotinên dilê xwe dibêje. Ev dikeve kategorîya monologê. Herwiha monologên di lîstikekî da ji bo guhdar an jî temaşevanan dibe neynikekî. Ji ber ku yê lîstikê temaşe an jî guhdar dikin, armanca karakteran bi saya monologan deşîfre dikin û zêdetir ji lîstikê fêhm dikin. Monolog di eslê xwe da dişibe diyalogan. Lê di diyalogan da herî kê du kes bi hevdu ra diaxivin. Lê di monologê da karakter dîsa hinkûfê xwe ye. Weke şanoyan, di lîstikên radyoyan da jî monolog bi vê rêyê tên bikaranîn. Karakter bi xwe xwe diaxive û guhdar fêhm lîstikê zêdetir dikin.

2.6.4. Muzîk di Radyoşanoyan da

Hêmaneke sereke ya radyoşanoyê jî muzîk e. Di hemû cureyên dramayan da muzîk ji laşê wan ra dibe kirasek. Ji ber ku muzîk ew hestên ku di temaşevanan da jî guhdaran da peyda dibin gur û gelectir dikin. Di radyoşanoyan da bi taybetî hebûna muzîkê ji bo lîstikê xurtîyek e. Özakman(2007: 37) di lîstikan da cureyên muzîkan di pênc kategorîyan da dicivîne ku ev “muzîkên jenerîk, muzîkên fonî, muzîkên fîcete, muzîkên sehneyan û muzîk efekt” in.

Weke ku Özakman (2007: 37) derdibire:

muzîkên Jenerîk: bi vokal an jî bê vokal in. Bi nivîsên danasîna lîstikê ra lê dikevin. Muzîkên jenerîk bi mijara lîstikê va ahengdar in. Herwiha dibe ku di jenerîkê da muzîkên wek klam, stran jî werin bikaranîn. Muzîkên fonî: Ev cure muzîk heta qedandina lîstikê, li gor bûyeran û li gor herikîna wê berdewam dike. Herwiha herikîna bûyeran xurttir dike, şîrove dike, kelectantir dike, hestîyartir dike, atmosferê çêdike. Muzîkên fîcete: Ew muzîkên ku bûyerekî, tirsekî, xetereyekî an jî geşedanekî nişkêva dide û kuta dibe. Ev cure muzîk gelectî kê dikşîne. Muzîkên sehneyan: Ev cure muzîk jî piştî destpêk û qedandina sehneyên radyoşanoyan da tên bikaranîn û bi vê rêyê sehneyan girê hevdu dide. Efekt muzîk: Di van curemuzîkan da jî dewsa ku efektê bikar bînin muzîkê bikar tînin.

Herwiha di muzîkên ku di radyoşanoyê da tên bikaranîn mekanê û demê jî dikare diyar bike. Wek mînak dema muzîka dewatan lê bide em ê bizanibin ku mekan cihekî dewatê ye. Herwiha dibe ku muzîkên tên bikaranîn temsîla karakteran jî bike. Wek mînak karakterek di lîstikê da bi amûrekî muzîka xwe lê bide em ê temsîlîyeta wî karakterî bi muzîkê ra têkildarî hevdu bikin.

2.6.5. Sehne di Radyoşanoyan da

Di berhemên şanoyan da nivîskar piştî ku berhema xwe dinivîse û li gor dikê dîzayn dike û wê li gor mijara lîstikê beş beşî dike. Bi vî teherî di şanoyan da perde hene. Li gor mijar û dirêjîya lîstikê jî hejmarên perdeyan diguherin. Lê di radyoşanoyan da perde tunene. Ji ber ku radyoşano ne li ser dikê tê lîstin, lê li ser radyoyê tê guhdar kirin. Ji ber vê yekê jî di radyoşanoyan da ne perde, lê sehne hene. “Di radyoşanoyê da li gor şanoyên din avantajek heye ku radyoşano dikare zû bi zû sehneyên xwe biguhere” (Çorbacıoğlu, 1967: 55). Lê ev guherandina sehneyan wisa ficete nayê kirin. Li gor mijarê û rayîşa wê sehne bi muzîkan tîr birîn û wisa dest bi beşeke din dikin.

2.6.6. Wext di Radyoşanoyan da

Wekî hemû curebernameyên radyoyan, di radyoşanoyan da jî wextekî dîyarkirî heye ku ji bo guhdarkirina wê grîng e. Ji ber ku radyoşano tê guhdarkirin, piştî demekî dibe ku guhdar ji lîstikê aciz bibin û hew guhdar bikin. Ji ber vê yekê “divê di radyoşanoyan da wext ji seetekî zêdetir nebe” (Çorbacıoğlu, 1967: 55). Hin lîstikên kurt ên wekî skeçan jî li dora nîv seetî berdewam dike. Radyoşanoyên ku gelek dirêj bin jî ji alîyê radyoyê va tîr dabeş kirin û wek rêzefilmên li ser televîzyonan heftê carekî tê lîstin. Lê weke ku hate gotin, divê lîstik li ser radyoyê seetekî zêdetir nedomîne.

BEŞA DUYEM

1. Kurtebehsek li ser Kurdên Kafkasyayê

Wêjeya Kurdî di nav xwe da û li gor şert û mercên demê şaxşaxî dibe û her wisa li gor cî, dem û mekanê êwr bi êwr ji hevdu vediqete. Di nav êwrên wêjeya Kurdî da êwra Kafkasyayê jî xwedî hin taybetmendîyan e ku gelek xebatên cihereng di nav xwe da dihevin. Beriya ku em behsa hin taybetî û xebatên wêjeya Kafkasyayê bikin divê em hinekî li ser Kurdên Kafkasyayê rawestin. Ji ber ku Kurdên li wir ziman, çand û wêjeya xwe li xerîbîyê, ji axa kal û bavan dûrtir ava kirine. Helbet hebûn, an jî “xwebûn” a Kurdên li wir xwe dispêre hezar salan. “Li gor Kurdnasê rûs Mînskî Kurd di demên pir kevnar de li herêma Kafkasyayê bi cih bûne. Li gor Gordon Childe û Vanilor, qewmên arî (ku Kurd jî di nav de ne) beriya Îsa di salên 6000î de li Kafkasyayê belav bûne” (Ulugana, 2017: 36). Herwiha Şamil (2015: 23) wisa behs dike ku “Kurd B.Z 2000 sal berê vir ve ye di nav wê axê da dijîn ku niha ew ax Azerbaycan e. Li gor agahiyên ku ji kolandinên arkeolojîk û berhemên dîroknasên yewnan ên antîk, qewmên Kurdan ên ûtî, gûtî, kûtî, kurtî (di wateya yên çiyayî de ne) di salên B.Z 2000an de li pêşên çemê Arasê ên başûr û bakûr, bi gotineke din di nav axa fireh ya ku navbera çemê Aras û Kur de ye û Kurdistanê sor jî hildide nava xwe de niştecih in û ev yeka bi van agahiyan hatiye îsbatkirin”.

Lê çerxa dîrokê ji bo Kurdên li wir gelek caran ji bo sirgunbûnê zivirîye. Weke ku Ulugana (2017: 37-39) behs dike pêşiyê Şah Ebbas 24 Eşîrên Xorasanê dişîne Azebeycanê, dû re gava şerê di navbera Osmanî û Safevîyan de diqede di sedsala 17an de çend eşîrên Kurd ên Mereş û Rihayê mişextiyê Gurcistanê dîkin. Ev eşîrên kevn tîne helandin û tîne asimîle kirin. Pê re bi sedemên şer gelek deverên Kurdistanê dikeve bin banê Rûsyayê. Piştî şerê cîhanê yê yekem Kurdên êzîdî tîne sirgunkirin û wan dişînin Qersa ku wê dewrê di nav tixûbên Rûsyayê de bû. Piştî şerê Oktobirê rûs ji Kafkasyayê vedikişin. Ev jî dibe sedema qetilkirina Kurdan ji aliyê Romê. Bi saya mudaxaleya Îngîlîzan Tirk ji Kafkasyayê vedikişin û Kurd jî Pergala Bolşevîkan nas dîkin. Bi dumahiya demê re Kurd sê caran tîne sirgun kirin. Cara yekem dewra Stalîn da (1937) pêk tê. Cara duyem (1944) Kurdên misilman sirgunê Kazakîstan û Ozbekîstanê dîkin. Cara sêyem (1947) jî Stalîn hinek Kurdên Êzîdî ji Gurcistanê mişextî Kazakîstan û Asya navîn dike. Herçend Kurdên li wir rastî mercên dijwar jî hatibin, xwe aliqandine pêşa dîrokê û heya niha gelek xebatên xwebûna xwe kirine û gihîştine heya roja îroyîn.

1.2. Xebatên Wêjeyî li Kafkasyayê

Destpêka wêjeya Kurdên Kafkasyayê li gor şert û mercên dema xwe, li gor polîtîkayên welatê Sovyetê hîmê xwe avêtîye û wisa pêş da çûye. Wisa ku dema Lenîn piştî Şoreşa Oktobirê serket û yekîtiya Sovyetê ava bû di dîroka Kurdên Kafkasyayê da jî rûpeleke nû vebû û ev rûpela vebûyî ji bo pêşdaçûna lîteratûra Kurdî grîng bû. Li gor zagonên Sovyetê wê hingê hemû çînên kêmjimar dikaribûn di alîyê çand û hunera xwe da xebat bikirana û xwe pêş bixistana. Bi vî teherî deriyê pêşdaçûna lîteratura Kurdî jî vebû û bere bere xebat û kedên Kurdên Kafkasyayê hate bihîstin û dîtin. Berîya Şoreşa Oktobirê û berîya ku sosyalîzm li Yekîtiya Sovyetê hasil bibe, di alîyê pêşketina zimanê kurmancî çend gavên çalepûka hatibûn avêtin. “Ji berî qeydê sovêtê, destpêka sedsaliya bîstan (1900-1904) împêratoriya Rûsiyayê li warên Kurd lê dijîtin sê dibistan ji bo zarokên Kurd vekirin. Ew dibistan yê êlêmêntarê çar sale bûn, bi zimanê rûsî. Mixabin, ji bûyerên wan salan zû hatin dadan û bawer ke şopa xwe jiyana Kurdên wê heremê da nehiştin” (Boyîk, 2012: 10).

Berê ku Kurd li wê deverê bikevin nava kurahîya xwebûna xwe gelek caran rastî zor û zehmetîyan hatin. Berê pêşî, Kurdên ku Kafkasya kirin stargeha xwe Êzdî bûn. “Piştî şerê Cîhanê yê yekem Kurdên Êzdî tên sirgûnkirin û wan dişînin Qersê ku Qers ku wê dewrê di nav tixûbên Rûsiyayê da bû. Kurdên ku li Qersê û deverên wê dijîyan û di bin hikumdariya Rûsan de bûn wek komên piçûk li wir dijîyan. Li gor îstatîstîkên berdestî di sala 1910an da bi qasî 5 hezar Kurdên Êzdî li wir dijîyan”(Can, 2013: 31). Lê Qersa ku mazûvaniya Kurdên Kafkasyayê dikir piştî vekişandina Rûsan careke din rêya sirgûnê nîşanê Kurdan da. “Gava artêşa Rûsîya dawîya sala 1917an ji pişkavkazê vekişîya, artêşa Tirkî kete wê deverê û bi deh hezaran êzdî qir kirin” (Reşîd, 2009: 14). Piştî ku Kurdên êzdî hatin sirgûn kirin xwe di bin sîwana Sovyetê de dîtin û Pergala Bolşevîkan nas kirin. Kurdê ku rê va gelek zor û zehmetî kişandibûn bi nîvmalbatî (yê mirî û yê mayî) li welatê Sovyetê rastî eleqeyeke mezin tînin û bi azadî jiyana xwe berdewam dikin. Welatê Sovyetê li ser mafên çînên kêmjimar û bindest disekine û têdikoşe. Di vê rewşê da Kurdên li wir bi cî dibin, dest bi xwendinê dikin û bere bere xwe pêş dixin. Wêjeya Kafkasyayê ji alîyekî va jî wêjeya sêwîyan bi xwe ye. Ji ber ku gelek zarokên bê dê û bê bav di êtîmxaneyan da mezin dibin, dixwînin û gav diavêjine lîteratura Kurdî. Boyîk wêjeya Kafkasyayê di sê deman da disenifîne û wisa li ser disekine.

1.2.1. Dema Ewilîn

Dema sirgunî û kuştin ji Kurdên li wir dûr dikeve, toximên xebatan bere bere tê reşandin. Em dikarin bibêjin ku dema ewilîn di navbera salên 1920 û 1937an da ye. Di destpêkê da kadroyên xebatkarên Kurdî hema bêje tunebûn. Zarokên Kurdan ên hatibûn sirgunkirin teze teze li pey xwendina xwe ketibûn û digihîştin. Pişgiriya welatê Yekitîya Sovyetê ji bo hemû çînen bindest bibû firsendeke mezin. Berî pêşî ji bo fêrkirina zarokên Kurdan li Ermenistanê biryar hate dayîn. Ev biryar wisa bû ku divê ji bo Kurdî elîfbayek bête çêkirin wekî zarokên Kurdan ên gund fêrî zimanê dayîkê bibin. “Sala 1921ê, meha Oktobirê, kitêba dersa: “ŞEMS” bi zimanê Kurdî lê bi herfên Ermenî hate weşandin” (Boyîk, 2012: 12). “Avakarê vê alfabeyê û nivîskarê pirtûka şems Lazo (Hakob Xazaryan) bû ku Lazo Ermenî bû û Kurdî baş dizanibû” (Reşîd, 2012: 203). Bi vê elîfbeya Lazo ra zarokên Kurdên Ermenistanê li gundên xwe û hin jî zarokên li Tiflîsê zimanê dayîka xwe fêr dibin. Kadroyên Ewilîn ên Kurdan li sêwîxaneyan bi vê elîfbayê dest bi hînbûna zimanê dê dibin. Heta sala 1930 di warê pêşketina çand û hunera Kurdî da pêşketin zêde çênabe. “Tek hêja ye bê bîranînê, ku sala 1926a bi kurteçîroka Lazo û tevbûna aktorên Ermenîya, yê wê demê yên herî bi nav û deng, ji emrê Kurda sînema *Zerê* hate kişandin” (Boyîk, 2012: 13). Piştî filma *zerê* di warê edebîyata Kurdî da gaveke mezin jî avakirina elîfbeya Kurdî ya latînî bû. Berî hingê Elîfbeya Ermenîkî têra dengên Kurdî nedikir. Ji ber vê yekê jî “sala 1928a Erebe Şemo û Isahak Mêrangûlov elfeba Kurdî ya bi tîpên latînî damezrandin. Hema wê salê pirtûka wane *xwe bi xwe hînbûna kurmancî* çap bû” (Boyîk, 2012: 13). Bi vê gavê ra jî êdî hêdî hêdî xebatên çand û hunera Kurdî dest pê kir. Di weşanên radyoyan da car caran beşên Kurdî hate axaftin, berhemên berhevokî hate dayîn û ya herî grîng rojnameya *Rêya Teze* dest bi weşanê kir. Zarokên sêwîxaneyan jî hêdî hêdî gihîştin û “usa, kadrên ewlin pêşda hatin: Heciyê Cindî Emînê Evdal, Qanatê Kurdo, Cerdoyê Genco, Wezîrê Nadîrî, Casimê Celîl, Etarê Şero” (Boyîk, 2012: 14). Li Ermenistanê jî ji bo pêşdaçûna lîteratura Kurdî weşanxane hatin vekirin û bi vî teherî berhemên Kurdî hatin dayîn. Yekem berhema edebî dîsa ya Lazoyê Ermenî bû. “pirtûka edebî, ya pêşîn, ku sala 1931ê li Ermenistanê da hate weşandin ya Lazo bû, bi sernivîsa: Serhatiya Casim. Sala 1932an berevoka efrandinên nivîskarên Kurda ewlin: Efrandinê Ewlin hat weşandin” (Boyîk, 2012: 14). Efrandinê duwem di sala 1934an û ya sisyan jî sala 1935an da tê weşandin ku gelek nivîskarên cuda tê da pênuşa xwe dibezînin.

Piştî hingê êdî berhemên Kurdî li pey hevdu rêz dibin. Di her qadên edebî da xebat tên kirin û gelek neşr pêş da tên. Wek mînak “sala 1932an Hecîyê Cindî şanoya xwe *Qutiya dû dermana* çap dike. Sala 1935an bi pirtûkên cuda Ahmedê Mirazî şanoya *Zemanê Çûyî*, Wezirê Nadirî *Reva jinê*, E. Şemo romana *Şivanê Kurmanca* û berevoka helbesta *Nûbar* diweşînin. Sala 1936an romana E.Şemo *Kurdê Elegezê* û berevoka zargotina Kurda ya bi nav û deng *Folklorê kurmanca* hatine weşandin. Ev berevoka zargotinê ye û hêja Hecîyê Cindî û Emînê Evdal hazir kiribûn” (Boyîk, 2012: 14). Di vê dema ewilîn da Kurdan ji sîyaset û rêbaza Sovyetê gelek sûd wergirtin û di warê pêşketinê da xebatên cihereng kirin.

1.2.2. Dema Duyan

Em dikarin bibêjin ku ev dem di navbera salên 1937an û 1955an da ye. Di navbera van salan da kar û xebatên Kurdî dîtewise û zordarî li Kurdên li wir tên kirin. Stalîn bi polîtîkayên dîktatorî xabatên Kurdî dide rawestandî. “Di 1930 û 1944an de, wekî encameke polîtîkaya Stalîn beşeke Kurdên Kafkasyayê hatin sirgûnkirin bo Asyaya Navîn û Kazaxistanê” (Omerxalî, 2017: 27). “Gelek rewşenbîrên Kurd ji kar tên avêtin, tên girtin, nefîkirin. Erebê Şemo nefîyî Sîbîrê dîkin. Hecîyê Cindî, Cerdoyê Gêncî, Ahmedê Mirazî tê girtin, zêrandin” (Boyîk, 2012: 15). Ji ber ku Stalîn dewletên Ewropayê wek tehdît didît û ji elîfbeya latînî aciz bû, dawî li elîfbeya latînî anî û bi vî teherî elîfbeya latînîya Kurdî dîsa veguherî tîpên kirilî. Ev kar jî dikeve ser milê Hecîyê Cindî û “sala 1946an elfeba tê çapkirin” (Boyîk, 2012: 15).

Kurdên Kafkasyayê ji bilî polîtîkayên Stalîn, ji şerê dijî Hîtler jî gelek êş dîtin. Di şerê ku 1941an da dest pê bû, gelek xortên Kurdan çûn şerê Hîtler û careke din venegerîyan mal û halên xwe. Her çiqas di wê dewrê da jî alîyê çanda Kurdî qedexa li ser xebatan ewr girtibû jî, ji alîyê xebatên şanoyê pêşketinên mezin hatin avêtin. Li gundê Elegeza Ermenistanê tîyatro hate vekirin û gelek şano lê hatin lîstin. Gelek destanên Kurdî, klasîkên Ermenîyan û yên din di şanoya li wir hatin lîstin. Em ê di bin sernaveke din da bi hurgulî behsa van şayoyan bikin û binasin.

1.2.3. Dema Sêyan

Dema salên çetnayê pişt ketin, di sala 1950yî şûndatir xebatên Kurdî li Kafkasyayê careke din gur û geş dibe. Weke Boyîk (2012: 16-21) jî derdibire Rojnameya Riya Teze dîsa dest bi weşanên xwe dike. Herwiha Radyoya Rewanê dest bi axaftinên kurmançî dike. Nivîskarên kadroyên dema duyem ên wek Hecîyê

Cindî, Emînê Evdal, Ahmedê Mirazî wan deman di karê dewletê da dixebitîn. Hin Kesên wek Qaçaxê Mirad, Êsivê Beko, Elîyê Evdilrehman û Mîroyê Esed hatin bi van kedkarên Kurdî ra gihîştin. Romanên Erebe Şemo yê bi navê Berbang (1959), Jîyana Bextewar (1959), Dimdim (1965) çap bûn. Hecîyê Cindî di gelek şaxên wêjeyê da xebat kirin. Piştî salên 60î jî nivîskarên esil ên wek Şikoyê Hesên, Fêrikê Êsiv, Wezîrê Eşo, Karlanê Çaçanî, Ordîxanê Celîl, Sihîdê Îbo û yên din derketin.

Helbestvanên wek Fêrikê Êsiv û Şikoyê Hesên di warê helbestê da pêşketineke mezin kirin. Dema mirov behsa wêjeya Kafkasyayê dike, divê ne tenê hişke hişk Ermenistan were bîra me. Bandora Sovyeta Yekgirtî li ser welatên wek Gurcistanê jî hebû û Sovyêt li ser wan jî hikum dikir. Piştî ku Kurd ji Qersê revîyan hinek ji wan pişt ra koçî Tîblîsa Gurcistanê kirin û zêdetir piştî salên 1970yê xebatên wêjeyî li wir jî geş bû. “Eger em berê xwe bidin Gurcistanê, di salên 1970yan û heta 1980an de eleqeyê li ser mijara Kurdan zêde bû û di demeke kurt de Tîflîs ji bo jîyana çandî ya Kurdan bû navendeke din. Li wir li dibistanan pol, şanoyek, komên muzîkê, weşanên pirtûkan, weşana radyoyê ya hefteyê pêk hatin û di Yekîtiya Nivîskaran a Gurcistanê de beşa Kurdî vebû” (Omerxalî, 2017: 30). Piştî salên 1950î heta niha di Kafkasyayê da gelek rûmannûs, wergervan, helbestvan, şanoger û yên din derketin û di gelek qadan da xebatên xwe tevî çemê wêjeya Kurdî kirin.

2. Xebatên Şanoyê di Êwra Kafkasyayê da

Kurdên Kafkasyayê ne tenê di warê helbest, roman, çirok yên din, di warê şanoyê da jî xebatên xwe kirine û neşrên xwe dane. Piştî ku li Kafkasyayê neteweyên kêmjimar ji bo lîteratûra xwe xebitîn û Sovyeta yekgirtî jî pişgirî da wan berhemdarên Kurdî xwe avêtin nava cureya şanoyê jî. Em dikarin bibêjin berî ku zext û zilma Stalîn dest pê bike, “şanoya Hakob Xazaryan (Lazo) ya bi navê “Qelen” li bajarê Tîblîsa Gurcistanê tê lîstin. Lazo, bi Ahmed Mîrazî û rewşenbîrên Kurd yên li Gurcistanê re, li kilûba *Lûkaşîn* ya bajarê Tîblîsê vê şanogeriya hazir dikin” (Zêdo, 2015: 250). Lê em dikarin wisa bibêjin ku yekem şanoya li Kafkasyayê ji aliyê Kurdekî va hate weşandin ya Erebe Şemo ye. “Koçekê Derewîn” ya Erebe Şamîlov, li Rewanê (Ermenîstan) tê weşandin” (Zêdo, 2015: 251).



(Ereb Şamîlov, *Koçêkê Derewîn*, Neşra Dewleta Şêwrê Ermenîstanê, Rewan, 1930)

Piştî şanoya Erebe Şemo “sala 1932a Hecîyê Cindî şanoya xwe ye “Qutiya du dermana” çap dîke” (Boyîk, 2012: 14). Piştî van şanoyan derîyê xebatên şanoyê heta li ser piştê vebû û sal bi sal şano hatin nivîsîn û çapkirin. Bi taybetî piştî polîtîkayên Stalîn ên ku qedexa dan li ser xebatên Kurdî, çirûska şanonivîsînê geştir bû. Di navbera destpêka polîtîkayên Stalîn, destpêka şerê dijî Hitler û mirina Stalîn da di nav xebatên Kurdî da şano gava herî pêş e. Berî ku li Elegezê tîyatroya Kurdî were damezirandin “sala 1935an *Reva Jinê* ya Wezîrê Nadir li Rewanê çap dibe. Heman salê *Zemanê Çûyî* ya Ehmedê Mirazî, li Rewanê çap dibe” (Zêdo, 2015: 253). Piştî du salan jî li Elegezê şanoya Kurdî vedibe û cur bi cur lîstik di tê da tîstî û pêşkêşkirin. Ji bilî tîyatroya Elegezê piştî salên 1970yî li Tîblîsê jî tîyatroya tê avakirin û gelek lîstik jî li wir tîstî pêşkêşkirin.

2.1. Tîyatroya Elegezê ya Dewletê

Hêjayê gotinêye ku di navbera salên 1937-1955an xebatên ku hatin berçavan hemû li ser şanoyê bû. Piştî ku çend şanoyên Kurdî hatin çap kirin, “sala 1937an, bi qirara Hukumeta Komara Ermenîstanê, li navenda Nehiya Elegezê, li gundê Kurdan (berê gund ra digotin Çamûşvana Mezin), Têatiroya Kurda ya Dewletê hate damezirandin” (Boyîk, 2012: 93). Ev tîyatroya ji alîyê komara Ermenîstanê va di hate qebûl kirin û palpişt kirin. Di serî da ji alîyê profesyonelîyê va tu kes tunebû.

Lîstikvan ji xortên Ermenî û Kurdan pêk dihatin. Herwiha van kesan ji alîyê dewletê va pere jî distandin. Ji bo serê pêşî “serokê têatroyê yê ewil, bineliyê gundê Qundexsazê (niha Riya Teze), nehiya Elegezê Celatê Koto, rejîsor Solak Nîkoxosiyân, serokê para bedewetiyê aktiyorê Ermenî, yê bi nav û deng Mikirtîç Canan hate kifşkirin” (Boyîk, 2012: 96). Di demeke nêzîk da şanoyên ku li ser dikê hatin lîstin di nav Kurdan da berbelav bûn. Xelkê gelek arezûdarî bi şanoyan anî û wek temaşevan gelek kes diçûn sêrkirinê. Di nav şanonûsên şanoya Elegezê da ne tenê Kurd, şanoyên Ermenî jî dihatin pêşkêşkirin. “Têatroyê di nav 10 salên heyîtiya xwe de nêzîkî 30 şano derxiste ser dikê, çar heb ji wan nivîskarên Kurd nivîsîbûn: *Lûr de lue* ya Celatê Koto, *Miraz* ya Heciyê Cindî û *Xûşka Doxtiriyê* û *Bira* ya Cerdoyê Gêncî” (Boyîk, 2012: 99). Jixwe piştî ku Hîtler li hember Sovyêtê biryara şer da, mijarên şanoyê jî vegerîyan li ser mêrxasîyê û mijarên propagandayî. Di dewrên şer da seroktiya tiyatroyê Cerdoyê Gêncî dike û herdu şanoyên wî jî li ser mijara şerê wetenîyê ne. Bi vî teherî şano wek amrazêke propagandayê jî hate bikaranîn. Şanoya Elegezê ya Dewletê piştî deh salan ku emir kir, zirze li derê wê ket. “Di sala 1947an ji alîyê hukumeta komara Ermenistanê nehiya Elegezê hate betalkirin” (Boyîk, 2012: 99).

Hin şanoyên ku li têatroya Elegezê hatine lîstin em dikarin wiha rêz bikin: “*Lûr de lue* ya Celatê Koto, *Miraz* ya Heciyê Cindî, *Heso* ya Ş. Gênosyan, *Heyfhildan* ya Nayrî Zaryan, *Mêrgên Elegezê* ya H. Şaybûn, *Jêlêznyakê Partîzan* ya B. Staffl, *Xûşka Doxtiriyê* û *Bira* ya Cerdoyê Gêncî, *Mem û Zîn* a Soxomon Tarons, *Pêpo* ya G. Sindûkyan, *Ruhê Xirav* a A. Şîrvanzadê, *Qeya* ya V. Papazyan, *Nezerê Mêrxwes* a H. Tumanyan; *Sîyaneta Welat* ya Midîvanî (ji wêjeya Gurciya); *Sivêrîl, Keça Welat* ya Cefer Cabarêlî (ji wêjeya Azeriyan)” (Zêdo, 2015: 254).

Piştî ku şanoya Elegezê hate dadan listikên şanoyê jî êdî kuta dibin û heta piştî salên heftêyî koma şanoyan çênabe. Jixwe dema Radyoya Rewanê 1955an dest bi weşanên xwe dike radyokompozîsyon li radyoyê tîn amadekirin û li radyoyê şanoyên bi deng tîn lîstin. Lê “bi biryara Wezîreta Kultûrayê ya Ermenistanê sala 1975an dîsa li gundê Elegezê teatroya Kurda ye gelêrî hate damezirandin” (Boyîk, 2012: 103). Dîsa şanoyên Kurdî derdikevin li ser dikê. “Koma têatroya gelêrî nava heyîtiya xwe da komêdiya Fêrikê Ûsiv *Bêqelen*, ya Wezîrê Eşo *Remo...*, Eskerê Boyîk *Sinco Keça Xwe Dide Mêr*, şanoyên *Birînên Rojên Bihurî*, *Heyf* û yên din derdixin

ser dikayê” (Boyîk, 2012: 103). Ev şano gelek caran li Tiflîsê jî tên lîstin. Jixwe piştî çar salên avabûna têtroya Elegezê ya nû, li tiflîsê jî Tîyatroya Tîblîsê ya Gelêrî tê avakirin.

2.2. Tîyatroya Tîblîsê ya Gelêrî


Dema Sovyêta Yekgirtî mafên Kurdan dan û li Ermenistanê gavên mezin di derbarê wêjeyê da hatin avêtin, li Gurcistanê jî xebatên cur bi cur dihatin kirin û hewlên mezin li wir jî hebûn. Pirtûkên Kurdî li wir jî dihatin çap kirin û nivîskarên li wir jî di nav têkoşîna wêjeya Kurdî da bûn. Lê li Gurcistanê xebatên berbiçav piştî salên heftêyî hatin kirin. Welatê Gurcistanê ji bo dengê xwe bidin li radyoya Gurcistanê da beşa Kurdî vekir û hişt kar û barên wêjeya Kurdî pêş bikeve. Berê pêşî “di salên 1970yî de, di radyoya dewletê ya Gurcistanê de weşana kurmancî dest pê kir” (Ûso, 1990, Zêdo, 2015: 205). weke ku Mirazê Caferov di roportaja xwe ye 1985an da behsa radyoyê dike, radyo her hefte roja çarşemê bi 15 xulek weşana xwe ya Kurdî dike.

Her heftiyê roja şembî, me 15 deqîqe programê radyoyê heye bi zimanê Kurdî li radyoya Corcîa û navê programî ev e: Rêveberîya nisandina programên Kurdî li radyoya Corcîa Sovêtî û navê berpirsê programan jî Keremê Enqosî. Van programan ji sala 1979ê dest pê kiriye” (Zêdo, 2015: 216).

Li ser destpêka radyoyê ra li Tiflîsê xebata şanoyê hate kirin û li Tîblîsê “şanoya Kurdî sala 1974ê hate damezirandin” (Zêdo, 2015: 217). Di vê şanoya Tîblîsê da tevî Kurdî bi zimanên din jî şano hatin wergerandin û pêşkêşkirin. Zêdo(2015: 215-225) wisa behs dike ku Piştî koma şanoyê hate avakirin, şeş sal şûnda yekem lîstika Kurdî derdixin li ser dikê ku ew jî şanoya Eskerê Boyîk ya bi navê *Sinco Keça Xwe Dide mêr* e. Ev şano di meha Gulana 1980î da li Tîblîsê tê pêşkêşkirin. Bi dûmahîya demê ra şanoyên cur bi cur derdikevin pêşberî temaşevanan. Di heman salê şanoyên bi navê *Cînar* û *Elî û Omer* yên Giyorgî Xakayîf tê pêşkêşkirin. Bi dû ra şanoyên Kurdî ên wekî *Zarîna Çiya* û *Xecê û Siyabend*, *Bûk û Xesû* yên din tên pêşkêşkirin. Şanoyên bi zimanê rûsî, azerî, gürçikî û ermenî jî ji aliyê wergervanan va dihate wergerandin û pêşkêşkirin. Wergerên ku ji zimanê Ermenîkî dihate kirin para Tosinê Reşîd û Şalikoyê Miraz ketibû. Van wergêran ruhê Kurdî li kirasê şanoyên bîyanîyan dikirin û ji nû va didan pêşkêşkirin.

Rejîsorê Tîyatroya gelêrî ya Tîblîsê Mirazê Êzo di roportaja xwe ya sala 1990î da wiha li ser vê meseleyê diaxive:

“Şanoyên ku me derdixistin ser sehnê, hinek ji wan Kurdî hatibûn nivîsandin, ne hemû yên dinê werger bûn.. Nivîskarên piyesên Kurdî: Eskerê Boyîk Sinco Keça Xwe Dide Mêr, Ezîzê Gerdenzerî Zarîna Çiya û Xecê û Sîyabend Lîstikên me bi zimanê Rûsî, Azerî, Gurcîkî, Ermenî jî hatin sehnekirin. Hin lîstikên me hatin wergerandin û lîstin. Wergêrên zimanê Ermenî, Tosinê Reşîd û Şalikoyê miraz bûn. Şanoya xwe heta ji destê me dihat me bi şêwê, karakter û ruhekî Kurdewarî diafirand” (Zêdo,2015: 210).



(Dîdemek ji şanoya Ezîzê Gerdenzerî ya bi navê *Zarîna Çiya*, Tîblîs)

Herwiha rejîsor Mirazê Êso di hevpeyvîna xwe ya sala 1991an li ser şanoya Tîblîsê wiha lê zêde dike:

Di nav van 10 salan de me 15 piyes hazir kirine. Piyesa pêşin a Eskerê Boyik “Sinco Qiza Xwe Dide Mêr” e. Wekî din jî piyesên Kurdî Xecê û Siyabend”, “Zarîna Çiya (Cihangîr Axa)” ya Ezîzê Gerdenzerî ne. Piyesên din ne yên Kurdî ne, me ji zimanên din tercûmeyî Kurdî kirine. Piyesên ku bi naveroka xwe ve nêzî pirs û pirsgerêkên Kurda ne, hatine hîlbijartin û tercûmeyî Kurdî bûne. Me ne tenê ziman tercûme kiriye, lê piyes bi her awayî guhertiye Kurdî. Wek nimûne piyesa Şamxalov (Azerî) “Xwesû”, piyesa Xugayet (ji gelê Os) “Cînar”, piyesa Papayan (Ermenî) “Zavê ji Welatê Dereke”, piyesa Ananyan (Ermenî)

“Mala Min Ne Mala Te ye”, Piyesa îyosel-yannî (Gurcî) “Hele Hêj Erebe Wernegeriyaye” û yê mayîn. Hin piyes jî me wek xwe hilgirtine, tu guhertin tê de nekirine. Wek piyesa jûrî Vîzbor (Rus) “Çiqîlê Spîndarê”, piyesa Çiyaxayîdzê (Gurcî) “Ji Saet 3 Heta 6’an. (Zêdo, 2015: 223).

Şanoya Tîblîsê jî bi vi teherî gelek şanoyên Kurdî û şanoyên bîyanî ên bi rihê Kurdî hatine xemilandin derxistine li ser dikê. Şanoyên ku hatine pêşkêşkirin ji aliyê temaşevanan va gelek eleqe dîtine û bajar bi bajar ji nû va hatine pêşkêşkirin.



(Dîdemek ji şanoya Eskerê Boyîk ya bi navê *Sinco Keça Xwe Dide Mêr*, Tîblîs)

2.3. Kronolojîya* Şanoyên Kafkasyayê

1928- Şanoya Hakob Xazaryan (Lazo) ya bi navê *Qelen* li bajarê Tîblîsa Gurcistanê tê lîstin. Lazo, bi Ahmed Mîrazî û rewşenbîrên Kurd yê li Gurcistanê re, li kilûba “Lûkaşîn” ya bajarê Tîblîsê vê şanogeriye hazir dîkin.

1930- *Koçekê Derewîn* ya Ereba Şamîlov, li Rewanê (Ermenîstan) tê weşandin.

* Ev kronolojî li gor pirtûka Çetoyê Zêdo ya bi navê *Dîroka Şanoya Kurdî* û li gor pirtûka Eskerê Boyîk ya bi navê *Çanda Kurdên Sovêtê* hatiye amadekirin. Tenê me *Tîgran û Mehmûd* a Wezîrê Eşo lê zêde kirîye.

1932- *Qutiya Dû-Dermana* a Hecîyê Cindî, li Rewanê çap dibe. Ev piyês, piştî bi sernavê "*miraz*" li Têatira Elegezê ya Kurdî ya dewletê tê pêşandan.

1935- *Reva Jinê* ya Wezîrê Nadir li Rewanê çap dibe.

1935- *Zemanê Çûyî* ya Ehmedê Mirazî, li Rewanê çap dibe.

1937-1947- Hin şanoyên Elegezê: *Lûr de lûe* ya Celatê Koto, *Miraz* ya Hecîyê Cindî, *Heso* ya Ş. Gênosyan, *Heyfhildan* ya Nayrî Zaryan, *Mêrgên Elegezê* ya H. Şaybûn, *Jêlêznyakê Partîzan* ya B. Staffl, *Xûşka Doxtirîyê û Bira* ya Cerdoyê Gêncî, *Mem û Zîn* a Soxomon Tarons, *Pêpo* ya G. Sindûkyan, *Ruhê Xirav* a A. Şîrvanzadê, *Qeya* ya V. Papazyan, *Nezerê Mêrxwes* a H. Tumanyan; *Sîyaneta Welat* ya Midîvanî (Ji wêjeya Gurciya); *Sivêrîl, Keça Wekat* ya Cefer Cabarêlî. (Ji wêjeya Azeriyan).

1957- Piyesa *Gulîzer* ya Emînê Evdal a radyofonîk di radyoya Êrîvanê de tê weşandin.

1964- *Zewaca Bê Dil* ya Îsmâîlê Dûko li Êrîvanê çap dibe.

1967- *Memê û Eyşê* ya Taharê Biro, li Ermenîstanê tê weşandin.

1974- *Bêqelen* a Fêrîkê Êsiv di radyoya Erîvanê de û li Şanoya Elegezê di heman salê de tê pêşkêşkirin.

1976- Pirtûka *Wezîrê Eşo* a bi navê Mizgînî hate weşandin. Di tê da deh çîrok hene. Çîroka bi navê *Tîgran û Mehmûd* bi dû ra wek radyokompozîsyon hatîye amadekirin û di radyoya Rewanê da bi navê *Destebirak* hatîye lîstin.

1978- *Teyrê Elegezê* a Vaçe Harûtûnyan, bi wergera Emerikê Serdar û derhêneriya Rizganê Emo, li Elegezê tê pêşandan.

1979- *Ker û Kulik* a Suren Gînosyan, bi wergera Hecîyê Cindî û bi derhêneriya Rizganê Emo ve li Elegezê tê pêşandan. Heman şano di sala 1980yan de li Tîblîsê jî tê lîstin.

1979- *Sînco Qîza Xwe Dide Mêr* a Eskerê Boyîk, bi derhêneriya Rizganê Emo ve li Elegezê tê pêşandan. Heman şano di sala 1980î de, tevî şanoya "Ker û Kulik" diçe tûrneya Gurcîstanê.

1980- *Memê û Eyşê* ya Xelîl Mûradov, bi derhêneriya Rizganê Emo li Elegezê tê pêşandan.

1980- *Pêşî Mirin Paşê Zewicîn* a M. Maksîmov, bi werger û derhêneriya Rizganê Emo ve li Elegezê tê pêşandan.

1980- *Heyfhildan* ya Eskerê Boyîk, bi derhêneriya Rizganê Emo ve li Elegezê tê pêşandan.

1980- *Sinco QîzaXwe Dide Mêr* ya Eskerê Boyîk, bi derhêneriya Miraze Uzo, li Tîblîsê tê pêşandan.

1980-*Cînar* ya Giyorgî Xakayîf, bi werger û derhêneriya Mirzê Êso, li Tîblîsê tê pêşandan

1980- *Elî û Omer* a Giyorgî Xakayîf, bi derhêneriya Mirazê Êso, li Tîblîsê tê pêşandan.

1981- *Xecê û Siyabend* a Suren Gînosyan, bi wergera Tosinê Reşîd û bi derhêneriya Rizganê Emo ve li Elegezê tê lîstin.

1981- *Xwesî* ya M. Şamxalov, bi derhêneriya Mirazê Êso ve Tîblîsê tê pêşandan.

1982- *Elî Welî* a Costa Xotagura, bi werger û derhêneriya Rizganê Emo li Elegezê tê pêşandan.

1982- *Hêj Otombêl Wernegeriyaye* ya Otia losseliani, bi derhêneriya Mirazê Êso, li Tîblîsê tê pêşandan.

1983- *Sînco Qîza Xwe Dide Mêr* a Eskerê Boyîk, bi derhêneriya Rizganê Emo ve, bi lîstikvanên nû re, bo careke din dîsa li Elegezê tê hazir kirin.

1983- *Zavayê Biyanî* ya Achot Papayan, bi derhêneriya Mirazê Êso, li Tîblîsê tê pêşandan.

1984- *Mala Min Mala Te Nîne* ya Girair Ananian, bi derhêneriya Mirazê Êso, li Tîblîsê tê pêşandan.

1985- *Ji Saet Sisêyan Heta Şeşan* a Alexandre Tchkhaidzê, bi derhêneriya Mirazê Êso ve li Tîblîsê tê pêşandin.

1986- *Çiqîlê Spîndarê* ya Juri Vizbor, bi derhêneriya Mirazê Êso, li Tîblîsê tê pêşandin.

1986-*Cînar* a G. Xugayev, bi werger û derhêneriya Rizganê Emo, li Elegezê tê pêşandan.

1987-*Temo û Lawik* a Wezîrê Eşo, bi derhêneriya Rizganê Emo, li Elegezê tê pêşandan.

1988- *Kumreşê Dînik* a Achot Papayan, bi werger û derhêneriya Rizganê Emo, li Elegezê tê pêşandan.

1988- *Ker û Kulik* a Suren Gînosyan, bi wergera Heciyê Cindî û bi derhêneriya Rizganê Emo ve li Kazakîstanê tê pêşandan.

1988- *Siyabend û Xecê* ya Tosinê Reşîd, ji weşanên Roja Nû, li Stockholmê tê weşandin.

1989- *Mem û Zîn* a Eskerê Boyîk, li Stockholmê ji aliyê weşanên Roja Nû ve tê çapkirin.

1989- *Yên Xwedê ji Wan Stendî* ya Şaliko Miraz, bi derhêneriya Mirazê Êzo ve, li Tîblîsê tê pêşandan.

1989- *Zarîna Çiyan* a Ezîze Gerdenzerî, li Tîblîsê tê çapkirin. Zarîna Çiya bi derhêneriya Mirazê Êzo ve di sala 1990î de tê lîstin.

3. Êrîvan Xever Dide: Radyoya Rewanê

Li nav Kurdên Sovyeta Yekgirtî gaveke mezintirîn jî radyoya Rewanê bixwe ye wekî di hêla çand û hunerê da gelek xebat lê hatine kirin û radyoyê çanda Kurdan bi tevî deng û miqamên wan jî nav jîyana gundîtîyê derxistîye û gihandîye dinyayê. Li welatê Sovyetê piştî ku li Elegezê şanogeh hate dadan û çend sal pişt ra jî bilî berhemdarîyê bi amûra radyoyê va zeliqîn û xwe pêş xistin. Dema Stalîn bi tevî polîtîkayên xwe di sala 1953an da mir hin civîn di Sovyetê da pêk hatin wekî şaşîyên Stalîn kirine li ber çavan raxin û ji ber vê yekê jî gavên nû biavêjin. Ordîxanê Celîl li ser vê mijarê û li ser van civînan wiha dibêje û dide dîyarkirin:

Pey mirina Stalîn welatê me da dereca polîtîka netewada hine guhastin çêbûn. Bona Kurda pîrsa here girîng ew bû, wekî 17-ê sêntyabira sala 1954a komîtêa merkeziya partîya komûnîstên Ermenistanê tevî gele pîrsên mayîn, sê biryarên bingeşî jî, ji bona Kurda pîr girîng, girtin. Yek ji wana jî nûva çapkirina rojnama “Rya teze” bû, ya ko sala 1938a derî lê hatibû girtin. Biryara dîda pîrsa amadekirina weşandina xebardana radyoya Kurdî bû ji Yêrêvanê. Gor vê biryarê xebardana bi zimanê Kurdî gere hevtê sê cara bihata weşandin, her cara bi 15 deqa. (Inanc, 2017: 61).

Bi vê biryara komîyeta komûnîstên Ermenistanê di sala 1954an xebatên radyoyê dest pê kirin. Lê weşanên radyoyê bi fermî hê jî dest pê nekiribû. Hîmê wê jî nû va dihate avêtin û xebatkarên profesyonel lê tunebûn. Di Radyoya Rewanê da weşanên ku Ermenîyan hazir dikirin hemû bi profesyonel bûn û karê wan baş pêş da diçû. Propagandaya pergala Sovyetê di nav bernamêyan wan da baş dihate kirin. Jixwe vekirina para Kurdî li radyoya Rewanê di eslê xwe da “meremê axaftinan dijî împêralîzmê piropaganda sosiyalîzmê bû”(Boyîk, 2012: 74). Kurdan jî bi avabûna para Kurdî, çand û hunera xwe bi rêya radyoyê gihande dinyayê. Piştî salekê “xebardana Radyoya Yêrêvanê bi resmî li Yekê Kanûna paş Yanvarê(Sermawez) sala 1955an dest pê kir. (Inanc, 2017: 17). Serê pêşî “berpirsyarê vê beşê, yê ewlîn

heta sala 1957an nivîskarê navdar Casimê Celîl bû. Pey ra ew heta sala 1964an parê da wek rêdaktorê beşa sitiran û mûzîkayê xebitî” (Eskerê Boyîk, 2012: 74). Casimê Celîl bi dest pê kirina weşanên Kurdî ra dikeve nava xebatên çandî û zêdetir li ser berhevkirina klaman disekine û li pey dengbêjan digere. Di radyoyê da beşên axaftinan yê 15 deqeyî dest pê dikan. “Axaftinên bi zimanê Kurdî pêşiyê, rojê panzde deqîqe bû, zûtirekê dikan nîv saet, saetek, paşê jî saet û nîvekê” (Inanc, 2017: 26). “Salên ewlin demeke kin sipîkêrî kirine Nûrê Polatova (xûşka şoreşgerê bi nav û deng Fêrik Polatbêkov, pîreka Wezîrê Nadîrî) Ordîxanê Celîl, Maksîmê Xemo. Bi demên dirêj axaftina Kurdî bi dengê Eznîfa Reşîd, Sêvaza Evdo, Gulîzera Casim, Lûsîka Huseyn diniyayê belav bûne” (Boyîk, 2012: 77). Di destpêkê da xeberdanên radyoyê her roj nebûn. Ordîxanê Celîl û Nûrê Polatova deng didan û weşan amade dikirin. Lê “pêşyê weşan zêndî nîbûn, deng ser şîrîtê digirtin, sênzor kontrol dikirin, paşê diweşandin” (Inanc, 2017: 80). Ordîxanê Celîl di beşên nûçeyan da û di beşên li ser jîyana gel da dengê xwe dida û bi dû ra weşanên wan dihatin kirin. Di destpêkê da pîrsgirêka radyoya Rewanê ew bû ku xebatkar ne profesyonel bûn û kes lê tunebû. Barê giran ketibû ser Casimê Celîl. Casimê Celîl jî dixwest klam û awaza Kurdan bigihîne hemû dinyayê. Lê “ji radyoyê ra stran û awazên Kurdî lazim bûn. Desteya pêşîn ji stranvan û muzîkaran, ew koma sazbandan a şamilê Beko bû. Şamilê Beko li nav Kurdên Ermenistan û Gurcistanê zurnevan, sazbandekî bi nav bû. Di heman demê da ji bona radyoya Kurdî Egîtê Têcir û Taharê Emer piştevan derketin. Taharê Emer bi hostevanî bilûrê dixist” (Inanc, 2017: 26). Bi dû van kesan ra kesên wek Egîdê Cîmo hatin tev li xebatên radyoyê bûn û bi hostevanî amûrên xwe lê xistin û miqamên Kurdî ji nû va afirandin. Casimê Celîl jî li pey dengbêjan digerrîya û wan ji gundan dianî dengê wan tomar dikir û di radyoyê da diweşand. Keç û xortên Kurdan jî dema ji radyoyê dengê Kurdî dibihîstin, dixwestin bîr li radyoyê dengê xwe bidin û bisitrên. Taharê Emer di derbarê wan rojan da wiha bi bîr tîne û dibêje:

Bîra min tê, wekî nivîsara radyoyê destnivîsar, zarnivîsar bû. Hildana kilama Kerr û Kulîkê, Silêmanê Silîvî, Mem û Zînê, Xecê û Syabend. Mi bilûrê lêdixist, Egîtê rehmetî jî distira, pêşiyê, berî gîşka ew aliyê Casimê Celîl da hatiye hildanê. (Inanc, 2017: 58).

Bi vî teherî miqamên Kurdî di radyoyê da deng dan û denbêjên Kurdan ên li radyoyê xwe nîşan kirin”Sitirana Kurdî ya ewlîn, ku bi radyoya Yêrêvanê hatîye dayîn “Bêrîvan” a dengbêjê denxweş Efoyê Esed bû. Paşê ji pey hev sitiranên Şeroyê

Biro, Ahmedê Mirazî, Zadîna Şekir, Sûsika Simo, Fama Îsa, Egîtê Têcir, Belga Qado, Bêmalê Keko, Reşîtê Baso, Mehmedê Mûsa, Karapêtê Xaço, Mecîtê Silêmin, Aslîka Qadir, Memoyê Silo, Xemoyê Hesên, Kubara Xudo, Seyadê Şemedîn, Şiblîyê Çaçanî, Sîsa Mecît û gelek-gelekên din hatine nivîsar” (Boyîk, 2012:77). Wekî dîtir, ne tenê Kurd xweyî radyoya Rewanê derketine, herwiha gelek dengbêjên Ermenî jî stranên Kurdî gotine û ked kane xebatên çandî. Di nav tomarên radyoyê da “dehan stran û awazên Kurdî hene, ku dengbêjên Ermenî strane: Abrahamê Karapêt, Karapêtê Xaço, Aramê Tîgran, Davîte Xilo, Îsraêl Ohanyan, Hovannês Badalyan û yên mayîn” (Inanc, 2017: 85).

Piştî du salên avabûna radyoya Rewanê, “sala 1957an wek berpirsyarê beşê Xelîl Mûradov hate kivşkirin û bîst çar sala serokatî li parê kir” (Eskerê Boyîk, 2012: 74). Casimê Celîl jî piştî hingê bû serokê para muzîkê û xebatên xwe di wê hêlê da berdewam kir. Radyoya Rewanê di wê dewrê da ne tenê bibû dengê Kurdên li Ermenistanê, herwiha bibû dengê hemû Kurdên li welatên dev û dor. Di radyoya Rewanê da rasterast palpiştîya hemû Kurdan dihate kirin û çand û hunera wan ji nû va dihate avakirin. Di wan deman di radyoya Bexdayê da jî weşanên Kurdî dihatin kirin. Piştî ku haya Kurdên Başûr bi hebûna radyoya Rewanê çêbû “piştî şorişa Îraqê ya 1958an ji radyoya Bexdayê wek dîyarî stran ji radyoya Yêrêvanê ra şandibûn. Di wan stranan da dengê Mehmed Arif Cizrawî, Hesên Cizrawî û yên mayîn jî hebûn” (Inanc, 2017: 27). Bi vî teherî dengê gelek dengbêjan di radyoya Rewanê da cî girt û pêş da çû.

Radyoya Rewanê ji destpêka xwe hetanî niha mazûvanîya gelek nivîskar û helbestvanan jî kirîye. Di radyoyê da weşanên cur bi cur dihatin kirin û propagandaya berhemên Kurdî dihate kirin. Helbestên helbestvanan dihatin xwendin û ji pirtûkên nûçapbûyî beşên kurt dihatin xwendin. Herwiha di radyoya Rewanê da gelek berhemdarên bi nav û deng xebitîne. “Helbestvanên mezin Mîkayêlê Reşîd ji salên şêstî heta 1985an, Fêrikê Ûsiv salên şêstî, Şkoyê Hesên, nivîskar, rojnamevan Emerîkê Serdar dîsa wê demê, Sîma Semend ji salên şêstî heta nivê salên nodî bi fermî para axaftinên Kurdî da kar kirine”(Boyîk, 2012: 76). “Nivîskar Wezîrê Eşo ji sala 1963an da timê wê parê va girêdayî bûye. Ewî tevî nivîsandina rêportaj, miqale û gotaran wusa jî aliyê wergerê da rojên şemî û yekşeman aliyê parê dikir. Ji sala 1983 heta 1995an ew wê parê da êdî bi fermî wek wergervan û rêdaktor xebitiye”

(Boyîk, 2012: 76). Lê “ji roja damezrandinê heta nîvê salên nodî para axaftinên Kurdî da bi fermî bi wede kin ya dirêj Dr. Nûra Cewarî, Cemîla Casim, Egîtê Cimo, Tîtalê Efo (heçar jî wek rêdaktorên beşa sitiranbêyê û muzîkayê) rojnemevanê hêja Têmûrê Xelîl, Îşxanê Eslan(wergervan) Hesenê Memûd (rêdaktor), Cemalê Êsiv (nûçevan) û Dr. Tosinê Reşîd (demeke pir kin) xebitîne” (Boyîk, 2012: 77). Bi vî awayî ji roja damezrandina xwe heya roja îroyîn gelek rewşenbîrên Kurdên Sovyetê, çî fermî û çî jî wek palpiştî, di radyoyê da kar kirine û ji alîyê çand, huner, sîyaset û yê din Kurdîtîyê pêş da birine.

3.1. Berpirsyarên Radyoya Rewanê

Piştî Radyoya Rewanê bi awayekî fermî dest bi weşanên xwe kirin, weke ku me li jor behs kir berpirsyarê radyoyê pêşî Casimê Celîl hate kifş kirin. Casimê Celîl piştî du salan, ji berpirsyariya radyoyê derbasî para muzîka Kurdî dibe û di wê hêlê da xebatên xwe dimeşîne. “Radyoya Rewanê ye ku dîroka wê ji niv qurneyî zêdetir e heta niha ji alîyê çar serokan hatiye birêvebirin. Casimê Celîl (1955-1957), Xelîl Mûradov (1957-1981), Ahmedê Gogê(1981-1994), Keremê Seyad (piştî 1994an)” (Şamil, 2015: 46).

3.1.1. Casimê Celîl (1908-1998)



Casimê Celîl yek ji berpirsyarê radyoya Rewanê ku berê pêşî ew wek berpirsyar tê hilbijartin. Weke Boyîk (2012: 167-180) behsa jîyana Casimê Celîl dike wisa dipeyîtîne ku Casimê Celîl di sala 1908an li gundê Qizilqulê ya navçeya Dîgora Qersê tê dinyayê. Casimê Celîl piştî ku ji dayîk dibe di deh salîya xwe da rastî zulma sala 1918an tê û bi tevî malbata xwe tê derwarkirin. Dema şerê cîhanê yê yekem rûs ji devera Qersê vedikişin, gundên Kurdên Êzdî jî dikevin bin hikumdarîya Tirkên. Bi vekişîna rûsan ra zilm û zext li gundên Kurdan dest pê dikin û Kurdên Qersê mecbûr dibin ku koç bikin. Di nav Kurdên koçkirî da jî malbata Casimê Celîl jî hebû ku berê xwe dabûn Ermenistanê. Casimê Celîl yek ji wan rewşenbîran e ku ji ber zilmê êtîm maye û hê piçûktayîya xwe da li êtîmxaneyê mezin bûye. Casimê Celîl xwendina xwe li êtîmxanê dike û piştî ku digihîje dest bi xebatên xwe yî Kurdewarîyê dike. Dema behs tê li ser Casimê Celîl xebatên wî yê li ser muzîka Kurdî û radyoya Rewanê derdikeve berçav. Casimê Celîl sê sal û nîvan, ji yekê Yanvara sala 1955an heta

Gulana sala 1958an serokatîya radyoya Rewanê dike. Piştî sala 1958an heta 1963an jî serokatîyê ji bo beşa muzîkaya Kurdî ya radyoya Rewanê dike. Casimê Celîl dema di radyoyê da dest bi xebatan dike zêdetir li ser klam û miqamên Kurdî radiweste û dixwaze dengê Kurdî bi saya radyoyê bigihîjîne dinyayê. Bi vî armancî Casimê Celîl dikeve nava Kurdan û dengbêjan kom dike, stranan dide hev û bi dengbêjên amator bi alîkarîya Ordîxanê Celî û Nûrê Polatova weşanan dike.

Casimê Celîl salên 1930î dest bi afirînerîyê dike û di rojnameya Riya Teze da werger û berhemên wî tên weşandin. Casimê Celîl ji nivîskarê Ermenî Hovhanês Tûmanyân, ji helbestvanê rûs Alêksandir Pûşkîn wergeran dike, destana *“Sîamanto û Xecêzerê”* ya helbestvanê Ermenî Hovhanês Şîraz werdigerîne kurmancî. Çend xebatên Marks, Lênîn, Drampyan û Nûrê Hîzanî werdigerîne Kurdî. Herwiha Casimê Celîl wergerê ji Kurdî bo Ermenî jî dike.

Berhevokên helbest û destanên Casimê Celîl yê bi zimanê Ermenî hatine çapkirin ev in:

1954- Berhevoka bi navê *“Elegez”*

1955- *“Beyt-serhatîyêd Kurdaye evîndarîyê”*

1957- *“Kanîya Dê”*

1968- *“Rê û dirbên Wede (Dorogamî vremyon)”*, jî zimanê rûsî.

Berhevokên Casimê Celîl bi zimanê Kurdî jî ev in:

1960- *“Rojên Min”*, berhevok. Di nav vê berhevokê da jî bilî helbestan destanên Kurdan yê gelêrî(*Zembîlfiroş, Memê û Eyşê, Têlî Eyşê, Leylê û Mecnûm*, bi veçêkirina wî *Nado û Nazê, Sura Bircê, Cibrî û Cemîle*.)

1966- *“Ocaxa Min”* (bi Ermenî)

1970- *“Kilamê Çiya”*

1975- *“Oda Kurda”*

1980- *“Kurdê Bengî”*

1982- *“Zozan”*

1984- *“Kofya Diya Min”*

1989- “*Bijare*” (bi Kurdî)

Ji bilî van berhemana bi kitêba Casimê Celîl ya bi navê “*Lîteratûra bona dersxana V-VI*” xwendekarê Kurd ji 1955an heta 1990î fêrî Kurdî bûne.

3.1.2. Xelîlê Çaçan Mûradov (1924-1981)

Dema li ser emrê Radyoya Rewanê ra du salan zêdetir wext derbaz dibe, Casimê Celîl di radyoyê da dibe serokê beşa muzîkayê û Xelîlê Çaçan Mûradov jî wek berpirsyarê Radyoya Rewanê tê hilbijartin. “Xelîl Mûradov sala 1924an 10ê Çileyê Pêşîn li gundê Karvanserê (niha Emirê teze), navçeya Artîkê, Komara Ermenistanê hatiye dinyayê. Malbata wan di gund da bi nav û deng bûn, ji êla Roşkiyan bûn. Kalbavê wan jî gundê Hesencano, navçeya Dîgorê ya Qersê, Kurdistanê Bakur dawîya salên sedsala 18an hatibûn wî gundî binecî bûbûn. Lê kîngê jî elê Roşkaniyê ya bi nav deng qetyabûn nedihat bîra kesî. Dibêjin ku di salên şerê Rûsiyayê-Osmaniyan yê di salên 1827-1828an da ji Bitlîsê hatibûne gundên dora Qersê bi cî bûbûn.

Xwendina xwe li dibistana gundê xwe ya despêkê temam dike. Paşê xwendina xwe li Dibistana Partiyê ya Bilind li Yêrêvanê. Dû ra jî Înstîtûta dûreke ya Pêdagogiyê didomîne. Berî temamkirina du xwendinên bilind ra ew li navçeya Elegezê li Ermenîstanê 6 salan (heta sala 1949an) dibe serokê komîtêya na-vendî ya komsomolên navçeyê. Paşê, ji sala 1950 heta sala 1957an dibe serokê beşa kûltûrayê li komîtêya şuxulvaniyê ya navçeya Araratê. Ji sala 1957an heta dawîya emirê xwe, ango sala 1981ê (24 salan) serokatî li beşa radyoyê ya zimanê Kurdî li Yêrêvanê dike.

Xelîlê Çaçan Mûradov nivîskar bû. Mêla wî himlî li ser zargotina gelêrî bû. Pirtûkên wî “*Kilamên cimaeta Kurdan*” 1963, “*Du poêm*” (destanên “Memê û Eysê” û “Zembîlfiroş”) 1965, “*Qisên ci-maetê*” 1969, “*Benê min qetiya*” 2007 (Weşanxaneya Doz), derheqa wê yekê da dibêjin. Sala 1976an berevoka wî ya kurteçîrokan “*Moriyê Nenê*” li Yêrêvanê hate weşandin. Berhevok ji aliyê xwendevana va bilind hate qîmetkirin. Dema xweye efrandariyê ye herî geş da têlê emirê wî qetiya” (Boyîk, 2012: 344-347).

Xelîlê Çaçan di derbarê xebata Radyoya Rewanê da bîst û çar salên xwe daya û ji bo pêşketina çanda Kurdî xebitîye. Piştî damezrandina Radyoya Rewanê zêdetir

bernameyên cur bi cur çêdibin û qada xebatên radyoyê berfirehtir dibin. Di dewreke wiha da hemû kar û berpirsariyê dikevin ser milê Xelîlê Çaçan. Ew jî heya dawîya emrê xwe li radyoyê kar dike û Kurdîtiyê pêş dixê. Gelek stranên bi nav û deng di dewra wî da deng dane û bernameyên cur bi cur bi berpirsariya Xelîlê Çaçan hatine amadekirin. Bernameyên wek çandî, sîyasî, perwerdehî û yên din di serada Xelîlê Çaçan ra derbaz bûne û wisa weşiyane. Ji bilî van bernameyan, bernameyên radyoşanoyê jî di radyoyê da dihate amadekirin û pêşkêşkirin. “Xelîlê Çaçan pey xwe ra ji bo gel 1800 stran, 40 pîyes-şano, 5 pirtûk û bi dehan gotar hîştin” (Xelîl, 2014: 292).

3.1.3. Ehmedê Gogê (1937-2003)



Ahmedê Gogê sala 1937an, li gundê Şamîranê, ser Nehiya Aştarakê, navça Aragatsotnê, Ermenistanê, malbeteke qedîma bi nav û deng da ji dayka xwe bûye. Piştî dawî anîna dibistana gund ya hevtsale ew para Kurdî ya Xwendinxaneya Yêrêvanê ya Pêdagogiyê da tê qebûlbûn. Piştî demekê vedigere gundê xwe û di dibistana gund da dersdariyê dike. Herwiha pêra jî fakûlteya Dîrokê û Ziman ya Înstîtûta Pêdagogiyê ji dûr va xilas dike.

Sala 1964an cîguhestî bajarê Yêrêvanê dibe, para radiyoaxaftinên Kurdî da dikeve xebatê, berê wek rêdaktor, paşê çawa serokê parê.

Wî berê jî gotar û mîqale radiyoyê ra dinivîsî, hizkirina wî ya afirandinê hebû, lê li wira bi temamî xwe pêşkêşî karê rojnemevanîyê dike. Qise, gotar, rêportajên wî ji aliyê guhdarvanan va rind tên qebûlbûn. Dema rêvabirîya wî da para axaftinên Kurdî, bi profîsiyolîzma xwe êdî ji parê dinê danedixist. Pîrr kar hate kirin bo zengînkirina fonda kilam û mîqamê Kurdî, gelek berhemên nû û hewaskar çêbûn.

Ahmed helbest jî dinivîsî. Hinek ji wan almanaxa nivîskarên Kurd ya salane Baharê da hatine weşandin. Dengbêj Aramê Tîgran çend helbestên wî kirine kilam. Ew sitiranên hizkirî ne û tim nava gel da tên gotin.

“Navê Ahmed wek nivîskarekî bi şûret, di nav neferên malbata nivîskarên Kurdên Ermenistanê da bi pirtûka “*Dengê kal-bavê me*” hate nivîsar. Ev pirtûka delal sala 1997an li Yêrêvanê hate weşandin. Ahmedê Gogê sala 2003an çû ber rema Xwedê” (Boyîk, 2012: 400-402).

3.1.4. Keremê Seyad(1938-2021)



Di Radyoya Rewanê da sala 1994an berpirsyarî ji Ahmedê Gogê derbasî Keremê Seyad dibe. Li ser jîyana Keremê Seyad Boyîk (2012: 448-450) dibêje ku Keremê Seyad di sala 1938an li gundê Heko, nehîya Telînê, komara Ermenistanê hatîye dinyayê. Kal û bavê Keremê Seyad di sala 1918an ji ber zulmê ji Qersê revîne hatine Ermenistanê. Keremê Seyad xwendina xwe dibistana gundê xwe da temam dike. Hê di salên xwendekarîya xwe da ji bo rojnameyan gotarên piçûk dinivîse û nivîsên xwe diweşîne. Di sala 1955an dema Riya Teze dîsa dest bi weşandina xwe kir, di Radyoya Rewanê da para axaftina Kurdî dest pê bû. Di sala 1960î da wextê axaftina Kurdî derdikeve saet û nîvekê. Di para Kurdî da pirsgirêkeke mezin jî tunebûna spîkerên dengxweş û profêsyonel bû. Di sala 1960î da ji aliyê serokatîya Radyoya Ermenistanê pêşbirk tê çekirin. Keremê Seyad jî di wê pêşbirkê da, di nava 26 kesan da dibe yekemîn. Piştî hingê Keremê Seyad di para axaftinên Kurdî da bi dengê xwe di nav Kurdan da deng vedide û tê nas kirin.

Berîya ku berpirsyarîya Radyoya Rewanê bikeve ser milê Keremê Seyad û malbata wî, her radyoguhdarekî ew ji dengê wî û spîkertîya wî nas dikir. “Ji pey sala 1994an ra kar û barên wê ocaxa Kurdî bi temamî ketin ser milê dîktorê (spîkêr) wê parêyî emekdar Keremê Seyad û malbata wî” (Boyîk, 2012: 75). Keremê Seyad ji sala 1960î heta 2021an radyoya Rewanê da kar dike û ji bo pêşdaçûna Kurdî kedeke mezin dide. Piştî ku Keremê Seyad tê li ser radyoyê bi tevî keça xwe Leyla û kurê xwe Tîtal radyoyê da xebatên xwe geştir dikan. Piştî hilweşîna Sovyetê komara Ermenistanê dixwaze para Kurdî were dadan lê Keremê Seyad bi tevî malbata xwe xwedîtîyê li radyoyê derdikevin û nahêlin radyo were dadan. Keremê Seyad herwiha “hîmên bernameyên heweskar û yên *wek zimanî te yî dê, xerîbê xwe digerin, Serhildanêd Kurda, rasthatin û bîranîn, pêncşema edebîyatê* avêt” (Boyîk, 2012: 449).

Keremê Seyad di nav Kurdên Sovyetê da zêdetir bi spîkertîya xwe û bi dengê xwe yî zelal hatîye nas kirin. Wî bi tevî Xelîlê Çaçan gelek xebatên cur bi cur kirine. Keremê Seyad di her curebernameyê da dengê xwe daye û zêdetir hatîye nas kirin. Helbest, nûçe û bi taybetî pîyesên di radyoyê da dihate xwendin bê dengê Keremê

Seyad nedibû. Di nav listikên pîyesan da Keremê Seyad gelemperî serlehengî û pêşkêşî dikir.

Keremê Seyad di 27ê Adara 2021an li Ermenistanê koça dawî dike û wî li gundê ku jê dayîk bûye teslîmî axê dikan.

3.2. Çend Bernameyên Radyoya Rewanê

Radyoya Rewanê li gor şert û mercên xwe û li gor xebatên xwe wek radyoyên din di qelek qadan da weşanên xwe kirine û xwe pêş xistine. Dema mijar tê ser Radyoya Rewanê zêdetir di hisê Kurdan da klam û miqamên Kurdî disêwire. Ev jî ji ber grîngî dayîna xebatkarên radyoyê li hember çanda Kurdîtiyê ye. Di destpêka radyoyê da xebatkarên profesyonel tunebûn. Kurd li ser miqamên xwe û li ser çanda xwe weşan dikirin. Lê bi dûmahîya demê ra di radyoya Kurdî da jî weşanên cur bi cur hatin dayîn û pêleya pêşketinê zêdetir bû. Di radyoya Rewanê da “bernameyên çandî, zaniyarî, dîrokî, perwerdeyî, malhebûna gindîtiyê, yên siyâsî, dostaniya gelan hatin dayîn, radyokompozîsiya dihatin hazirkirin” (Eskerê Boyîk, 2012: 74). Di radyoyê da dema weşanan çiqas zêdetir dibû, para axaftinê û cureyên bernemayan jî ew qas zêde dibûn. Di dîroka weşangerîya radyoya Rewanê da gelek bernameyên bi navên cuda hatine kirin. Weke ku me li jor jî behs kir dema Keremê Seyad dibe berpirsyarê radyoyê bernameyên bi navê “*zimanî te yî dê, xerîbê xwe digerin, Serhildanêd Kurda, rasthatin û bîranîn, pêncşema*” çêkirine. Lê em dikarin di dîroka radyoyê da bernameyên rêk û pêk û domdar di nav çend serenavan da bicivînin.

3.2.1. Bernameyên Propagandayê

Di pergala Sovyeta Yektirtî da gelek grîngî didan propagandaya sosyalîzmê. Di hemû radyoyên lê hazir û hemû xebatên edebî da divê berhemdar an jî xebatkar pesnê sosyalîzmê bida û lê bişêkranda. Dema em bi çarçoveyeke giştî xebatên wê demê dinihêrin, hemû jî di êlega pargala Sovyetê ra derbaz bûne û wisa xwe xweyî kirine. Dema di sala 1955an da radyoya Rewanê da para Kurdî bi awayekî fermî dest bi xebata xwe kir, di serî da armanca yekem pesndayîna sosyalîzmê bû. “Peyama bingehîn ya polîtîkaya weşanên radyoyê ew bû wekî dixwastin bibêjin: Radyoyeke ku ji bo bi milyona Kurdên ku berbelavê Rojhilata Navîn û Kafkasyayê bûne weşan dike tune lê li Sovyetê ji bo çend hezar Kurdan weşana Kurdî heye. Bi van gotinan jî dixwastin Kurdan bikin hevalbendê xwe û wan li hember yên ku dijî sosyalîzmê tevdigerin rakin ser pîyan” (Ağcakulu, 2012: 67). Bi vî armancî jî di radyoyê da

bernameyên propagandayê dihatin çêkirin û pesnê sosyalîzmê dihat dayîn. Di weşanên radyoyê da propagandayeke cidî ji bo sosyalîzmê di hate kirin. Di van weşanan da dema roportaj di hate kirin, sosyalîzm, her wekî rejimeke qenc di hate ravekirin. Carna bi hin kesên ji enstitûya Kurdolojîyê ra carna bi rêveberên giştî ra û carna jî bi rojnamevanan ra roportaj di hate kirin û peyamên bi nêrîneke sosyalîst dihatin dayîn” (Ağcakulu, 2012: 68).

3.2.2. Bernameyên Nûçeyan

Di nav bernameyên radyoyan da bernameyên nûçeyan cihekî grîng digire. Di Radyoya Rewanê da ji despêka damezrandina radyoyê heya niha bernameyên nûçeyan kêr ne bûne. Berê pêşî “Hemû nûçe û şîroveyên dihatin radyoya Rewanê ji Moskovayê dihat. Nûçeyên ku nûçegîhanên di radyoya *Dengê Rûsyayê* dişandin bi taybetî nûçeyên ku herêma Kurdistan eleqedar dikir û di nav da peyvên Kurdîti û Kurdistan derbas dibûn, ji alîyê xebatkarên radyoyê va ji rûsî bo Kurdî dihatin wergerandin. Tiştên ku li dinyayê diqewimîn, geşedanên politîkayê yên di nav Sovyetî da pêk dihatin û bi taybetî geşedanên Rojhilata Navîn yên siyasî û Kurdistan eleqedar dikir bi perspektîva Sovyetê ji bo gel dihat dayîn” (Ağcakulu, 2012: 68). Herwiha di radyoyê da nûçeyên derveyî welatê Sovyetê jî di hate dayîn. Di radyoyê da “behsa komkujîyên Iraqê yên li hemberê Kurdistan dihatin kirin, behsa sirgunên li wir dihatin kirin û di jî Iraqê bizavên propagandayî dihatin kirin. Jê cuda nûçeyên di derbarê şerê otonomîyê ya ku Mele Mistefa Barzanî dimeşand ji bo radyoguhdaran dihatin dayîn. Herwiha lehengîyên Barzanî dûvdirêj dihat behskirin û li ser vê mijarê şîrove dihatin kirin. (Ağcakulu, 2012: 68).

Radyoya Rewanê niha jî di nav weşanên xwe da nûçeyên Ermenistan û cihanê rabe rî radyoguhdaran dike û karê xwe dimeşîne.

3.2.3. Bernameyên Jîyana Gundîtîyê

Welatê Sovyeta yekgirtî piştî Şoreşa Oktobirê wek politîkayên Sosyalîzmê pergalek di nav gel da ava kir ku jê ra Kolxoz dihatin gotin. “Kolxoz kurtkirina peyvên Kollektivnoye Hozyaystvo (çandinîya kolektîf) e. Kolxoz ew kompanyaya çandinîyê bû wekî tê da malbatên gundî dixebitîn, di axên dewletê da hilberan dikirin û li gor dem û kedên xwe heqdestî distandin. (Ağcakulu, 2012: 71). Ev pergala dewletê di nav Kurdistan da kêr pêş diket. Ji ber vê yekê jî di radyoyan da behsa jîyana gundîtîyê di hate kirin û pesnê kolxozan di hate dayîn. Di radyoyê da “ji

bereketa erdên kolxozê bigire heta şîrdayîna çêlekên kolxozê bername dihatin çêkirin. Wek mînak di radyoyê da pêşbirkên bi navê “kê ji erdan zêde diçîne” an jî “çêleka kê dê zêdetir şîr bide” dihat çêkirin û encamên van pêşbirkan dîsa di radyoyê da dihat dayîn”(Ağcakulu, 2012: 72). Helbet ev bernameyên wiha ji bo propagandaya sosyalîzmê dihatin çêkirin û dihat xwestin wekî Kurd hînî vê pergalê bibin û tevî xebatên kolxozan bibin.

3.2.4. Bernameyên Edebî

Radyoya Rewanê ji bo hişyarkirina Kurdan û ji bo pêşdaçûna lîteratûra Kurdan jî gelek gav avêtîye û bi saya pêlên weşanên wê Kurd ji hevdu haydar bûne. Serî pêşî heta niha meriv dikare bibêje ku di radyoyê da di derheqa dîroka Kurdan, di derheqa roman û helbestên Kurdî, nivîskarên Kurdan da agahî dide û wisa li ser mijara edebî da xwar dibe. Dema radyo hate damezrandin “xebatkarên radyoyê ji Kurdologên Moskova û Rewanê alîkarî dixwastin. Ev Kurdolog gelemperî Kurd nebûn. Xebatkaran ji van Kurdolagan di derbarê bûyerên siyasî yên nû, di derheqa dîroka Kurdan da gotar dixwastin û ev gotar di radyoyê da dihatin weşandin” (Ağcakulu, 2012: 69). Herwiha di derbarê jîyana kesayetên Kurdên grîng da agahî dihatin dayîn û hê jî tê dayîn. Di radyoyê da ji bo berhemên Kurdî ên nû hatibûn weşandin propaganda dihat kirin. Jê cuda “di radyoyê da roman jî hatine weşandin. Her roj ji romanên beşek dihat xwendin û neqlê guhdaran dikirin. Wek mînak romanên Erebe Şemo di radyoyê da hatîye xwendin û neqlkirin” (Ağcakulu, 2012: 73).

Di radyoya Rewanê da ji bilî romanên helbest jî dihatin xwendin. Bi taybetî “helbestên ku li ser welat, gel, lehengî û evîne hatibûn nivîsandin dihatin xwendin. Di nav wan helbestan da helbestên îdeolojîk zêdetir dihatin xwendin û zêdetir helbestên helbestvanên bi pergala Sovyetê mezin bûne di radyoyê da dihat dayîn” (Ağcakulu, 2012: 73). Di radyoyê da helbestên helbestvanên wek Fêrikê Êsiv, Cegerxwîn, Şikoyê Hesên û yên din hatine xwendin û pêşkêşî guhdaran bûne.

3.2.5. Bernameyên Klamên

Di nav bernameyên radyoya Rewanê da bêguman ya herî bi bandor û navdar bernameyên klaman in. Piştî damezrandina para axaftina Kurdî di radyoyê da, gavên ewilîn dayîna klamên Kurdî bû. Berpirsyarê pêşîn Casimê Celîl demildest li ser klamên Kurdî da xwar dibe û jî gundên dev û dor dengbêjan kom dike. “Casimê

Celîl, pêşîyê wek berpirsyarê radyoya Kurdî(1955-1958) û paşê wek serokê beşa muzîkayê (1958-1963), barê amadekirina muzîkaran û dengnivîsandina stran û awazan girtibû ser milê xwe” (Inanc, 2017: 27) Casimê Celîl ne tenê dengbêjên dev û dor kom dikir, herwiha keç û xortên Kurd ên dengê wan xweş jî vedixwand radoyoyê û bi wan stran dida gotin û ew stran di radyoyê de diweşandin. Herwiha sazbandên wek Egîtê Cimo, Taharê Emer jî piştî avabûna radyoyê diçûn bilûr û fiqên xwe bi miqamên Kurdî lê dixistin. Dengê klamên Rewanê ne tenê li Ermenistanê, li çar perçeyên Kurd lê dijîyan belav bibû. Bi saya klamên Kurd û Kurdewarîyê vejîneke xwebûnê di nav Kurdan da çêbû û Kurd careke din bi miqamên xwe hisîyan. Di serborîya beşa muzîkayê ya radyoya Rewanê da serkeşî zêdetirî malbata Celîlan kirîye. Serê pêşî Casimê Celîl ji avabûna radyoyê dest bi xebatên muzîka Kurdî kir. Weke ku Inanc (2017: 120-124) derdibire, Casimê Celîl di radyoya Rewanê da neh salan kar kir û di nava van neh salan da li pey xwe 700 stran û awazên Kurdî hîşt. Casimê Celîl bi xebatên xwe va bingeha muzîka Kurdî di radyoyê da avêt û fonda zêrîn ava kir. Piştî sala 1963an Dewrêşê Efo û Nûra Cewarî her yekî 2 salan di radyoyê da serkeşî û rêdaktorîya beşa muzîka Kurdî kirin. Piştî van herdu xebatkaran Cemîla Celîl di sala 1967an hate ser beşa muzîka Kurdî û hetanî sala 2003an xebatên xwe li ser muzîka Kurdî berdewam kir. Hetanî niha di dengxaneyê Kurdî da li dora 2000 stran û awazên Kurdî hene û ev stran di dengxaneyê da tên parastin. Herwiha “li studyoya radyoyê dengê zêdeyî 170 dengbêjan û mûzîkaran tomarkirî ne. Hemû jî stranvanên neprofêsyonal bûne, bê tecrûba stûdyoyê. Ewana bona ku dengê xwe radyoya Kurdî bispêrin, ji gund û zozanan dihatine Yêrêvanê” (Inanc, 2017: 79).

Helbet di xebatên bernamêyên muzîka Kurdî da ked û para berpirsyarên radyoyê Xelîlê Çaçan, Ehmedê Gogê, Keremê Seyad nayê pîvanê. Van kesan gelek ked ji bo para radyoyê dîtine wekî dengê wan hildane, tomar kirine û dane weşandin. Di radyoyê da gelek dengbêjên bi nav û deng strane û gelek sazbandên navdar bi miqamên Kurdî hunera xwe pêşkêşkirine. Yekem klama ku di radyoyê da hatîye weşandin “Bêrîvan” a Efoyê Esed bûye. Pişt ra dengbêjên Kurd ên wek Şeroyê Biro, Ahmedê Mirazî, Zadîna Şekir, Sûsika Simo, Fama Îsa, Egîtê Têcir, Belga Qado, Bêmalê Keko, Reşîte Baso, Aramê Zeker, Asa Evdal, Cemalê Êsiv, Cemalê Paşê, Casimê Şemo, Becoyê Hesên, Batalîkê Şîrîn, Bagîyê Memê, Dîlbera Wekîl, Cemîlê Cefo, Çoloyê Silo, Elîyê Hemed, Eslanê Memed, Hakobê Esmer, Sihîdê Silo, Gulîzera Çerkez, Feyzoyê Rizo, Hesênê Qaso, Hesênê Gogo, Kezîzera Xalo, Keremê

Erefat, Reşîdê Baso, Mehmedê Mûsa, Mecîtê Silêmin, Îskoyê Lezgî, Aslîka Qadir, Memoyê Silo, Xemoyê Hesên, Kubara Xudo, Seyadê Şemedîn, Şiblîyê Çaçanî, Sîsa Mecît, Mehmed Arîf Cizrawî, Hesên Cizrawî, Eyşe Şan û yê din, jî dengbêjên Ermenî ên wek Abrahamê Karapêt, Karapêtê Xaço, Aramê Tîgran, Davîdê Xilo, Îsraêl Ohanyan, Hovannês Badalyan û yê din klamên xwe strane û dengên xwe gihandine hemû dinyayê. Herwisa sazbandên wek Egîdê Cîmo jî bi amûrên xwe tevî xebatên muzîka Kurdî bûne.

3.2.6. Bernameyên Radyoşanoyê

Di nav weşanên radyoya Rewanê da bernameyeke sereke jî radyoşano bixwe ne. Berî ku para Kurdî di radyoya Rewanê da vebe, gelek şano hatine nivîsar û neşr kirin. Herwiha gelek şanoyê hatine nivîsar jî li Tîyatroya Elegezê da hatine pêşkêşkirin. Lê piştî ku li Elegezê derê şanogehê hate dadan êdî şanoyên hatine nivîsar li ser radyoyê hate lîstin û pêşkêşî guhdaran bû. Xebatkarên radyoyê gelek şanoyê nivîsar, çîrok û destanên Kurdî li gor weşana radyoyê adapte kirine û li ser radyoyê dane lîstin. Serê ewilîn bi tevî Casimê Celîl, Ordîxanê Celîl dengkirina radyoşanoyê dike û bi dumahîya demê ra lîstik û lîstikvan li ser hev zêde dibin. Em ê di beşa sêyem da bi hurgulî behsa xebatên bernameya radyoşanoya Rewanê bikin û li ser du mînakên radyoşanoyên ku di radyoya Rewanê da hatine weşandin bisekinin.

BEŞA SÊYEM

1. Bernameyên Radyoşanoyê di Radyoya Rewanê da

Kurdên Kafkasyayê piştî salên 1930yî di qada şanoyê da jî xebatên xwe pêştir xistibûn û li Elegezê piştî çend salan şanogeh vekiribûn. Herwiha piştî salên 1970yî li Tîblîsê jî şanogeh vebibû û listikên bi gelek zimanan hatibûn listin. Lê di warê radyoşanoyê da gavên ewilîn bi avabûna Radyoya Rewanê ra hatin avêtin. Radyoşanoya ku di cîhanê da hîmê wê di sala 1924an hatibû avêtin piştî sala 1955an ket nav bernameyên Radyoya Rewanê jî. Piştî ku şanoya Elegezê tê dadan listikên şanoyê bi awayekî sistematîk di radyoyê da berdewam dibe û wisa pêşkêşî guhdaran dibe. Piştî ku Radyoyê da para Kurdî vedibe û Casimê Celîl dibe serokê para Kurdî xebatên çandî dest pê dibin û radyo bi awayekî amator dest bi weşanên xwe dike. Serî da bi tevî Casimê Celîl, Ordîxanê Celîl jî di radyoyê da kar dike û xwendinên radyoyê zêdetir Ordîxanê Celîl dike. Tevî pêşkêşkirina bernameyên hazir (nûçe, klam û yên din) Ordîxanê Celîl di radyoyê da yekem kes e ku bi dengê wî bernameyeke dramtîk tê pêşkêşkirin. Li ser vê mijarê Ordîxanê Celîl bixwe wiha behs dike;

Me bi alîkariya opêratorê me Haykaz Davîtyan poêma Pûşkîne “Hikyat derheqa mesîgir û mesîya zêrîn” hazir kir û bi Kurdî da ber pêlê radyoyê. Tekst min bi xwe dixwand, pê ra jî mûzîkeke klasîk jî hebû. Bi dîtina min, wê rojê me hîmê radyokompozîsiya Kurdî danî. Navê wan radyokompozîsiya yên pêşîn, ku bi dengê min hatine nivîsandin ev in: “M”asîyê zêrîn” ya A.S.Pûşkîn, “Saz û Fîqe” ya Dêrênîk Dêmîrçyan, “Memê û Eysê” ya Sîras, “Lûr de Lûr” ya Virtanês Papazyan, her pênc jî bi tercima Casimê Celîl (Inanc, 2017: 69).

Bi wî awayî bingeha bernameya radyoşanoyê di Radyoyê Rewanê da bi dengê Ordîxanê Celîl tê avêtin. Bernameyên radyoşanoyê yên ku serî ewilîn hatin kirin hemû ji aliyê Casimê Celîl hatibûn wergerandin û wisa jî ji aliyê Ordîxanê Celîl hatibûn pêşkêşkirin. Lê di radyoyê da yekem şanoya Kurdî di salan 1957an da hatiye weşandin. Sala **1957**an Pîyesa bi navê *Gulîzer* ya Emînê Evdal a radyofonîk di Radyoya Rewanê de tê weşandin. Piştî wê gelek radyoşano di Radyoya Rewanê da tê weşandin ku gelemperî ev radyoşano jî şanoyên tîyatroya Elegezê sîd wergirtibûn. “Listikên ku gelemperî ji zimanên din hatibûn wergerandin û hatibûn veçêkirin di navbera salên 1937-1947an da li Tîyatroya Elegezê hatibûn pêşkêşkirin. Gelek ji wan şanoyên ku li Elegezê hatibûn pêşkêşkirin di navbera salên 1956-1975an da li Radyoya Rewanê da wek radyoşano hatine weşandin” (Zêdo, 2017). Xebatkarên

Radyoya Rewanê bi tevî radyoşanoyan di qada muzîka Kurdî da li ser destanên Kurdî jî disekinîn û ji nû va dikirin klam û diweşandin. “Destanên gelêrî yên wek *Mem û Zîn*, *Sîyabend û Xecê*, *Ker û Kulik*, *Zembîlfroş*, *Memê û Eyşê*, *Sêva Haco*, *Dimdim* û gelekên din bi stiran û çîrok hatin nivîsar. Ji wan gelek, veçêkirna nivîskaran bûne radiokompozîsiya, şano û hatine parastin. (Boyîk, 2012: 79). Xebatkarên radyoyê û nivîskarên Kurd destanên Kurdî li gor şertên radyoyê dinivîsandin û bideng dikirin. Helbet ne tenê li ser destanên Kurdî, destan û çîrokên rûs û Ermenîyan jî ji bo Kurdî dihate wergerandin, li gor şertên radyoyê dihate nivîsandin û wisa dihatin weşandin. Li ser amadekirina radyoşanoyan, pêşkêşkirina wan û lîstikvanê wan Têmûrê Xelîl wiha dibêje:

Dewlemendîyeke radyoya Rewanê herwiha piês-şanoyên wê ne jî. Yên wek “Elenewêrek”, “Xecê û Sîyabend”, “Memê û Zînê”, “Bêqelen”, “Hisret”, “Meriv gerekê pêşekê bizanibe”, “Gîkor”, “Memê û Eyşê”, “Zembîlfroş” û yên din. Bidine ber çavan, ku ew piês piştî kar dihatine amadekirinê. Qîmetê wan piêsan herwiha ew e jî, ku serokê radyoya Ermenîstanê M. Ayvazyan rojekê ha got: “Piêsa nivîskarê Ermenîyan Hraçya Koçar ya bi navê “Hizret” Ermenîyan jî çê kirîye, Kurdan jî. Lê ya Kurdan ji ya Ermenîyan baştir derketîye, ew jî wê demê gava hemû artistên Ermenîyan profesyonel in, lê yên Kurdan ne profesyonel in. Ev hemû kar bi saya serê serokê radyoyê Xelîlê Çaçan Mûradov, cîgirê wî Qaçaxê Mirad, serwêrên parê Fêrikê Ûsiv, Şikoyê Hesên, Mirazê Evdo, Mikayêlê Reşîd, Sîma Semend, Emerîkê Serdar, Keremê Seyad, Eznîva Reşîd, Sêvaza Evdo, Barîyê Mehmûd, Hamoyê Rizgo, Wezîrê Eşo û yên mayîn pêk hatîye. Bextê min lê xist min jî ji sala 1981ê heta sala 1984an di wê radyoyê da wek yek ji berpirsyaran kar kir (Xelîl, 2017).

Di radyoya Rewanê da ji bo radyoşanoyê êwra zêrîn di wextê berpirsariya Xelîlê Çaçan da pêk tê. Piştî ku Casimê Celîl di para muzîka Kurdî da kar dike û Xelîlê Çaçan dibe berbirsîyar, radyo ji gelek alîyan va pêştir dikeve. Him ji aliyê muzîka Kurdî va û him jî ji aliyê bernameyên radyoşanoyan va gelek gav tînin avêtin. Bi taybetî “Xelîl Mûradov hereketekî mezin xerc kir seba bi hezara nimûnên hunermendîya Kurdan ya sitiranbêjîyê ji windabûnê xilaske û qeyd bike. Bi saya Xelîlê Çaçan Mûradov bi sedan nimûneyên sitiran û miqamên Kurdî fonda radiyoyê dewlemend kirin û îro radioguhdar bi wana şa dibin. Xênjî sitiran û miqaman, hêna wî da gele radyokompozîsyon (şano, piês) hatin hazîrkirinê ser hîmê radiopîêsên nimûneyên zargotina Kurdî, nivîskarên Kurd û Ermenî” (Boyîk, 2012: 76). Xelîlê Çaçan bixwe jî nivîskarê sê radyoşanoyan e ku navê wan “*Memê û Eyşê*”, “*Elenewêrek*” û “*Merî Gerekê Pêşekê Bizanibe*” ye. Di dema Xelîlê Çaçan da 40

radioşano tên hazirkirin û pêşkêşkirin. Çi destanên Kurdî be û çî jî destanên miletên din, ji alîyê nivîskar û xebatkarên radyoyê ji nû va dihatin nivîsandin û di radyoyê da dihatin pêşkêşkirin. Herwiha ji bilî destanên Kurdî şanoyên nivîskaran jî li gor radyoyê dihat adaptekirin û ji alîyê lîstikvanên amator va dihatin lîstin. Carna jî nivîskarên şanoyan bixwe di şanoyên xwe da dilîstin û diketin dilqên karakterên şanoyan. Wek mînak Fêrikê Êsiv di şanoya xwe ya bi navê *Bêqelen* da di dilqê karakterê sereke da lîstîye ku em ê bi hurgulî li ser vê mijarê bisekinin. Herwiha helbestvanê Kurdê Sovyetê Şikoyê Hesen jî di veçêkirina radyoşanoyan da cî girtîye û çîrokên Kurdî adapteyê radyoyê kirîye. Wek mînak Şikoyê Hesen çîroka Kurdî ya bi navê *Şengilo, Mengilo û Xaliçengilo* ji nû va veçêkirîye û bi saya veçêkirina wî ev çîrok di radyoyê da wek radyoşano hatîye pêşkêşkirin. Ji bilî van kesan Wezîrê Eşo jî gelek di radyoyê da kar kirîye û di radyoşanoyan da lîstîye. “Emekê Wezîrê Eşo pire di çêkirina radyokompozîsiya da. Dengê wîyî qalim ji nava hezar dengî da di hate naskirin û hiskirin” (Boyîk, 2012: 76). Wisa jî ji çîrokên Wezîrê Eşo radyoşano dihatin çêkirin û dihatin lîstin. Wek mînak çîroka *Tigran û Mehmûd* ya ku di pirtûka wî ye bi navê Mizgînî da ye ji bo şanoyê ji nû va hatîye hazir kirin û di radyoyê da bi sernavê *Destebirak* hatîye pêşkêşkirin.

Di çêkirina radyoşanoyan da ji bilî nivîskaran, keda gelek dengbêj, sazband û pêşkeşvanan jî heye. Wek mînak Aslîka Qadir di radyoşanoya bi navê *Kumsor* da di dilqê kumsorê da lîstîye. Herwiha Klamên dengbêjên wek Dawidê Xilo, Elîyê Hemed, Siloyê Evdal, Karapetê Xaço û yên din di muzîka radyoşanoyan da, Dengê bilûr û meya Egîdê cimo, Cerdoyê Genco, Taharê Emer, Xacoyê Xelî, û yên din di fonên radyoşanoyan da hatîye bikaranîn. Herwiha ji bo fona radyoşanoyan gelek muzîkên klasîk, muzîkên Ermenî û rûsan jî hatine bikaranîn. Keda pêşkêşvanên radyoyê jî di çêkirina radyoşanoyan da gelek e ku bi taybetî pêşkêşvanê Radyoya Rewanê Keremê Seyad di gelek şanoyan da him pêşkêşvanî kirîye û him jî ketîye gelek dilqên karakterên radyoşanoyan. Li gor radyoşanoyên li ber dest, Keremê Seyad di radyoşanoyên *Bêqelen, Serdar û Karê, Destebirak, Zembilfroş û Gulxatûn, Şengilo, Mengilo, Xaliçengilo û Leyl û Mecnûnê* da lîstîye û pêşkêşvanî kirîye.

Ji destpêka weşana xwe û heya roja îrojîn Radyoya Rewanê da gelek radyoşano hatine weşandin û pêşkêşkirin. Mixabin em nehihîştin hemû navên radyoşanoyên ku heta niha hatine weşandin. Weke çavkanîyên li ber dest

(Boyîk,2012, Xelîl,2017, Zêdo, 2017, Inanc, 2017, Ağcakulu, 2012). û weke radyoşanoyên ku li medyaya civakî hatine weşandin em dikarin navên radyoşanoyên hatine weşandin wisa bidin:

1. *Masîyê zêrîn*, nivîskarê wê A.S.Pûşkîn e. Dengkirin Ordîxanê Celîl, werger ji bo Kurdî Casimê Celîl dike.
2. *Saz û Fîqe*, nivîskarê wê Dêrênîk Dêmîrçyan e. Dengkirin Ordîxanê Celîl, werger ji bo Kurdî Casimê Celîl dike.
3. *Memê û Eyşê*, nivîskarê wê Sîras e. Dengkirin Ordîxanê Celîl, werger ji bo Kurdî Casimê Celîl dike.
4. *Lûr de Lûr*, nivîskarê wê Virtanês Papazyan e. Dengkirin Ordîxanê Celîl, werger ji bo Kurdî Casimê Celîl dike.
5. *Gulîzer*, nivîskarê wê Emînê Evdal e. (yekem car sala 1957ê tê weşandin.)
6. *Elenewêrek*, Nivîskarê wê Xelîlê Çaçan e.
7. *Gîkor*, Nivîskarê wê Hovhannes Tumanyan e.
8. *Hisret*, nivîskarê wê Hraçya Koçar e.
9. *Bêqelend*, nivîskarê wê Fêrîkê Ûsiv e. (yekem car 1974an tê weşandin.)
10. *Merî Gerekê Pêşekê Bizanibe*, nivîskarê wê Xelîlê Çaçan e.
11. *Xecê û Sîyabend*, nivîskarê wê Semend Sîabendov e.
12. *Sisê*, nivîskarê wê Mîroyê Esed e.
13. *Remo, Şemo û Temo*, nivîskarê wê Wezîrê Eşo ye.
14. *Şengilo, Mengilo, Qalîçenglo*, Şikoyê Hesên ji nû va veçêkirîye.
15. *Kumsor*, çîroka Rûsan a bi nav û deng e.
16. *Memê û Eyşê*, nivîskarê wê Xelîlê Çaçan e.
17. *Destebirak*, nivîskarê wê Wezîrê Eşo ye.
18. *Memê û Zînê*, gelêrî.
19. *Zembîlfiroş*, gelêrî.
20. *Ker û Kulik*, gelêrî.
21. *Sêva Haco*, gelêrî.
22. *Dimdim*, gelêrî.
23. *Serdar û Karê*, gelêrî.
24. *Leyl û Mecnûn*, gelêrî.

Di nav van radyoşanoyan da heta niha *Destebirak, Bêqelen, Serdar û Karê, Şengilo, Mengilo û Xalîçengilo, Leyl û Mecnûn û Zembilfroş* li ser medyaya civakî hatîye weşandin. Yê mayîn û yê hê jî nehatine tesbîtkirin, an jî ber bêderfetîyan an jî ji ber pîrsgirêkên radyoyê jî nû va nehatine parvekirin. Em ê bi kurtî behsa radyoşanoyên *Serdar û Karê, Şengilo, Pengilo û Xalîçengilo, Leyl û Mecnûn û Zembilfroş* bikin û pişt ra jî bi hurgulî li ser radyoşanoyên *Destebirak, Bêqelen* rawestin û tesbîtên xwe bikin.

1.1. Şengilo, Mengilo û Xalîçengilo

Radyoya Rewanê ji bo radyoşanoyan jî çîrok û destanên Kurdî sûd wergirtîye ku ji wan yek jî çîroka Kurdî *Şengilo, Mengilo û Xalîçengilo* ye. Ev çîroka Kurdî ji demên berê heya niha di nav Kurdistan da tê gotin û bi nav û deng e. Radyoya Rewanê jî ji vê çîroka Kurdî ya fabl sûd wergirtîye û di radyoyê da daye weşandin. Helbestvanê Kurd yê Sovyetê Şikoyê Hesên ev çîroka gelêrî jî nû va veçêkirîye. Piştî veçêkirina Şikoyê Hesên jî ev çîrok pêşkêşî guhdarên Radyoya Rewanê bûye.

Mijara lîstikê: Çîroka *Şengilo, Mengilo û Xalîçengilo* di radyoyê da ji koka xwe negatîye dîrxistin. Tenê diyalog û vegotinên çîrokê veçêker nivîsîye. Di vê radyoşanoyê da mijar li ser bizinê, sê karên wê û li ser gurekî ye. Li gor ku radyoyê da hatîye weşandin; bizinê jî kerîyên pêz vediqete û tena serê xwe diçe zozanekî û dixwaze li wir bijî. Dema bizin li gor dilê xwe cihekî dimîne li gor dilê xwe binê zinarekî dikole û diwarekî datîne. Piştî ku bizin mal û halê xwe temam dike, demek şûnda dizê û sê karên piçûk çêdibin. Navê yekî dike *Şengilo* navê yekî dike *Mengilo* û navê yekî jî dike *Xalîçengilo*. Bizin gelek ji karên xwe hez dike û ji bo wan dan bike herroj diçe mîrgan diçêre. Lê bizin karên xwe şîret dike wekî ji bilî hin gotinên wê divê kar derî ji kesî ra venekin. Roj tî û derbaz dibin. Rojekî gurekî gelek birçî mala bizinê dibîne û bi dizî tê mala bizinê raçav dike û karên piçûk dibîne. Gur biryarê dide ku gotinên bizinê jiber bike û piştî ku bizin çû çêrînê ew jî dengê bizinê derxe, karan bixapîne û bixwe. Gur dema bizin tê mal gotinên wê jiber dike û piştî ku bizin ji mal derdikeve ew jî diçe li ber derî û gazî karan dike wekî derî vekin. Lê kar ji stûrîya deng û zûhatina bizinê şik digirin û derî venakin. Gur piştî ku dibîne kar naxapin ji mal dîr dikeve û piştî wextekî dîsa tê gazî dike. Vê carê gur dengê bizinê baş derdixe û karan dixapîne. Dema kar derî vedikin gur ser sê karan jî dixwe û diçe. Dema bizin tê mal ecêba reş dibîne. Digirî û dikewgire. Bizin li çol û

mexela dikeve wekî karên xwe bibîne. Bizin rê da teyr, legleg, gakovî û hirç dibîne û pîrsa ser sê karên xwe ji wan dike. Lê kesekî karên wan nedîtîye. Bizin demek şûn da gur dibîne. Dema gur jî bizinê dibîne xwe ditelîne û ji wir hêdî hêdî dûr dikeve. Bizin fêr dike ku gur karên wê xwarîye û lêze lez xwe gur ra dighîne û dewa şer ji gur dike. Berîya şer bizin diçe li cem hosta û qoçên xwe tûj dike. Gur jî diçe li cem rovîyekî kal û diranên xwe tûj bike. Lê rovî diranê gur hê diçe ko dike. Bizin û gur li meydana dest bi şerê xwe dikin. Bizin çend qoçan li serê gur dixê û dîkê. Bizin zikê gur diqelêşe û her sê karê xwe ji zikê gur bi saxî derdixe.

Karakterên Lîstikê: Di lîstikê da hemû karakter ajal in. Di vê lîstika fabl da karakterên sereke bizin, Şengilo, Mengilo, Xalîçengilo û gur e. Karakterên alîkar jî teyr, legleg, gakovî, hirç, rovî ye.

Kadroya Lîstikvanan: Di vê lîstikê da heşt dengên cuda hene. Her karakterek xwedî dengê ye. Vebêjerê lîstikê Keremê Seyad e. Wezîrê Eşo di vê lîstikê da dilqê gur da ye. Di lîstikê da mêran dilqê gur, teyr, gakovî û hirçê, jinan dilqên bizin, rovî û leglegê û zarokan jî dilqên Şengilo, Mengilo û Xalîçengilo deng kirine.

Dîyalogên Lîstikê: Veçêkerê vê lîstikê Şikoyê Hesên hemû dîyalog bi terza helbestê amade kirîye. Vebêjerê lîstikê bi terza helbestê çîrok vedibêje û karakterên lîstikê jî dîyalogên xwe bi terza helbestê dikin.

Wek mînak lîstik bi van gotinên vebêjer dest pê dikin;

“Bihar me hat, gulan anî

Deşt û zozan tev gul dan

Mêrg û çîman, çîya û banî

Gul û sosinan xemil dan”

“Bû xulîna avêd kanîya

Helyan berfêd belekîya

Li bedena esmanê kûr

Keskesora awazî

Ji tîrênca royêye nûr

Bûye qîzeke kezî”

Em dikarin mînakê jî ji dîyalogên lîstikê wiha bidin:

Xalîçengilo:

“Dayêcan dayê mal derney

Bê te ditirsim ji xof û qezyayê

Cîkî da neçe inka mine ezîz

Me tenê nehêlî vê çîyayê bê îz”

Bizin:

“Min we ra negot ku hûn bitirsin

Şîret dikim wekî guhdar bin

Bona her tiştî wekî hilyar bin

Ji maka xwe pêştir derî venekin”

Muzîkên Lîstikê: Di lîstikê da ji alîyê Kurdewarîyê va klam û miqamên Kurdî nehatîye bikaranîn. Di lîstikê da muzîkên Rûsan ên klasîk hatine bikaranîn. Ev muzîkên klasîk di destpêkê da, di xebardanên gur da, di êşa dilê bizinê da û di şabûnên dawîya lîstikê da diguherin. Di lîstikê da gelemperî muzîka *Children's Suite: VII. Battle* di fona piştê da lê dide. Ev muzîka klasîk ji alîyê orkestraya bi navê *Leningrad Philharmonic Orchestra* ku Yevgeny Mravînsky birêva dibir tê lêxistin. Di lîstikê da efekt nehatine bikaranîn.

Wextê Lîstikê: Lîstika Şengilo, Mengilo û Xalîçengilo ji serî heya dawîyê û tevî hevdu nîv seate.

1.2. Zembîlfroş

Di ber pêlên Radyoya Rewanê da gelek destanên Kurdî wek şano hatîye lîstin ku yek ji wan jî destana Zembîlfroş e. Ev destan di eslê xwe da xwedî dîrokeke kevnar e û di nava folklorê Kurda da ji alîyê gelek kesan hatîye nivîsîn. Ev destan “bi qasî ku tê zanîn pêşî Feqîyê Teyran, piştî wî Melayê Bateyî û Miradxanê Bazîdî nivîsandine”

(Adak, 2015: 240). Ji ber ku Xebatkârên Radyoya Rewanê jî li ser destanên Kurdî rawestîyane, ji nû va destanên Kurdî li gor radyoyê veçêkirine û dane li ber pêlên radyoyê. Veçêkerê vê radyoşanoyê ne dîyar e. Herwiha Zembîlfroşa ku di radyoyê da hatîye weşandin ji alîyê mijarê va ne dûrî destana bingehîn e. Hêjayê gotinêye ku dema Radyoya Rewanê weşanên xwe dikirin propagandaya sosyalîzmê jî dikirin. Pergala Sovyeta Yekgirtî li hember axa û mîran bû û nedigîşt ku gundan da ev pergala axayan bimeşe. Di dawîya destana Zembîlfroş da jî em rastî wê yekê tên ku nebaşbûna pergala axatîyê bi awayekî sublîmînal tê dayîn. Di dawîya lîstikê da pêşkêşvanê lîstikê wiha dibêje:

“ Zembîlfroş bi kulfetên xwe va çûn cîkî isa wekî dengê axa û mîra lê neyê ”

Mijara Lîstikê: Zembîlfroş feqîreke û ji bo debara malbata xwe bike selika difroşe. Rojekî Zembîlfroş li ber qesra mîr ra derbaz dibe. Jina mîr Zembîlfroşê bedew di pacê ra dibîne. Gulxatûn du carîyên xwe dişîne li pey Zembîlfroş da ku wî bînin qesra mîr. Zembîlfroş dema dikeve hundirê mala mîr carîyeyên Gulxatûnê piştê va derî dadidin. Gulxatûn dixwaze Zembîlfroş were nava doşega mîr û pê ra şa bibe. Zembîlfroş gelek dîndar e û ji malbata xwe ra heqtemam e. Ji ber vê yekê jî daxwaza gulxatûn nayîne cî û piştî demekê xwe ji birca qesra mîr ra davêje. Zembîlfroş bi vî teherî ji destê Gulxatûnê derdikeve û diçe mala xwe. Jina Zembîlfroş piştî ku bûyera mêrê xwe hîn dibe di halê xwe û zarokên xwe yê birçî da gelekî dikewgire. Jina Zembîlfroş ji bo zarokan bixapîne kevîran di avê da dikelîne û heta zarok dikevine xewê wan bi kelîna kevîran dixapîne. Berbanga sibê Gulxatûn pê dihibe ku Zembîlfroş revîyaye. Bi demildest diçe mala Zembîlfroş û di kuleka malê da Zembîlfroş û jina wîye razayî dibîne. Gulxatûn xwe ji kulekê ra davêje erdê. Jina Zembîlfroş ji deng hişyar dibe û Gulxatûnê dibîne. Gulxatûn kinc û zêrên xwe tev dide jina Zembîlfroş û ji wê daxwazê dike wekî saetekî tevî Zembîlfroş razê. Jina Zembîlfroş vê daxwazê qebûl dike. Gîlxatûn jî kincên jina Zembîlfroş li xwe dike û dikeve nava nivînên Zembîlfroş. Di wê navberê da mîr jî ji bajarekî din vedigere û dibîne ku Gulxatûn ne li qesrê ye. Demekê şûnda Gulxatûn ji mala Zembîlfroş vedigere qesrê li cem mîr. Herçiqas Gulxatûn dixwaze mîr bixapîne jî carîyên qesrê hemû tişt ji mîr ra dibêjin. Mîr sê meriv dişînin li pey Zembîlfroş û ew meriv diçin Zembîlfroş hildidin û tînin li qesrê. Mîr Zembîlfroş û Gulxatûnê tana derpê û kirsî dike û dest û pê girêdayî davêje zindanê. Du seet şûnda mîr bi xulamên xwe va tên

zindanê. Mîr bi kêrê Zembîlfroş birîndar dike lê Wê kêlîyê Gulxatûn bi dizî kêr ji destê mîr digire û zikê mîr diqelişîne. Gulxatûn pişt ra Zembîlfroş xilas dike û birênên wî pak dike. Êdî ew dikevin nava hebûna mîr û Zembîlfroş bi tevî kulfetên xwe va diçin cihekî dûr wekî dengê mîr û axayan li wan tesele nebe.

Karakterên Lîstikê: Di radyoşanoya Zembîlfroş da Zembîlfroş û Gulxatûn karakterên sereke ne. Mîr, carîyeyên qesrê û jina Zembîlfroş jî karakterên alîkar in.

Kadroya Lîstikvanan: Di lîstika Zembîlfroş da tenê du deng hene. Pêşkêşvanê Lîstikê Zadîna Şakir e. Karakterên Zembîlfroş, Mîr, carîyeyên qesrê, Gulxatûn û jina Zembîlfroş jî Keremê Seyad bideng dike. Herwiha Keremê Seyad hin cîhan da pêşkêşvanîyê jî dike.

Dîyalogên Lîstikê: Di lîstika Zembîlfroş da dîyalog tenê ji alîyê Keremê Seyad tên kirin. Ji ber vê yekê jî dîyalog kin û qels in. Lê zaravakirinên Keremê Seyad xurt in û reksîyonên dengê wî li gor axaftinên karakteran diguhere.

Muzîkên Lîstikê: Di vê radyoşanoyê da lîstik bi gelemberî bi klaman va hatîye palpiştîkirin. Klama Karapêtê Xaço ya bi navê *Zembîlfroş* ji destpêka lîstikê heya dawîya wê du cara tê dayîn. Ji bilî klama Karapêtê Xaço, ji bo fona pişt lîstikê dengê meya Egîdê Cimo hatîye bikaranîn. Di destpêkê da fona Egîdê Cimo ya bi navê *Metê Dêranê* hatîye bikaranîn. Pişt ra jî dîsa ji Egîdê Cimo *Zerê Qurban*, *Filîte Quto û Gulê Dêran*, ji Miqamê Cimaeta Kurda ya bi navê *Serew û Hewaya Zirne*, ji bilûra Lezgîyê Ferî ya bi navê *Miqama Kurdî*, Ji dengê meya Xelîlê Evdile ya bi navê *Nazlîyê* hatine bikaranîn. Bi tevî hevdu neh fonên cuda di lîstika Zembîlfroş da hatine bikaranîn. Di lîstika Zembîlfroş da efekt nehatine bikaranîn.

Wextê Lîstikê: Lîstika Zembîlfroş tevî hev bîst û sê deqe ye.

1.3. Serdar û Karê

Di radyoya Rewanê da lîstikeke din jî çîroka Serdar û Karê ye. Ev çîroka gelêrî weke ku pêşkêşvan di serê lîstikê da behs dike; li gundê wan qewimîye û hemû neferên gundê wî vê serhatîya Serdar û Karê dizanin. Pişt ra pêşkêşvan hinekî şayesandinê li ser gundê xwe dike û behsa dara Serdar û Karê dike. Piştê hingê jî lîstik tê dest pê kirin. Ev çîrok ji alîyê xebatkarên radyoyê ji nû va hatîye veçêkirin û wisa hatîye lîstin. Navê veçêkerên vê lîstikê ne diyar e. Herwiha qeyda vê

radioşanoyê ne temam e. Piştî deqeya bîst û dudyan, ku ber bi kutabûna lîstikê, qeyd qut bûye.

Mijara Lîstikê: Serdar û Nazê du xwîşk û bira ne. Dema Serdar hê jî piçûk bûye bav û dêya wî ji nexwaşîya xolorê dimirin. Pîr Qasoyê apê wan herdu zarê êtîm hildide li cem xwe û xwayî dike. Dema Serdar hinekî digihîje û dest bi berxbantîyê dike. Rojekê ji gundê cînar hin kes tên û Nazêya donzdeh salî dixwazin. Pîr Qaso jî Nazê dide û Nazê hildidin dibin gundê cînar. Serdar jî her dem serî li xwîşka xwe dide û diçe cem wê. Sal derbaz dibin û Serdar dibe bîst salî. Serdar dilê xwe berdide qîza cînarê xwe ya bi navê Karê. Karê jî ji Serdar hez dike û dilê xwe berdide wî. Serdar û Karê êdî bi dizî hevdu dibînin û dikevin xeyalên zewacê. Lê rojekê ji gundê cînar çend kes tên mala bavê Karê û Karê dixwazin. Bavê Karê, Qerê qîza xwe dide kurê Cindî yê bi navê Xalit. Xalit mêrekî mezin e, xweyê heft zara ne û jina wî çûye rehmetê. Karê naxwaze mêr bike û li hember bav û dêya xwe derdikeve. Lê bavê Karê gelek zilm li ser qîza xwe dike û lê dide. Dema haya Serdar ji vê meseleyê çê dibe dîn û har dibe. Berîya ku tiştê bike diçe li cem xwîşka xwe û bi wê dişêwire. Nazê naxwaze wekî Serdar şaşîkî bike. Dema çend roj dibîne ji siwarkirina Karê ra dêya Karê ji qîza xwe daxwazê dike wekî ew here mala pîr Qaso û dermanê serêşê bîne. Karê gelek şadibe wekî dixwaze Serdar bibîne û ji vê meselê ra çareyekê bibîne. Dema Karê diçe mala Pîr Qaso Serdar dibîne û herdu biryara revê didin. Serdar ji nav gund derdikeve û li cihekî hêvîya Karê dimîne. Karê jî pişt ra diçe cem Serdar. Lê merivekî dîlnexwaz ku jê ra digotin Hûtê Bayîs, wan herduyan dibîne û rasterast diçe mala bavê Karê. Bavê Karê haya mala apê Serdar jî pê dixê û hemû kes bi hespa li pey Serdar û Karê dikevin. Dema Serdar dûrva siwara dibîne dest bi axaftinan dike.

Di vir da qeyda lîstikê qut e. Dîyar nîne wekî dawîya dawî çî diqewime di lîstikê da. Lê weke ku pêşkêşvan di serê lîstikê da dide dîyarkirin, di gund da darek ji bo serdar û karê heye û kanîyek li ber serê darê ye. Tenê em dikarin ji van agahîyan tê derbixin ku Serdar û Karê negihîştine mirazên xwe.

Karakterên Lîstikê: Di lîstika Serdar û karê da gelek karakter hene. Karakterên Sereke Serdar û Karê ne. Karakterên bi navê Nazê, Pîr Qaso (apê Serdar), Qero (bavê Nazê), Cindî, jina Qero (nav nayê dîyarkirin), Xalit(kurê Cindî ye, lê di lîstikê da xeber nade, tenê navê wî derbaz dibe) û Hûtê Bayîs jî karakterên alîkar in.

Kadroya Lîstikê: Di lîstika Serdar û Karê da gelek deng hene. Gelek dengê karakterên alîkar jî hene ku navê wan di lîstikê da derbaz nabe. Pêşkêşvanî jî bo lîstikê Keremê Seyad dike. Wezîrê Eşo di dilqê Qero da dileyîze. Porsora Serdar jî him di dilqê Karê da û hin jî di dilqê dîya Karê da dileyîze. Ji bilî van kesan lîstikvanên ku di dilqê Serdar, Nazê, Cindî, Pîr Qaso û Hûtê Bayîs da dileyîzin nehatine tesbît kirin. Bi taybetî di lîstika Serdar û Karê da pîrsgirêkeke dengkirina karakteran derdikeve pêş. Wisa ku Porsora Serdar hin di dilqê Karê da û hin jî di dilqê dîya Karê da dileyîze. Ev yek jî ji bo guhdaran tevlihevîyê derdixe holê.

Dîyalogên Lîstikê: Di radyoşanoya Serdar û Karê da dîyalog pir in lê ji bilî dîyalogên du kesî, di dîyalogên pirkesî da yên ku meriv tê da zêde ne tevlihevî xûya dibin. Wek mînak di dîyalogên xwastina Karê û Nazê da û di dîyalogên dawîya lîstikê da cimaet tev da û carekê da xeber didin. Ev yeka jî tevlihevîya dengên derxistîye holê. Meriv nizane wekî kê diaxife û kê bêdeng e. Di dîyalogên du kesî da jî temamîyeke kîp heye. Di dengkirina karakteran da jî lîstikvanan dengên xwe li gor bûyeran guherandine û bertekên xwe ji bo guhdaran dane hîs kirin. Vê yekê jî dengkirina lîstikê xurt kirîye.

Muzîkên Lîstikê: Di vê radyoşanoyê da klamên bi miqamên Kurdî hatine bi kar anîn û ji bo fona lîstikê jî dengê sazên bi miqamên Kurdî hatine bikaranîn. Lîstika Serdar û Karê bi dengê meya Egîdê Cimo ya bi navê *Kura Çayê* dest pê dike. Piştî dengê meya Egîdê Cimo, klama Efoyê Esed ya bi navê *Qazî* di fona lîstikê da lê dide. Piştî ra jî ji miqamên cimaeta Kurda ya bi navê *Hey Wax*, dengê zirneyê, klama gelêrî ya bi navê *Zewal Lawiko* û ji bilûra Lezgîyê Ferî ya bi navê *Miqama Kurdî* hatîye bi kar anîn.

Efektên Lîstikê: Efekt jî bo xeyalkirina guhdaran metodeke radyoşanoyê ye ku di lîstika Serdar û Karê da hatîye bikaranîn. Tevî hev du efekt hatine bikaranîn. Ya yekem ber bi di dawîya lîstikê da pêşkêşvan dibêje “*dihat bîna bayê sar*” û biştî gotina pêşkêşvan dengê efekta bayê di lîstikê da tê bihîstin. Efekta duyem jî di dawîya lîstikê da tê bihîstin. Dema ku bavê Karê û apê Serdar dibihîzin herdu evîndar revîne bi hespan li pey wan dikevin. Dema ew li pey herdu evîndaran dikevin di lîstikê da efekta dengê hespan û dengê nalê wan tê bikaranîn.

Wextê Lîstikê: Lîstik tevî hev bîst û du deqe û bist û çar sanîye ye. Lê weke ku me di serî da jî got, qeyda vê lîstikê ne temam e. Ber bi dawîyê va qeyd qut bûye.

1.4. Leyl û Mecnûn

Leyl û Mecnûn destaneke kevn e ku bingeha xwe ji efsaneyeke Ereban digire. Piştî ra jî di nav Farisan, Kurdan û Tirkan da jî belav dibe û tê gotin. Herwiha ev destan di nav radyoşanoyên Radyoya Rewanê da jî cihê xwe digire û pêşkêşî guhdaran dibe. Ev radyoşano jî li gor radyoyê tê veçêkirin û tê pêşkêşkirin. Di vê lîstikê da tenê yek deng heye. Keremê Seyad him pêşkêş dike û him dilqê karakteran dileyîze. Em dikarin bibêjin ku ev radyoşanoyeke yek dengî ye.

Mijara Lîstikê: Pêşkêşvan dema dest bi lîstikê dike ji kalikê Mecnûn da dest pê dike. Li gor ku tê gotin; Navê bavê Mecnûn Mihemed Emîn bûye. Mihemed Emîn rojekî ji xwe ra diçe nêçîrê û li ber konekî keçîkekî dibîne. Navê Keçîkê Eynê bûye. Mihemed Emîn bengîyê Eynê dibe û diçe li cem bavê xwe û ji wî daxwazê dike wekî Eynê ji wî ra bixwaze. Bavê Mihemed Emîn diçe li ser kursîyê xwezgînîyê rûdinê û Eynê ji kurê xwe ra dixwaze. Bavê Eynê jî qîza xwe dide Mihemed Emîn û dewata wan dikin. Piştî dewata wan dikin Mihemed Emîn rojek şûnda dimire. Bavê Mihemed Emîn emir dide wekî Eynê bişînin mala bavê. Eynê naxwaze bizivire mala bavê xwe lê bavê Mihemed Emîn ji şiltaxên xelqê ditirse û Eynê ber bi mala bavê wê va rê dike. Eynê di rê da direve û naçe mala bavê xwe. Bi vî teherî debara xwe ji xulamî û parsektîyê dike. Piştî neh mehan kurekî Eynê ji Mihemed Emîn tê dinyayê. Navê wî lê dike Mecnûn. Mecnûn kurekî zehf bedew bûye. Mecnûn piştî ku dibe heft salî dibe golikvan. Mecnûn li ber golikan hînî sazê dibe. Rojekî Mecnûn li rastî koçan tê û li ser devekî keçek dibîne. Dilê Mecnûn dikeve keçîkê û dilê keçîkê jî dikeve Mecnûn. Mecnûn diçe ji şivan û gavanan pirs û pirsîyaran dike û hîn dibe wekî navê wê keçîkê Leyl e. Mecnûn demildest diçe li cem dîya xwe û ji wê daxwazê dike wekî ew here û Leylê ji wî ra bixwaze. Dîya wî jî radibe û diçe nava koçan parsektîyê dike wekî Leylê jî bibîne. Dema Eynê di nava koçekan da parsektîyê dike, Leylê dîya Mecnûnî dibîne, wekî bêjî nas dike û diçe xêrê dide wê. Eynê dizivire li cem Mecnûn û lê Leylê naecibîne. Mecnûn jî hêrs dibe, saza xwe hildide û diçe li ber kanîyekî ku koçan lê ewirîbûn saza xwe lêdide. Leylê dengê sazê dibihîze û bi mabesta av anînê kûpê avê hildide û diçe li cem Mecnûn. Herdu evîndar demeke dirêj li cem hev dibînin û dikevin sohbeta keyf û henekê. Piştî ra xewa

Mecnûn tê û serê xwe datîne li ser çoka Leylê û dikeve xewê. Qederek şûnda tê bîra Leylê wekî ew ji bo av anînê hatibû li ser kanîyê. Leylê morîya xewê dike guhê Mecnûn û avê hildide û ber bi konên koêan diçe. Lê Leylê dibîne û wa koç bar dîkin li ser çîyayekî din. Malbata Leylê gelek ji Leylê ra hêrs dibe û bê pîrs wê davêjin terketîya deveyan û dibin li ser çîyayekî din. Rojekî Leylê teyrekî ku ji cihê Mecnûn lê maye dibîne û halê Mecnûn ji teyr dipirse. Teyr wisa behs dike wekî li dora Mecnûn Qamîş hêşîn bûne, li ser çavê wî çivîkan hêlîn çê kirîye. Leylê gelek digirî û dikewgirî. Rojek tê koça wan dîsa biryara zivirîna deştê dîkin. Leylê sibê zû berîya her kesî tê deştê û demildest diçe li ser kanîyê. Dinîhêre wan qamîşan Mecnûn di nava xwe da wenda kirîye. Dema Leylê Mecnûn dibîne lê dihinêhere wekî kincên Mecnûn hemû rizîyane, li ser çavê wî hêlîn hatine çê kirin û haylo cûcîk mezin bûne û firîyane. Leylê gelek digirî û dia dike. Xwedê jî diayê wê qebûl dike. Leylê morîya xewê ji guhê Mecnûn derdixe û Mecnûn dîsa hişyar dibe. Mecnûn serî da bawer nake ku ev qas wext razayî maye. Piştî ku Mecnûn qanîh dibe û dîsa herdu evîndar dest bi axaftinan dîkin bavê Leylê li ser herduyan da derdikeve û dixwaze wan bîkujê. Herdu evîndar dia ji Xwedê dîkin wekî wan bike du stêrk û biavêje ezmanan. Xwedê diayê wan qebûl dike û herdu evîndar dibin du stêrk. Êdî dema biharan herdu stêrk digihîjin hevdu Leylê diçe çîyê Mecnûn dibîne aranê. Wextê payîzê jî dema herdu stêrk tên li hev dikevin Leylê dimîne aranê Mecnûn diçe çîyê.

Karakterên Lîstîkê: Di lîstîka Leyl û Mecnûn da heşt karakter hene ku ji wan Leyl û Mecnûn krakterên sereke ne û Mihemed Emîn, Eynê, Bavê Mihemed Emîn, Bav û dîya Nazê jî karakterên alîkar in. Di vê lîstîkê da hemû karakter ji alîyê keremê Seyad tên dengkirin. Ev tişt serkeftina lîstîkê kêr dike.

Muzîkên Lîstîkê: Di Radyoşanoya Leyl û Mecnûnê da berî ku pêşkêşvan dest bi lîstîkê bike ji miqama bilûra Tiharê Emer ya bi navê *Leyl û Mecnûn* lê dide. Bi du ra jî ji miqama Kurdî ya bi navê *Serew*, ji dengê meyên Egîdê Cimo *Metê Dêranê*, *Gulê Dêran* û *Gulê Merûmê* lê dide. Ji bo teqlîtîkirina saza Mecnûn jî ji dengê saza Aşîq Kemal ya bi navê *Miqam* hatîye hilbijartin û wek fon hatîye dayîn.

Efektên Lîstîkê: Di lîstîka Leyl û Mecnûn da tenê efektek hatîye bikaranîn ku ew jî dengê hespan e. Dema Bavê Mihemed Emîn diçe ji bo xwestina Eynê dengê efekta hespan tê dayîn.

2. Herdu Radyoşanoyên Radyoya Rewanê: *Bêqelen* û *Destebirak*

2.1. *Bêqelen*

Helbestvan û nivîskarê Sovyêtê Fêrikê Êsiv şanonûsekî Kurdî ye ku him ji bo pîyesên li ser dikê û him jî ji bo radyoşanoyan kar kirîye. Şanoya *Bêqelen* jî xebateke Fêrikê Êsiv e ku di sala 1974an da him li ser dikê hatiye lîstin û him jî di heman salê da li ser Radyoya Rewanê hatiye lîstin. Ev şanoya Fêrikê Êsiv bi awayekî amatorane nehatiye nivîsin. Wisa ku *Bêqelen* li gor cureya xwe hemû deqên şanoya komedyayê têr dike û wek cureya xwe komedyaya ye. Ev lîstik dijberî tragedyayê ye û ji serî heya dawîyê bi awayekî kêf û henekî berdewam dike. Ev lîstik di nav cureyên komedyayê da jî dikeve milê komedyaya karakter û edetan. Ev cure şano civakê hildide hemberî xwe û kêmasîyên civakê rexne dike. Li gor mijara ku bête rexnekirin şano tê nivîsîn û bûyer tên afirandin. Karakterên dijber tên afirandin û peyamên rexneyî li civatê tê kirin. Şano an jî radyoşanoya *Bêqelen* jî cureya komedyaya karakter û edetan e ku edetêke di nav Kurdan rexne dike û rêya rast dide ber çavan.

2.2. Fêrikê Êsiv

2.2.1. Jîyana Wî



“Helbestvan, wergêr, destannûs, laqirdînûs û şanonûsê Kurd e ku di sala 1934an da li gundê Pampê tê dinê ku gundekî Kurdan ê Yêrêvanê ye. Mezinên wî ji Qersê ne. Piştî şerê cîhanê yê yekemin tevî Kurdên Êzdî û Ermenîyan derbasî alîyê Êris bûne û di rê da ji malbata wî gelek kes mirine. Dibistana seretayî li gundê xwe dixwîne, piştî xwendina xwe ya çar salan, Fêrikê Êsiv di 1955an de, di beşa Fîlolojî û Dîrokê da dest bi xwendina xwe ya bilind dike. Heman salê di rojnameya *Rya Teze* da dest bi xebatê dike û helbest û nivîsên wî diweşin. Piştî kutakirina enstîtûyê di radyoya Kurdî ya Yêrêvanê da weke serokê wêjeyê dest bi xebatê dike. Di pêşbirka wergerê ya Sayat Nova da bi wergera xwe ya bo kurmancî xelata sêyemînîyê werdigire. Ji Lêrmontov, Pûşkîn, Yasenîn, Goethe, Shekaspeare û gelek nivîskarên din wergeran dike. Di sala 1968an da li gundê xwe dest bi mamostetîyê dike û di sala 1974an da dibe endamê Yekîtiya Nivîskaran. Fêrikê Êsiv di helbestê da Pûşkîn û Yasenîn weke hosta qebûl kirine. Di sala 1987an da sewa bajarê ku Pûşkîn lê maye bibîne, derdikeve gereke demdirêj û li danzdeh bajarên welatê Êris digere, di sala 1997an da vedigere Yêrêvanê lê êdî nexweşî li Fêrikê Êsiv

giran dike. Di 1ê Gulanê da radikin nexweşxaneyê û 3yê Gulana 1997an da li Yêrêvanê, di 63 salîya xwe da diçe rehma Xwedê” (Ûsiv, 2011: Beşa jînenîgarîyê) Fêrikê Ûsiv di nav berhemdarên Kafkasyayê da xwedî cihekî grîng digire. Wî di gelen qadên cur bi cur da xebatên xwe kirine, li pey esil û esasên xelkê xwe maye û bûye şairekî Kurdan. Dema di nav wêjeya Kurdî da navê Fêrikê Ûsiv tê gotin, ew wek helbestvanekî xwezayê tê nîşan kirin. Fêrikê Ûsiv bi taybetî di helbestên xwe da li ser xwezayê disekine û heza xwe ye li hember xwezayê û gundê xwe dirêse pênûsa xwe.

Fêrikê Ûsiv berî ku berevokên wî bîr çap kirin û navê wî li nav gel belav bibe, di gelek qadan da ji bo Kurdî kar kirîye û li ser Kurdî hûr bûye. Wek mînak Fêrikê Ûsiv “Sala 1960î, ji pey qedandina xwendinê ra rêdaksîya axaftinên radiyoya Yêrêvanê, di beşa bi zimanê Kurdî da derbazî li ser kar dibe, çawa serwêrê para edebîyatê. Lê karê wî dirêj nakşîne, kar dihêle, vedigere gundê xwe, Pampa Kurdan (Sîpan), di dibistana gund da dersê zimanê Kurdî dide” (Boyîk, 2012: 240). Fêrikê Ûsiv ji gundê xwe gelek hez kirîye û li gundê xwe nêzî bîst û pênc salan dersên Kurdî daye.

2.2.2. Berhemên wî

Jîyana Berhemdayîna Fêrikê Ûsiv serê pêşî bi berhema Helbestan ya bi navê “Çavkanî” dest pê dike. Dema ev berhem di sala 1961ê da derdikeve gelek tê ecibadin. “*Gelek helbestên wê berevokê bûne kilam, heta niha jî ji aliyê stranbêjên Kurdan va têne gotin*” (Boyîk, 2012: 241). Piştî vê berhemê êdî Fêrik gelek berhem li pey xwe dihêle. Ew berhemên Fêrikê Ûsiv ev in:

1. Çevkanî, Yêrêvan, 1961, helbest.
2. Gula Elegezê, Yêrêvan, 1964, helbest.
3. Lîrika, Yêrêvan, 1967, helbest.
4. Ûsivê Nevya, Yêrêvan, 1973, helbest.
5. Narê, Yêrêvan, 1977, helbest.
6. Hisretdefter, (di berevoka Bahar da, hej.3), Yêrêvan, 1984, helbest.
7. Dinya delal, (di berevoka Bahar da, hej.6), Yêrêvan, 1987, helbest.
8. Hîveron, Stockholm, 1993, (cure ne dîyar e).
9. Hisret, Yêrêvan, 2004, pişt ra Êrbîl 2004, destan.

10. Gahavêj arvî apîn (Ber ava gurr), berevoka helbesta bi zimanê ermenkî, Yêrêvan, 2004, (cure ne diyar e).
11. Destan, Yêrêvan, 2005, piştra Êrbîl 2006, (cure ne diyar e).
12. Bera ber deriya, berevoka wergera, Yêrêvan, 2006, (cure ne diyar e).
13. Kerdîga kilama, Yêrêvan, 2007, (cure ne diyar e).
14. Berevoka berhema, cilda I-ê, Yêrêvan, 2008.
15. Berevoka berhema, cilda II-a, Yêrêvan, 2008.
16. Berevoka berhema, cilda III-a, Yêrêvan, 2009.
17. Pampa min, Yêrêvan, 2009, berhemên bona zarokan.
18. Bijare, Yêrêvan, 2010, (cure ne diyar e).
19. Xewna Mîrmih (di nava pirtûka Hîkayet Der Heqê Bar Mûraz De), bi rûsî, Moskova, 1971, destan.
20. Rihana Reso, Yêrêvan, 1984, destan” (Artemêt, 2020: 9).

2.3. Hilbijartina Mijarê

Di şano û radyoşanoyan da mijar gava ewil e ku xîmên lîstikê bi hilbijartina mijarê tê avêtin. Nivîskarê ku mijarekî hilbijêre divê hin xalan bide ber çav û wisa mijara xwe hilbijêre. Di hilbijartina mijarê da nivîskarekî ku ji bo dikê metn hazir dike divê li gor derfetên dikê bifikire û wisa mijara xwe hilbijêre. Lê nivîskar an jî veçêkerekî radyoşanoyê dikare hemû mijaran hilbijêre. Ji ber ku lîstik li ser radyoyê tê pêşkêşkirin û sehne di hişê guhdaran da ava dibe. Lê di şanoyê da jî û di radyoşanoyê da jî divê balkêşîya lîstikê hebe û divê nivîskar ji bo başîya gel mijara xwe hilbijêre.

Fêrikê Ûsiv di hilbijartina mijara şanoya xwe da kêmasîyên gel daye ber çavên xwe û bi armanca rexnekirinê şanoya xwe nivîsîye. Ev şano ji alîyê armanca xwe va li ser edetên Kurdan xwar dibe û wan rexne dike. Ji ber vê yekê jî nivîskar ji alîyê hilbijartina mijarê va xurt e. Herwiha şanoya Bêqelen him ji bo lîstika li ser dikê û him jî ji bo xwendina radyoyê şanoyeke destdayî ye. Ji ber vê yekê jî radyoşanoya Bêqelen li gor radyoyê ji nû va nehatîye veçêkirin û ji metna esil dûr neketîye.

Mijara radyoşanoyê li ser zewacê û li ser edeta xwestina qelenê ye. Wisa li gor lîstikê karakterê Cefo dixwaze kurê xwe yê bi navê Ezîz bizewicîne. Bi vê mabestê jî dixwaze qîza Dûko ya bi navê Sernaz ji kurê xwe ra bîne. Herçiqas jina

Cefo nexwaze ji gundekî din bûkekî bîne jî Cefo bi ya xwe dike û ji gund çend merivan hildide û diçe gundê Biradaşê. Cefo berîya çûyîna xwezgînîyê eraqê vedixwe û serxoş dibe. Cefo bi merivên xwe va li hespan siwar dibin û diçin mala Dûko. Cimaet hemû li mala Cefo dikevin sihetê û diaxivin. Cefo ji bo ku kurê wî Sernaza qîza Dûko bibîne avê dixwaze. Sernaz avê tîne dide Cefo û ew bi Ezîz va hev dibînin. Herdu xort jî beşerxweş dibin. Piştî hingê Dodo tê mala Dûko û cimaet tev rex Dodo dikevin û dikenin. Dawîya Dawî Ûsiv dibêje Dûko wekî ji bo xizmetekî hatine mala wî û qîza wî ji kurê Cefo ra dixwazin. Dûko mêvanperwerîya xwe dike û keçikê dide kurê Cefo. Lê piştî erêkirina Dûko dor tê li ser dîyarkirina qelenê Sernazê. Wê kêlîyê Cefo hê jî serxoş e û gilîyên xwe tevlihev dike. Dûko ji bo qelenê qîza xwe pênc hezar manat pereyê teze û sê heb jî dîyarî dixwaze. Cimaet tev da şaş dibînin lê ji ber ku Cefo hişê wî serê wî nîn e ev qelen ji wî ra zêde nayê. Merivên Cefo ji Dûko daxwaz dikin ku hinekî qelen kêmbike. Cefo jî her tim tev gilîyan dibe û nahêle merivên wî tevî zehfbûna qelen bibin. Dawîya dawî Dûko pînsed manatî kêmbike û di çar hezar pînsed manat û sê dîyarî dixwaze. Cefo qebûl dike û gustîlkê dike tilîya Sernazê. Piştî ra cimaet dest bi xwarinê dike, dikevin nava sihetê, klaman dibêjin û gazî sazbandan dikin û miqamên dewatê didin lêxistin. Piştî ra jî Cefo û merivên xwe qeyd û qirarên xwe dikin yek û diçin gundê xwe. Sibetirê Cefo ji xewê hişyar dibe û kincên xwe li xwe dike. Lê ji ber serxoşîya wî ye şeva derbazbûyî tu tişt nayê bîra wî. Cefo û Şerê hinekî didin ber hevdu û Cefo dibêje wekî çar hezar ji bo perê qelen zehf e û berê xwe dide mala Dûko ji bo gustîlê biavêje. Dema Cefo rê dikeve Dûko jî li ber derîyê malê him bilûrê dixwe û him jî dikeve hesaBêqelenê qîza xwe. Di wê navberê da Cefo digihîje mala Dûko û dixwaze gustîlê vegerîne. Dûko û Cefo rikîfê hevdu dikin û Dûko ji jina xwe gustîlê dixwaze wekî bide Cefo. Lê Sernaz gustîlê nade û li hember bavê xwe derdikeve. Dûko hêrs dibe û kurê xwe dişîne li pey Dodo wekî Sernazê bide Dodo. Sernaz direve derdikeve derva û Cefo jî dide pey Sernazê, wê erebê siwar dike û Bêqelen bûka xwe dibe gundê xwe.

2.3.1. Pevxistin

Piştî ku nivîskar mijara xwe hildibijêre û armanca şanoya xwe dîyar dike, êdî beşên lîstîkê ava dike û bûyeran diafirîne. Nivîskar di pevxistinê da divê bûyeran baş girê bide û wisa lîstîkê bihûne. Ji bo şano û ji bo radyoşanoyan jî pevxistina lîstîkê merhaleyeke grîng e. Divê beşa destpêkê, beşa pevçûyînê, beşa tevlihevîyê, beşa

lûtkeyê û beşa dawîyê ji alîyê girêdana bûyeran xurt bibin û temaşevan an jî guhdar ji lîstikê dûr nekevin.

2.3.1.1. Beşa Destpêkê

Di şano an jî di radyoşanoyan da beşa destpêkê zêdetir danasîna lîstikê û danasîna karakteran dihevin. Lîstik di serî da tê danasîn, karakter dest pê dîkin û dileyîzin. Lê radyoşanoya Bêqelen da lîstik an jî karakter nayên danasîn. Di serî da piştî klameke miqamî vebêjer mekana lîstikê dide nasîn, kirinên karakteran ji bo radyoguhdaran dide xeyalkirin û pişt ra jî dîyalogên karakteran dest pê dibin.

Vebêjer: *“Gundê Axdaşê, mala Cefo. Cefo li ser keravatê çarmêrkî rûniştiye, Şarê li ber tenure şîpiya sekiniye, teşiyê dirêse. Ethem rûniştiye ser çewalêd arvên, lingên xwe dibe tine”*

Di Bêqelen da karakterê Cefo û jina wî Şarê dixwazin kurê xwe bizewicînin. Lîstik rasterast bi dîyalogên Cefo û Şarê dest pê dibe. Şarê naxwaze keça Dûko bixwaze lê Cefo li hember jina xwe derdikeve û merivên xwe kom dike ji bo xwestina sernazê. Merivên Cefo bi malbatê ra radibin û diçin mala Dûko. Em dikarin bibêjin ku ji serê lîstikê û heya çûyîna xwestina Sernazê Beşa destpêkê ye. Di vê beşê da lîstik armanca xwe dide dîyarkirin û bingeha bûyeran tê hazirkirin.

2.3.1.2. Beşa Pevçûyînê

Beşa pevçûyînê geşedana bûyeran e û karakter zêdetir dikevin nava dîyalogan. Di Bêqelen da beşa tevlihevîyê di mala Dûko da dest pê dibe heya qirardayîna qelenê Sernazê. Li gor beşa pevçûyînê bûyer zêde dibin û dîyalog dikevin nava pevçûnan. Bêqelen da bi çûyîna mala Dûko ra dîyalogên karakteran zêde dibin. Di vê beşê da deqên cureya komedyayê jî tê dagirtin û kêf û henek gelek tên kirin. Dîyalogên karakterên alîkar jî zêde dibin û birîna qelenê Sernazê dibe sedema pevçûnên. Wek mînak di navbera Êsiv û Dûko da ji bo qelenê Sernaz dîyalogeke wiha derbaz dibe;

Êsiv.— Tu qelenê xwe bibêje!

Dûko.— Qelenê qîza min pênc hezar manat û çar xelat.

Êsiv.— Nabihêêem...

Rûsipîyên hevalê Cefo bi Dûko ra dikevin bazarê da ku qelen kêmbike. Lê Cefo ji ber serxosîya xwe qelenê Sernazê qebûl dike bi merivên xwe ra pevdîçe.

Ûsiv.— *De erê, Cefo... Me tu tişt negotîye. Kurê te ye, mirazê te pê bibe.*

Cefo.— *Erê, ne îşê we ye, mêrik çiqas dibirre, ez çiqas didimê...*

Ûsiv.— *Ê... Min dixwest hinekî di quweta te de bûya. Min dixwest te bizanibûya pênc hezar çiqas ye.*

Piştî ku Cefo qelen qebûl dike êdî qelen tê birîn û Cefo gustîlê dike tilîya Sernazê. Piştî ra jî cimaet dikevin nava kêf û şahîyê.

2.3.1.3. Beşa Tevlihevîyê

Di lîstikekî da beşa tevlihevîyê destpêka geşedanan e. Pirsgirêk xwe di vê beşê da didin nîşan kirin û kelecana lîstikê zêde dibe. Karakterên sereke û dijber xwe nîşan didin û bûyer li dora wan kîp dibe. Di Bêqelenê da jî beşa tevlihevîyê bi hişyarbûna Cefo ra dest pê dike. Cefo roja din hişyar dibe û serxoşbûna wî derbaz dibe. Tiştêk nayê bîra wî wekî çiqas qelen hatiye birîn. Di navbera Cefo û jina wî da diyalog çêdibin û Cefo qelenê Sernazê qebûl nake.

Cefo.— *(Şaş mayî, destê wî ji qayîşê tê berdan, şalê wî dişiqite.) Ehê, çawa çar hezar û pênc sed?!*

Şarê.— *De êdî huşşş...*

Cefo.— *Heee? Hela ev çiqas dibê'? Çawa çar hezar û pênc sed manat? Çawa huşşş? Ew kî di dewranê de bihîstîye çar hezar û pênc sed manat qelen?ii*

Şarê.— *Ew e, qelenê mêrik jî ew e.*

Cefo.— *Ê, erê, qelen qelen, qelen hezar manat, haydê ji te re du hezar, lê çar hezar û pênc sed manat çiqas xeber e?*

Şarê.— *Ê ne te xwe da ber?*

Cefo.— *Ê min xwe da ber, te xwe neda ber... Keyê, xwe seba ewa şirtiberwarî (ji şikra bûkê ra) xwe ez xwe talan nakim? Here, here, nîşaniyê bîne!*

Cefo bi Şarê û Ezîzê kurê xwe ra pevdîçe û dixwaze gustîlê ji mala Dûko hilde. Herçiqas Şarê û Ezîz nexwazin jî Cefo radibe diçe gundê Dûko. Dûko û Cefo dikevin pêşîra hevdu û pevdîçin. Beşek ji diyalogên wan ev in:

Dûko.— *Tu duh ron bûbûyî, îro jî hatîyî xwe beropaşo datîni?*

Cefo.— *Lo beropaşo tu yî, wekî ez ji te re bi Kurmancî dibêjim, nîşaniyê bi paş de bidin! Tu fam nakî ?*

Dûko.— *Çi ye, qelên qudumê te şikênand?*

Cefo.— *Lêê qelen, qelen hindik e? Çar hezar û pênc sed manat çi xeber e ?*

Dûko.— *Te duh digot, “Bibirr!”*

Cefo.— *Min gotiye, “Bibirr, bi însaf bibirr” Ne ku lap berbad bike. Min gotiye, hezarî bibirr, du hezaran...*

Dûko.— *Qîza min ne qîza du hezaran e!*

Di beşa tevlihevîyê da bûyer kîp dibin û ji bo bûyeran pêdivîya çareserîyê derdikeve holê.

2.3.1.4. Beşa Lûtkeyê

Beşa lûtkeyê di listikekî da pêleya herî dawî ya bûyeran e. Bûyer tên pêleyeke wisa ku guhdar di nav kelecaneke mezin da dimînin. Êdî bûyer xirab an jî baş ber bi çareserîyê va diçin. Bêqelen da jî beşa lûtkeyê piştî pevçûnên Cefo û Dûko zêde dibin dest pê dibe. Dûko hêrs dibe û ji Besê ra dibêje wekî gustîlê bîne û bide Cefo. Lê Sernaz gustîla xwe nade.

...

Dûko.— *Qizê, barişne, komsomol, ez tûyî wan heşt salên te kim, wekî te dixwend! Tê xwe bavêjî ser sêla sor? Ka nîşaniya wan?*

Sernaz.— *Here, ji min bi dûr bikeve! Çiyê te bi min ketiye?*

Dûko.— *Çiyê min bi te ketiye? Han ji te re, çiyê min bi te ketiye!*

(Sîleyekê dide qîza xwe.)

Sernaz.— *Apooo... ihî, ihî...*

(Digiri.)

Cefo.— *Êêê olam, tu li bûka kî dixî?! Ez ê te vejênim!*

...

Cefo dixwaze Sernazê Bêqelen bibe. Dûko jî gazî Dodo dike da ku Sernazê bide wî.

...

Dûko.— *Têrmaş, tu bi wê gumanê yî ez qîza xwe bidime kurê te?*

Ez ê bidime Dodo jî, lê tu carî nadime kurê te.

Cefo.— Êêê, giliya mêran gilî ye!

Dûko.— *Weki ez nedime Dodo, bavê min Kurdûnda be! Kuro, zû here gazî Dodo bike!*

Besê.— *Dûko, te xêr e? Ca kerr be, Dûko!*

Dûko.— *Kuro, vê saetê gazî Dodo bike!*

...

Piştî van diyalogan êdî beşa lûtkeyê xilas dibe û lîstik derbasî beşa dawîyê dibe.

2.3.1.5. Beşa Dawîyê

Di lîstikan da beşa dawîyê xilasbûna pîrsgirêkên bûyeran e. Bûyer xirab an jî bextewarî kuta dibin. Ji ber ku radyoşanoya Bêqelen dikeve bin cureya komedyayê dawîya wê jî bi bextewarî kuta dibe. Di lîstikê da Sernaz derdikeve derva û Cefo jî li pey Sernaz derdikeve. Cefo demildest Sernazê siwarê erebeyê dike û Sernazê Bêqelen ji Ezîz ra dibe. Beşa dawîyê û herwisa lîstik bi van gotinên vebêjer û diyalogan kuta dibe:

...

(Sernaz wê demê diçe derve. Cefo li pey dertê.)

Sernaz.— *Inê, ez çûm!*

Cefo.— *Zû xwe bavêje kabînkê, zû bike! Ezîz li hêviya te ye!*

(Dew avtiyê tê.)

Besê.— *Sernazzz!*

Cefo.— *(Ji dûr ve.) Malî ava, malî ava..!*

(Dengê kilamê tê.)

2.3.2. Aheng

Çi şano an jî çi radyoşano, aheng ji bo lîstikekî merheleyeke grîng e. Nivîskar an jî veçêkerê lîstikê divê ahenga lîstikê di radeyeke baş da bigire. Di şanoyên li ser dikê da nivîskar lîstikê li gor bûyeran ji hevdu qut dike. Di terma şanoyê da ji vê yekê ra “perde” tê gotin. Lê ji ber ku di radyoşanoyan da sehneyek tune lîstik bi fon an jî bi gotinên vebêjer tên birîn. Ji ber vê yekê jî di radyoşanoyan da perde tune lê beş hene. Veçêkerê şanoyê lîstik beş bi beş ji hevdu vediqetîne û wisa dide ber pêlên radyoyê.

Di radyoşanoyan da serkeftina ahengî bi veqetandina beşan pêk tê. Veçêker an jî nivîskarê lîstikê divê beşên lîstikê baş ji hevdu veqetîne da ku di lîstikê da yekgirtîyek peyda bibe. Herwiha divê di radyoşanoyan da wextê beşan jî gelek ji hevdu cuda nebin. Eger di lîstikekî da beşek ducarkî beşeke din bibe, dibe ku guhdar ji beşa dirêj aciz bibin.

Di radyoşanoya Bêqelen da tevî hevdu pênc beş hene. Lîstik bixwe tevî hevdu çil û du deqe ye. Dirêjîya beşên lîstikê ji bilî beşa sêyem nêzikî hevdu ne. Beşa herî dirêj ya sêyem e ku gelemperî dîyalog di vê beşê da tên bikaranîn. Herwiha di vê beşê da geşedana bûyeran zêde dibe. Ji ber vê yekê jî nivîskar ji bo ahenga lîstikê beşa sêyem dirêj û beşên din jî kurt girtîye. Gelemperî ahengeke kîp di lîstikê da heye. Beşên lîstikê li gor bûyeran di heddê xwe da ji hevdu hatîye veqetandin. Em ê di bin sernava Sehneyên lîstikê da kûrahî li ser beşên lîstikê rawestin.

2.3.3. Bicîhkirina Karakteran

Di radyoşanoyan da karakter hêmaneke sereke ye. Bûyer li dor karakteran dizivirin û hemû dîyalog bi wan tên kirin. Nivîskar an jî veçêkerê lîstikê ji bo xurtîya lîstikê divê karakterên xwe baş hilbijêre û kirasê wan li gor bûyeran û mijarê li wan bike. Herwiha hemû karakter divê di hemna fikrî da nebin da ku bûyer geş bibin û encamek derkeve holê. Di lîstikekî da divê erkên hemû karakteran hebin. Dema di lîstikekî da karakterekî bê erk hebe ev yeka kêmasîya lîstikê dide der û lîstik tevlihev dibe. Dema em bala xwe didin Lîstika Bêqelen, nivîskarê wê tevî hevdu deh karakter daye lîstin. Di nava van karakteran da nîvepir karakterên alîkar in. Em dikarin karakterên lîstikê di sê sernavan da dabeş bikin:

2.3.3.1. Karakterên Sereke

Di radyoşanoya Bêqelen da karakterên Sereke Cefo, Ûsiv û Şarê ne. Dîyalogên lîstikê gelemperî li dor van karakteran dizivire.

Cefo: Bavê Ezîz e. Karakterê Cefo mirovekî zana ye. Li gor ku di lîstikê da tê ravekirin gelek zimanan dizane û ji zanîna xwe zehf razî ye. Herwiha ev karaktere karakterekî girover e. Ji serê lîstikê û heya dawîya lîstikê di heman fikrî da namîne. Wek mînak qelenê Sernazê di serxoşîya xwe da qebûl dike lê dema ser xwe da tê qelen zehf dibîne. Herwiha destpêka lîstikê da pesnê Dûko û Bavê Dûko(Şewêş) dide. Lê dema Cefo û Dûko li ser qelen dikevin nîqaşê Cefo heqaretê bavê Dûko ra dibêje û ew piçûk dibîne.

Cefo di hemû beşên lîstikê da heye û bûyer hemû li dor wî diçe û tê. Li gor qirarên wî bûyer nû dibin û di lîstikê da geşedan pêk tên.

Ûsiv: Rûsipîyê hevalê Cefo ye. Di lîstikê da giraniya wî heye û ew bazara qelenbirînê dike. Bixwe karakterekî heddê xwe da ye û li cem karakterên din qîmeta wî heye.

Şarê: Dîya Ezîz e. di lîstikê da karakterekî dûz e û timî li hember qirarê Cefo ye. Di lîstikê da tenê di navbera wê û Cefo da diyalog çêdibin.

2.3.3.2. Karakterên Dijber

Di radyoşanoyekî da karakterên dijber li hember karakterên sereke disekinin û bi vî awayî jî bûyer diqewimin. Di Bêqelen da tenê karakterê Dûko karakterê dijber e ku her tişt li ser xwastina qelenê wî ye biha derdikeve.

Dûko: Bavê Sernazê ye. Bixwe karakterekî dijber e ku mijara lîstikê li ser qelenê qîza wî ye. Dûko karakterekî dûz e û ji destpêka lîstikê heya dawîyê di heman fikrî da ye. Bixwe karakterekî jixwe razî ye û gelek ji pereyan hez dike. Herwiha li ser kevneşopa kal û bavan dimeşe û li gor edetên wan dimeşe.

2.3.3.3. Karakterên Alîkar

Karakterên alîkar ji bo lîstikan divêtiyeke sereke ye. Ev karakter wê firsendê didin ku lîstik xweştir bidome. Nivîskarê Bêqelen di lîstika xwe da gelemperî karakterên alîkar afirandîye. Em dikarin karakterên alîkar wiha bidin:

Ezîz: Di lîstikê da mijara qîzxwastinê ji bo wî ye. Karakterekî alîkar e ku bandora wî li ser lîstikê tune ye. Tenê Cefo lîstikê da qirara ecibandina Sernazê dide wî. Diyalogên ku Ezîz dike di lîstikê da kêmtir in.

Sernaz: Qîza Dûko ye û di lîstikê da keça ku tê xwestin Sernaz e. Sernaz tenê di dawîya lîstikê da cî digire. Karaktereke hişk e û li hember qexwestinê ye. Li hember bavê xwe derdikeve û bi Cefo ra diçe bigihîje Ezîz. Di lîstikê da Dema Dûko bi Sernazê ra dikeve nîqaşê em hîn dibin ku Sernaz heşt sala xwendîye û keçeke xama ye.

Nazê: Di lîstikê da tenê dengkirineke piçûk dike lê ne hevok jî tenê dema xwezgînî diçin mala Dûko ew goçik dirêjî xezûrê xwe dike û deng derdixe. Bixwe wek bûka Cefo tê nîşandan Lê em nizanin ka jina kî ye.

Têmûr: Yek ji hevalên Cefo ye. Ji bo xwestina Sernazê bi Cefo ra diçe mala Dûko. Dîyalogên wî di lîstikê da gelemperî li ser kêf û henekan in.

Dodo: Di lîstikê da Dodo karakterekî saf e û tiştek di dilê wî da tune. Ji ber vê yekê jî lîstikê da kêf û henek bi dîyalogên di navbera wî û cîmaetê da pêk tên. Dodo ji aliyê karkaterên din va kêmtir dîtî.

Besê: Jina Dûko ye. Tenê di dawîya lîstikê da diaxîfe. Rola wê ya lîstikê kêmtir e.

Ji bilî van karakteran behsa hin kesên wek *Koço*, birazîya Cefo *û Şewêş* tên kirin lê tu erkeke van karakteran di lîstikê da tune. Tenê navê wan derbaz dibe.

2.3.4. Kadroya Lîstikvanan

Di radyoşanoyan da dengkirin ne mimkun e ku ji aliyê her kesî va bête xwendin. Dema lîstikvanek dikeve dilqê karakterekî û dileyîze divê li gor wî karakterê tevbigere, tevgerên xwe yê dengî baş bicih bike û wisa dengkirina xwe bike. Di lîstikekî da serkeftîbûn li gor denkirina lîstikvanan jî bilind dibe.

Kadroya veçêkerîn radyoşanoya **Bêqelenê** ev kes in:

Nivîskar: Fêrikê Êsiv e.

Rêdaktor: Xelîlê Mûradov e.

Rejîsorê Dengan: Êdvard Karapêtyan e.

Operatorê Dengan: Aramê Tîgran e.

Lêanîna Sazbendî ya Muzîkê: Keremê Seyad kirîye.

Vebêjer: Keremê Seyad e.

Kadroya lîstikvanên radyoşanoya Bêqelen ev kes in:

Keremê Seyad: Keremê Seyad di vê lîstikê da him vebêjer e û him jî di dilqê Têmûr da dileyîze. Lîstik bi şayesandinên vebêjer dest pê dike.

Fêrikê Êsiv: Nivîskarê Bêqelenê Fêrikê Êsiv bixwe jî di lîstika xwe da lîstîye û di dilqê Cefo da dengê xwe daye.

Egîdê Abasî: Dilqê karakterê Dûko dileyîze.

Şikoyê Êsiv: Dilqê karakterê Êsiv dileyîze.

Onîkê Ûsiv: Dilqê karakterê Dodo dileyîze.

Mîşayê Ûsiv: Dilqê karakterê Ezîz dileyîze.

Porsora Serdar: Porsora Serdar di gelek radyoşanoyan da deng daye ku yek ji wan jî Bêqelen e. Di Bêqelenê da tevî tev sê karakterên jin hene. Porsora Serdar him di dilqê Şarê, him di dilqê Sernaz û him jî di dilqê Besê da dileyîze. Ev yeka kêmasîyeke lîstikêye ku tevlihevîyê di nava lîstikê da çêdike. Dibe ku guhdar di xeyalkirinên xwe da Sernaz, Şarê û Besê ji hevdu dernexin.

2.3.5. Biwêj û Gotinên Pêşîyan Folklorîk di Bêqelen da

Nivîskar Fêrikê Ûsiv di nivîsandina şanoya Bêqelen da hin gotinên pêşîyan û jim jî biwêj kirine nava diyalogan.

2.3.5.1. Gotinên Pêşîyan

Zimanê lîstikê ji aliyê gotinên pêşîyan va hatîye xurtkirin. Herwiha di lîstikê da gotineke pêşîyan ya Tirkî jî hatîye bikaranîn. Gotinên Pêşîyan yên ku di lîstikê da hatine bikaranîn ev in:

Şarê.— “..... *meriv dewê xwe yê cêribandî nade qatixê necêribandî*”

Şarê.— “.....*Ji dê û bavan hezar tûle dikevin*”

Cefo.— “.....Mêrê Tirk dibê: “*Eslinda nedir, beslinda odır*”

Dûko.— “..... *Qîz heye qîz e, qîz jî heye, qîz kok e*”

Ezîz.— “..... Bila em bê giliya mezinan nebin. *Merivê bê mezin bê serî ye*”

2.3.5.2. Biwêj

Şarê.— *Ez dudil im.* (Dudilbûyîn)

Ûsiv.— “..... *Ez bê serê te nebin.* (Bês serî mayîn)

Cefo.— “..... *tu bi kê re kapan davêjî?*” (Kap avêtin)

Ûsiv.— “Cefo, nebê’, ez kêr, tu penêr! Bibêje, *tu kêr, ez penêr!*”

Ûsiv.— “....şukir *mirazê wî hê digere*”(Miraz gerîn)

Dûko.— “..... *Tê xwe bavêjî ser sêla sor?*” (Xwe avêtina li ser sêla sor)

Ûsiv.— “... *Dinya şên e, em lê ne*”

Dûko.— “.....*Meriv rastî sorê çavhêşîn neyê*”

Cefo.— “....çi ferqî ?! *Ya Hesên Keçel, ya Keçel Hesên*”

Usiv. —“..... *Wisa be, ne şîş bişewite, ne kebab*”

Di nav lîstikê da biwêjeke Tirkî jî hatîye bikaranîn:

Cefo.— “.. ku bi silametî min bûka xwe bire malê, ez ê kozî bikim *anane doxme* bikim..” (anane doxme kirin)

2.4. Taybetîyên Radyoşanoya Bêqelen

Radyoşano ji alîyê temsîla karakteran, lîstina wan, hîlbijartina mekan û teknîkan va ji şanoyên li ser dikê hêsantir e. Hewcedarîya radyoşanoyan bi sehneyekî, kostûman an jî temaşevanan tune. Ji ber vê yekê jî nivîskarê radyoşanoyan ji alîyê hîlbijartina mijaran va azadtir in. Bêqelen him li ser dikê hatîye lîstin û him jî li ser Radyoyê hatîye pêşkêşkirin. Lê helbet di pêşkêşkirina radyoyê da ji bo ku lîstik baş were xeyalkirin û tesîrê li ser guhdar bike hin teknîk hatine bikaranîn ku ev tişt ji bo hemû radyoşanoyan teknîkên grîng in. Cuhahîya herî mezin ya di navbera şano û radyoşanoyan ew e ku şano li ser dikê tê temaşekirin lê radyoşano li ser radyoyê tê guhdarkirin. Temaşevanên şanoyan bûyeran bi çavên xwe dibînin û wisa hîs dikin. Lê di radyoşanoyan da dîtin tune û tenê guhdarkirin heye. Guhdar bûyeran û dîyalogan ji dengê karakteran dibihîze û wisa di xeyalên xwe da mekanek ava dike. Ji ber vê yekê jî di radyoşanoyan da teknîk çiqas baş werin bikaranîn xeyalkirina guhdaran jî ewqas xurttir dibe û bandora li ser wan zêde dibe. Lîstika Bêqelen jî gelek taybetî û teknîkan di nava xwe da dihevine.

2.4.1. Efektên di Bêqelenê da

Di radyoşanoyan da efekt teknîkeke bingeîn e ku ji bo bandora lîstikan hewce ne. Dema guhdarên radyoşanoyan guh didêrin lîstikê divê di xeyalên xwe da lîstikê temaşe bikin û wisa tehmê ji lîstikê bigirin. Ev tehm jî bi saya teknîkên radyoşanoyan xurttir dibe ku yek ji wan jî efekt in. Efekt di lîstikekî da dikarin mekanê, tirsê, demê û yên din dikarin bikin. Efektên ku di Bêqelenê da hatine bikaranîn ev in:

• Dengê Çeliqandinê

Di lîstikê da yekem efekta tê bikaranîn dengê çeliqandina eraqê ye. Dema Cefo kurê xwe dişîne li pey Têmûr û Ûsiv ji bo çûyîna mala Dûko bixwe diçe xênî û eraqê diçelqîne. Berî ku ev efekt were bikaranîn vebêjer tevgera Cefo dibêje û bi dû ra jî ev efekt tê bikaranîn.

Vebêjer:

(Eto diçe, Cefo ji şifanêrka qulçê xênî litrê araqê derdixe, diçeliqîne.)

Piştî vê gotina vebêjer dengê efektê tê wekî Cefo eraqê diçelqîne û pişt ra jî vedixwe.

-Efekta dengê ewtîna kuçikan, dengê firxûnê, dengê ajotinê û dengê lingê gamêşan.

Hin efektên ku tê bikaranîn atmosera lîstikê dide dîyarkirin. Wisa ku di Bêqelenê da Dema Cefo bi tevî merivên xwe li firxûnê (erebeya gamêşan) siwar dibin û ji bo xwestina Sernaz diçin mala Dûko ev efektên bikaranîn. Berî pêşî Cefo dibêje Koço (yê ku firxûnê diajo) “Koço bajo, biftîne!” û pişt ra jî dengê ewtîna kuçikan, bi dû ra dengê firxûnê û dengê lingê gamêşan tê. Efekta dengê kuçikan dide dîyarkirin ku firxûn di nava gund ra derbaz dibe û kuçik diewtine firxûnê û efektên din jî dide dîyarkirin ku Cefo û merivên xwe va firxûnê siwar in û ber bi gundê mala Dûko diçin. Ev herçar efekt atmosfera lîstikê dide der û nîşan dike wekî karakter wê kêliyê li kuderê ne.

-Efekta Dengê Maşînê, Tîtika wê û Dengê Lêdana Derî

Di Bêqelenê da yek ji efektên hatîne bikaranîn dengê maşînê û tîtika wê ye. Wisa ku Dema Cefo rojek piştî qelenbirînê ser hişê xwe va tê, qelen qebûl nake û diçe mala Dûko ev efekt tê bikaranîn. Dema Dûko li ber derîyê xwe bilûrê dixwe dengê maşînê tev li dengê bilûra Dûko dibe, piştî dengê maşînê dengê tîtika wê û dengê lêdana derî tê. Bi van efektan guhdar pê dihesin ku Cefo maşînê siwar bûye, dema digihêje li ber derîyê Dûko tîtikê dide lêdan, ji maşînê peya dibe û li derîyê mala Dûko dide. Ev efekt ji bo teswîrên xeyalên guhdaran palpişt in. Guhdar bi vî awayî dikare dengê maşînê û tîtika wê û li derî xistinê di hişê xwe da mekanekî biafirîne û lîstikê temaş bike.

Efekta dengê maşînê di beşa dawîyê da du caran hatîye bikaranîn. Wisa ku dema Cefo Sernazê hildide û diçe şofêrê Cefo maşîneyê dide xebitandin û diçe. Bi vî awayî dengê xebitandina maşînê û çûyîna wê jî wek efekt hatîye bikaranîn.

2.4.2. Dîyalog di Bêqelenê da

Yek ji hêmaneke sereke ya lîstikan jî dîyalog in. Dema nivîskar lîstikekî dinivîse portreya hemû karakteran di dîyalogan da vedişêre. Guhdarên radyoşanoyan piştî ku dîyalogên karakteran dibihîzin hest û ramanên wan û tevgerên wan fêhm dikin, karakteran dipîvin û li gor wê jî portreya karakteran di hişê xwe da xêz dikin. Ji ber vê yekê jî di radyoşanoyan da dîyalog hêmaneke bingeîn e. Herwiha nivîskar bi saya dîyalogan di lîstikê da dem, cih, aksesûarên karakteran, rewşa wan dikare bide dîyarkirin. Ji bilî dîyalogan, nivîskar dikare bi vebêjer jî dem, cih, aksesûar û rewşa karakteran bide dîyarkirin.

Erkeke dîyalogan jî ew e ku zimanê lîstikê dide dîyarkirin. Ango em bi dîyalogên karakteran an jî bi vegotinên vebêjer dikarin zimanê lîstikê analîz bikin û li ser rawestin.

Radyoşanoya Bêqelen zêdetir ji dîyalogan pêk tê. Herwiha zêdebûna karakteran jî dîyalog dirêjtir û xurttir kirine. Em dikarin dîyalogên radyoşanoya Bêqelen di bin çar sernavan da wiha bicivînin:

- Dîyalogên ku Demê Dîyar Dikin

Di lîstikê da em bi van dîyalogan tê digihîjin ku bûyer di wextê berîya nandirûnê diqewime:

Dûko.— Ûsiv, qe nanê we îsal çawa ye?

Cefo.— Tuyî sax bî, Dûko, tollî ye...

Ûsiv.— Dûko, weleh bi qewlî Cefo ve, tollî ye, rind hatiye, de çi ka ma...

Dûko.— Baranên îsal xezîne bûn, xezîne...

Dema Cefo bi tevî merivên xwe diçin xwestina Sernazê karakterê Dodo Êvarxêrîyê dide cimaetê. Ango dema xwestina Sernazê êvarê ye.

Dodo.— Êvara we bi nir!

Bi hev re.— Di ser çavan re hatî, ser çavan!

Dîsa di nav dîyalogên karakteran da derengîya êvarê wiha tê dîyarkirin:

Ûsiv.— *Cimaet, sax bin, serfinyaz bin, em bê serê Dûko nebin, wisa jî bê serê Cefo jî nebin. Wekî îro merivatiya xwe kirine yek, miraz gihandine hev û me jî kêfeke dinyayî ji xwe re derbas kir. Cimaet, ez texmînan dikim êpêce şev çûye. Ji hatiyan re jî çûyîn lazim e, ji mayiyan re jî rihetî. Werin em ve kasê jî hildin eşqî texteyê Dûko, bila şên be, qedîm be!*

Di lîstika Bêqelenê da ji bilî karakteran vebêjer jî di cihekî da demê ji guhdaran ra dide dîyarkirin û dibêje:

Vebêjer: *(Ro bi bejneke bilind bûye. Tîrincê avêtiye kuleka Cefo. Cefo ji xewê radibe, tevziyan dide xwe, kincên xwe li xwe dike, qayîşa xwe dixwaze girêde... Şarê nava malê dide hev. Ethem li dora tenûrê rûniştiye)*

- Dîyalogên ku Mekanê Dîyar Dikin

Di Bêqelenê da du mekan hene ku ji aliyê vebêjer va tê dîyar kirin. Bûyer li du gundan derbaz dibin. Di destpêka lîstikê da vebêjer mekanê wisa dide dîyarkirin:

Vebêjer: *“Gundê Axdaşê, mala Cefo. Cefo li ser keravatê çarmêrkî rûniştiye, Şarê li ber tenure şipiya sekiniye, teşiyê dirêse. Ethem rûniştiye ser çewalêd arvên, lingên xwe dibe tine”*

Piştî ku xwezgînî diçin mala Cefo vebêjer dîsa behsa mekanê duduyan dike û dibêje:

Vebêjer: *“Xwezgînî di nava deh panzdeh deqeyan da digihîjin gundê Biradaşê, mala Dûko. Rûdinên, xweş û bêj, gilî û gotin, ji xwe re xever didin.*

- Dîyalogên ku Aksesûaran Dîyar Dikin

Ji ber ku radyoşano li ser dikê nayê lîstin aksesûarên karakteran jî bi doyalogan an jî bi şayesandinên vebêjer tînin dîyarkirin. Di Bêqelenê da Aksesûarên karakteran wiha tînin dîyarkirin:

Vebêjer: *“.....Şarê li ber tenure şipiya sekiniye, teşiyê dirêse. Ethem rûniştiye ser çewalêd arvên, lingên xwe dibe tine”*

Di vê hevoka vebêjer da guhdar tê digihîjin ku di destê Şarê da Teşî heye. Di vir da teşî aksesûara karakterê Şarê ye. Dîsa, ji dîyalogeke di navbera Şarê û Cefo da em fêm dikin ku li ser Cefo aksesûara *Saroçke* heye.

Cefo.— “....Ê ne tu jî ji sibehê heta êvarê qîza girik geniyê yî, ji vê dinyayê çi fam dikî ?. Keyê, çi dewra sermakirinê ye. Saroçkeya min li min e, saroçke, kor î, nabînî?”

Di lîstikê da aksesûareke din jî tizbî ye. Vebêjer aksesûara Dûko wiha dide dîyarkirin:

Vebêjer: “...Dûko li ser text çarmêrkî rûniştiye, tizbiya xwe li ba dike. Difîkire”

Di lîstikê da aksesûareke din jî bilûr e. Dema Dûko li mala xwe dikeve xeyalên qelenê qîza xwe, ji kurê xwe bilûrê dixwaze û bi dû ra jî di lîstikê da dengê bilûrê wek muzîk tê dayîn.

Dûko.— “Çaaar hezaaar û pênc sed... Çar hezar û pênc sed manat. Ez ê hezar manatî ji qîza xwe re tê kime xerc, wê sê hezar û pênc sed manat bimîne. Meco lawo, çi ka wê bilûra min bîne, min ji zû ve li bilûrê nexistiye!”

Di lîstikê da dema hemû cimaet li mala Dûko li ser sifrê rûdinên vebêjer jî teswîra sifreya wan dike û wiha dibêje:

Vebêjer: (Bûk diçe. Dertê texte rast dike. Nanê loş, goştê pêz ê qelandî, şeravê û kanyakê datîne ser texte.)

Bi vê şayesandina vebêjer em aksesûarên li ser sifreya cimaetê dikarin xeyal bikin û şerav, kanyak, goştê pez, nanê loş û sifreya texte wek aksesûar bihesibînin.

2.4.3. Monolog di Bêqelenê da

Di lîstikan da bikaranîna monologan ji bo guhdaran dibe derfetek ku dilê karakteran raste rast nas dikin. Monolog axaftinan karakteran ên xwe bi xwe ne. Nivîskarên lîstikan bi monologan dixwaze karakteran bi guhdaran bide nasîn. Di Bêqelenê da monolog tenê carekê û ji aliyê karakterê Dûko va tê kirin:

Dûko.— “Çaaar hezaaar û pênc sed... Çar hezar û pênc sed manat. Ez ê hezar manatî ji qîza xwe re tê kime xerc, wê sê hezar û pênc sed manat bimîne...”

Di vir da karakterê Dûko xwe bixwe diaxive û mabesta dilê xwe dide dîyarkirin. Bi vê axaftinê jî karakter wek perehez ji guhdaran ra tê nîşankirin.

2.4.4. Sehne di Bêqelenê da

2.4.4.1. Sehneya Yekem

Di lîstika Bêqelen da sehneya yekem ji dîyalogên Cefo, Şarê û Etem dest pê dike. Di vê sehneya yekem da Şarê û Cefo biryara xwestina qîzan didin. Pişt ra jî Cefo Etem dişîne li pey merivên xwe. Cefo pişt ra jî xênî lîtrê eraqê derdixe û diçelqîne, vedixwe û li benda rûsipîyên merivên xwe disekine. Beşa yekem ji çar deqeyan pêk tê. Piştî sehneya yekem nêzî deqeyekî muzîkeke bi miqamê dewatê lê dide û pişt ra jî lîstik derbasî sehneya duwem dibe.

2.4.4.2. Sehneya Duyem

Di sehneya duwem da merivên Cefo Êsiv û Têmûr tên mala Cefo. Koço jî firxûn dide sekinandin ji bo çûyînê. Di wê navberê da Cefo, Têmûr û Êsiv dikevin nava dîyalogan. Cefo jî ji ber eraqê serxoş dikeve. Cefo bi merivên xwe ra qet û bira xwe dikin yek. Pişt ra jî Cefo, Êsiv, Têmûr, Şarê, birazîya Cefo û Ezîz firxûnê diwar dibin ber bi gundê Dûkê rê dikevin. Cefo di rê da kilaman dibêje. Ev beşa duwem jî nêzî çar deqeyan berdewam dike û pişt ra derbasî sehneya sêyem dibe. Di navbera sehneyên duyem û sêyem da muzîk an jî fon nehatîye bikaranîn.

2.4.4.3. Sehneya Sêyem

Bingeha lîstika Bêqelen di vê sehneyê da tê avêtin. Cefo û bi tevî merivên xwe diçin mala Dûko û cimaet dikevin nava axaftin û laqirdîyan. Dodoyê cînarê mala Dûko jî tê mala Dûko û cimaet li ser Dodo dikevin û sohbetê dikin. Pişt ra Êsiv rûsipîtiya xwe dike û mabesta hatina mala Dûko ji wî ra dibêje. Pişt ra Êsiv û Dûko ji bo birîna qelen dikevin nava dîyalogan. Dûko qelenê qîza xwe zêde dibire lê Cimaet li hember Dûko derdikeve. Cefo jî ji ber serxoşîya xwe li hember merivên xwe derdikeve û Qelenê Dûko qebûl dike. Lê dîsa jî li ser xatirê Cimaetê Dûko qelen hinekî berjêr dike û qelenê Sernaz tê birîn. Piştî ku qelenê Sernazê tê birîn Cefo gustîlê dike tilîya Sernazê û Cimaet dest bi xwarin û şeraba eşqê dikin. Cefo dişîne li pey sazbandan û Ji cimaetê hin kes kilaman dibêjin. Talîyê jî mêvan ji mala Dûko radibin û ber bi gundê xwe diçin. Bi vî awayî sehneya sêyem kuta dibe û derbasî sehneya çarem dibe.

Ev sehne bi tevî hev nêzikî bîst û du deqeyan e. Di radoşanoya Bêqelen da beşa herî dirêj ev beş e. dîyalogên herî dirêj di vê beşê da pêk tên. Herwiha muzîk û klamên lîstikê herî zêde di vê sehneyê da tê bikaranîn.

2.4.4.4. Sehneya Çarem

Di sehneya çarem da Cefo sibetirê ji xewê hişyar dibe û serxoşîya wî derbaz dibe lê tiştek ji şeva derbazbûyî nayê bîra wî. Di vê sehneyê da da diyalog di navbera Şarê, Cefo û Ezîz da derbaz dibin û Cefo qelenê zehf dibîne û dixwaze gustîlê paş da hilde. Herçiqaş Şarê û Ezîz li hember Cefo derdikevin jî Cefo biryara xwe dide û ber bi gundê Dûko diçe û sehneya çarem xilas dibe.

Ev beş nêzîkî sê deqeyan dikişîne û foneke ji miqama Kurdî dikeve di navbera seyneyên çarem û pêncem.

2.4.4.5. Sehneya Pêncem

Sehneya pêncem beşa dawîya lîstikê ye. Ev beşa dawî jî ji şeş deqeyan pêk tê. Di vê sehneyê da Cefo diçe mala Dûko û gilîyên xwe ji Dûko ra dibêje. Dûko û Cefo pevdîçin û Cefo dixwaze gustîlê hilde. Dûko hêrs dibe û ji Besê gustîlê dixwaze da ku bide Cefo. Lê Sernaz gustîla xwe nade. Dûko ji ber nedana gustîlê li Sernazê dide. Cefo jî piştî Sernazê dike û li hember Dûko derdikeve. Talîya talî Sernaz derdikeve derveyî malê û Cefo Sernazê erebeyê siwar dike û Sernaz bêqelen hildide û diçe.

2.4.5. Muzîk Di Bêqelen da

Di nav teknîkên radyoşanoyan da yek jî muzîk bixwe ye. Bikaranîna muzîkan di radyoşanoyan da ji bo bûyer û karakteran palpişteke e. Wisa ku dema muzîk bi bûyeran ra tên bikaranîn guhdar zêdetir di bin bandora lîstikê da dimînin. Herwiha muzîk di radyoşanoyan da di navbera beşên radyoşanoyan da jî tê bikaranîn da ku guhdar ji lîstikê qut nebin. Di Bêqelenê da gelek muzîk hatine bikaranîn. Ji ber ku mijar lîstikê li ser qelenê ye, zêdetir muzîkên dewatan hatine bikaranîn. Lê ji bilî miqamên dewatê, dengbêjî, miqam û fonên Kurdî jî hatine bikaranîn. Muzîkên ku di Bêqelenê da hatine bikaranîn ev in:

-Tiringî (Xacoyê Xêlî)

Ev miqama dewatê di destpêka lîstikê da tê dayîn. Em dikarin bibêjin ku muzîka dest pê kirina lîstikê ev e. Piştî vê muzîkê vebêjer dest bi vegotina lîstikê dike.

-Yar Xuste (Miqamê Cimaeta Kurdan)

Ev miqama dewatê jî piştî kutabûna beşa yekem tê dayîn. Di navbera beşa yekem û beşa duwem da ev muzîk heye.

-Gozê (Elîyê Hemed)

Ev kilama dengbêjî di lîstikê da piştî xwestina Sernaz tê gotin. Lê ev stran ne ji alîyê karakteran hatîye gotin. Klama Elîyê Hemed wek ku karakter gotibe hatîye dayîn.

-Bavê Feqîr (Siloyê Evdal)

Ev kilam jî kilameke dengbêjîyê ye ku piştî klama Gozê ev kilam hatîye dayîn. Dîsa ev kilam jî wekî karakter di lîstikê da gotîye hatîye dayîn.

-Qeydê Çûyî û Mayîya (Miqamê Cimaeta Kurdan)

Ev miqama dewatê di lîstikê da weke ku sazband lê didin hatîye dayîn. Navê vê miqamê karakterê Cefo wek “Qeydê Çûyî û Mayîya” bi nav dike. Ji ber vê yekê jî me navê vê muzîkê li gor karakterê Cefo lê kir. Ji bilî vê miqamê sê miqamên din jî tên bikaranîn lê me xwe negihand sazband an jî navê wan.

-Serawa Pez (Ji bilûra Lezgîyê Ferî)

Ev miqama bilûrê ya ku Lezgîyê Ferî lê dide wekî ku karakterê Dûko lê dide tê dayîn.

-Nazlîyê (Xelîlê Evdile)

Ev miqam jî di navbera beşa çar û pêncem da tê bikaranîn. Ev muzîk ya dawî ye ku di Bêqelenê da tê bikaranîn. Piştî vê muzîkê êdî di lîstikê da muzîk nehatine dayîn.

2.4.6. Wext di Bêqelenê da

Weke hemû bernameyên radyoyê, di bernameyên radyoşanoyan da jî wextekî dîyarkirî heye. Divêtî ew e ku wextê radyoşanoyan ji seetekî zêdetir nebe. Di vir da armanc bergirtina acizîya guhdaran e. Lîstikên ku gelek dirêj hebin jî rojên wan tên dîyarkirin û weke rêzefilmên televîzyonan di radyoyê da tê dayîn. Lê Bêqelen ji alîyê wextê xwe va ji seetekî kêmtir e. Tevî hev çil û du deqe didome û yek carî di radyoyê da hatîye weşandin.

2.2. Destebirak

Radyoşanoyeke ku di ber pêlên Radyoya Rewanê hatîye dayîn jî Destebiraka Wezîrê Eşo ye. Ev radyoşano berî ku di radyoyê da were veçêkirin, di sala 1976an

da, di nav pirtûka bi navê “Mizgînî” da wek çîrok tê nivîsîn. Navê radyoşanoya Destebirak di pirtûkê da wek *Tîgran û Mehmûd* derbaz dibe. Lê ev çîrok pişt ra jî ji aliyê xebatkarên radyoyê ji nûva tê veçêkirin û bi navê Destebirak di radyoyê da wek radyoşano tê lîstin. Nivîskar Wezîrê Eşo mijara vê çîrokê li ser destebiraktîya Kurd û Ermenîyan honandîye. Bi taybetî nivîskar ji bûyera dîrokî ya sirgûnîya Ermenîyan sûd wergirtiye û xwestîye hevaltîya Kurd û Ermenîyan ya wê dewrê bi mijareke pevxistî nîşan bide. Ji aliyê cureya xwe va em dikarin radyoşanoya Destebirak wek Tragedya bihesibînin. Ji ber ku di vê radyoşanoyê da zêdetir bûyerên biêş hene û dawîya wê da kêf û xweşî tunene. Di nav dîyalogên lîstika destebirak da jî ji bilî mijarên grîng û bi keder dîyalogên henekî û jirêzê tunene. Herwiha di cureya Tragedyayê da zêdetir muzîkên xemgînîyê tê dayîn. Weke ku Şener (2015: 51) dibêje “di navbera navgînên ku hunera tragedyayê zengîntir dikin, piştî zimên a herî grîng, muzîk e” Muzîkên di radyoşanoya Destebirak da hatine bikaranîn jî zêdetir muzîkên klasîk û miqamên Kurdî ên dilşewat in.

2.3. Wezîrê Eşo

2.3.1. Jîyana Wî



Wezîrê Eşo Nivîskar, wêjezan, dîrokzan, rojnamevan û wergêrê Kurd ê bi nav û deng Wezîrê Eşoyê Hûtî Begê 1ê Mijdara sala 1934an li paytexta Gurcistanê; Tibilîsê hatiye cîhanê. Xwendin û perwerdeya xwe a destpêkê di dibistanên gundê xwe û ên li Tibilîsê de bi giranî bi zimanê Ermenî bi cî anîye. Sala 1958'an fakûltêta Zanîngeha Yêrîvanê a dîrokê xilas kiriye. Salên 1961-1963'an li Lenîngradê (niha Petersbûrg) di beşa Kurdzanîyê de a Înstîtûta Rojhilatzanîyê, bûye pisporê dîroka Kurdistanê. Salên 1964-1994'an wekî redaktor, serrerastkir û kontrolkirekî çapemenîya Ermenîstanê ê sereke, her wisa jî wekî redaktor û wergêrê beşa weşanên bi Kurdî a Radyoya Ermenîstanê li wî welatî; Yêrîvanê kar û barên xwe bi cî anîne. Ji sala 1995'an hetanî sala 2015an li Paytexta Belçîkayê; Brûkselê jîya û afîrand. Wezîrê Eşo di sala 2015an de çû li ser dîlovanîya xwe.

Gelek gotar û raporên wî ên bi taybetî li ser pirsên Kurdzanîyê û li ser Kurdzanan, li ser dîrok, wêje û çanda Kurdên Yekîtiya Sovyetê û Ermenîstanê bi şiklê lêkolînên zanyarî di berevok, rojname û kovarên Ermenîstanê, Rûsyayê,

welatên Ewropayê û Herêma Kurdistanê a Federal de bi Kurdî, Ermenî, Rûsî û Almanî hatine çapkirin.

Wezîrê Eşo, gelek berhemên nivîskarên Ermenî ên klasîk û hemdem ên pexşanê bi giranî ên li ser jîyana Kurdî û qehremanên Kurd bi wergerên xwe kirine mal û milkê xwendevanên Kurd. Bi wergera wî her wisa jî kurteromana nivîskarê Rûs ê mezin Arkadî Gayîdar a bi sernavê *Têmûr û Koma Wî* hatiye wergerandin ser Kurdî û di beşa pirtûka fêran a Zimanê Kurdî de hatiye bicîkirin.

Wezîrê Eşo, di radyoya Yêrîvanê de pir salan şêwirmendê derhênan bûye di warê amadekirina şanoyên radyoyê de ên li ser bingeha berhemên nivîskarên Kurd û Ermenî çêkirî. Du şanoyên radyoyê jî li ser bingeha serhatîyên wî bi xwe ên bi semavên *Tîgran û Mehmûd û Koçekê Derewîn* hatine amadekirin. Lê komedîya Wezîrê Eşo a bi sernavê *Remo, Şemo, Temo û Lawik* çend salan li ser dika Tîyatroya Elegezê a Kurdî a gelêrî bi serkeftin hatiye nîşandan” (Eşo, 2020: Beşa Jînenîgarîyê) Wezîrê Eşo di qada çêkirinên radyoşanoyan da xebatkar û herwiha lîstikvanekî çê bû jî. “Wezîrê Eşo tim him dilqên sereke dilîst, bhim jî dewsgirtîyê rejîsor bû” (Boyîk, 2012: 369)

2.3.2. Berhemên Wî

Berhemên wî ên sereke ev in; *Mizgînî*(1976), *Xebera Dostan*, *Dengbêj Kal Bûbû*(1983), *Xaçatûr Abovyan*, *Kurd, Êzdî (werger)*, *Pamp-Sîpan*(1986), *Dosyaya Barzanî Di Sandoqa Stalîn a Polayî De*, *Kurdzanê Mezin Qanatê Kurdo*, *Zargotinzanê Kurd ê Mezin*. Gelemperî pirtûkên Wezîrê Eşo ji tîpên kirîlî hatine latînîzekirin û di roja îroyîn da hatine weşandin. Lê wek mînak pirtûka wî ye bi navê *Mizgînî* hê jî ji bo tîpên latînî nehatiye latînîzekirin. Roman û novelên Wezîrê Eşo yê ku di weşanxaneyê Lîsê da çap bûne jî ev in:

Sîber, roman, 2016, Lîs

Qirme, roman, 2016, Lîs

Itibarî, novel, 2016, Lîs

Hosta Hovhannes, novel, 2016, Lîs

Tosinê Êşan, roman, 2016, Lîs

Kilam û Pênûs, lêkolîn, 2018, Lîs

2.4.Hilbijartina Mijarê

Bi awayekî giştî nivîskar çîroka xwe li ser surgûnbûna malbateke Ermenî û li ser malbateke Kurd nivîsîye ku ev herdu malbat destebirakê hevdu ne. Bi dû ra ev çîrok ji alîyê xebatkarên radyoyê hatîye veçêkirin û wek radyoşano hatîye weşandin. Lîstik bi vegotina vebêjer dest pê dibe û pişt ra diyalogên karateran destpêdibin. Radyoşanoya Destebirak dema destpêdike em ji diyalogan fêm dikin ku hin bûyer berî lîstikê qewimîne. Wisa ku li gor diyalogan em fêm dikin leşker hatine gundê Ermenîyan, gund talan kirine, dest danîne li ser hemû hebûma gundîyan û karakterê bi navê Avêdîs jî birine olamê.

Lîstik bi diyalogên Zarûhî û Tîgran destpêdike. Li gor lîstikê Tîgran zarokekî sêzdeh salî ye. Bavê wî Avêdîs jî alîyê leşkeran hatîye birin. Zarûhî di xênî da çend cil zarên xwe werkirîye û nava wan da rûniştîye. kurê wê Tîgran hişyar e. Zarûhî dixwaze Tîgran razê lê xewa Tîgran naye. Tîgran dest bi gazinda dike û ji bo berxa xwe ye leşkeran birî dikewgire. Herçîqas Zarûhî dixwaze Tîgran hiş bibe jî Tîgran dest bi gazindên xwe bernade. Herî dawî Tîgran mala Evdile tîne bîra Zarûhîyê. Li gor çîrokê Evdileyê Kurd û Avêdîsê Ermenî du destebirakê hev in û herdem hevdu ra alîkar bûne. Zarûhî ji tinebûn û ji birçîbûna zarokan Tîgran dişîne Dêrsimê mala Evdile wekî hinek arvan bîne. Tîgran bi oxirkirina dê ra dikeve rê û berê xwe dide mala Evdile. Tîgran berêvarê di rê da çend sîyaran dibîne û dixwaze xwe ji wan veşêre lê lingê wî dikeve kevirekî, piştosan li erdê dikeve û ji ser xwe va diçe. Dema Tîgran ser xwe va tê xwîna serê xwe dibîne û gelek ditirse. Piştî tirsîna Tîgran jî êdî qerepere tên ber çavê Tîgran û kevirekî dûr wek gurekî dibîne. Tîgran demeke dirêj ji tirsê cihê xwe nalipite lê dema ferq dike ku ew qerepere ne gur e, hêzê dide xwe û bêhemdî ber bi gundê mala Evdile diçe. Tîgran dema digihîje mala Evdile bêhemdî li derî dixê û dîsa ji ser xwe va diçe. Mehmûdê kurê Evdile Tîgran hildide malê û Evdile tevî malbata xwe li ser Tîgran kom dibin û dixwazin hînbibin wekî çi hatîye serê wî. Piştî gelek kirinên Evdile û malbata wî Tîgran hinekî ser xwe va tê û bi darê zorê mijarê ji Evdile ra rave dike. Lê Tîgran gelekî nexweş dikeve û heya destê şeveqê ber pesna diaxive. Sibetirê, berêvarê Evdile, Mehmûd û du xortên cînanan barê du hespan xurek amade dikin da ku herin hawarîya Zarûhîyê. Evdile bi tevî xortan çek û qemeyên xwe jî hildidin û bi tevî barê hespa bi rê dikevin. Di rê da

Evdile ji xortan ra rave dike wekî çetnaya wana pireya gundê mala Avêdîs e ku ew pire ji alîyê leşkeran va hatîye girtin. Dema Evdile û xort xwe digihînin hinda pireyê leşker pêşbirî didin wan. Herçiqas Evdile dixwaze leşkeran bixapîne jî leşker naxapin û dixwazin dest daynin ser barê hespan. Piştî hin pevçûnan şer derdikeve û Evdile bi tevî xortan leşkeran bi qemeyan dikuvin. Lê leşkerek bi qemeya xwe Mehmûd birîndar dike. Evdile kurê xwe û xortan li ser pirê dihêle û bi tenê bi bayê bezê diçe barê hespan datîne li cem Zarûhîyê. Evdile dîsa vedigere cem xortan û ew dîsa berê xwe didin gund. Dema Evdile û xort xwe digihînin nêzîkayîya gund dengê şîn û girîyê ji dûr va tê bihîstin. Dema Mehmûd fêr dike ku Tîgran mirîye ji Evdile daxwazê dike wekî birîndarbûna wî nebêje kesî heya şîna Tîgran safî bibe. Evdile kurê xwe dişîne mala birê xwe û gazî hekîma dike wekî birîna wî pak bikin. Evdile bixwe jî diçe nav şîna Tîgran û bi tevî mêrên gund biryarê hildide wekî Tîgran li gundê wan were heqkirin. Piştî ku Tîgran tê heqkirin û rojek ser da derbaz dibe birîna Mehmûd xedartir dibe û ew jî diçe rehmetê. Mexberê Mehmûd jî li rex mexberê Tîgran tê çêkirin. Li ser vê bûyerê ra êpêce wext derbaz dibe. Rojekî Avêdîs bi tevî çend hevalên xwe ji destê Romê xilas dibin û tîn daxilî nava gundê Evdile dibin. Evdile û Avêdîs li mal rûdinên û dikevin pîrs û pîrsîyara. Weke ku Avêdîs dibêje; Ew vegerîyaye gund lê ne jin dîtîye û ne jî zar. Hemû neferên wî hatine sirgunkirin û ew bixwe jî nizane kuderê da birine. Li ser vê gotina Avêdîs Evdile dikeve nava gilîyan û bûyera Tîgran ji destebirakê xwe ra rave dike. Piştî demekê herdu destebirak li ser mexberê Tîgran disekin. Avêdîs mexberekî nû li rex mexberê Tîgran ferq dike û ji Evdile dipirse. Evdile jî Avêdîs ra dibêje wekî ew mexber jî yê Mehmûd e. Li ser vê gotina Evdile ra herdu destebirak hevdu hemêz dikin û birînen xwe derman dikin.

2.4.1.Pevxistin

2.4.1.1.Beşa Destpêkê

Di radyoşanoya destebirakê da berê pêşî vebêjer teswîra demsalê dike û pişt ra jî rasterast mekana ku karakterê Zarûhî û zarokên xwe lê dişayesîne. Berî ku vebêjer dest bi şayesandinên xwe bike miqameke klasîk di destpêkê da tê dayîn û bi du ra ev gotinên vebêjer tê bihîstin:

“Ewlê bihara qeza Çarsincaqêye sar bû. Belekîyêd berfê li rasta tek tûka mabû, lê singê çîya teze reşayî dikete erdê. Xanîkî binerdî tarîda ber tendûra karto

hemankî qeretîyê çend merivê paldayî xane dikir. Zarûhîyê çend cil zara werkiribûn û bi xwe jî orta wanda melûl rûniştibû.. Zarûhî wê şevêqê teva zefîr ji hişyarbûna zara ditirsîya. Şikevê da tenê du girik gaût mabûn.”

Di vê vegotina vebêjer guhdar fêrî dikin ku halekî kesîvîyê heye û karaktera Zarûhî bêçare di nava zarên xwe da sekinîye. Piştî ra jî diyalogên karakteran destpêdibin û hêdî hêdî çîroka berî lîstikê ji alîyê karakteran va tê diyarkirin.

....

Zarûhî.- *“Were lao, ez te bişînim Dêrsimê, mala kirîvê meyî Evdile. Evdile û jinêva qe navên na. Wekî arvanê wanî rojê be jî wê me ra bişînin. Ew û bavê te mîna birê temê dê û bavê ne, qe na-no nakin. Tîgran birê diya xwe, îcar tu dizanî tê çi bêjî?”*

Tîgran.- *Çawa nizamim?*

Zarûhî.- *“Lao, bê Romê eva serê sê mehane bavê min birye olamê, qe nizamim çi serî qewimî. Bê hal û hewalê me û eskerê romê jî bû ev. Bê eskerê Romê mala me, hebûna me, çi hebû tunebû, talan kir-bir. Bê gundê me xelayêdane. Bêje birê Evdile, bê diya min digot bira hema arvanê pêlekê dest me bigre, heta birakê wî vedigere..”*

Bi van diyalogên ewilîn him mijara lîstikê xwe dide der û him jî beşa dawîyê ver bi kutabûnê va diçe. Em bi awayekî giştî dikarin bibêjin ku di beşa destpêkê da Zarûhî û Tîgran li ser meseleya kirinên Romê diaxivin û Tîgran mala Evdile tîne bîra dêya xwe. Dê jî ji tunebûnê Tîgran dişîne Dêrsimê ji bo alîkarîyê.

2.4.1.2.Beşa Pevçûyînê

Beşa pevçûyînê piştî beşa destpêkê tê û bûyer hêdî hêdî germ dibin. Di radyoşanoya Destebirak da beşa pevçûyînê ji rêketina Tîgran destpê dibe. Tîgran piştî ku ji dêya xwe xatir dixwaze birê dikeve. Lê şert û mercên hewayê bi tevî tirsê Tîgran nahêle Tîgran bi silametî bigihêje mala Evdile. Dengê bayê ji Tîgran ra weke dengê bavê wî tê û Tîgran dikeve nava monologan. Ev rewşa Tîgrane psîkolojîk ji alîyê vebêjer va wiha tê vegotin:

(Bakî qalîn dihat. Tîgran diçû. Nava gujîn û vizîna bayê da teyê bigota dengê meriva lê tesele dibe û ew deng ber guhê Tîgran bû dengê bavê. Te qey tirê Avêdîs Tîgran ra xever dide.)

Tîgran piştî lezekî çend sîyar dibîne û dixwaze xwe ji wan veşêre lê lingê wî dikeve kevir û li ser piştê dikeve erdê. Tîgran dema ser hişê xwe va jî tê qerepereyan dibîne û kevir dişibîne gurî û êpêce wext ji cîyê xwe nalipite. Lê piştî ku fêhm dike qerepereya ku wî dît kevir e dîsa rêya xwe berdewam dike heya digihîje mala Evdile. Tîgran di vê rêwîtiya xwe da gelekî nexweş dikeve.

Em dikarin wisa bipeyîtin ku beşa pevçûyîne ji rêketina Tîgran destpêdike û heya rêketina Evdile, Mehmûd û du xortên cînar ji bo alîkarîya mala Avêdîs berdewam dike. Di vê beşê da pîrsgirêk hêdî hêdî derdikevin û bûyer germ dibin.

2.4.1.3.Beşa Tevlihevîyê

Di beşên tevlihevîyê da pîrsgirêk zêdetir dibin û kelecana lîstikê digihîje radeyeke bilind. Di Destebirak da beşa tevlihevîyê ji biryara alîkirina Zarûhîyê destpê dike. Evdile li ser rewşa malbata Avêdîs biryara alîkarîyê hildide û barê du hespan tije dike.

...

Evdile.- *Tîgrancan tu qet netirse. Nizanm sive safî nebe. Ez ê xwe mala we ra bigihînim.*

Gulperî.- *Erê erê, qurbana te û kura bim, gune ne.*

Evdile.- *Dayê, lê xwe ez mala Avêdîs wî halî da nahêlim. Çira dinya ber bayê samê çûye!*

...

Di vê beşê da dema Evdile û xort rêdikevin çek û qemeyên xwe jî hildidin li cem xwe. Ev yeka jî di lîstikê da vê yekê îşaret dike kû şer û pevçûnên di lîstikê da derbikeve:

Vebêjer.-*(Mala Evdile barê du hespa ar, den, penêr, toraq û xwarinên mayîn dagirtibûn. Kurê Evdile Mehmûd û du xortêd cînarê wan tivdarekê xwe kiribûn wekî Evdile ra herin gundê Avêdîs. Teve bi çek û sîlah bûn. Tivingê wane stû da bûn, qemê wane ber da bûn....)*

Piştî ku Evdile û xort digihîjin li ser pireya gundê mala Avêdîs leşker wan dibînin û bi wan ra dikevin nîqaşê. Piştî hinek dîyalogan leşker dixwazin dest daynin ser hes û barên li ser wan:

Pîkêt.- *Wekî hûne kesîv in barê hana çi ne? Îda xeverdan ne lazim e, hespa cî da bihêlin hûn ji ku da hatine wê da jî herin.*

Evdile.- *Çawa hespa bihêlin?*

Pîkêt.- *Dive tuyî ker î? Ez divêm hespa barê wan va bihêlin herin.*

Lawikê Cînar.- *ew yek tucar nabe.*

Evdile.- *Axir tiştê isa dibe camêr?*

Pîkêt.- *De wê da bicehimin, wekî merivtayê fem nakin em ê niha zorê we bistînin!*

Piştî van pevçûyînan şer di navbera leşker û Evdile û xortan derdikeve. Di vî şerî da hemû leşker tîk kuştinê lê Mehmûd bi derba qemeya leşkerekî birîndar dikeve. Evdile xortan dihele, diçe alîkarîyê dide mala Avêdîs û dîsa vedigere li cem xortan.

Di vê beşê da şer û pevçûn derdikevin holê û hemû pîrsgirêk çareserîyekê divên. Lê ji ber ku lîstika Destebirak li ser hîmê tragedyayê da hatîye nivîsîn, pîrsgirêk çareser nabin. Tenê tiştê ku tê çareserkirin alîkarkirina Zarûhîyê ye. Beşa tevlihevîyê bi vî teherî di vir da kuta dibe.

2.4.1.4.Beşa Lûtkeyê

Di lîstikan da beşên lûtkeyê sînorê herî dawî yê hestane. Wisa ku di vê beşê da hemû hîsên guhdaran dipîleya herî jor da ye. Di Destebirakê da jî beşa lûtkeyê ji vegerîna Evdile û xortan dest pê dike û bi mirina Mehmûd kuta dibe. Wisa ku Evdile, Mehmûdê birîndar û xortên cînaran vedigerin gund. Dema xwe rênizkayî gund dikan dengê girîyê wan tasele dibe. Ev yek ji alîyê vebêjer wiha tê ravekirin:

Vebêjer.- *(Şeveqa sibê ra lawika xwe gund ra gihandin. Çaxê wana ra rênêzkayê mala Evdile kirin dengê şîn û girîyê bihîstin.)*

Evdile.- *Eva çi ye? Dêmek tişteke serê Tîgran Qewimîye?*

Mehmûd.- *Min isa jî zanibû. Bavo, Ez î pak im, nevî nevî dîya min ra divêjî?*

Evdile.- *Çima?*

Mehmûd.- *Eger Tîgran tiştê pê hatibe tu ya min jî bêjî qalmeqalmeke zêde yê rabe. Bira her tişt xilas be paşê. Ez hêvî ji te dikim bavo.*

Evdile.- *De bira gilîyê te be lao. Lê hema lawika ra here mala apê xwe bira hekîm bînin ser te.*

Bi vî teherî Tîgran di vê beşê da berxwe nade û ji ber nexweşîyê dimire. Ji bo Meyan (dîya Mehmûd) jî berxwe nekeve birîndarbûna Mehmûd ji wê ra nayê gotin.

Bi mirina Tîgran ra hemû cimaet li hev kom dibin û biryarê didin wekî Tîgran li gund heq bikin. Piştî ku Tîgran tê heq kirin du roj şûnda Mehmûd jî ji ber birîna xwe ye xedar can dide. Ev yeka wiha tê ravekirin:

Vebêjer.-*(Pey heqkirina Tîgran ra du roj derbaz bûn. Berbangeke sivê zîwîn ketê gund, Mehmûd can dabû.)*

Bi vî awayî Mehmûd jî can dide û mexberê wî li cem yê Tîgran çêdikin. Ev beş bi mirina herdu xortan jî bo guhdaran digihîje lûtkeya herî bilind. Ji alîyê hestîyarîyê va beşa herî bi bandor ev beş e.

2.4.1.5. Beşa Dawî

Di lîstikên radyoşanoyan da beşa dawî kutabûna hemû bûyeran e. Ji ber ku Destebirak lîstikeke xembar e dawîya wê bi başî xilas nabe. Lê nivîskar di beşa dawîyê da wê peyamê dide wekî destebiraktîya Kurd û Ermenîyan çawa xurt e. Piştî ku Mehmûd jî dimire pêlek li ser van bûyeran ra derbaz dibe. Rojekî Avêdîs û çend hevalên xwe va ji destê Romê direvin û tîn daxilî nava gundê Evdile. Evdile û Avêdîs dikevin nava pirs û pirsîyan. Evdile hemû bûyerên ku qewimîne ji Avêdîs ra şirove dike lê tenê behsa mirina Mehmûd nake. Hedu destebirak radibin diçin ser mexberê Tîgran. Avêdîs mexberê nû li rex mexberê Tîgran dibîne û ji Evdile dipirse. Evdile jê ra dibêje wekî ew mexber jî ya Mehmûd e. Diyalogên dawîyê ên lîstikê wiha derbaz dibin:

Vebêjer.-*(Lezekî şûn da Avêdîs û Evdile ser mezelê Tîgran ra sekinîbûn. Herdu jî çila bûbûn, kesî ji wan dey nedikir. Avêdîs mezelekî teze rex mezelê Tîgran texmîn kir û vegerîya ser Evdile.)*

Avêdîs.-*Rehme lêbe, Evdile, eva mexberê rex yê Têgran yê kê ye?*

Evdile.-*Eva, eva mezelê Mehmûdê te ye...*

Vebêjer.-*(Ewana êpêce waxt ker û lal sekinîbûn. Paşê li hev nihêrîn û bê xeberdan hev hemêz kirin. Wê demê nava wê hemêzê da tey bigota birîne dilê Avêdîs û Evdile kew digirtin.)*

2.4.2. Aheng

Nivîskarê radyoşanoyan divê ahengekî di nava beşan da çê bikin û divê beşên lîstikê ji hevdu qut nebe. Di Destebirak da tevî hev çar beş hene. Em beşên lîstika Destebirak zêdetir li gor bûyeran ji hevdu veqetînin. Herwiha di Di radyoşanoyan da beş bi muzîkan jî ji hevdu tê veqetandin lê di radyoşanoya Destebirak da fonên dirêj

gelek hatine bikaranîn. Herwiha li pişt diyalogan jî lêdana fonan gelek caran berdewam dibe.

Nivîskar Wezîrê Eşo beşên lîstîkê di ahengeke kîp bi hevdu va zeliqandîye. Di lîstîkê da zêdehî an jî bûyerên bê eleqe tune. Em ê di bin sernava sehneyên Destebirak da zêdetir li ser beşên lîstîkê bisekinin û wan bidin diyarîkirin.

2.4.2.1. Bîcîhkirina Karakteran

Di nivîsandina radyoşanoyan da karakterên ku tên afirandin ne dûrî bûyeran û mijara lîstîkê ne. Nivîskar li gor mijara lîstîkê karakterên xwe diafirîne û wan dide lîstin. Karakterên ku di lîstîkê da derbaz dibin ne heman fikrî û ne jî heman hestî di hundirê xwe da dihevin. Ji bo beşên lîstîkê divê karakter jî cur bi cur bin û wisa jî çerxa lîstîkê rind vegere. Nivîskar an jî veçêkerên radyoşanoyan dema karakterên xwe diafirînin gelemperî wan sê beşan da kategorîze dikin ku ew jî Karakterên Sereke, Karakterên dijber û karakterên alîkar in. Di lîstîka Destebirak da tevî hev çar deh karakter cî digirin. Em dikarin karakteran wiha bisenifînin:

2.4.2.1.1. Karakterên Sereke

Di radyoşanoya Destebirak da karakterên sereke çar kes in.

Evdile: Ev karakter piştî beşa yekem dikeve nava lîstîkê û heya dawîya lîstîkê li ser bûyeran xwedî bandor e. Evdile di lîstîkê da karakterekî gelek baş tê qebûlîkirin. Li gor çîrokê Evdile destebirakê Avêdîs e û ji bo destebiraktîya xwe dikare her tiştî bike. Herwiha bûyer gelemperî li dor Evdile dizivire û di lîstîkê da qîrar hemû li ser gotinên Evdile ne.

Tîgran: Tîgran kurê Zarûhî û Avêdîs e û hêna zarokekî sêzdeh salî ye. Lîstîk bi diyalogên wî û dê va destpêdikin. Di lîstîkê da barê herî giran dikeve li ser piştî karakterê Tîgran. Herçend nivîskar gotin, derd û kirinên karakterê Tîgran di çarçoveya zaroktîyê da nivîsîbe jî barê herî giran jî daye li ser piştî wî ku wekî ew ji bo hewariyê here mala Evdile.

Mehmûd: Kurê Evdile ye. Di lîstîkê da wek xortekî fedakar û bêtirs tê teswîrkirin. Ev karakter tenê di beşa sêyam ya lîstîkê da dileyîze lê yek ji wan karakteran e ku bandor li ser lîstîkê hîştîye.

Zarûhî: Dîya Tîgran e. Ev karakter tenê di beşa yekem da dileyîze. Lê di hemû beşan da navê wê derbaz dibe. Lîstik bi dîyalogên wê û Tîgran destpêdike.

2.4.2.1.2.Karakterên Dijber

Di radyoşanoyan da divê karakterên dijberî karakterên sereke û alîkar jî hebin ku bûyer zêde bibin û geşedanê pêk bînin. Lê di radyoşanoya Destebirak da zêdetirî hemû karakter di heman fikrî da ne. Bûyer zêdetir li ser pirsgerêka talankirina Ermenîyan e. Ji ber vê yekê em di lîstikê da tenê Pîkêtan (leşker) dibînin.

Pîkê: Leşkerên dewletê ne. Zêde girêdayî dewleta xwe ne û li hember Ermenî û Kurdan in. Ji ber vê yekê jî di lîstikê da naxwazin wekî Evdile û xort li ser pirê derbaz bibin. Em dikarin pîkêtan di lîstikê da wek berdevkê dewletê bihesibînin.

2.4.2.1.3.Karakterên Alîkar

Di radyoşanoya Destebirak da zêdetir karakterên alîkar hatine bikaranîn. Hin karakterên alîkar jî navê wan di lîstikê da nehatine bikaranîn. Her tenê dîyalogên wan hatine dayîn.

Gulperî: Dîya Evdile ye. Jineke dilşewat e. Li ser Tîgran gelek xemgîn dibe û dikewgire. Tenê di beşa duyem da dileyîze.

Meyan: Jina Evdile ye. Jineke dilşewat e. Li ser Tîgran gelek xemgîn dibe û dikewgire. Tenê di beşa duyê da dileyîze.

Avêdîs: Bavê Tîgran e. Ji destpêka lîstikê heya dawîya lîstikê navê wî derbaz dibe lê di lîstikê da dîyalogên wî gelekî kêr in. Tenê Dema Tîgran dengê bayê dişibîne dengê bavê xwe û di beşa dawîyê da dîyalogên wî hene. Ji ber vê yekê jî bandora karakterê Avêdîs li ser bûyeran gelekî kêr e û ev yek jî wî dike karakterekî alîkar.

Di Destebirakê de karakterên wek hevalên Mehmûd û cînarên Evdile jî dikevin nala dîyalogan lê dîyalogên wan kêr in. Herwiha bandora wan jî li ser lîstikê gelek kêr e. Ji ber vê yekê jî em dikarin karakterên bînav jî di nava karakterên alîkar da bicîh bikin.

2.4.3. Kadroya Lîstikvanan

Di radyoşanoya Destebirak da em li rastî çardeh dengên cuda tên. Weke ku me li jor jî tesbîta wê kiribû di lîstikê da tevî hev çardeh karakter hene. Bi vî teherî em dikarin bibêjin ku di dengkirina Destebirakê da dengên wek hev tunene. Ev yek

jî xurtbûna lîstikê dide nîşankirin. Herwiha kadroyên lîstikvanan li gor bertek û hîsên karakteran dengê xwe edilandine û wisa di dilqê karakteran da lîstine.

Ji ber şert û mercên radyoxaneyê Radyoya Rewanê me xwe bi temamî negihande kadroya lîstikvanan. Weke ku me ji dengên wan peyîtandin em dikarin kadroya Destebirak wiha bidin:

Keremê Seyad: Di lîstika Destebirak da di dilqê Tîgran da dileyîze.

Wezîrê Eşo: Nivîskarê lîstika Destebirakê di lîstika xwe da jî di dilqê karakterê Evdile da dileyîze.

Porsora Serdar: Di lîstikê da di dilqê karaktera Zarûhîyê da dileyîze.

Egîdê Ebasî: Di lîstikê da di dilqê Pîkê da dileyîze û pîkêtan deng dike.

Ji bilî van kesan me xwe negihand kadroyên din.

2.4.4. Biwêj û Gotinên Pêşîyan di Destebirak da

2.4.4.1. Gotinên Pêşîyan

Di Destebirak da ev tenê gotineke pêşîyan hatîye bikaranîn:

Evdile.- “Bira, meseleke cimetê divê: *şîna tevê dinê şayî ye.*”

2.4.4.2. Biwêj

Di lîstika Destebirak da gelek diyalog bi biwêjan hatine xurtkirin:

....

Zarûhî.- “.... Ew û bavê te mîna birê *temê dê û bavê ne, qe na-no nakin.* Tîgran birê dîya xwe, îcar tu dizanî tê çi bêjî?” (Temê dê û bavê bûyîn, na-no nekirin.)

....

Zarûhî.- “Tîgran, çara min, rêva miqat-miqatî xwebî, nevî nevî li merivan disekinî, cîya egle divî..Tu ku eskerê romê dûr va divînî, riya xwe biguhêze, *xwe ta de,* ez çi zanim..”(xwe dayîn)

...

Zarûhî.- “Te ra oxir be lao, *kevir ber pê te penêr be*”.

...

Vebêjer.- “*Berf dibare, bakî bozixî sar tê, tarî jî îdî erdê hildiçine.*”(Erd hilçînîn)

..

Tîgran.- “Erê, wax dayê wax bavo ez ê li vira *şeveder bimînim.* Na! Gerek ez herim, esse herim.” (Şeveder mayîn)

...

Lawikê Cînar.- “Apê Evdile eger pîkêt me *bibine xeta*, wî çaxî wê ça be?” (xwe xeta kirin)

...

Evdile.- “.... Hûn ber Mehmûd bin ez ê *bayê bezê herim û vegerim.*”(bayê bezê çûyîn)

...

Evdile.- “.....min gelekî *ro kir û pîva.*” (ro kirin û pîvandin)

...

Kalemêr.-“Bavo yek nîne, dudu nîne, eva êdî çendik-çend care mêrê me *destê Romê diçin.*”(dest çûyîn)

..

Evdile.-“.....lê hema tîfalî rêva gelekî serma kiribû. *Tehl ket.*” (tehl ketin)

2.5.Taybetîyên Radyoşanoya Destebirakê

Weke radyoşanoyên hatine peyitandin, di Destebirak da jî gelek teknîk hatine bikaranîn. Ev teknîkên ku hatine bikaranîn bandora lîstikê ya li ser guhdaran xurttir dike. Ji ber ku Destebirak bi terza tragedyayê da ye loma muzîkên ku hatine bikaranîn jî yên dilşewat in.

2.5.1. Efekt di Destebirakê da

-Efekta Dengê Bayê

Efekta yekem ku di Destebirak da hatîye bikaranîn dengê bayê ye. Dema Tîgran rêdikeve û diçe mala Evdile di rê da gelek ba tê. Berî pêşî vebêjer di derheq rewşa Tîgran da wiha dibêje:

Vebêjer.-(*Bakî qalîn dihat. Tîgran diçû. Nava gujîn û vizîna bayê da teyê bigota meriva lê tesele dibe û ew deng ber guhê Tîgran bû dengê bavê. Te qey tirê Avêdîs Tîgran ra xever dide.*)

Pîştî vegotina vebêjer di lîstikê da efekta dengê bayê tê bikaranîn.

Efekta dengê bayê pîştî dîyalogên Tîgran û Avêdîsê xeyalî dîsa tê dayîn. Ev efekta bayê di rêwîtiya Tîgran da gelek caran tê bikaranîn.

-Efekta olandayînê

Tîgran dema rê da diçe dengê bayê dişibîne dengê bavê xwe û pê ra xeberdide. Di dengê axaftina Avêdîs da jî efekta olanê hatîye bikaranîn. Bi vê efektê hatîye xwestin ku guhdar bizanibin ev deng ne yê Avêdîs e, wisa jî tenê

xeyalkirineke Tîgran e. Herwiha efekta olanê du cîhan jî hatîye bikaranîn. Dema Tîgran xwe mala Evdile ra digihîne Mehmûd derî vedike. Evdile jî ji Mehmûd dipirse wekî bizanibe kî li derî dide. Di pîrskirina Evdile da deng olan dide. Ev efekt di wê armancê da ye ku guhdar bizanibin Evdile ji dûr va gazî dike. Bi vê armancê dîsa efekta olanê ji bo pîkêtên ser pirê jî hatîye bikaranîn.

-Efekta Tirsê

Dema Tîgran rêya xwe berdewam dike di rê da siwaran dibîne. Bi dîtina siwaran ra Tîgran xwe bi xwe diaxive û efekta tirsê bi tevî dengê bayê bi axaftina wî ra tê dayîn.

Tîgran.-*‘Peyyy ev kîne, sîyar in? erê sîyar in. dîvek eve eskerê romê ye, dîveke ez dîtîm..’*

(Efekta tirsê û dengê bayê)

-Efekta Dengê Derî

Di lîstikê da efekteke ku hatîye bikaranîn jî dengê lêdana derî ye. Dema Tîgran xwe bi mala Evdile ra digihîne efekta dengê derî tê dayîn. Bi vê efektê jî guhdar fêhmî dikin wekî Tîgran gihîştîye ber derê mala Evdile.

2.5.2.Dîyalog di Destebirak da

Radyoşanoya Destebirak ji alîyê dîyalogan va xurt e. Wisa ku him dîyalog ji alîyê lîstikvanên cuda hatine kirin û him jî hîs û tevgerên karakteran di dîyalogan da serkeftî hatîye dayîn. Jê cuda em ji dîyalogên lîstika Destebirak mekana lîstikê, demên lîstikê û aksesûarên karakteran dihisin. Herwiha vebêjerê lîstikê jî ji bo destebiraktîya Evdile û Avêdîs baş ji guhdaran ra vebêje gelek caran şîrovedike:

Vebêjer.- *“...Hemîn ya mala Avêtîs û Evdile başqe bû: Her sal Avêtîs hedayîkî giran mala Evdile ra dibir, êmîşê qutîya inka Nenê jî, Avêdîs qulçekî têra da cî dikir. Gulperîya kulfeta Evdile xên ji kondelê Avêdîs, tu kondele pê nedikirin. Dayka Avêtîse rehetî Maro xênji penêr-toraqa destê Nenê ya tu kesî nedixar. Çaxê Evdile jî diçû mala Avêdîs destevala nediçû. Hemîn her sal, berxa mala wîye serberanî, nêr bûya, mê bûya, pêşkêşa Tîgran bû.”*

- **Dîyalogên ku Mekanê dîyar dikin**

Taybetîyeke dîyalogan jî ew e ku di lîstikê da mekanê dîyar dikin. Di destebirakê da serê pêşî vebêjer ji bo guhdaran mekanê wiha dide dîyarkirin:

Vebêjer.- “...*Xanîkî binerdî tarîda ber tendûra karto hemankî qeretîyê çend merivê paldayî xane dikir.*)

Bi van gotinên ewil em fêhm dikin ku di serî da mekan xanîyek e. Di tê da jî Zarûhî tevî kulfetên xwe hene. Piştî şayesandina vebêjer dîyalogên Zarûhî û Tîgran dest pê dikin. Di nav dîyalogên Zarûhî û Tîgran da jî em fêhm dikin ku mekana Tîgran û Zarûhî lê ne gundekî Ermenîyan e:

Zarûhî.- “*Lao, bê Romê eva serê sê mehane bavê min birye olamê, qe nizamim çi serî qewimî. Bê hal û hewalê me û eskerê romê jî bû ev. Bê eskerê Romê mala me, hebûna me, çi hebû tunebû, talan kir-bir. Bê gundê me xelayêdane. Bêje birê Evdile, bê dîya min digot bira hema arvanê pêlekê dest me bigre, heta birakê wî vedigere..*”

Piştî ku Tîgran rê dikeve jî di lîstikê da mekan diguhere. Tîgran jî bo ku here Dêrsimê dikeve rêya wê û diçe. Vê carê em têdigihîjin ku mekana lîstikê dibe rêya Dêrsimê. Vebêjerê lîstikê di derheq mekanê da wiha şirove dike:

Vebêjer: (*Barana berbangêye hûr niha gur kiribû. Tîgran dilezand. Rê û dirbê Dêrsimê ewî mîna pênc pêçîyê xwe zanibûn. Ewî hê lap zaro bû, bavê ew xwe ra dibire Dêrsimê, mala Evdilê destebirakê xwe....*).

Piştî gelek xireciran Tîgran xwe digihîne mala Evdile. Di lîstikê da Dêrsim ne Dêrsima niha ye. Di lîstikê da Dêrsim navê gundekî ye. Di dawîya Lîstikê da em bi gotinên vebêjer têdigihîjin ku Dêrsim navê gundekî ye:

Vebêjer.-(*Pêlek derbaz bibû. Avêdîs ji destê Romê revîbû hatibû gundê xwe. Berêvarekî Avêdîs û çend hevalên xwe va daxilî nava gundê Evdile bûn. Evdile û Avêdîs odê da rûniştibûn û pîrs pîrsîyar ji hev dikirin.*)

Dema Tîgran digihîje gundê Evdile mekana lîstikê jî dibe mala Evdile. Di lîstikê da jîna Evdile mekanê wiha dide dîyarkirin:

Meyan.-“*Tîgran, kurê min, tu mala me da nî, mala apê xwe yî Evdile da.*”

Di lîstikê da careke din jî mekan diguhere û vê carê bûyer li ser pira bintara gundê Avêdîs da diqewimin. Berî ku karakterê Evdile û xortên li cem wî alîkarî bibin gundê Avêdîs, karakterê Evdile di derheq pireya ku bûyerê lê biqewimin wiha diêje:

Evdile.- *“Gelê lawika, çetnaya me cî ke. Tenê pira ye. Divên romê ser pira binatara gundê Avêdîs pîkê dane sekinandinê. Însan e, emik rastî wan hatin, nevî nevî hûn tevî gilîya divin. Eger gilî ji gilîya derbz bû, wî çaxî êdî ez we divînim.”*

Em bi van dîyalogan jî têdigihîjin ku karakterên Evdile û xortên li cem wî xwe gihandine nêzikayîya pirê:

Mehmûd.- *Wane ha, li wirin.*

Evdile.- *Min çawa we ra got.*

Pîkê.- *Hûn kî ne, bisekinin.*

Evdile.- *Gelî lawika bikin em xwe pirê ra bigihînin.*

Pîştî ku li ser pirş bûyer diqewimin û Evdile diçe alîkarîyê dide Zarûhîyê dîsa mekan dibe mala Evdile. Ev yeka jî ji alîyê vebêjer wiha tê ravekirin:

Vebêjer.- *(Gundî tev hilşîyabûn mala Evdile. Dilê teva serkurê Avêdîs dêşîya. Gişka qedrê Avêdîs dizanibû. Mêr odê da rûniştibûn, kulfet ji xênî da dora cinyazê Tîgran çît girtibûn...)*

- Dîyalogên ku Demê Nîşan didin

Taybetîyeke dîyalogan jî ew e ku di lîstikê da demê dîyar dike. Di lîstika Destebirak da serî pêjî dem ji alîyê vebêjer va wiha tê ravekirin:

Vebêjer.- *(Ewlê bihara qeza Çarsincaqêye sar bû. Belekîyêd berfê li rasta tek tûka mabû, lê singê çîya teze reşayî dikete erdê. Xanîkî binerdî tarîda ber tendûra karto hemankî qeretîyê çend merivê paldayî xane dikir. Zarûhîyê çend cil zara werkiribûn û bi xwe jî orta wanda melûl rûniştibû.. Zarûhî wê şevêqê teva zeftir ji hişyarbûna zara ditirsîya. Şikevê da tenê du girik gaût mabûn.)*

Em ji gotinên vebêjer fêhmî dikin ku di lîstikê da ji demsalan destpêka biharê ye. Weke ku tê şayesandin reşayî hêdî hêdî dikeve erdê. Herwiha em ji dîyalogên di navbera karakterên Zarûhî û Tîgran jî têdigihîjin ku wext destê şevêqê ye:

Zarûhî.- *Tîgran, kurê min, tî hişyarî?*

Tîgran.-*Erê dayê.*

Zarûhî.-*Birê dîya xwe, razê razê hela hê zû ye.*

Tîgran.- *Xema min nayê dayê nikarim razê.*

Zarûhî.- *Hişş, hêdî xeber de, lao, zarê hişyar bin.*

Di lîstikê da Dema karakterê Tîgran sîyaran dibîne û li erdê dikeve ji hiş dikeve û heya destê êvarê li erdê dimîne. Ev wext ji alîyê vebêjer wiha hatîye ravekirin:

Vebêjer.-(*Tîgran kir ku paş da bireve, lê lingê wî parava kevirekî girt û ew piştostan ket. Tîgran hew serxwe da hat wê ser piştê ye. Berf dibare, bakî bozixî sar tê, tarî jî îdî erdê hildiçine. Kincê wî, çarix gorê wîye şil ber sira çîyê ber qerimîbûn. Tîgran hizî da xwe wekî rabe ser pîya lê serî lê gêj bû, ber çavê wî reşeve hat û serê wî hêhemdê wî kete erdê.*)

Li gor lîstikê karakterê Tîgran heya berêvarkî li erdê ji xwe va diçe. Piştî ku karakterê Tîgran xwe digihîne mala karakterê Evdile, dîsa vebêjer demê wiha dide dîyarkirin:

Vebêjer.-(*Xêleke xurt ji şevê çûbû. Evdile û neferê wî ranezabûn.*)

Di lîstikê da dîyalog û vegotinên ku demê dîyar dîkin ev in:

Vebêjer.-(*Hespeke barkirî jî ser herdê din da zêde bûn. Evdile lawik dane ser xwe û ber êvar bû ewana rê ketin. Evdile qest bednde dereng rêket wekî tarî bigihîjin mala Avêdîs*)

.....

Pîkêt.- *Hikyata min ra nevêje. Hûn wa kuda herin?*

Evdile.-*Emê herin aş. Zarong birçî ne.*

Pîkêt.-*Aşê çi wextî? îslam niha bona weten kafîr qir dike hûn jî diçin aş?*

Em ji van dîyalogên ku Evdile û Pîkêt têdigihîjin dîroka bûyerên lîstikê li dora salên 1915an e ku li gor îddeayan wê dîrokê da gelek Ermenî hatine derwarkirin.

Vebêjer.-(*Şeveqa sibê ra lawika xwe gund ra gihandin. Çaxê wana ra rênêzkayê mala Evdile kirin dengê şîn û girîyê bihîstin.*)

...

Vebêjer.-(*Pêlek derbaz bibû. Avêdîs ji destê Romê revîbû hatibû gundê xwe. Berêvarekî Avêdîs û çend hevalên xwe va daxilî nava gundê Evdile bûn. Evdile û Avêdîs odê da rûniştibûn û pirs pirsîyar ji hev dikirin.*)

...

Evdile.- “Êvarekê tarî ketibû erdê, derê me kutan me derî vekir, eva Tîgran....”

- Dîyalogên ku Aksesûaran nîşan didin

Aksesûarên karakterên radyoşanoyan car carna ji aliyê vebêjer tê ravekirin carna jî di nav dîyalogan da tê vegotin. Aksesûarên ku di Destebirak da tê ravekirin di van dîyalogan da tê ravekirin:

Vebêjer.-(*..... Zarûhîyê çend cil zara werkiribûn û bi xwe jî orta wanda melûl rûniştibû..*)

Bi vê vegotina vebêjer em dibînin ku aksesûara cilên li ber tendûran hatîye bikaranîn.

Vebêjer.-(*Mala Evdile barê du hespa ar, den, penêr, toraq û xwarinên mayîn dagirtibûn. Kurê Evdile Mehmûd û du xortêd cînarê wan tivdarekê xwe kiribûn wekî Evdile ra herin gundê Avêdîs. Teve bi çek û sîlah bûn. Tivingê wane stû da bûn, qemê wane ber da bûn. Ew bû, êdî Evdile û lawik rêketinê bûn sê çar kulfetê cînara hatin ber derê Evdile.*)

Bi vê vegotina vebêjer ra em aksesûarên tiving û qemeyê dibînin. Ev aksesûar di çend cihê din da jî derbaz dibin:

..

Pîkêt.- “Dizgînê berde merrezz yanê na kuçîk çapê divînî?”

Mehmûd.- *Ez ê niha kuçûk çapê nîşanê te dim!”*

...

Vebêjer.-(*Mehmûd tiving dengê pîkêt derxistû hilbirî wekî bîne serê wî lê pîkêt qeme ber xwe kişand û anî bedena Mehmûd*)

2.5.3.Monolog Di Destebirak da

Di lîstika Destebirak da monolog ji alîyê karakterê Tîgran tê kirin. Meriv dikare wisa bibêje ku ji rêketina karakterê Tîgran heya gihîştina wîye mala Evdile, hemû giliyên Tîgran monolog in:

Tîgran.- *‘Peyyy ev kîne, sîyar in? erê sîyar in. divek eve eskerê romê ye, diveke ez dîtîm..’*

..

Tîgran.- *“Îcar halê minê çawa be, divek ez nikaribim rêva herim, tu were ez vê çolê sirê bibim yanê jî gur min bixwin. Na! Çawa jî hebe gereke ez herim, çalipîya jî mabe gereke ez bigihîjim mala apê Evdile. Waxx, wax ev çi hatîye serê min. Axx, serê min çawa diêşee.. peyyy, eva xûne porê min da qerimîye. Erê, wax dayê wax bavo ez ê li vira şeveder bimînim. Na! Gerek ez herim, esse herim. Wekî ez neçim bavê minê paşê nevêtu çawa mêr bûyî wekî nikaribûy biçûyayî. Evê han kê ye?divek dîsa eskerê romê ye? Naa! Eva ne mîna merîva ye. Divek gur e? hema min bivîne êdî xilasbûna min tune ez gerek xwe veşêrim!”*

...

Tîgran.- *“Divek ne gur e. Lê çi ye? Wê eynî mîna guran e. Lê wekî ne gur be..Divek kevir be jî. Ez rabim..yan na. Eva gur nîn e. wekî gur bûya qe na wê cî bilipitîya! Ez rêkevim hema gur be jî bira min bixwe! Wey dayê, ez çima ditirsim, na, na, na bavo ez natirsim, ez natirsim!”*

Ev monologên Tîgran hemû hêrs û tîrsa Tîgran pêşkêşî guhdaran dike. Em dikarin bibêjin ku diyalogên Tîgran û Avêdîsê xeyalî jî dikevin qada monologan. Ji ber ku li gor lîstikê bavê Tîgran bi wî ra naştexile. Ew gotin hemû ji alîyê Tîgran va tê xeyalkirin.

2.5.4.Sehne di Destebirak da

Radyoşanoya Destebirakê ji çar sehneyan pêk tê. Ev herçar sehne li gor bûyeran ji hevdu vediqetin û wisa pêşkêşî guhdaran dibin.

2.5.4.1.Sehneya Yekem

Destpêka Sehneya yekem bi muzîkeke klasîk destpêdike. Piştra jî diyalogên Tîgran û Zarûhîyê berdewam dike. Em dikarin bibêjin ku sehneya yekem da Zarûhî û Tîgran di derbarê kirinên Romê da diaxivin û Tîgran mala Evdile tîne bîra Zarûhîyê.

Zarûhî ji ber xelayê Tîgran destê şeveqê dişîne gundê Evdile ji bo alîkarîyê. Piştî ku Tîgran ji mal derdikeve sehneya yekem kuta dibe.

2.5.4.2.Sehneya Duyem

Ev sahne piştî rêketina Tîgran destpêdike. Di serê vê beşê da vebêjer hinekî behsa destebiraktîya Evdile û Avêdîs dike. Piştî ra Tîgran dengê bayê dişibîne dengê bavê û pê ra dikeve diyalogan. Piştî diyalogên wan kuta dibin Tîgran rê da sîyaran dibîne. Tîgran ji tirsê paş da diçe lê lingê wî dikeve kevir û li ser piştê erdê dikeve. Piştî ketina wî jî Tîgran ji derba serê xwe ji xwe va diçe. Tîgran berêvarkî ser xwe va tê lê vê carê jî qerepereyan dibîne û kevirê dişibîne gurekî. Tîgran heya qanîh dibe ku ew qerepere kevir e dîsa dikeve rê û xwe digihîne mala Evdile. Lê Tîgran rê da gelek serma dike û ditirse. Herçiqas Evdile û neferên wî xwestibin Tîgran pak bibe jî rewşa Tîgran hê çetintir dikeve. Evdile jî qirar hildide wekî sivetirê xwe mala Avêdîs ra bigihîne.

2.5.4.3.Sehneya Sêyem

Di lîstika Destebirak da sehneya herî dirêj û bi bandor ev sehne ye. Wisa ku Evdile sibetirê Mehmûd û du xortên gund hildide cem xwe û bi barên hespan berêvarkî ber bi gundê Avêdîs diçin. Lê di rê da pîkêtên pirê xwe wan ra dixin xeta û şer û pevçûn derdikeve. Hemû pîkêtên kuştin lê Mehmûd jî di vî şerî da birîndar dikeve. Evdile tenê diçe alîkarî dide Zarûhîyê û dîsa vedigere. Evdile bi tevî xortan dîsa vedigerin gund lê nêzikayîya gund ji dengî şîn û girîyê fêrî dikin ku Tîgran mirîye. Piştî mirina Tîgran du roj şûnda jî Mehmûd ji ber birîna xwe canê xwe dide.

Sehna ku herî zêde guhdar dike bin bandora xwe ev beş e. Em dikarin bibêjin ku ev sehneya sêyem hemû lûtkeyên bûyerên lîstikê di hundirê xwe da diheve.

2.5.4.4.Sehneya Çarem

Sehneya dawî ya lîstikê da piştî mirina Tîgran û Mehmûd pêlek şûnda Avêdîs ji destê Romê xilas dibe û tê gundê Evdile. Evdile ji Avêdîs ra hemû tiştî rave dike û rewşa Tîgran jê ra dibêje. Piştî ku herdu destebirak diçin li ser mexberê Tîgran Avêdîs mwxberêkî nû ferq dike. Dema ku Avêdîs hîn dibe ku ew mexber yê Mehmûd e herdu destebirak hevdu hemêz dikin. Piştî hemêzkirina herdu destebirakan jî lîstik kuta dibe.

2.5.5. Muzîk di Destebirakê da

Muzîk ji bo radyoşanoyan teknîkeke sereke ye. Ji ber vê yekê jî bandora lîstikê li ser guhdaran bi saya muzîkan xurttir dibe. Ji ber ku Destebirak jî ji alîyê mijara xwe va têrêş e, gelemperî muzîkên klasîk û muzîkên biêş hatine bikaranîn. Muzîkên di Destebirak da hatine bikaranîn hemû nehatine tesbîtkirin. Di destpêka lîstikê da muzîkeke fonî ya ku bi amûra meyê lê dide tê dayîn. Piştî wê fonê jî foneke klasîk dîsa tê dayîn. Mixabin ev fonên ku hatine bikaranîn nehatine tesbîtkirin. Tenê du muzîkên fonî hatin tesbîtkirin ku ew jî ev in:

-Gulê Marûmê(Egîdê Cimo)

Dema ku Mehmûd di şerê li ser pirê birîndar dikeve ev fona dengê meya Egîdê cima Tê bikaranîn.

-Lawikê Metînî(Egîdê Cimo)

Piştî ku Evdile bi tevî Xortan vedigerin gund û dibînin ku Tîgran mirîye ev fona muzîkê di lîstikê datê dayîn.

-De Yo Yo (Egîdê Cimo)

Di lîstikê da piştî mirina Tîgran du roj şûnda Mehmûd jî dimire. Dema di lîstikê da Mehmûd jî rihê xwe teslîm dike Ev fon muzîka Egîdê Cimo tê dayîn.

2.5.6.Wext Di Destebirakê da

Radyoşanoya Destebirak bi tevî hevdu çûl û pênc deqeyan berdewam dike. Lîstik ji bo weşandina bi carekî da hatîye dîzaynkirin. Ji ber vê yekê jî ji hevdu nehatîye qutkirin. Em dikarin bibêjin ku dirêjîya lîstika Destebirak di heddê xwe da ye ku guhdaran bi dirêjahîyê aciz nake. Her wiha bi mûzîkên hatine dayîn jî ji giranîya dîyalogan ra bûye palpişt.

ENCAM

Bi dahêna radyoyê ra pêwendîyên di navbera civakên cuda pêştir dikeve û radyo ji bilî qadên wek nûçegihanîyê di qadên wêjeyî da jî gav diavêje û gelek bername dikevin nav weşanên radyoyên cîhanê. Dema em li dîroka weşangerîya radyoyê ya Kurdan jî dinîhêrin em dibînin ku di gelek radyoyên gelek welatan da parên axaftinên Kurdî hatine vekirin û kardan dengê xwe çand û hunera xwe bi saya radyoyê gihandîye cîhanê. Di nav weşanên radyoyan da yek jî para axaftina Kurdî di Radyoya Rewanê da tê dest pê kirin ku ev radyo di xizmeta çand û hunera Kurdî da gelek ked dîtîye û çerçîfiye. Piştî sala 1955an di Radyoya Rewanê da para axaftina Kurdî vedibe û di vê parê da gelek xebatên çandî tên kirin. Di nava wan xebatên çandî da yek jî bernameyên radyoşanoyan ên di Radyoya Rewanê da nin. Me jî di vê xebata xwe da li ser radyoşanoyên ku di Radyoya Rewanê hatine weşandin lêkolîn kir û em lê warqilîne van encaman:

- 1) Radyoya Rewanê ji destpêka xwe heya niha di gelek qadan da bûne dengê Kurdan û bernameyên wek propaganda, nûçe, jîyana gundîtîyê, edebî, klam, radyoşano û yên din dane li ber pêlên radyoyê.
- 2) Piştî ku di Radyoya Rewanê da para axaftina Kurdî vebû kesên Wek Casimê Celîl û Ordîxanê Celîl him li ser muzîka Kurdî sekinîne û him jî ji şanoyên zimanên bîyanîyan wergerandine û di bernameyên daramatîk da wek radyoşano dane li ber pêlên radyoyê.
- 3) Şanoyên ku berî avabûna radyoyê hatine nivîsîn ji alîyê veçêkerên radyoyê ji nû va tên dîzaynkirin û li ser mîkrofonê tên lîstin.
- 4) Di veçêkirinên radyoşanoyan da destan û çîrokên Kurdî ji bo xebatkarên radyoyê û ji bo şanonûsan bûye palpişteki û destanên wek *Memê û Zînê*, *Zembîlfiroş*, *Ker û Kulik*, *Dimdim*, *Şengilo*, *Mengilo û Xaliçengilo* û *Leyl û Mecnûn* di radyoyê da bi terza radyoşanoyê hatine lîstin.
- 5) Di vêçikirinên radyoşanoyan da gelek keda sazbandên Kurdan, nivîskaran û berspîrsarên radyoyê (Casimê Celîl, Xelîlê Çaçan, Ahmedê Gogê, Keremê Seyad) çêbûne.
- 6) Ji destpêka Radyoya Rewanê heya niha ji çilî zêdetir radyoşano hatine weşandin û weke ku me lêkolîn kir me tenê xwe gihande navê bîst û çar radyoşanoyan. Di nav bîst û çar radyoşanoyan da jî heya niha tenê şeş heb

li ser medyayên civakî hatine parvekirin ku ew jî radyoşanoyên bi navê *Serdar û Karê, Zembîlfroş, Şengilo, Mengilo û Xalîçengilo, Leyl û Mecnûn, Destebirak û Bêqelen* in. Di nav van radyoşanoyan da jî tenê me xwe gihande metnên Bêqelen û Destebirak.

- 7) Weke ku em li ser radyoşanoyên *Serdar û Karê, Zembîlfroş, Şengilo, Mengilo û Xalîçengilo û Leyl û Mecnûn* sekinîn em lê warqilîn ku kesên wek Wezîrê Eşo, Keremê Seyad, Zadiîna Şakir û Porsora Serdar di dengkirinên van radyoşanoyan da cî girtine. Em wisa jî têgihîştin ku Keremê Seyad di hemû radyoşanoyan da deng daye û yan bûye vêbêjer yan jî di dilqê karakterên sereke da lîstîye. Dîsa miqamên sazbandên Egîdê Cimo, Lezgîyê Ferî, Tiharê Emer, Efoyê Esed, Aşiq Kemal û muzîkên klasîk ên bîyanîyan wek fon di van radyoşanoyan da hatine bikaranîn.
- 8) Dîsa weke ku me li ser radyoşanoya Bêqelen lêkolîneke kurtir kir em tê gihîştin ku nivîskarê lîstîkê bixwe jî di dilqê karakterê sereke dileyîze. Hewiha Lîstika Bêqelen ne tenê radyoşanoyeke ji rêzê, wisa jî lîstîkeke komedî ye û edeta qelenxwestinê rexne dike. Bêqelen ji aliyê veçêkerê Xelîlê Çaçan gelek ji şanoya esil dîr nexistîye û wisa jî daye ber pêln radyoyê. Di Bêqelenê da ji bo bandora lîstîkê gelectir be efektên dengê derî, çeliqandinê, dengê maşînê, dengê kuçikan û yê din hatine bikaranîn. Dîsa Di Bêqelenê da gelek miqamên Kurdî hatine bikaranîn ku dîsa em rastî stran û miqamên *Xacoyê Xelî, Eliyê Hemed, Siloyê Evdal, Xelîlê Evdile* û gelek miqamên anonîm tên. Di dengkirina Lîstîkê da jî em rastî navên *Keremê Seyad, Fêrikê Êsiv, Egîdê Abasî, Şikoyê Êsiv, Onîkê Êsiv, Mîşayê Êsiv û Porsora Serdar* tên ku van kesan bi awayekî amatorane, lê xurt, dilqên xwe lîstine. Dema em li Bêqelenê dinihêrin jî nivîskar gelek gotinên pêşîyan û biwêj bikara anîne.
- 9) Dema em radyoşanoya Destebirak jî dinihêrin em xwe di bûyereke dîrokî da dibînin. Nivîskarê lîstîkê Wezîrê Eşo ji bûyereke dîrokî sûd wergirtiye û bi terza tragedyayê ev lîstîk afirandiye. Dîsa dema em li Destebirakê dinihêrin em dibînin ku zêdetir miqamên sazband Egîdê Cimo hatiye bikaranîn. Wekî din jî fonên muzîkên klasîk di radyoşanoyê da hatiye bikaranîn. Herwiha di radyoşanoya Destebirak da efektên wek dengê

lêdana derî, dengê olandayînê û dengê bayê hatine bikaranîn ku ev efekt jî bandora lîstikê li ser guhdaran zêde dike. Dema Em bala xwe didin kadroya lîstikvanan jî em rastî navên Wezîrê Eşo, Keremê Seyad, Porsora Serdar û Egîdê Ebasî tên. Herî dawî dem aem bala xwe didin zimanê lîstikê em gelek li rastî biwêjan tên.

ÇAVKANÎ

Adak, Abdurrahman, (2015), *Destpêka Edebiyata Kurdî ya Klasîk*, Ç. 3, İstanbul, weş. Nûbihar.

Ağcakulu, Ali, (2012), Ortadoğu’da Kürtçe Radyo Yayınları: Erivan Radyosu Örneği (1955-1990), İstanbul Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü, Teza masterê ya çapbûyî, İstanbul.

Arslan, Sevda, (2010), Türkiye’de Radyo Oyunları, Hacettepe Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü, Teza Matirê ya Çapbûyî, Ankara.

Artemêt, Mem, (2020), Îmaj Di Şi’ra Fêrîkê Êsiv da, Bingöl Üniversitesi Yaşayan Diller Enstitüsü, Teza Masterê ya Çapbûyî, Bingöl.

Ataman, Özlem, (2013), *Radyo-televizyonda program yapımı*, Eskişehir, weş. Anadolu Üniversitesi.

Aziz, Aysel, (1981), *Radyo Ve Televizyona Giriş*, Ankara, weş. Ankara Üniversitesi Siyasal Bilgiler Fakültesi Yayınları.

Boyîk Eskerê, (2004), *Nûra Elegezê; Çend dîdem ji Edebyeta Kurdên Ermenistanê*, Oldenburg, weşangeha Dengê Êzîdiyan.

Boyik, Eskerê, (2012), *Çanda Kurdên Sovêtê*, İstanbul, weş. Deng.

Brecht Bertolt, (1993), *Tiyatro için küçük organon*, (wer. Ahmet Cemal), İstanbul, Mitos yayınları.

Can, Hüseyin, (2013), *Kürtler ve Stalin*, İstanbul, İşçi Kolettifi Yayınları.

Cebe Rohat, (2019), Modern Şarkı Söyleme Teknikleri İçerisinde Dengbêjliğin Yeri, Uluslararası Dengbêjlik Kültürü ve Dengbêjler, Şırnak, Şırnak Üniversitesi Yayınları.

Crook T, (1999), *Radio Drama Theory and Practice*, Routledge.

Çetin, Zeynep, (1999), Kitle İletişim Araçları ve şiddet, Marmara İletişimi Dergisi, İstanbul, Marmara Üniversitesi İletişim Fakültesi Yayını.

Çorbacıoğlu, Fazıl Hayati, (1967), *Radyo Tiyatrosu ve Piyes*, İstanbul, Mikrofon yayınları.

Doğan, Serhat, (2017), Türkiye’de Değişen Radyo Dinleme Alışkanlığı Ve Özel Radyolarda Radyo Tiyatrosu, İstanbul Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü, Teza Mastirê ya Çapbûyî, İstanbul.

Elçi, Dicle Özcan, Cengiz, Gazal, (2019), *Literatürde Kadın Dengbêjlerin Yeri Ve Tartışılma Biçimleri*, Uluslararası Dengbêjlik Kültürü ve Dengbêjler, Şırnak, Şırnak Üniversitesi Yayınları.

Erbay Vecdi, (2012), *İnatçı Bir Bahar*, İstanbul, weş. Ayrıntı.

Eşo, Wezîrê, (1976) *Mizgînî*, Yêrêvan, weş. Hayatsan.

Göçer Ali, Kurt Akife, (2020), *Sözlü İletişim Becerilerinin Gelişiminde Radyo Oyunlarının Kullanımı Üzerine Kuramsal Bir Çalışma*. Avrasya Dil Eğitimi ve Araştırmaları Dergisi.

Gül, Ruhi, (2009), *Televizyonda Program Türü Olgusu ve Türkiye’deki Gelişim Süreci*, Selçuk Üniversitesi, Sosyal Bilimler Enstitüsü, Teza Masterê Ya Çapbûyî, Konya.

Gülada, M. Ozan, Çakı, Caner, (2019), *İkinci Dünya Savaşı’nda Sovyet Partizanlara Yönelik Hazırlanan Propaganda Posterleri Üzerine İnceleme*, eKied.

Hand Richard J, Traynor Mary, (2011), *The Radio Drama Handbook: Audio Drama in Practice and Context*, weş. Continuum.

Karabulut, Tufan, (2014) *Modern Tiyatro*, İstanbul, Mitos Boyut Yayınları.

Kars, Neşe, (1993), *Kavram ve içerik açısından radyo oyunları değerlendirmesi*, hej. 2, Marmara İletişim Dergisi.

Kasım, Metin, (2011), *Hitler Döneminde Propaganda Aracı Olarak Radyo*, hej. 4, Konya, Selçuk İletişim.

Kaya, Ramazan, (2007), *Tarihin Hayat Bulma Alanı: Tiyatro*, Hejmar: 15, Kkefd/Jokkef.

Keleş, Bahattin, (2019), *Dengbêjliğin Tarihi Süreç İçerisinde Ortaya Çıkışı Ve Değişimi*, Uluslararası Dengbêjlik Kültürü ve Dengbêjler, Şırnak, Şırnak Üniversitesi Yayınları.

Kerem Engin, (2019), *Dengbêj û Dengbêjên Culemêrgê*, Uluslararası Dengbêjlik Kültürü ve Dengbêjler, Şırnak, Şırnak Üniversitesi Yayınları.

KOÇ, Nurgün, (2012), *Cumhuriyet’in ilk Yıllarında Radyo*, hej.15, Cumhuriyet Tarihi Araştırmaları Dergisi.

Kulu, Muharremli, (2020), *Radyo Tiyatrosu Sanatı*, Ankara, Gülnar Yayınları.

Kuruoğlu, Huriye, (2006), *Propaganda ve Özgürlük Aracı Olarak Radyo*, Ankara, weş Nobel.

- Kuyucu, Mihalıs, (2013), Radyonun Müzik Kutusuna Dönüşümü: Radyo Program Türleri Ve Tercih Edilirlik Oranları, hej.4, Humanities Sciences.
- Kuyucu, Mihalıs,(2013), Türkiye’de Özel Radyo Yayıncılığı: Ulusal Ölçekte Yayın Yapan Özel Radyo Kanallarının Yapıları Üzerine Bir Araştırma, hej.7, Global Media Journal, İstanbul.
- Nutku Özdemir, (2001), *Dram Sanatı; tiyatroya giriş*, İstanbul, Weş. Kabalcı.
- Omerxalî Xanna, (2017), *Li Dewletên Sovyeta berê Kurd bi Perspektîfa Dîrokî û Çandî*, Hej. 9/10, Wêje û Rexne.
- Özakman, Turgut, (2007), *Oyun Ve Senaryo Yazma Tekniği*, Ankara.,weş. Bilgi Yayınevi.
- Özdemir, Nutku, (2008), *Dünya Tiyatrosu Tarihi 2*, İstanbul, Mitos Boyut Yayınları.
- Özdemir, Nutku, (2011), *Dünya Tiyatrosu Tarihi 1*, İstanbul, Mitos Boyut Yayınları.
- Öztürk, Gülcennet, (2017), Bir propaganda aracı olarak radyo, Hej.3, AKAR.
- Öztürk, S. (2004), Bir Radyo Piyesinin Yarattığı Yankılar, hej.2, İletişim Araştırma Dergisi.
- Piscator, Erwin, (2012), *Politik Tiyatro*, İstanbul, weş. Agora kitaplığı.
- Reşîd, Tosinê, (2009), *Kurdên Yekîtiya Sovyetê: Berê û Niha, Bîrnebûn*.
- Şamil, Hêjarê, (2015), *Diyaspora Kürtleri*, Stenbol, weş. Perî.
- Şener, Sevda, (2003), *Dram Sanatı*, İstanbul, Weşanên Mitos-Boyut.
- Şener, Sevda, (2015), *Ji Duh Heta Îro Ramana Şanoyê*(Werger: Dîlawer Zeraq), İstanbul, W-weş. Komeleya Akademiya Sînemayê ya Rojhilata Navîn.
- T.C. Milli Eğitim Bakanlığı, (2011), *Radyo Program Türleri*, Ankara Radyo-Televizyon Yapım Ve Yayıncılığı.
- T.C. Milli Eğitim Bakanlığı, (2011),*Gazetecilik*, Ankara. Radyo Televizyon Tarihi.
- Taner, Haldun, And Metin, Nutku Özdemir, (1996), *Tiyatro Terimleri Sözlüğü*, Ankara, Türk Dil Kurumu yayınları,
- Tmmob, (2014), *Ferhenga Zaravên Teknîkî*, Ankara, weş. TZP Kurdî.
- Tözem, Kemal, (1941), *Radyofonik Tiyatro*, hej. 1, Radyo.
- TRT Akademi, (2020), *Türkiye Radyoları*, İstanbul.

Tufan, Fırat, (2010), *Radyo Yayıncılığı*, İstanbul Üniversitesi.

Tufan, Fırat,(2014), Tamamlayıcı Öğretim İşlevinin Açık Radyo Üzerinden İncelenmesi, 2014/I 46, istanbul Üniversitesi İletişim Fakültesi Dergisi.

Türkmen, İlknur, (1994), Türkiye’de Radyo Yayıncılığının Gelişimi, İstanbul Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü, Teza Masterê ya Çapbûyî, İstanbul.

Ulugana, Sedat, (2017), *Kurdolojiya Sovyetê û Kronolojiya Edebiyata Wê ya Kurdî(1922-1991)*, Wêje û Rexne, h.9/10, Diyarbakır.

Ûsiv, Fêrikê, (2011), *Hesretdefter*, Ankara, Weşanên Lîs.

West, Keith Ray, (2007) *Theatre of the Mind, Live on Stage: Radio Theatre Production for Theatre Practitioners*, Texas Tech University, Teza Çapnebûyî ya Doktorayê. Texas.

Xelîl, Têmûrê, (2014), *Antologîya 35 Helbestvan û Nivîskarên Kurd ên Sovyeta Berê*, İzmir, Weş. Na.

Yıldırım, Asiye Çığrı, (2017), *Tragedya Işığında Modern Trajedinin Tahlil Unsurları: Mezopotamya Üçlemesi’nde Trajik Ögeler*, Hej. 16, Sobider.

Yıldız Deveci, Bozkuş, (2019), Ermeni Toplumunda Dengbêjlik Kültürü, Uluslararası Dengbêjlik Kültürü veDengbêjler, Şırnak, Şırnak Üniversitesi Yayınları.

Zêdo, Çetoyê, Akkuzu Yavuz,(2015), *Dîroka Şanoya Kurdî*, , İstanbul, weş. Peywend.

Çavkanîyên Malperan

Şeker, Cafer Talha, (2017), Ortadoğu Masasında Kürtler ve Kürtçe, Ordaf, (14.02.2021) <https://ordaf.org/ortadogu-masasinda-kurtler-ve-kurtce/>

Amûdî, Dilyar, (2017), Bexda, Êrîvan, Qahîre...Sê radyoyên giring di dîroka Kurdan de, Çandname, (14.02.2021) <http://candname.com/bexda-erivan-qahire-se-radyoyen-giring-di-diroka-Kurdan-de/>

Mahabad, Occo, (2020), Urmiye Radyosunun Kürt Yıldızları, Banews, (14.02.2021) <https://www.basnews.com/tr/babat/640575>

Kevirbirî, Salih, (2019), Gürcistan Kürtlerinin kahramanı: Keremê Anqosî, Duvar, (15.02.2021)

<https://www.gazeteduvar.com.tr/forum/2019/10/12/gurcistan-kurtlerinin-kahramani-kereme-anqosi>

Erkmen, Ayhan, (2019), Keremê Anqosi'nin yüzyıllık hasreti, Yeni Yaşam, (15.02.2021)

<http://yeniyaşamgazetesi2.com/kereme-anqosinin-yuzyillik-hasreti-ayhan-erkmen/> ,

Paksirêşt, Elî, (2019), Çapemenî û ragihandina bi kurmancî li Îranê, Basnews, (15.02.2021)

<https://www.basnews.com/kr/babat/540704> ,

Xelîl, Têmûrê, (2017), Radyoya Kurdî ya Rewanê bi mîlyonan Kurd hişyar kir, Ritaze, (18.08.2021)

<https://krd.riataza.com/2017/06/09/radyoya-Kurdi-ya-rewane-bi-milyonan-Kurd-hisyar-kir/>,

Zêdo, Çetoyê, (2017), Kûrtçe Tiyatro Metinleri, Bianet, (15.02.2021)

<https://m.bianet.org/bianet/sanat/185967-kurtce-tiyatro-metinleri/>

PÊVEK

DESTEBÎRAK(Wezîrê Eşo)

(Ji tîpên Kirîlî, Serhat KAYA.)

Sehneya Yekem

(Miqam)

Vebêjer.-(Ewlê bihara qeza Çarsincaqêye sar bû. Belekiyêd berfê li rasta tek tûka mabû, lê singê çîya teze reşayî dikete erdê. Xanîkî binerdî tarîda ber tendûra karto hemankî qeretîyê çend merivê paldayî xane dikir. Zarûhîyê çend cil zara werkiribûn û bi xwe jî orta wanda melûl rûniştibû.. Zarûhî wê şevêqê teva zeftir ji hişyarbûna zara ditirsîya. Şikevê da tenê du girik gaût mabûn.)

Zarûhî.- Tîgran, kurê min, tî hişyarî?

Tîgran.-Erê dayê.

Zarûhî.-Birê dîya xwe, razê razê hela hê zû ye.

Tîgran.- Xema min nayê dayê nikarim razê.

Zarûhî.- Hişş, hêdî xeber de, lao, zarê hişyar bin.

Tîgran.-Dayê, wekî apê Evdile virbûya xwe eskerê Romê nikaribû em talankirina, usa nîn e?

Zarûhî.-Ê, lawo ez çi bêjim.

Tîgran.-Na, na, tivinga apê Evdile, ya Mehmûd ya gundîyê wan tevî heye, ewana qe dihiştin Rom isa bîne serê me.

Zarûhî.- Hêdî, hêdî xeber de, kurê min.

Tîgran.-Dayê lê bavê min ê kengî bê?

Zarûhî.- Ax.. ez çi zanim. Belkî mala sebeba xira be.

Tîgran. – Na, ez ê esse apê Evdile ra, Mehmûd ra bêjim wekî ewana berxa min jî birin.

Zarûhî.-Tîgran, bîrê dîya xwe, te gilîkî rind kire bîra min. Lao lê min qet fikra mala bîrê Evdile nedikir. Lao, tê halê me divînî. Şikir tî mezinî, îdî sêzdeh salî yî. Wa nave, lao emê bîrçîna guhê vî xanîyê sikîsar da. Ez çi zanim wê çi bê serê me..

Tîgran.- Lê em çi bikin dayê?

Zarûhî.- Were lao, ez te bişînim Dêrsimê, mala kirîvê meyî Evdile. Evdile û jinêva qe navên na. Wekî arvanê wanî rojê be jî wê me ra bişînin. Ew û bavê te mîna bîrê temê dê û bavê ne, qe na-no nakin. Tîgran bîrê dîya xwe, îcar tu dîzanî tê çi bêjî?

Tîgran.- Çawa nizanim?

Zarûhî.- Lao, bê Romê eva serê sê mehane bavê min birye olamê, qe nizanim çi serî qewimî. Bê hal û hewalê me û eskerê romê jî bû ev. Bê eskerê Romê mala me, hebûna me, çi hebû tunebû, talan kir-bir. Bê gundê me xelayêdane. Bêje bîrê Evdile, bê dîya min digot bira hema arvanê pêlekê dest me bigre, heta birakê wî vedigere..

Tîgran.-Birabe dayê, te çawa got ezê isa jî bêjim.

Zarûhî.- Bîrê dîya xwe, şikir tî ne yê şîreta nî, halê me tevî bîrê Evdile ra şiro vekî.

Tîgran.- Esse dayê.

Zarûhî.- Tîgran, çara min, rêva miqat-miqatî xwebî, nevî nevî li merivan disekinî, cîya egle divî..Tu ku eskerê romê dîr va divînî, riya xwe biguhêze, xwe ta de,ez çi zanim..

Tîgran.- Dayê, çira ez fem nakim. Eskerê Romê hema pê bihese ez Ermenî me, wê ecêbekî bîne serê min.

Zarûhî.- Erê lao, gilîyê te ye.

Tîgran.- De, ez êdî rêkevim.

Zarûhî.- Lao, tê birçî çawa bidî ser rê? şikevê da du girik qaut mane, yekê xwe ra hilde rêva qewatî dikî.

Tîgran.- Ez î tîr im. Bira zaro bixwin dayê. Êdî dereng e, ez rêkevim.

Zarûhî.-De te ra oxir be, xêr û silamet dayka xwe vegerî. Tîgran, bêje Nenê û Gulperîyê, bê dîya min hûn bara-cema silav dikirin. Lao de were dîya te bê rûyê te...

Tîgran.- De min xatirê te dayê. Netirse ez ê zû vegerim.

Zarûhî.- Te ra oxir be lao, kevir ber pê te penêr be.

Sehneya Duyem

(muzîkeke klasîk)

Vebêjer.-*(Barana berbangêye hûr niha gur kiribû. Tîgran dilezand. Rê û dirbê Dêrsimê ewî mîna pênc pêçîyê xwe zanibûn. Ewî hê lap zaro bû, bavê ew xwe ra dibire Dêrsimê, mala Evdilê destebirakê xwe. Avêtîsê soldirû bû. Ewî payîzê kundele, êmîş û xurekê deştê dibire Dêrsimê û li wir pêz ra, rûn û penêr ra hirîyê ra diguhêrî û paş da dihat. Hemîn ya mala Avêtîs û Evdile başqe bû: Her sal Avêtîs hedayîkî giran mala Evdile ra dibir, êmîşê qutîya inka Nenê jî, Avêdîs qulçekî têra da cî fikir. Gulperîya kulfeta Evdile xên ji kondele Avêdîs, tu kondele pê nedikirin. Dayka Avêtîse rehmetî Maro xênji penêr-toraqa destê Nenê ya tu kesî nedixar. Çaxê Evdile jî diçû mala Avêdîs destevala nediçû. Hemîn her sal, berxa mala wîye serberanî, nêr bûya, mê bûya, pêşkêşa Tîgran bû.)*

Vebêjer.-*(Bakî qalin dihat. Tîgran diçû. Nava gujîn û vizîna bayê da teyê bigota meriva lê tesele dibe û ew deng ber guhê Tîgran bû dengê bavê. Te qey tirê Avêdîs Tîgran ra xever dide.)*

(Dengê bayê)

Avêdîs.- Tîgran can.. xwe tu serma nakî?

Tîgran.- Na Bavo, ez difikirim gelo berxa mala apê Evdile îsal nêr e yanê mê ye?

Avêdîs.- Kîjan Berx?

Tîgran.- Ya serberanê.

Avêdîs.-haa, tu berxa xwe ra nî?

Tîgran.- Lê çawa..

Avêdîs.-Ez çi zanim lao, xwe ezî ne bîldarim, yanê remla min tune. Emê niha bivînin.

Tîgran.- Bavo, apê Evdile hersalî pêşkêşî dide min, lê ez çira qet nadimê?

Avêdîs.- Xwe ra bêje Tîgran can. Ez çi zanim çira..

Tîgran.- Lê ez nizanim çi bidimê wekî apê Evdile şa be.

Avêdîs.- Tu çi jî bidî apê xwe wê şa be.

Tîgran.- Bavo, miştik dive?

Avêdîs.- Çima nabe lao.

Tîgran.- Wekî isane ez ê miştika kalkê xwe ye k'arbar bidimê.

Avêdîs.- Tîgran can, apê teyî Evdile kengê miştika kalkê te hildide.

Tîgran.- Çima?

Avêdîs.- Zanî çima, kurê min. Kalkê teyî rehmetî û bavê Evdileyî rehmetî destebirakê hev bûne.

Tîgran.- Mîna te û apê Evdile?

Avêdîs.- Erê lao... Hey gidî dinyayê, lê hema biratîya wan diha şîrin bûye. Şerê ûris û romê da Kalikê te digrin davêtin kela Ezurmê. Bavê Evdile tenê du gayên wî yê cot hebûne, herduya jî difroşe, dike zêr û pê wan zêra kalkê te ji kela kevirî derdixe.

Tîgran.- Çiqas merîkî heyf bûye.

Avêdîs.- Lê çawa. A lema jî apê teyî Evdile tucar miştika kalkê te hilnade. Ew miştik gerekê mala meda heta kurê-kura çawa bîranîna kalkê te bimîne.

Tîgran.- Lê ez miştikeke baş ku bînim?

Avêdîs.- Ezê bikirim, bidim kurê xwe, tu jî alyê xwe da pêşkêşî apê xweyî Evdile ke.

Tîgran.- Erê bavo can, apê Evdileyê çiqasî şa be. Ez zanim wê ese bêje: Eferim, Tîgranê min. A îcar ez zanim tu apê xwe hiz dikî.

(dengê bayê)

Tîgran.- Ax, bavo, wekî tu virabûyayî ez ê çira biketama vî halî, ezê çira tenê biçûma Dêrsimê..

Tîgran.-‘Peyyy ev kîne, sîyar in? erê sîyar in. divek eve eskerê romê ye, diveke ez dîtîm..

Vebêjer.-*(Tîgran kir ku paş da bireve, lê lingê wî parava kevirekî girt û ew piştostan ket. Tîgran hew serxwe da hat wê ser piştê ye. Berf dibare, bakî bozixî sar tê, tarî jî îdî erdê hildiçine. Kincê wî, çarix gorê wîye şil ber sira çîyê ber qerimîbûn. Tîgran hizî da xwe wekî rabe ser pîya lê serî lê gêj bû, ber çavê wî reşeve hat û serê wî hêhemdê wî kete erdê.)*

Tîgran.- Îcar halê minê çawa be, divek ez nikaribim rêva herim, tu were ez vê çolê sirê bibim yanê jî gur min bixwin. Na! Çawa jî hebe gereke ez herim, çalipîya jî mabe gereke ez bigihîjimmala apê Evdile. Waxx, wax ev çi hatîye serê min. Axx, serê min çawa diêşee.. peyyy, eva xûne porê min da qerimîye. Erê, wax dayê wax bavo ez ê li vira şeveder bimînîm. Na! Gerek ez herim, esse herim. Wekî ez neçim bavê minê paşê nevêtu çawa mêr bûyî wekî nikaribûy biçûyayî. Evê han kê ye?divek dîsa eskerê romê ye? Naa! Eva ne mîna merîvaye. Divek gur e? hema min bivîne êdî xilasbûna min tune ez gerek xwe veşêrim!

Vebêjer.-*(Tîgran êpêceyî wext li erdê velezîyayî ma û tirûş nedikir serê xwe bilind ke.)*

Tîgran.- Divek ne gur e. Lê çîye? Wê eynî mîna guran e. Lê wekî ne gur be..Divek kevir be jî. Ez rabim..yan na. Eva gur nîn e. wekî gur bûya qe na wê cî bilipitîya! Ez rêkevim hema gur be jî bira min bixwe! Wey dayê, ez çima ditirsim, na, na, na bavo ez natirsim, ez natirsim!

Vebêjer.-*(Tîgran ranêzkayî qeretî kir. Menzîla orta û qeretî da isa kin bû wekî şevereşê da Tîgran fereh kevir qeşirand. Ew kevirê dûûr va mîna gura xane dikir. Tûgran diçû lê ne rê didît ne jî dirb. Tenê ewî texmîn dikir wekî hevraz hildikşe. Wekî isane ber bi gundê Evdile diçe. Nişkêva dengê sa li Tîgran tesele bû. Şabûn kete dilê wî. Tîgran xwe li dengê sa girt û lezand. Lezekî şûnda ew êdî ber derê Evdile bû.)*

(dengê lêdana derî)

Tîgran.-Aaa..pooo, A...poooo..

Mehmûd.- Ew kîye?

Tîgran.- Ez..ez..

Evdile.- Mehmûd lao, ew kî ye?

Mehmûd.- Bavo Tîgran e.

Evdile.- Kurê Avêdîs?

Mehmûd.- Erê.

Evdile.- Ê de bîne hundir.

Mehmûd.- Bavo mine anî. Lê nizam çi sêrî qewimîye, hişê wî serî çûye.

Evdile.- Çi divêjî? De bise ez î hatim alî te.

Mehmûd.- Hêdî bavo hêdî, tu milê wî bigire milê wî.

Evdile.- Ha. Ha de tu bide pêşîyê. Cilê bînin cilê. Dayê cilê bînin hişê Tîgran sêrî çû!

Meyan.- Pî la çavê min rijîyayê. Eva tifala vê şevê ji ku tê? Ev çi hatîye serê wî!

Nenê.- wey wey wey wey, ev çi serê vî zarî qewimîye.

Mehmûd.- Inê bike em kincê wî çarix gorê wî bêxin, tu dibînî çi halî da ne.

Vebêjer.-*(Gulberî û Mehmûd kinc çarix gorê Tîgran Jêxisin kirin û nava cîya. Lezekî ma, Tîgran çavê xwe vekir û ecêbmayî dor berî xwe nihêrî)*

Tîgran.- iiiii...iiii.

Meyan.- Tîgran, kurê min, tu mala me da nî, mala apê xwe yî Evdile da.

Tîgran.- iii, mala apê Evdile da? Erê..erê..

Evdile.- Tîgran ev çi serê te qewimîye, çi hewal e lao?

Tîgran.- Dîya min ez şandim.

Meyan.- Tîgran lao, te xêr e? mala we silamet e?

Tîgran.- Dîya min ez şandim got here mala apê xwey Evdile.

Evdile.- Dayê binhêrin xwe dere wî surê nebirîye.

Meyan.- Hî la çavê min rijyayê!

Evdile.- Mehmûd banzde hine berf bîne, dest pê wî de!

Gulperî.- Îja Zarûhîya porkur vê zivistanê ev tifala ça serê rê xist!

Evdile.- Êê dayê, hilbet derdekî wê jî hebûye!

Mehmûd.- Va minê berf anî!

Meyan.- De bîne bîne. Werin em dest pê wî bidin.

Evdile.- Mehmûd te hine av jî bianîya, sûretê wî bireşanda wekî ev tifala ser xwe da bê, nabînî dîsa xwe va diçe.

Gulberî.- Meyo, ber pêşîrê wî veke.

Meyan.- Erê dayê xebera te ye.

Vebêjer.-*(aaa Tîgran wê ser rengê xwe da hat)*

Evdile.- Tîgran can, kîdera te dêşe?

Tîgran.- iiiii,axxx, apo ez î pak im, berxwe nekevin, tenê serê min gêj dibe.

Evdile.- Tîgran lao, de îcar bêje, çi serê we qewimîye? Mala we silamet e?

Tîgran.- Bavê min ne li mal e. Romê birîye olamê.

Evdile.- Zû va?

Tîgran.-Eva serê sê mehane.

Meyan.-Lê dîya te? Xûşk û birê te?

Tîgran.-Dîya min, xûşk birê min sax in lê..lêê..ce me..ce me.. weyy, apê Evdile ev çîye? Gur e. Na, na kevir e.. mala me xelayê da ne, xûşk û birê min....

Evdile.- Hebe tunebe eva kirê Roma reş e. yanê na kengî mala Avêdîs ketîye vî halî.

Gulperî.- Wey wey wey wey.. eva tifala çawa nexulîfiye, şeveder nemaye. La qirik terqel bûyê Zeryê wekî qirik qertel bû.

Meyan.- Tîgran lao, lê arvanê we çawa bû?

Tîgran.- Tev eskerê Romê birin. Non jî birin, dewar jî.

Evdile.- Çawa?

Tîgran.-Berxa min jî birin apo, ewa te dabû min, berxa min jî..axx tişte nehiştin.
Berxa minnn.. ihiii..

Meyan.-wey wey wey, ev çi agire ser van hêsîran barîye.

Gulperî.- Ca isa bêje, agir jî isa dive..

Evdile.- Tîgrancan tu qet netirse. Nizanm sive safî nebe. Ez ê xwe mala we ra bigihînim.

Gulperî.- Erê erê, qurbana te û kura bim, gunê ne.

Evdile.- Dayê, lê xwe ez mala Avêdîs wî halî da nahêlim. Çira dinya ber bayê samê çûye!

Vebêjer.-*(Xêlêke xurt ji şevê çûbû. Evdile ûneferê wî ranezabûn. Tev dora cî nivînê Tîgran rûniştibûn. Wana kirin nekirin ewî nan nexwar. Tîgran ketibû germê û ber pesna xeber dida)*

Tîgran.- Na! Na. Ez berxa xwe nadim.Înê were! İnê berxa min jî dibin. Wey wey.. dayê ez î têr im, bira zaro bixwin..Bavo, bavo te miştik anî, te miştika apê Evdile..wax waxxx, evê han gur e, gur e, wê min bixwe, wey wey dayê!

Evdile.- Tîgran, birê apo, netirse, eme virin, tişte tune lao.

Sehneya Sêyem

Vebêjer.-*(Sivetirê Evdile karê xwe dikir wekî ser mala Avêdîs da here.)*

Evdile.- Dayê min cab kir wekî hekîm bê. De êdî hûnê ber Tîgran bin. Ezê herim xwe mala Avêdîs ra bigihînim. Çika çi halê wan çawa bû, çi hate serê wan. Hebe tunebe qezîyak wana qewimîye.

Gulperî.- Here lao, here. Belkî tu û kura va telî tengayê nevînin.

Meyan.- Tu here Evdile em e vir in. Tu xwe wan hêsîra ra bigihîne.

Evdile.- De êdî hûn miqat miqatê Tîgran bin. Ax ez çi zanim, qet aqilê min nabire!

Gulperî.- Çi nabire, lao.

Evdile.- Dayê qet aqilê min nabire Tîgran ji vê nexwaşîyê xilas be. Wekî vê carê Tîgran ji vê nivînê rabe hûn zanibin êdî mirina wî tune.

Gulberî.- Înşella tişte tune lao, çira zar nexwaş nalkevin?

Evdile.- Êêê, ez çi zanim..

Vebêjer.-*(Mala Evdile barê du hespa ar, den, penêr, toraq û xwarinên mayîn dagirtibûn. Kurê Evdile Mehmûd û du xortêd cînarê wan tivdarekê xwe kiribûn wekî Evdile ra herin gundê Avêdîs. Teve bi çek û sîlah bûn. Tivingê wane stû da bûn, qemê wane ber da bûn. Ew bû, êdî Evdile û lawik rêketinê bûn sê çar kulfetê cînara hatin ber derê Evdile)*

Kulfeta Cînar.- Apê Evdile, tê bibaxşînî, cefa ye. Eve heve den û rûn e. tê fireya xwe bifi mala Avêdîs.

Cînareke Din.- Evdile, eva heve xurek e, xwîşka te bona mala Avêdîs dagirtîye, tê kerema xwe bidê.

Cînareke Din.- Evdile, kurê min, belkî tu kura va kederê nebînin. Eva heve toraq penêr e. Me tirê ne tişteke e, de dîsa lao, bive zarongê Avêdîs gunene.

Evdile.- Camêr, vane hine gundî dîsa tên. Îja ez ê haqa hûr mûr çawa bibim.?

Cînar dubare.- Lao, borcê merivayîyê borcekî giran e, êdî gerekî cefê bibînî.

Vebêjer.-*(Hespeke barkirî jî ser herdê din da zêde bûn. Evdile lawik dane ser xwe û ber êvar bû ewana rê ketin. Evdile qest bednde dereng rêket wekî tarî bigihîjin mala Avêdîs. Ewî zanibû wekî eger eskerê romê ser hise hisa keve tucar nahêle ardimî bigihîje Ermenîyan)*

Evdile.- Gelê lawika, çetnaya me cî ke. Tenê pira ye. Divên romê ser pira binatara gundê Avêdîs pîkê dane sekinandinê. Însan e, emik rastî wan hatin, nevî nevî hûn tevî gilîya divin. Eger gilî ji gilîya derbz bû, wî çaxî êdî ez we divînim.

Mehmûd.- Bira gilîyê teve bavo.

Lawikê Cînar.- Apê Evdile eger pîkê me bibine xeta, wî çaxî wê ça be? Xwe em destê xwe tewar nakin nasekinin..

Evdile.- Wî çaxî, wî çaxî hûn û mêranîya xwe. Lê nevî nevî dengê çeka derdixin.. şixulê xwe bi qema bikin. We bihîst?

Mehmûd.- Bira isa be bavo.

Lawikên cînar.- Esse, esse.

Vebêjer.-(*Nîvê şevê bû. Lawika ranêzikayî pirê ra kir. Gilîyê Evdile derket, dûrva qeretûyê du meriva ber ronahîya hîvê ser pirê xanê dikir.*)

Mehmûd.-Wane ha, li wirin.

Evdile.- Min çawa we ra got.

Pîkêt.- Hûn kî ne, bisekîni.

Evdile.-Gelî lawika bikin em xwe pirê ra bigihînin.

Pîkêt.-Hûn xwe ne kerr in, yanê femê we tune. Min negote we bisekînin. Hûn xwe ne cerdbaşîne?

Evdile.-Malavano, ca moletê bide. Cerdbaşîyê çî, halê çî. Em jî îslam in, xwe ne kafirin, tu usa hêrs dikevî.

Pîkêt.- Hikyata min ra nevêje. Hûn wa kuda herin?

Evdile.-Emê herin aş. Zarong birçî ne.

Pîkêt.-Aşê çî wextî? îslam niha bona weten kafir qir dike hûn jî diçin aş?

Evdile.-Lê em çawa bikin? Axir neçin jî nabe.

Pîkêt.- Çira nabe?

Evdile.- Lê zaro...

Pîkêt.- Çima zaro eskerê Alî Oaman çêtirin? Yanê hûn kêdkavir in?

Evdile.- Em merivine kesîv in.

Pîkêt.- Wekî hûne kesîv in barê hana çî ne? Îda xeverdan ne lazim e, hespa cî da bihêlin hûn ji ku da hatine wê da jî herin.

Evdile.- Çawa hespa bihêlin?

Pîkêt.- Dive tuyî ker î? Ez divêm hespa barê wan va bihêlin herin.

Lawikê Cînar.- ew yek tucar nabe.

Evdile.- Axir tiştê isa dibe camêr?

Pîkêt.- De wê da bicehimin, wekî merivtayê fem nakin em ê niha zorê we bistînin!

Mehmûd.- De hela hûne mêr in xwe biceribînin!

Pîkêt.- Dizgînê berde merreez yanê na kuçik çapê divînî?

Mehmûd.- Ez ê niha kuçûk çapê nîşanê te dim!

Evdile.- Mehmûd lao bisekine. Camêr wa nabe.

Pîkêt.- Berde yanê na ez ê zikê te tijî dû kim ha!

Lawikê cînar.- De hela biceribîne!

Mehmûd.- Tu mêr î bike!

Pîkêt.- De îcar tê bivînî! Merreez!

Lawikê cînar.- Mehmûd tu ewî ortê rake ez ê hersê siwarê dinê bême der!

Vebêjer.-*(Mehmûd tiving dengê pîkêt derxistû hilbirî wekî bîne serê wî lê pîkêt qeme ber xwe kişand û anî bedena Mehmûd)*

Evdile.- Lêxin, lêxin birê min kiribin!

Vebêjer.-*(Heta Evdile xwe pê ra gihand Mehmûd birîndar bû lê Evdile qeme zikê pîkêt da zivirand. Derba quntaxa Mehmûd jî serê pîkêt girt. Herdu lawikê dinê pîkêtê mayîn bi qema kuştin.)*

Evdile.- Mehmûd kîdera te birîndar e ?

Mehmûd.- Qet ber xwe nekeve bavo, qemê bedena min girtîye, tişte nake.

Evdile.- Gelî lawika, zû bikin kincê Mehmûd jê bêxin, em birînê girêdin.

Vebêjer.-*(Xûn ji bedena Mehmûd dikişîya, Lawikan birîn girê dan ûhêvîya gotina Evdile bûn.)*

Evdile.- Gelî lawika, hûn Mehmûd Mespê siwar kin bivin gund.

Mehmûd.- tu zû bike xwe mala Avêtîs ra bigihîne. Ez ê vir bim heta tu tê.

Evdile.- Gelê lawika, de wekî isa be eglebûn ne lazim e. Hûn ber Mehmûd bin ez ê bayê bezê herim û vegerim.

(miqam)

Vebêjer.-(*Êmekî şûnda Evdile xwe lawika ra gihand.*)

Evdile.- Mehmûd tu çawa nî?

Mehmûd.- Ez î pakim bavo, qet berxwe nekeve.

Evdile.- Gelî lawika dizgîna hespa Mehmûd bigirin em hespê siyar kin.

Mehmûd.- Camêr çima ez isa bûn nikarin hespê jî siwar bim?

Lawikê cînar.- De pak pak, ez ê dîzgînîyê bigirim tu bixwe sîyar be.

Evdile.- De bajon, bajon hê kes me nehisyaye.

Mehmûd.- Bavo, te qe çawa kir?

Evdile.- Min xurek teslîmî kulfeta Avêdîs kir. Kes çûyîna min nehisîya.

Mehmûd.- Halê wan çi bû?

Evdile.- Feqîra halekî giran da nin. Nêze nêz ji wan dihat. Bawer bikî wekî me îşev xwe wan ra negihandawê birçîya çika çi bihata serê wan. Gelî lawika de êdî dereng e, sivik bajon.

Mehmûd.- Bavo, lê ya Tîgran?

Evdile.- Ya Tîgran jî min got mala me da ne. Zarûhîya hêsîr gelekî şa bû. Wextê derketinê got, birê Evdile em sax man hemîn em ê bên Tîgran bînin lê eger sax jî neman xwe ra bike ewled , bira ew jî bive kurê te.

Mehmûd.- Bavo,iii, hevekî hêdî bajo..

Evdile.- Wexlê mala min şewitîyê! Lê tu çira navêjî?

Mehmûd.- Ez ê çi bêjim.

Evdile.- Gelî lawika hespa lap hêdî bajon, ev der çel û nerd in, hesp hiltê datê, loma birîna Mehmûd dêşe.

Vebêjer.-(*Şeveqa sibê ra lawika xwe gund ra gihandin. Çaxê wana ra rênêzkayê mala Evdile kirin dengê şîn û girîyê bihîstin.*)

Evdile.- Eva çi ye? Dêmek tişteke serê Tîgran Qewimîye?

Mehmûd.- Min isa jî zanibû. Bavo, Ez î pak im, nevî nevî dîya min ra divêjî?

Evdile.- Çima?

Mehmûd.- Eger Tîgran tişt pê hatibe tu ya min jî bêjî qalmeqalmeke zêde yê rabe. Bira her tişt xilas be paşê. Ez hêvî ji te dikim bavo.

Evdile.- De bira gilîyê te be lao. Lê hema lawika ra here mala apê xwe bira hekîm bînin ser te.

Vebêjer.-*(Gundî tev hilşîyabûn mala Evdile. Dilê teva serkurê Avêdîs dêşîya. Gişka qedrê Avêdîs dizanibû. Mêr odê da rûniştibûn, kulfet jî xênî da dora cinyazê Tîgran çît girtibûn. Çend kulfeta dinivat, davîtime ser mirîyên xwe yî kev û teze, ser Tîgran û zelûlîya wî, ser xerîbîya wî, ser mala bavê wî ye bêxwey û bêxweda. Evdile hat, nava mêra da rûnişt lê bengzê wî kesî ra xweş nedibû.)*

Mêrekî hazir.- Evdile, niha em çi bikin, gilîyê te çiye?

Evdile.- Aqilê min, em hema Tîgran li vira heq kin teva çêtir dibe.

Mêrekî Din.- Lê dê û bavê wî yê nebêjin çi?

Evdile.- Berê ewilin ez ewledê Avêdîs û ewledê xwe hev nabişkivim. Hûn tev zanin berê da, hela hêna kal û bavê me da malê me yek bûne. Hemîn hûn Avêdîs jî rind nas dikin.

Mêrekî hazir.- Ela wekîl camêrekî şertê xwe ye.

Mêrekî Din.- —Malavao! Qisûra wî mêrî heye.

Evdile.- min gelekî ro kir û pîva. Neferê mala Avêdîs halekî giran da nin. Ew bixwe jî ne li mal e. Emik niha cinyazê Tîgran bivin ew ruhê ber dîya wî maye ew ê jî bibure. Em Tîgran bi wê yekê venagerînin. Serî ew e em xwedîtîyê li neferê wî bikin. Heta Avêdîs tê digihîjê. Hûn ya min dikin hema em êvî tîfalî cem me jî heq kin. Hemîn min dîya wî ra got bira Tîgran mala me da be heta dinê ronkî dikeve. Eve teqîş toqîşa hana ortê hiltê.

Vebêjer.-*(Gundî tev hatin ser sozê Evdile. Ewana bi erf û edetên Dêrsimê Tîgran nava mezelê gund da teslîmî erdê kirin.)*

(miqam)

Vebêjer.-(*Pey heqkirina Tîgran ra du roj derbaz bûn. Berbangeke sivê zîwîn kete gund, Mehmûd can dabû.*)

(Miqam)

Vebêjer.-(*Gundî tev hilşîyabûn mal Evdile Heval-hogirê Mehmûd dora cinyazê wî çît girtibûn. Evdile nava mêra da rûniştibû û qelûn pey qelûnê vedixist. Kirîn ji kesekî nedihat. Wê deqa kere-lal, berî teva kalemêrekî xeber da.*)

Kalemêr.-Bavo yek nîne, dudu nîne, eva êdî çendik-çend care mêrê me destê Romê diçin. Heyran berê kengî wa bû? Hedê eskerê Romê hebû ser sîya me keta.

Mêrekî ji cimaetê.- Gilî jî gilîyê apê min e. Bavê minê remetî jî hertim ew gilî dikir.

Evdile.-Ya me, eme serê çîya ne. Hela hûne dakevne deştê hûnê hêja kirê eskerê Romê bivînin.

Kalemêrek.-Erê, divên hêsîrê Ermenîya sirgûn dikin. Îcar ew padşê Romê çi ji wê cimeta hêsîr dixaze, feqîra çi kirine. Rom devxûn bûye. Belkî textê padişê wê welgere wekî wê riatê hatîye xezebê. Êêê bavê min, em jî gunekarin, em jî. Çaxê Dêrsimîya hev digirtin, wî çaxî devê bavê tu padşê Romê neketibû lingê xwe bavêje yêra me. Wî çaxî mêr nava me da hebûn. Mîna niha ye? Wekî Kurda hev berdaye, piştta hev nagirin. Welleh serê bavê camêra kim em ku hev bigirin, tifaqa me hebe tu cara Rom na, bavê romê jî bê piştê tucar me nikare.

Vebêjer.-(*Rojekî şûnda xwelîya mexberê Mehmûd jî rex ya mexberê Tîgran da bilind bû.*)

(Miqam)

Sehneya çarem

Vebêjer.-(*Pêlek derbaz bibû. Avêdîs ji destê Romê revîbû hatibû gundê xwe. Berêvarekî Avêdîs û çend hevalên xwe va daxilî nava gundê Evdile bûn. Evdile û Avêdîs odê da rûniştibûn û pirs pirsîyar ji hev dikirin.*)

Evdile.- Avêdîs bira, de îcar tu wê bêje, çi hatibû serê te? Tu niha ji ku tê?

Avêdîs.- Qet, ji min vegere, ya hatîye serê min bira neyê serê Îbê kurmexarî. Evdile, bira ezik vegerîyam min ne jin dî ne jî zaro.

Evdile.- Lê çawa bûne?

Avêdîs.- Kî zane..

Evdile.- Hilbet?

Avêdîs.- Divên eskerê Romê gundîyê me tev dane pêşîya xwe û kes nizane kî alî birine. Ezik çûme gund, min gund nas nekir. Eskerê Romê nivê avaya hilşandibûn nivî jî şewitandibûn. Rêva em pê hisîyan wekî gele Ermenî revîne xwe dane çîyayê Dêrsimê wekî bal Kurda serê xwe xilas kin.

Evdile.- Avêdîs, bira, rojê ha da mêr gerek dilê xwe qewîn ke, ber her çetnaya teyax bike.

Avêdîs.- Êdî em teyax nekin em ê çi bikin?

Evdile.- Bira, meseleke cimetê divê: şîna tevê dinê şayî ye.

Avêdîs.- Belê, isa divên.

Evdile.- Avêdîs, ez ê te ra gilîkî bêjim lê tu gerekê bîna xwe firekî.

Avêdîs.- Bêje Evdile, bêje.

Evdile.- Êvarekê tarî ketibû erdê, derê me kutan me derî vekir, eva Tîgran. Xûşka Zarûhîyê şandibû hine arvan. Eskerê Romê gundê we talan kiribû, zaro xelayê da bûn lê hema tîfalî rêva gelekî serma kiribû. Tehl ket. Me kir nekir çare nebû. Avêdîs bira, dinyaye, gerekê tu berxwe bidî.

Avêdîs.- Gotina te, tişteke Tîgran hatîye?

Evdile.-Avêdîs, çavê birê te kor be...

Vebêjer.-(*Lezekî şûn da Avêtîs û Evdile ser mezelê Tîgran ra sekinîbûn. Herdu jî çila bûbûn, kesî ji wan dey nedikir. Avêtîs mezelekî teze rex mezelê Tîgran texmîn kir û vegerîya ser Evdile.*)

Avêdîs.-Rehme lêbe, Evdile, eva mexberê rex yê Têgran yê kê ye?

Evdile.-Eva, eva mezelê Mehmûdê te ye...

Vebêjer.-(*Ewana êpêce waxt ker û lal sekinîbûn. Paşê li hev nihêrîn û bê xeberdan hev hemêz kirin. Wm demê nava wê hemêzê da tey bigota birînê dilê Avêdîs û Evdile kew digirtin*)

BÊQELEN (Fêrikê Ûsiv)

Sehneya yekem

(Meqamekî Kurdî)

Gundê Axdaşê, mala Cefo.

Cefo li ser keravatê çarmêrkî rûniştiye, Şarê li ber tenure şipiya sekiniye, teşiyê dirêse. Ethem rûniştiye ser çewalêd arvên, lingên xwe dibe tîne.

Cefo.— Lê lê, Keyê, qîza Dûko ji Ezîz re şir qelandiye, husn, cîsn, çakûçê wê rast, xeysetê wê baş, çi qas tunebe, qîza esilzadeyan e, neviya Şewêş e, Şewêş wextekê rîspîtiya gundekî dikir, bi gilaviyan re dida û distand, bi gûbêrnator re dida û distand, xwe ne qolayî ye?

Şarê.— Cefo! Bi ya min be tê terka Şewêş mewêşan bidî. Bi ya min bikî, em ê îşev herin destê qîza Rustem bigirin, nîşaniyên xwe pê ve kin, qet û birra xwe tê kine yek û bêne mala xwe... Qîza mêrik, di ser bextê min û kurê min de be, hêja ye: Pî pêş e di gund de, serî ew e di gund de ye, gundiya me ye, em nas dîkin, dibê'n, merov dewê xwe yê cêribandî nade qatixê necêribandî.

Cefo.— La pihîn li wî dewî ketê, dewê sirsûmê yê ku Xezal bikilê...

Şerê.— Îcar çiyê te bi dê ketiye?! Dê ji xwe re, keçik jî ji xwe re. Ji dê û bavan hezar tûle dikevin.

Cefo.— Ê ça' çiyê min bi dê ketiye ? Ji xinamiya xwe re ez hinekî jî beşerxweş nebim, laqirdiyekê, gilî û gotinekê pê re nekim... Na na, Xwedê hebînî, êdî çi xinamî ? Rabe, Eto can, rabe here gazî Ûsivê Sefer, Têmûrê Emerîkê bike, bila bîn.

Şarê.— Eto, neçe, hela sebir ke...

Cefo.— Ê çawa sebir kim? Axir qewl û qerarên min bi mêrik re hene. Mêrik niha taxsa xwe kiriye...

Şarê.— E, bo tê bişînî pey Usiv, Têmûr, Têmûrê Dîlo bîne, ew ê bê te li hespê siwar bike ?!

Cefo.— E, bi keleyê bavê te kim, ez jî dixwazim siwar bim. Ji zû ve li hespan siwar nebûme, heee, bi serê Eslan, ku bi silametî min bûk siwar kir, ez hespekî sovxozê, Mehê distînim, siwar dibim, çend tiradan didimê. Naaa, Keyê, hewesa min rabûye. Min ji zû de kur nezewcandine, şeka min neşikêne. Eto can, baz de!

Şarê.— Ez dudil im.

Cefo. — Xwedê dudiliyê nedê, çi teba ye dudilî ?

(Eto diçe, Cefo ji şifanêrka qulçê xênî litrê araqê derdixe, diçeliqîne, lê dinhêre)

Cefo.— E... çi rind xeleq digire. Eêêf... Male kandraband e, kî vê vexwe, wê bi pêxemberan re bimeşe.

Şarê.— Bixwe, bixwe, belkî xwe li ber Dûko mûkoyan dişewişîn.

Cefo.— Keyê, ji çi re Dûko yê min teze nas bike? Em hev nas dikin hêê ji heyna Nikola de... Em jî şukir diçin şahiyê, xwe naçin şînê? Xwezgînî jî bibêjim, hinekî kêfa wan xweş be. Ez ê vê bi araq verê bikim, heta ku Êsiv û Têmûr tên. Ê ya Rebê aleme, tu ar û namûsê bidî.

Sehneya duyem

Dengê zirneyê tê.

Koço ser rê fîrxûn daye sekinandin. Bendên hespan dişidîne. Cefo, Êsiv, Têmûr, Şarê, Eziz, biraziyê Cefo ji malê dertên, ber bi fîrxûnê ve diçin. Cefo serxweş e. Hemangî dişewişe, xwe dide rex Êsiv.

Cefo.— Êsiv, haaa... em ê herin, dêmek qet û birra xwe tê kin yek, tasek duduyên xwe jî li hev xin, bên.

Êsiv.— *Bila xêrlisî* be, bila Xwedê oxir û namûsê bide.

Cefo.— Xwedê oxir û namûs daye, ji zûû da... Qewl û qerarên me bi hev re hene...

Êsiv.— Yên te û Xwedê ?

Cefo.— Yê min û Dûko, lo... Ez bê serê Dûko nebim, Dûko başqe ye. Niha taxsa xwe kiriye... Esil heye, êêê, ne qolay e. Aaa... Heke eslê mêriv hebe, bizanibe her tişt jî tollî ye. Mêrê Tirk dibê': "Eslinda nedir, beslinda odır"

Êsiv.— *Eslinda nedir, beslinda odır...*

Cefo.— Dere diki çi dibê' ? Dibê', dêmek, eslê te, cîsnê te çi ye, gilî û gotina te jî ew e. Dêmek, *eslinda nedir, beslinda odır...*

Têmûr.— Êsiv, vî ew Tirkî ji kû aniye?

Cefo.— Hiii, te çi got, çûro? Lo, tu çûr î, here çûrtiya xwe bike. Karê te bi min neketiye, ha... Dewr dewrana min e...

Eziz.— Bavo, de biliv, siwar be.

Cefo.— Ez ê siwar bim. Tu hela were, ji te re ez e giliyekê bibejim. Ro riyo, em ê niha herin wir. Em ku çûn wir, be, ê...

Ezîz.— Ê...

Cefo.— Ez ê bibêjim, “Ez tî me” îcar tu dizanî ez çima isa dibê’m, xwe ez tî nîn im?.. Naaa... Ez isa dibê’m, keçik te ra avê bîne û tu keçikê bibînî, begem bikî. Te ku begem kir, bê, ê...

Ezîz.— Ê...

Cefo.— Çavê xwe ji min re biqirpîne. Te ku qirpand, ii efendiye xwe re bibêjim, ezê bizanibim te begem kir.

Ezîz.— De, ez dizanim, îîî...

Cefo.— Nebê’, dizanim, ji xwe re hîn bibe.

Usiv.— Cefo, em bilivin, dereng e.

Cefo.— Êsiv, erê, me gilî rast kir, em bilivin.

(Êsiv, Têmûr, Şarê, Ezîz, biraziyê Cefo hedî hedî li firxûnê siwar dibin. Cefo ji hildikişê ku siwar bibe, hingê Naza bûk di parra va destê xwe davêje milê wî, pêncekê wî dirêj dike.)

Nazê.— Hi... hi... niç...

Cefo.— Ê... ev çi dibê’? Bo here, li xwe nakim.

Nazê.— Hi... hi...

Cefo.— Keyê, pîîî... qey ev me fam nake ?

Şarê.— Bo te xwe winda kiriye...

Cefo.— Keyê, ez dibê’m, bibe, ew dibê’, niç, niç?..

Şarê.— Ê li xwe bike, çi tu kaw dibî, tê serma bikî!

Cefo.— Ê ne tu jî ji sibehê heta êvarê qîza girik geniyê yî, ji vê dinyayê çi fam dikî ? . Keyê, çi dewra sermakirinê ye. Saroçkeya min li min e, saroçke, kor î, nabînî? Kuro, bajo, Koço bajo, biftînê!

Cefo.— (Distrê.)

Eman eman keçikêêê, emaaan,

Me derbas bûn sal û zemaaan,

Xelq zewicîn, ez û tu man...

Sehneya Sêyem

Xwezginî deh panzdeh deqeyan da digihîjin gundê Biradaşê, mala Dûko. Rûdinên, xoş, bêş, gilî û gotin, ji xwe ra xever didin.

Dûko.— Cimaet ser çavê me ra hatiye!

Bi hev re.— Xwedê serê te xweyî ke!

Dûko.— Êsiv, qe nanê we îsal çawa ye?

Cefo.— Tuyî sax bî, Dûko, tollî ye...

Êsiv.— Dûko, weleh bi qewlî Cefo va, tollî ye, rind hatiye, de çi ka ma...

Dûko.— Baranên îsal xezîne bûn, xezîne...

Cefo.— Ez tîî me...

Dûko.— Qîzê Besê, ca bibêje qîza malê, bila ji Cefo ra avekê bîne.

(Sernaz avê tîne. Cefo bi çokê diniçîne Ezîz, wekî li Sernazê dinihêre. Bala Ezîz û Sernazê dikeve hev, her du jî beşerxweş dibin. Sernaz diçe. Hingê cîranê Dûko, Dodoyê reş î ebilû di dêrî de tê.)

Dodo.— Êvara we bi nirr.

Bi hev re.— Di ser çavan re hatî, ser çavan!

Dodo.— Besikê, ca qet benda xwe nadî, diya min dixwaze.

Dûko.— Dodo, kerem bike, bi pêş da were!

Êsiv.— He, ev Dodoyê me ye ?

Cefo.— Êsiv ji çi ra te hêca nedît avahiyê çawa birq veda. Te texmîn nekir? Ew şewqa nûr û neder Dodo ye.

(Dikenin.)

Dodo.— Meriv rastî sorê çavhêşîn neyê.

Dûko. — Dodo, kerem bike, rûnê.

Dodo.— Ezî bi lez im, Xalê Dûko.

Dûko.— Hela rûnê, rûnê! Ê Êsiv, qet li cem we dengê dinyayê çi heye?

Ûsiv.— Dengê dinyayê, Dûko, saxî û silametî. Dinya şên e, em lê ne. Şer tunebe, her tişt ê jî baş be.

Dûko.— Dibê, gîtnakanekî gotiye, wekî ku Şerê Sisiyan bibe, ew atom ku biteqe, dinya yê mîna aşê bêrê li dora hev bizivire.

Ûsiv.— Xwedê neke tişteki wisa hebe. Êdî aş ê bimîne, qeraş ê bimîne? Tev ê bibe toz û xwelî...

Dûko.— Ûsiv, îcar, Elah neke, tişteki isa ku bû, ev ruhber, ev însanê wê çawa bibe ? Axirîya dinyayê wê bibe çi?

Ûsiv.— Wê çawa be, we bibe axirdewir. Dinya yê bibe fisildûman. Herça bû rastiye, însan temami wê qir be, *batmîş* be, û ji Dûko re bibêjim, paşê dinya yê dawarive, *tezedan* rawir ê ji xweliyê rabe, paşê meymûnê bi çêsidê Dodoyê me bi pêş de bê, û hêja însaniyet ê ji meymûnê bixuliqe...

(*Dikenin.*)

Têmûr.—Wey mala Dodo ketî, Dodoyî zor e...

Dodo.— Beskê, de te qet benda baniya, ez biçûma, niha diya min li hêviya min e.

Dûko —Tu wê rûniştîyî, Dodo can, Tê rabî çi ? Bila zarek qetekê bibe. Tu rûnê, lawik hatine, em ê ji xwe re xeber din, hey em ê laqirdiyekê bikin, hey ew ê laqirdiyekê bikin, em ê şeva xwe derbas bikin. Qîzê Besê de zû bike!

Ûsiv.— Duko, bila Xwedê vî *qapîyî* şên bike, qedîm bike. Bila kêmasiya vê malê tunebe. Em îro seva xizmetekê hatine. Hetanî ku tu xizmeta me bi miraz şa nekî, ehd û qerar be, em destê xwe li mala te danaynin.

Dûko.— E, erêêê, hûn di ser çavên min re hatine. Bila non bîne, em ê nanê xwe bixwin, dîsa em ê ji xwe ra xeber din... Dîsa em ê giliyên xwe bibêjin. Giliya we çi jî hebe, ez we bê qedir verê nakim.

Ûsiv.— Xwedanqedir bî. Ez bê serê te nevim. Ez giliya te talan nakim. Lê îja, dêmek, gilî hene, derece hene. Şukir îro kurê Cefo jî gihiştîye, qîza te jî. Em îro hatine *qapîyê*, te, qonaxa te, dêmek, dewa merivatiyê li te dîkin.

Dûko.— Ser çavên min ra bên. Bila wek giliya we be. Qîzek e, min qurbana kurê we kir.

Bi hev re.— Rûspî bî, Xwedê te rûspî ke!

Ûsiv.— Dûko, de îja keremke. Qelenê qîza xwe jî bêje yekser, em qet-birra xwe têkine yek, paşê em ê xwera rûnên derbaskin. Şeve dirêjin...

Cefo.— Dûko, bibêje, ez li ber te sekinîme. Ez bavê Ezîz im, bibêje, hema ez kêr, tu penêr. Çi qas te tê, bibirre.

Ûsiv.— Cefo, nebê, ez kêr, tu penêr! Bibêje, tu kêr, ez penêr!

Cefo.— Ey çi ferqî?! Ya Hesên Keçel, ya Keçel Hesên. Yek nîn e?

Ûsiv.—Kû re yek e? Axir tu kêr bî, ew penêr be, tê wî bibirrî, ew kêr be, tu penêr bî, ew ê te bibirre.

Cefo.— O, Xwedê birrînê nede.

Ûsiv.— Lê qelenê xwe nabirin?

Cefo.— A îcar qelen bira bibirrin. Dûko, bibirr, çarê.

Ûsiv. —Dûko, we rê da.

Dûko.— Ez ê bêm, bêm. Lê îcar, Ûsiv, hesav hene, hesavê qîzan jî heye! Qîz heye qîz e, qîz jî heye, qîzkok e. Qîza min jî qîz e, qîzên xelkê jî qîz in, lêbelê, ferqî heye! Min qîza xwe terbe û tore dayê, qîza min, dêmek, di ocaxzadeyan de mezin bûye, qîza min pêncî xwezgîniyên wê hatine, min nedaye! Ne seva ku ez bibêjim qelen, malê dinê. Na. Dilê min nexwestiye, min nedaye, xwe ez hemû merivan yek nagirin.

Ûsiv.— Tu qelenê xwe bibêje!

Dûko.— Qelenê qîza min pênc hezar manat perê teze û çar xelat.

Ezîz.— Nabihêêem..

Cefo.— Kuro, tu çawa nabihêyî?

Ezîz. — bo, cê tu ker be ûûû!

Cefo. — îyyyy evî guhjejî!

Şarê.— Cefo, ca vir da! Kuro, te hebek araq vexwariye, tê me têkî sosret?

Cefo.— Keyê, mêrik qelenê xwe dibirre, ev dibê', nabihêm...

Şarê.— Îcar zanî qelen çi qas dibê'? Pênc hezar manat...

Cefo.— De bila bibêje! Îcar pênc hezar çi ye?

Şarê.— Pênc hezarê teze, pêncî hezarê berê?!

Cefo.— De pêncî olsun aa... pêncî çi tebayek e?

Ûsiv. —Duko, berjêr were, berjêr! Wisa bike di quweta mêrikan da be, merikan bidin. isa be, ne şîş bişewite, ne kebab.

Cefo.— Dûko, bibirr, çavê'm, ez kêr, tu penêr...

Ûsiv.— Cefo , ca bise, malavayo, bise em hev *qandirmîş* bikin.

Cefo.— Kuro, Ûsiv, Xwedê hebînî, tu çi wisa xwe kişî ortê dikî? Xwe tu xweyiyê kur nîn î? Kur kurê min e? Kurê min e! Mêtirîka wî, famîla wî, gilî û gotina wî li ser min e? Li ser min e, xelas bû çû!

Ûsiv.— De erê, Cefo... Me tu tişt negotiye. Kurê te ye, mirazê te pê bibe.

Cefo.— Erê, ne îstirsên, mêtirîk çi qas dibirre, ez çi qas didimê senane.

Ûsiv.— Ê... Min dixwest hinekî di quweta te de bûya. Min dixwest te bizanibûya pênc hezar çi ye.

Cefo.— Hê, hê... qama min, tu bi kê ra kapan davêjî. An te dixwest bizanibûya pênc hezar çi ye? Dixwazî te ra tercime bikim: piyat tîsiç, pênc hezar, beş bîn! Dixwazî bi Gurckî jî bibêjim?

Têmûr.— Bes, bes Cefo, Cefo, em serwaxt bûn.

Ûsiv. — Alîkî da jî gilî giliya Cefo ye, wekî di gêriya mirov da hebe, na na, Xwedê hebînî, mirov çima nede? Îcar dewlet Xwedê li serê Cefo. Çima tune? Ihi, ihi..(*Dikuxe.*) Şukir bol e... bol e, lê ew qasî me dixwest çend manatan peya bikî...

Dûko.— Pênc sed manat jî qurbana we, lê çar hezar û pênsidê xwe ez ê tam bistînim!

(*Meqam.*)

(*Bûkê tînin, Cefo gustîlekê dike tiliya bûkê.*)

Cefo.— Tiliyên bûka min zirav in. Dûko rind xweyî nekiriye. Tu bise, ku bi silametî min bûka xwe bire malê, ez ê kozî bikim *anane doxme* bikim wekî her tiliyeke wê bibe şivdarekê.

(*Dikenin*)

(*Bûk diçe. Besê texte rast dike. Nanê loş, goştê pêz ê qelandî, şeravê û kanyakê datîne ser texte.*)

Cefo.— Nanê bê sazband tê xwarinê? Bişînin pey sazbandan.

Ûsiv.— Cimaet, sax bin! Dûko, Cefo, bila ev şahî bimbarek û piroz be! Em vê kasê birincî pêk bînin, eşqî dê û bavê, bûk û zavê, eşqî her du gulan!

Dûko.— Gul xulamên te ne, Ûsiv.

Ûsiv. — Eşqî her du gulan. Wekî îro bûne meniya vê kêfê, vê şahiyê, ku em xwe ra derbas dikin. Bila her du gul bi rizaya Xaliqê min bibine du gulên bêhn, neçilmisin. Eşqî wan. Cabê dihêlim bal zavê.

Bi hev re.— Eşqî her du gulan! Bila bi sehet û quwet bin, bila bibin gulên qencyê!

Cefo.— Xwedî xêrê ji kasa xwe bibînin.

Têmûr.— Xêrê ji mirazê xwe bibînin.

Ezîz.— Apê Dûko, Xalê Ûsiv, Xalê Têmûr, bavo, herçê mezin, ez xulamê we me. Herçê cahil jî, em birayên hev in. Bila em bê giliya mezinan nebin. Merivê bê mezin bê serî ye. Bila Xwedê wê merîfetê jî bide me, em qedrê mezinên xwe bizanibin. Û anegorî wê eşqê, ji wê hurmetê derên, çi ku mezin ji me re hesab dikin... De li ser gilî û gotinên we.

Dûko.— De efîyet be, kurê min, şukir tam e.

Cefo.— Ma ji çi re kurê kî ye ne tam be?

Têmûr. — Mirazê te pê be.

Dûko.— Lawikno, de nanê xwe bixwin. Hûn çawa dixwin? Nanxwarina we qet ne bi dilê min e.

Têmûr.— Edî em zehfî dixwin, lewma ne bi dilê te ye?

(Dikenin.)

Dodo. — Lê wekî sorê çavhêşîn e.

Têmûr.— Heyrana wê netika te me, Dodo can. Tu wê bêje, tê kingê bizewicî? Tê ew qîz û bûkên Baradaşê gişk kamçoyî kirin, malavayo...

(Dikenin.)

Dûko.— Cînetî bî, Têmûr, cînetî bî.

Ûsiv.— Lawikno, ez ê giliyekê bibêjim.

Dûko.— Kerem bike, birayê min!

Bi hev re.— Kerem bike, rîspî!

Ûsiv.— Cîmaet, ev îro ku em bi kêf, eşq, ken, laqirdî derbas dikin, ev qedir seba çi ye ? Ev tev bi rizaya Xaliqê min, bi saya serê Dodo ye, gula eniya wî, nûr û nedera wî, werin em vê kasê jî pêk bînin eşqî Dodo, eşqî caniya wî!

Dûko.— Weleh xweş e, hêja ye Dodo.

Ûsiv.— Eşqî Dodo, Dodoyî ber bi miraz e, şukir mirazê wî hê digere, bi silametî, bi xêr û xweşî em rojeke wiha jî li ber def û daweta wî bireqisin. Delalê mîna Dodo jî li millet kêr nebin, rewşa millet neşehite.

Dûko.— Bila Xwede te rûspî ke, Ûsiv. Bila camêrê mîna te jî li millet kêr nebe.

Ûsiv.— Dûko, bila tu jî sax bî, serfînyaz bî. Bila merivatiya te û Cefoyê me jî, bi rizaya Xalîqê min, bi qet û bira we va zirav û dirêj be.

Cefo.— Na Ûsiv, na, yox, isa nebêj, nebê', dêmek, merivatiya we zirav be, dirêj be... Bila merivatiya me qalim be, dirêj be. Mîna şîrîtan, mîna wan şîrîtêd li serê finîkilorê... Riyo-riyo, Têmûr, tu çûyî Tiflîsê?

Têmûr.— Çûme.

Cefo.— A merivatiya me isa dirêjê be, bê, ji serê finîkilor de bê, ji Çiyayê Kojor derbas be, isa wir da bê di Gêdûka Ortînavê re heere li serê Çiyayê Elegezê biale, paşê ji wir da berjêr bê, bigihîje vira, ez ê rind kêrîşa Dûko da bialînim, paşê bi serê şîrîta şêmîka me va girêdim, tekera trextorê ji bidim ser, mengene bikim... isa be qe neqete.!

Têmûr.— Heyla, Xwedê mala te ava bike.

Cefo. — Dûko, te çi got ?

Dûko.— Xwedê bike isa be. Bila Xwedê rûspîtiyê bide.

Bi hev re.— Silametî be! Silametî be!

Ûsiv.— De kasa dagirtî bi eşqa Dodo.

(Klam)

Ûsiv. — Kêşş.. li ber derê Koço.

Koço.— *(Dikuxe.)* Ez ê yekê bibêjim. Hesenê Cizîrî distrê.

Têmûr. — A ji wan haaa.

Dûko.— Çi ka bibêje, em bibihên.

(Kilam.)

Ûsiv.— Koço, kurê min, dengê we ji me ra, kerema Xwedê jî ji we re. We çawa kasa min şêrîn kir, bila Xwede jî emrê we şêrîn ke.

Koço.— Ê bavo weleh heq e di ser eşqa Dodo da Hesen Cizîrî jî bistrê, Ehmedê Cizîrî jî, na welle Şeroyê Biro jî, Mehmedê Mûsa jî.. Eşqa wî ye...

Bi hev re.— Eşqî te, Dodo!

Dodo.— Xwedê sehetê bide we!

Têmûr.— Dodo, eşqî bext mirazê te û qîza Çarsim Axa.

(Dikenin.)

Cefo. — Dodo Kerem bike.

Dodo.— Xêrê jê bibînin!

Bi hev ra. — Xwedê mirazê te jî bide Dodo!

Dodo. — Cimaet saxbî! Çiqas bijî baş bijî! Ez zehf razî me bona eşqê, ez jî dixwim eşqî xwe, bîrîncî eşqî nefsa canê xwe, îkîncî eşqî çarsim axa û Têmûrê birazîyê wî!
(*Dikenin*)

Têmûr. — Saxbî Dodo Saxbî.

Dûko. — Têmûr te girte xwe, de îda ker be ha! Ser sîya Dodo nekeve.

Têmûr. — Bavo welle ez ê îda ker bim. Kî ker nebe bira Xwedê wî bîne ser çêşîdê Dodo!

(*Dikenin*)

(*Hingê sazband dêrî da tên. Rûdinên tasa eşqê vedixwin. Cefo dibêje wana*)

Cefo.— Kuro zirneçî, tûş, tûştûşekî lêxe, bila cahil rabin bilîzin!

(*Dengê zirneyê. Govendê digirin.*)

Cefo. — Kuro lêxin lêxin, isa bikin bira dinya biheje, teh teh teh teh, hoka hoka hoka.. kuro lêxin ka hûn ça lêdixin, ez çaxê we ra bûm min ser piştâ qamêş tîk tîk trîngî dilîst, kuro zirneçî huşş, ez çend pera bidim te tu serawek isa lêxî ev dîwarê Dûko gişk cî da bireqisin?

Sazband. — Çi jî bidî me qebûl e!

Cefo. — Keyê, çîqa kastûnê min.

Şarê. — Kastûnê te li mal ma.

Cefo. — Ê te çî ra neanî? Te negot şayîk heye gilîk heye. Pere li gund mane roryoo, pere kastûnê min danin, sivê were gundê me ez deh manatekî reqreqo bidime te. Dodo îja tê ku da herî, were xwe ra bileyîze, Têkeve sergovendê. Silametî ku min dewat kir ez te dikim serdewatî, qaîlî?

Dodo. — Qayîl im.

Cefo. — Here Dodo can, qet minetê nekişîne, ez xalê te me.

Ûsiv.— Cefo, were, salixî mane.

Bi hev ra. — Cefo were, Cefo pêş da were.

(*Civat rûdinê.*)

Ûsiv.— Cimaet, sax bin, serfinyaz bin, em bê serê Dûko nebin, wisa jî bê Cefo jî nebin. Wekî îro merivatiya xwe kirine yek, miraz gihandine hev û me jî kêfeke dinyayî ji xwe ra derbas kir. Cimaet, ez texmînan dikim êpêce şev çûye. Hatiyan re jî çûyîn lazim e, ji mayiyan re jî rihetî. Werin em ve kasê jî hildin eşqî texteyê Dûko, bila şên be, qedîm be!

Bi hev re.— Malî ava, bila şên be, qedîm be!

Cefo.— Kuro zirneçî, qaydeyê çûyî û maya lê xe!

(*Meqam.*)

- Tûş, tûş...

(*Civat belav dibe.*)

Sehneya çarem

(*Ro bi bejneke bilind bûye. Tîrincê avêtiye kuleka Cefo. Şarê nava malê dide hev. Ethem ber tenûrê rûniştiye kewkanîyê çêdike. Cefo xewê radibe, tevziyan dide xwe, kincên xwe li xwe dike, qayîşa xwe girê dide.*)

Cefo.— Keyê, ez îro çima iha têr im?

Şarê.— Ez çi bizanibim? Xwedê bizanibe. Dibe tu rabûyî paşîvê?

Cefo.— Êêê... Paşîva çîwanî?

Şerê.— “Paşîva çîwanî?!” Paşîva mala Dûko! Te duh kerratî nedixwar?

Cefo.— (*Di bîr tîne.*) Ça? Min jî vedixwar?

Şerê.— (*Bi eks.*) Na, min dixwar...

Cefo.— Ê erê, min dît texte danîne. Min dît, lawikan dixwar, lê herça ez im, min nedixwar...

Şarê.— Te xwar, xwar, çar hezar û pênsedê teze jî kire qelenê ser serbar!

Cefo.— (*Şaş mayî, destê wî ji qayîşê tê berdan, şalê wî dişiqite.*) Ehê, çawa çar hezar û pênc sed?!

Şarê.— De êdî huşşş...

Cefo.— Heee? Hela ev çi dibê? Çawa çar hezar û pênsid? Çawa huşşş ? Keyê kî di dewran da bihîstiye çar hezar û pênsed manat qelen?

Şarê.— Ew e, qelenê mêrik jî ew e.

Cefo.—Ê, erê, qelen qelen, qelen hezar manat, haydê te ra du hezar, lê çar hezar û pênsed manat çi xeber e? Keyê, here here, xwe seba ewa şirtiberwarî (*ji şikra bûkê ra*) xwe ez xwe talan nakim? Here nîşaniyê bîne!

Şarê.— Kerr be, de îda kerr be. Tê me nava xelkê da bikî sosret.

Cefo.— Lo keleyê bavê wî xelkî! Na na, Xwedê hebînî, sibehê ez ku rût bûm, birçî bûm, xelkê nên bide min?

(*Ezîz di dêrî re tê.*)

Ezîz.— Çi ye? Çi qewimiye?

Şarê.— Kuro, duh qîza mêrik nîşan kiriye, îro hatiye dibêje, here nîşaniyê vegerîne.

Ezîz.— (*Bi hêrs ketî.*) Çawa vegerîne?!

Şarê.— Lê, teze bi xwe hisiyaye, teze dibê', çar hezar û pênsed zehf e min birriye...

Ezîz.— Zehf e, bira nebirriya.

Cefo.— Qelenê qîzên xelkê du hezar e, hezar û pênsid e, hela qîz hene, hezar in.

Ezîz.— Here, here, yeke bi dused manatî ji min re bixwaze.

Cefo.— Ê ka te sed manat jî aniye vê malê tu ser pişta min kap dilîzî?

Ezîz.— Bo tu kincê xwe li xwe bike.

Cefo.— Kincê min li hêviya te maye?

Ezîz.— Evî xurifî...

(*Dêrî qalim lê dixê, dertê.*)

Cefo.— (*Bi destekî şalê xwe digire, li pey Ezîz dertê derê malê.*) Îî beytû... beytû..!

Şarê.— (*Milê wî dikişîne, dibe hundir.*) Pîî, pîî! Kuro were, tê me di nava xelkê da elaw bikî ?

Cefo.— Êne ev jî kurê te dêyî ye, ji te ketiye, wê bibe çi? Here gîza girgîgenîyê, nîşaniyê bîne!

Şarê.— Ez naçim. Te çawa nîşan kiriye, wisa jî here vegerîne.

Cefo.— E ez ê herim, çima naçim jî. (*Şalê xwe hersehêrs girêdide, kumê xwe dide serê xwe.*) Koro, Eto, binihêr avtiya Miko hatiye?

Şarê.— Pîî, evî sosret, îcar pê avtiyê diçe, wê here bûkê siwar bike.

Cefo.— Sosret bavê te bû, wekî peya rê diçû.

(*Diçin.*)

Sehneya pêncem

(Meqam)

(*Gundê Baradaşê, mala Dûko. Besê tarelkê şuştî zuha dike, dike sêrvantê. Dûko ser text rûniştiye çena xwe miz dide, tizbiya xwe li ba dike. Difikire. Paşê xwe bi xwe ji xwe re xever dide.*)

Dûko.— Çaaar hezaaar û pênc sed... Çar hezar û pêncsed manat. Ez ê hezar manatî ji qîza xwe re têkime xerc, wê sê hezar û pêncsed manat dimîne. Meco lawo ca bilûra min bîne, min ji zû ve li bilûrê nexistiye!

(*Bilûrê tîne. Ew lê dixê. Dengê avtiyê tê. Cefo ji dêrî de tê.*)

Cefo.— Rojxêra we.

Dûko.— Ser çavan ra, kerem bike.

(*Dûko bilûra xwe nerm datîne kêleka xwe. Cefo rûdinê, deqeyekê li hev dinihêrin.*) "

Cefo.— Dûko, zanî ez îro seba giliyekê hatime.

Dûko.— Seva çi?

Cefo.— Tu nizanî seva çi?

Dûko.— Seva çi ? Nebî tu hatî qîzeke din jî bixwazî ?

Cefo.— Min yek xwestiye zehf razî me, îcar ma yeke din...

Dûko.— Çi ra ne razî yî?! Duh tu direqisiyî...

Cefo.— Duh duh bû, îro îro ye, xwe hemû dewran nabin yek..

Dûko.— Îcar niha dewa te çi ye ?

Cefo.— De'wa min ew e ku, dêmek, ji me re dest nade. Ez nabêjim wekî qîza te qolayî ye, filan û bêvan, na! Qîza te, weleh, baş e jî, pak e jî, lê vê demê kurê min zewacê naxwaze.

Dûko.— Kuro, ez lêpokê te me? Te duh xelk anî, qîza min nîşan kir, îro hatî vedigerînî?

Cefo.—Haşa ji te, Xwedê lêpoktiyê nede...

Dûko.— Lê lêpoki nîn e? Te duh merivatiya me dikire şîrît, di finîkilorê ra dianî serê Elegezê, îro hatî van giliyan dikî?

Cefo.— Kuro, dîn î, finîkilor li kû, Elegez li kû? Çawa şîrît ê ji wir da bê li serê Elcgezê biale?! Tu qe didî hişê xwe tu çi dibêjî? Ew giliyên ku tu dikî, hêê merivên heyne beriya Deqdenos ên lap herîf dikaribûn tiştên wisa bigotana. Ev çi dewran e ?

Dûko.— Te îcar tekera trextorê danî dida ser?

Cefo.— Kuro, bi erda Xwedê ketime, herim, dêmek, tekera trextorê, sarika wî ya binî derxim? *Naxagah* ê nebê' çî ?

Dûko.— Tu duh ron bûbûyî, îro jî hatiyî xwe beropaşo datînî?

Cefo.— Lo beropaş mîna yênte ne, wekî ez jî te ra Kurmancî dibêjim, nîşaniyê bi paş da bidin! Tu fam nakî ?

Dûko.— Çi ye, qelên qudumê te şikênand?

Cefo.— Lêêê qelen, qelen hindik e? Çar hezar û pênsed manat çî xeber e ?

Dûko.— Te duh digot, “Bibirr!”

Cefo.— Min gotiye, “Bibirr, bi însaf bibirr” Ne ku lap berbad bike. Min gotiye, hezarî bibirr, du hezaran...

Dûko.— Qîza min ne qîza du hezaran e!

Cefo.— Ji çî re kê mî pere ye du hezar? du hezaran ra kapan davêjî? Niha, vê saetê, mirov çavê xwe bigire, dikare bi du hezaran pêncî pezî bistîne.

Dûko.— Qîza min pez nîn e!

Cefo.— Wekî pez nîn e, çima difiroşî?

Dûko.— Ez nafiroşim, heval, ez qîza xwe bi qelen didim!

Cefo.— Êêê yek nîn e? Çî bifiroşî, çî bi qelen bidî, yan Hesên Keçel, yan Keçel Hesên. Yek nîn e?

Dûko.— Helbet yek nîn e; firotan firotan e, qelen qelen e. Qelen ew edetê *atada babada* ye.

Cefo.- *Atada babada* ber serê min ra derbas nabe, ez merivê balşêvîk im.

Dûko.— Ew tu kingê da wisa bûyî balşêvîkê xalis ?

Cefo.— Ez timî jî balşêvîkê xalis bûme. Timî jî li ser *sragîra* wan çûme. Di *sragîra* wan de jî qelen tune. Heke rastiya Xwedê dipirî, bi zagonê bikeve, qet te ra qelen nakeve. Te ra sîd dikeve; yê mîna te, xercê wan sîd e. Lê çî dewran e. (*Dûko çavtirsîyayî dibe, Cefo bi ser ve tê.*) Bêqelen, mîna mîletên mayîn, Bêqelen! Hergê tê Bêqelen bidî, ser çavan, ser seran, ez ê îro jî bûka xwe siwar bikim.

Dûko.— *Yazix*, tu di mala min da nî Cafer.

Cefo.— Na na, Xwedê hebînî, di mala te de nîn bûma, te yê çî bikira?

Dûko.— Min dizanibû min çî dikir...

Cefo.— De derê ber Pira Bella, em teseliya hev bikin!

Dûko.— Qîzê, bîne, bîne zirt û zibîla nîşaniya vî gemarî bidinê, bila biteqise here!

(Besê dertê ji odeyê, diçe nîşaniyê bîne.)

Cefo.— Te got çî? Zanî, ez te jî nas dikim, kalê te jî nas dikim, bavê te jî...

Dûko.— Bavê min glavîyê gundekî bû, parsekçî!

Cefo.— Bavê te selexur bû, wekî niha hebûya, min ê ew bida sûd.

(Besê mehde kirî tê hundirê odeyê.)

Besê.— Dûko, ca were!

Dûko.— Qîzê, ka nîşanî?!

Besê.— Ca were...

Dûko.— Ka nîşanî?

Besê.— Qîza te nade, nade...

Dûko.— Qîzê, çawa nade?!

Cefo.— Heyrana çavê wê me, ew li ser qerara min e.

Dûko.— La mi....

Cefo.— Lo, qarişma, qirara kê ra didî xevera! Ezê te tême pison!

(Dûko hersehêrs diçe otaxa ku Sernaz tê de ne.)

Dûko.— Qizê, *barîşne*, komsomol, ez tûyî wan heşt salên te kim, wekî te dixwend!

Tê xwe bavêjî ser sêla sor? Ka nişaniya wan?

Sernaz.— Here, ji min dûr bikeve! Çiyê te bi min ketiye?

Dûko.— Çiyê min bi te ketiye? Han ji te ra, çiyê min bi te ketiye!

(Sîleyekê dide qîza xwe.)

Sernaz.— Apooo... ihî, ihî...

(Digiri.)

Cefo.— Êêê olam, tu li bûka kî dixî?! Ez ê te vejênim!

Dûko.— Qancix, tu qîza min î, yan na?

Sernaz.— Ez ez im.

Dûko.— Qîza min î, yan na?

Sernaz.— Qîza te me, ne peza te me...

Cefo.— *Maladês!*

Dûko.— Têrmaş, tu bi wê gumanê yî ez qîza xwe bidime kurê te?

Ez ê bidime Dodo jî, lê nadime kurê te.

Cefo.— Êêê, giliya mêran gilî ye!

Dûko.—Weki ez nedime Dodo, bavê min Kurdûnda be! Meco lawo gazî Dodo bike!

Besê.— Dûko, te xêr e? kerr be, Dûko!

Dûko.— Kuro, vê saetê gazî Dodo bike!

(Sernaz wê demê diçe derve. Cefo pey dertê.)

Sernaz.— Inê, ez çûm!

Cefo.— Zû xwe bavêje kabînkê, zû bike! Ezîz li hêviya te ye!

(Deng avtiyê tê.)

Besê.—Serkêêê!

Dûko. — Sernazzz!

Cefo.— *(Ji dûr ve.)* Malî ava, malî ava..!